

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ




- Ali Karadeniz Sed carî Nûbihar
► Sabah Kara Kultur zik tîr nake
► Süleyman Çevik Umrek me bi Nûbiharê re derbas kir
► Memê Alan Bi hêviya nêçe sed hejmaran
► Muayyed Tayyib
► Dr. Muhsin Doskî
► Tahsîn Îbrahîm Doskî
► Ayhan Geverî Rola kovaran û cîyê Nûbiharê
► Rojen Barnas Jimara sedî ya Nûbiharê
► M. Emin Bozarslan Xweştir e
► Ehmed Akın Sê xisûsiyetên Nûbiharê
T
T
E
B
Y
A
T
A
R
A
M
-
J
► Adar Jîyan Bi hêviya temenekî dirêjtir
► Zeynelabidîn Zinar Nûbihar adana berê çanda hezarsale ye
► Felat Dilgeş Nûbihar hilmek azadî ye
► Ebdulhadi Botî Nûbihar medreseyek e
► Mehmed Uzun Name
► Mehmet Rauf Çiçek Çi dibêjin di heqê Nûbiharê de
► Selahaddîn Şivan Gula payizê Nûbihar
► Cankurd Derketina 100 jimareya Nûbiharê hîviya di dilan de geştir dîke
► Ferîd Îzol Ciyê kovara Nûbiharê
► Murad Celalî Hejmara Nûbiharê ya sedan
► Dr. Naci Kutlay Nûbihar û kurd
► Salihê Kevirbirî Panzdeh sal gotina "kurdî-kurmancî": Nûbihar
► Selîm Temo Mîna hîva çardê mehê
► Ahmet Aras Ferqa Nûbiharê
► Roşan Lezgîn Nûbihar, biciwe hezaran wisar



KENT'in ışıkları

M.Said Ramazan el-Bûtî'den
iki önemli eser



Roman, 150 s.



Roman, 157 s.



Kultur zik t�r nake. 5 Sabah Kara	R�. 34 R. Karakaya
Umrek me bi N�bihar� re derbas kir . . . 7 S�leyman �evik	N�bihar medreseyek e 37 Ebdulhadi Boti
�ir 9 Johann Wolfgang vo Goethe	Name 39 Mehmed Uzun
Xazel 10 Mimi Khalvati	�i dib�jin di heq� N�bihar� de 41 Mehmet Rauf �i�ek
Bi h�v�ya n�ce sed hejmaran 11 Mem� Alan	Gula payiz� N�bihar 44 Selahadd�n �ivan
�i dib�jin di heq� N�bihar� de? 15 L�pirs�n: Mesud Girav� Muayyed Tayyib Dr. Muhsin Doski Tahs�n Ibrahim Doski	Derketina 100 jimareya N�bihar� h�v�ya di dilan de ge�tir dike 45 Cankurd
Rola kovaran � c�y� N�bihar� 17 Ayhan Geveri	C�y� kovara N�bihar� 46 Ferid �zol
Hehecik 21 Xur�id R��en	Hejmara N�bihar� ya sedan. 47 Murad Celali
Jimara sed� ya N�bihar�. 22 Rojen Barnas	N�bihar � kurd. 49 Dr. Naci Kutlay
Xwe�tir e 24 M. Emin Bozarslan	Panzdeh sal gotina "kurd�-kurmanci": N�bihar 51 Salih� Kevirbiri
S� xis�siyet�n N�bihar�. 25 Ehmed Ak�n	Can li p�� te her saet dirize � ��n dibe 53 Mewlana Celaedd�n� Rom�
Bi h�v�ya temenek� dir�jtir. 28 Adar J�yan	P�r � D�r 54 Berken Bereh
N�bihar adana ber� �anda hezarsale ye 31 Zeynelabidin Zinar	M�na h�va �ard� meh� 55 Sel�m Temo
N�bihar hilmek azad� ye 32 Felat Dilge�	Di edebiyat� de �avek d�rb�n: �irok . 57 Ayhan Geveri
�arin 33 Rojen Barnas	Ferqa N�bihar�. 61 Ahmet Aras

Sed carî Nûbihar

Bi hejmara 100î ve merheba ji we re. Kovara Nûbiharê di hundir van çardeh salên dawî de, di jîyana weşangerîyê de li gor xwe cîhek girtîye. Li erdekî ku xebat û çalakîyên nivîskî lê çenedibû dest bi jîyanê kir û rehê xwe berda binê axê. Kesê ku pêşengtîya derxistina Nûbiharê kirin, bi qîymetê ilm û zanîn û xwendinê rind dizanîn. Pê bawer bûn ku cihê tedrîsat lê tunebe, dibe sebebê tevlihevî û ne-rehetîyê. Civata bêilm û xwendin, weke ava ku di cihê xwe de girtî bimîne û neherike, wisan bihn dikevêyê.

Jîyaneke bikêrhatî û serkeftî, bi mirovên rêzan û çavnasê jîyanê çêdibe. Bi vê fikrê û bi vê nîyetê kovara Nûbiharê dest bi jîyana xwe kirîye. Mirovên ku di meydana teng de jîyana xwe dimeşandin, xwestîye wan bikşîne nava meydana fikrê û asoyên nû li ber wan veke, xwestîye ku însanên wê di jîyana fikrî, aborî, ilmî de bêhtir bixebitin.

Di hundir van çardeh salan de bêguman tiştê Nûbiharê kirîye, gaveke gellekî biçûk e. Meriv dikare bibêje tenê biqasî mûmekê dora xwe ronî kirîye. Lê em dikarin bi kamranî bibêjin ku di vî nîrê teng de wê xwe bi sebrê girtîye. Di vê meydana ku qedrê xwendinê di pey hemî tiştan re tê, tiştên ku jîyana mirovan îşxal kirine, wê xwe bi sebrê û elbettê xwe bi destê xwendevanên xwe yê dilsoz girtîye û maye heta îro. Bêguman, Nûbihar fêkîya vê desthev-girtinê ye.

Kovarên kulturî parçeyek in ji kultura milletê xwe. Bi wan re hene û her di nav wan de ne. Kovarên kulturî ew deng in ku ji gellek dangan pêk tê, serekî pîr biçav û pîr biguh e. Hemû helên heyatê, hemû aliyên jîyanê tê de xwuya dibin. Rêyek mezin e ku hemû rê digîhêjinê. Behreke fireh e ku hemû çem tî tevî dibin.

Nûbihar, bi vê nîyetê hate derxistin û li ser nîyeta xwe ye. Tevî qisûr û kêmasîyê wê em pê bawer in ku Nûbiharê tişteki gellekî muhîm bi cîh anîye; ew bûye sebeba ku mirovê me hêjayîya berhemên kulturî, hebûna xebatên kulturî çêtir fahm bikin. Ji vî muddetî ku Nûbihar dertê, têkîlî û aleqeya di navbera mirovan de pêk hatîye, gellekî kêfxweşîyê dide meriv. Ew pîrek e di navbera hemû aliyê civata me de. Ji bilî vê jî, ew bûye pîrek di navbera edebîyata kurdî û edebîyata zimanên din de. Ew bûye sebebê îftîxara Ahmedê Xanî, bûye dengê Cizîrî ku bang li Selmaya xwe dike. Bûye şetê ku Feqîyê Teyran pê re diavêje ber hev. Bûye peyrevê hemî mîmarên kultura me. Bûye dengê bengîniyan, bûye defter û tuwala ressamên. Bûye rêya çîrokên ku ji kûranîya dîrokê tî ber bi dûranîyê ve diçin. Bûye meclîsa mutfekkiran û ronakbîran ku li wê tîne cem hev û li ser meseleyan munazereyan dikin.

Em bi wê hêvîyê ne ku heta ku kovara Nûbiharê bi kêra kultura milletê xwe biê, ev dengê mutewazî, berdewam be.

Piştî hejmara sedî êdî gaveke nû dest pê dike ji bo Nûbiharê. Bi munasebata hejmara 100î me pêşbazîyek li darxistîye. Di şaxa çîrokê de û di şaxa şîrê de. Xwedê ra û destûrê bide, emê van pêşbazîyan bidomînin.

Em hêvîdar in ku emê dîsa bi hev re dest bi dest din û vê kovarê bimeşînin.

Ali Karadeniz

Nûbihar, biciwe hezaran wisar 62 Roşan Lezgîn	Alî û Zehra di betlanê de 101 Rojbin Özkan
Dexlê to bena 64 Ö. Faruk Çetinkaplan	Çûk û sofî 103 Seyda Ronahî
Cu û merg 65 W.K Merdimîn	Evîneke zor 104 Gülîstan Çoban
Amîd û Dicle 66 Hasan Huseyin Çevik	Wefata M. İsmet Kiliçaslan 105 M. Reşîd Irgat
Kirmanckî (zazakî) û edebiyata wê . . 67 Roşan Lezgîn	Ji keçeke qerd, veweşînine xurt 107 Ayhan Meretowar
Leyletul Qedr = Şeva Qedrê fezîleta şeva qedrê 73 Mela Muhammed Bêrkevanî	Şîr 109 Heinrich Heine
Mirin bêberbûr e 78 Zilkîf Xweşhêvî	Vae victis 1: lome 110 Selîm Temo
Demsal 81 Bamed Serdar	Ristem û Sohrab 111 Lokman Polat
Ji hemû zanyar, meşayix, serok û zilamên Kurdistanê re daxûyanîyek derbarê meşrûtiyetê de 83 Bediuzzeman	Du xerîbên piçûk 115 Gulîstan Çoban
Resmên şevê 84 Sever Işık	Hêviyên piştîsikestî 116 Murad Pola
Wendayîyên mirov an gera li dîv xwe 87 Zübeyir Çoban	Ziman pergala jîyanê ye 119 Seyda Ronahî
Nan 89 Wolfgang Borchert	tîretav û siba zer 121 Sîdîq Gorîcan
Ji wêjeya devkî du çîrok 91 Dilşad Mutî	Sebrê Sebrê 123 İsmet Behrewanî
Doxtorê insan, pisporê zeman: Seîdê Nursî 93 Nevzat Eminoglu	Bihuşta Lal 123 Salihê Kevirbirî
Ronekbîrê kolikî Hecî Uzêr 97 Remzi Çakın	Êşa Evînê 124 Raîfê Bêçare
	Hewar e 125 Seydayê Muhammed Nûrî

Nûbihar

KOVARA ÇANDÎ HUNERÎ EDEBÎ

(KÜLTÜR SANAT EDEBİYAT DERGİSİ)

Büyük Reşit Paşa Cad. Yumni İş Merkezi No: 22/29 Vezneciler/Beyazıt - İstanbul

Tel&Fax: (0212) 519 00 09

www.nubihar.com • info@nubihar.com

Navnîşana Name û Nivîsan

P.K. 80 Fatih - İstanbul

•

Li ser navê Pak Ajans Yayıncılık Ltd. Şti. (adına) Xwedî û berpîrsîyarê Nivîsaran
(Sahibi ve Yazı İşleri Müdürü)

Süleyman Çevik

•

Nûnertîya Almanya

Burhan Kaya

kizilkaya_burhan@yahoo.de

Tel: 0234 - 890 74 10

•

Kovara **Nûbihar** ji 3 mehan carekê; serê Payizê, Serê Zivistanê,
serê Biharê û serê Havînê tê weşandin

•

Amadeyiya ji bo çapê

Nûbihar

•

Çapxane

Kilim Matbaacılık

•

Yayın Türü:

Yerel Süreli

•

Mesûlîyeta ramanên nivîsaran aîdê nivîskaran e. Berhemên hatine şandin bi şûn de nayên veşandin.

•

Berdêla abonetîya salane:

Tirkîye: 20 YTL (20.000.000 TL.)

Welatê din: 25 EURO, 30 \$

•

Jimareyên Hesaban:

Hundir Tirkîye: Postgiro (Posta Çeki H.) Süleyman Çevik: 658265

Dervê Tirkîye: Süleyman Çevik, İşbankası Yavuz Selim Şubesi: 1079-30100-3118770

Kultur zik têt nake

Sabah Kara

Piştî Cenga Cihanîya Duyem, payetextê Alamanyayê Berlîn di binê bombeyan de hema bêje bîtevayî serobino bibû. Herder xerabe bû.

Dibêjin, wê deme fermandarêkî leşkerê Amerîkayê tevî serwezîrê nûyê Alamanyayê Adenauer bi mekînekê li nava bajêr digere. Piştî ku hemû wan xerabeyan dibînin, fermandarê Amerîkî ji serwezîr re dibêje: "Ez bawer nakim ku hûn bikarin van xerabeyan di gellek salan de jî ji holê rakin!"

Cewaba serwezîr Adenauer zehf balkêş e: "Milletê me mirovên wek Goethe, mirovên wek Beethoven derxistîye. Ev millet wê di demek zehf kurt de hertiştî ji nû ve ava bike!"

Û çî dikin, ma hûn dizanin?

Berî hertiştî binayên kulturê ji nû ve ava dikin!

Mekteban; kutûbxaneyan; tîyatroyan; sînemeyan; muzeyan...

Zilamên wan yan di cengê de hatibûn kuştin, yan jî wek êsîr ew biribûn li Rûsyayê, li Îngilistanê, li Frensayê di kampên esaretê de bicih kiribûn.

Yanî Alamanan hemû ew tişt bi zarok û jin û kalan anîn pê!

Ha! Dema ku emele û hemal ji wan re lazim bûn, berê xwe dan welatên wek me û mirovên me ji xwe re birin.

Milletên mezin ew millet in ku ji wan mirovên mezin derketine.

Milletên biçûk ji xerakirinê re; milleten mezin ji avakirinê re ne.

Mongol xerakirin; ava nekirin!

Misrî ava kirin; yunanî ava kirin; romî ava kirin; cihû ava kirin; file ava kirin; misliman ava kirin...

Ji ber ku xerakirin hêsan; lêbelê avakirin zehmet e.

Ji xerakirinê re ti tişt ne lazim e; lêbelê ji avakirinê re îlm divê, zanîn divê, kultur divê...

Malxerab e ew millet ku bê-îlm e, bêzanîn e, bêkultur e, bê mirovên mezin e...

Lêbelê ji wî jî malxerabtir e ew millet ku mirovên wî yên mezin diçin ji milletên din re xizmetê dikin.


Millêtên mezin ew millet in ku ji wan mirovên mezin derketine.

Milletên biçûk ji xerakirinê re; milleten mezin ji avakirinê re ne.

Mongol xerakirin; ava nekirin!

Misrî ava kirin; yunanî ava kirin; romî ava kirin; cihû

ava kirin; file ava kirin; misliman ava kirin...



Berga jimara 96. a Nûbiharê

Gotinên Ehmedê Xanî wek sixêfan in lê ne xema ti kesî ye! Milletê ku mirovek wek Camî hetta neke meysterê (=seyisê) xwe jî, ew millet milletekî lanetkirî ye.

De ka bifikirin ku eger Bedî-
uzzeman hemû ew kullîyata
xwe bi kurdî binivîsîya çi dibû?
Û bifikirin ku çima nenivîsî?
Bi gotina wî, wê demê mese-
len li Stenbolê çil hezar hema-
lên kurd hebûne ku yek ji wan jî
xwendin û nivîsandinê nizanî-
bûye.

Alîyên din yên welat jî wilo
bû.

Îcar ma tê ji kê re binivîsî?

Gotinên Ehmedê Xanî wek
sixêfan in lê ne xema ti kesî ye!
Milletê ku mirovek wek Ca-
mî hetta neke meysterê (=seyisê)

xwe jî, ew millet milletekî lanet-
kirî ye.

Milletê ku mirovek wek Ni-
zamî hetta bi qurûşkî jî nekirre,
ew millet ne millet e, lê kerî ye.

Hatîye neqilkirin ku rokê şa-
irê mezinê alaman Goethe çûye
gerrê. Di vegeerê de desmêja bi-
çûk zehf zorê dayîyê. Berî ku
xwe bighîne malê, mecbûr ma-
ye û bi dîwarê hewşa xwe de
mîzîye. Wê demê tu nabê gun-
dîyin ji gund ber bi bajêr ve di-
çin û rîya wan ji ber dîwarê Go-
ethe derbas dibe. Ew Goethe
wek şexs nas nakin. Dibînin ku
waye mirovek bi dîwarê Goethe
de dimîze. Yek ji wan bi hêrs ji
Goethe re dibêje: “Xirifîyo! Ma
tu ji xwe fihêt nakî ku tu bi dî-
warê şairê herî mezinê alaman
de dimîzî!”

Rokê ji Goethe dipirsin ku:
“Ustad! Te gellek medh û sena
bihîstine. Gelo medha ku herî
zêde kêfa te jê re hatîye, kijan
e?”

Cewaba Goethe, “Gotina wî
gundîyî!” ye.

Îcar bi nîyeta ku em zanîn û
kulturê bi zimanê wan di nav
mîrovên xwe de geş bikin, me di
sala 1992wan de mecmûeya pir
bi bereketa Nûbiharê weşand.

Jimara 100em bi xêr be.

Bi hêvîya hezaran!

Rayên Nûbiharê, îxlas e.

Gewda Nûbiharê uxuwwet
e.

Dar û pelên Nûbiharê hêvî û
dua ne.

Gul û fêkîyên Nûbiharê ave-
ruwê me ne.

Û wesselam! ■

Umrek me bi Nûbiharê re derbas kir

Süleyman Çevik

ceviksuleyman@hotmail.com

Li Fatîhê, di wî cihê gelek piçûk de em du-sê kes bûn. Du odayên me yên piçûk cihê xebata me, cihê pêşwazîkirina mêvanên me û cihê çêkirina feravîn û çaya me bû jî...

Ev cih, herdu ode pevce encax 30 m² hebûn. Me li wî cihê di sala 1992yan de dest bi Nûbiharê kir û li wêderê şeş hejmar derxistin.


Pêşîyê qomputerê me jî tunebû. Hejmara yekê û ya duduyan me li cem hinek hevalên din yên ku weşangerîyê dikin amade kirin. Paşê me qomputerê jî xwe re kirî... Ew qomputera ku me ji xwe re kirîbû hê jî heye, lê êdî naşixule... Kekê Sabah Bepirsîyarê Giştî bû; nivîsên kovarê wî rêz dikirin, teshîh dikir û pergala rûpelan jî wî çêdikir. Min û Mûştahir Karakaya jî alîkarîya wî dikir. Dema Ali Karadeniz piştî hejmara pêncan ji Enqerê hat, ji alîyê rêzîkirin û teshîhê ve barê kekê Sabah sivik bû...

Berga kovarê jî hetanî hejmara 16an me li ciheke din da çêkirin. Lêbelê ji hejmara 17an pêve êdî berga kovarê jî me bi xwe amade dikir.

Heta ku hejmara 36an derket sê salan bînavber ez bi kekê Sabah re xebitîm. Piştî wê, dema kekê Sabah çû Ewrûpayê û li wir ma, Ali Karadeniz jî ji ber sebêbên aborî êdî li cihê din dixebitî. Ji bo kovarekê ku demeke dirêj bête hesibandin ez tenê mam û heta Ali vegeyîya navber dirêj bû û hejmarên kovarê jî bi derengî ketin...

Bi çûyina kekê Sabah ew pergala ku ewî danîbû xirab bibû. Ji vir pê ve divê me li gor xwe pergalek danîya. Kovareke mîna Nûbiharê jî bi şexsekî dernediket! Ji destpêkê heta îro li cihê emê çend heb bixebitîyana em yek-dudu dixebitîn... Ez bi xemgînî dibêjim ku bi rastî jî em yek-dudu bûn. Ji destpêka Nûbiharê heta îro jî ji ber sebêbên aborî me nikarîye em çend merivan îstîhdam bikin. Di ser de tew jî carina me karê Nûbiharê jî îhmal kirîye. Ji bo başîkirina aborîya xwe hinek ji me ya karên din kirine, yan jî ew heval bi temamî çûne di ciheke din de xebitîne. Ev rastî, bûye sebebê ku me nikarîbûya kovareke xweştir û dewlemendtir derxînin.

Pêşîyê qomputerê me jî tunebû. Hejmara yekê û ya duduyan me li cem hinek hevalên din yên ku weşangerîyê dikin amade kirin. Paşê me qomputerê jî xwe re kirî... Ew qomputera ku me ji xwe re kirîbû hê jî heye, lê êdî naşixule...



Berga jimara 92. a Nûbiharê

- Koçberî û Pêşeroja me
- Hêmayên Partî Partî Mîrî
- Kevokê Bîfîndê
- Rêbaza Teşîbê di Bîlêhe
- Sorhatê Mîrî
- Ew û Bîrewerîya Netewî
- Mahabad û Şewê
- Bi Zana Farqîbî re Hêvîyên
- Jêrêke Be Ewmanî Tu
- Mezîrîstêke Xwestî, Serab
- Zûnanê Xwezayî
- Çand û Hêner
- Di Çolpeke Cûmbûyîstê de...
- Mîrî
- Şahmed û Xecê

Divê vê xebata Nûbiharê de heger ez keda Kekê Osman ne-bêjim ezê neheqîyek mezin lê bikim. Ji destpêkê heta niha di şertên herî dijwar de Kekê Osman tim û tim li me xwedî derketîye...

Demekê jî ez bi Selman Dîlovan re xebitîm. Selman di warê edebîyata klasîk ya kurdî de hevalekî gelek baş e. Medrese xelas kiribîye, hem zimanê erebî dizane, hem jî bi latînî û erebî kurdî xweş dizane... Di van salên dawî de jî—gerçî niha li Stenbolê nine—Ayhan Gevêrî baş alîkarîya me dike... Ew jî weke Selman herdu alfabe-yên kurdî jî dizane...

Ji ber ku qaîdên zimanê kurdî ji bo herkesî rûnenîştine, ji kovareke tirkî zêdetir hewceyîya me bi xebatkarên heye.

Ji destpêkê heta îro çûyîn û hatina Nûbiharê jî gelek e.

Hem ji bo amadekirin û rastkirina Nûbiharê, hem jî ji bo aleqedarbûna mêvanan mirov lazîm in...

Heta niha rojname û kovarên kurdî tevan di şertên gelek dijwar de, rojnamegerîyek ji welatê xwe dûr meşandine. Ev rojnamegerî, rojnamegerîya sirgûnê ye û bi alîyan ve ji adetên dunyayê der e. Nûbihar jî yek ji elemanên vê

weşangerîyê ye û wê jî ji van tiştên neyinî têra xwe para xwe standîye...

Însanên ji derve li me mêze dikin niha dibêjin, madem ewqas sal e ev kes Nûbiharê derdixin naxwe aborîya wan baş e. Helbet em hêvî dikin ku aborîya me baş bibe... Lê divê ez li vir bibêjim ku sebebê domandina vî karî ne ji başbûna aborîya me ye. Heger nîyeteke jidil û îxlas di vî karî de nebana îro behsa xebateke wiha jî nedihate kirin...

Weke gelek kes jî dibêjin, ji destpêkê heta îro Nûbiharê bi zîhneke vekirî li meseleyan mêze kirîye, her dor hambêz kirîye û cûdatî nexistîye navbera wan... Heta niha Nûbiharê derîyê xwe jî ji kesekî negirtîye. Çûye li derîyê herkesî jî xistîye û li wan bûye mîvan jî.

Ji vir pêve jî divê Nûbihar vê xeta xwe bi îstîqrar bidomîne. Hevalên ku bûne sebeb Nûbihar hatîye roja îro, divê ji vir pêve jî li vê xizmetê xwedî derkevin.

Kurdên ku heta niha ji Nûbiharê dûr mane lazîm e ew jî li vê xizmeta mutewazî xwedî derkevin û di vê meşê de mil û dest bidine me.

Carina ez li cihna rastî hinekan tîm, û ew kes ji hedê min zêdetir qîmetê didine min; û ez ji ber wê qîmetdayînê fedî dikim. Herçiqas ez bizanibim ew qîmetdayîna ne ji bo şexsê min be jî... Carina jî ji rast û çepê min dengên teqdîran tîne guhê min, ez dîsa dizanim ku mijar Nûbihar e. Ji ber ku ev xebat kêfa însanên me tîne, şadîyek li min peyda dibe. Lêbelê dema çavê min li çavê wan dikeve, serê min li ber min xwar dibe. Ew hezkirin û qîmeta ku divê meriv li hezaran bi

Însanên ji derve li me mêze dikin niha dibêjin, madem ewqas sal e ev kes Nûbiharê derdixin naxwe aborîya wan baş e. Helbet em hêvî dikin ku aborîya me baş bibe... Lê divê ez li vir bibêjim ku sebebê domandina vî karî ne ji başbûna aborîya me ye. Heger nîyeteke jidil û îxlas di vî karî de nebana îro behsa xebateke wiha jî nedihate kirin...

merivî belav bike, tev di ser min de tèn û ez di bin wê aleqeyê de dipelçiqim...

Ewên ku ji kovarê re abone peyda kirine, yên ku bi desta firotine, yên kovar kirîne, yên ku di kovarê de nivîsîne... keda tevan di vî karî de heye û ewana tev layiqê vê hezkirinê ne.

Ji sala 1992yan heta îro umrek derbas bûye. Di vê mudetê de me hem biharên rengîn ku meriv pê şad û mesrûr dibe dîtîn, hem jî zivistanên wisa dîtîn ku ji dilên me, ji bedenên me parçe parçe goşt jêkirin û birin... Li cihkî kêf û şahîya pêşveçûna me, dewamkirina xebata me hebû û em bi wan kêfxweş bûn; li cihkî jî li ser rêya me kelem û sitirî hebûn, ewana canên me ji me distandin...

Hûn egîtên vê rêya pîroz nas nakin û nizanin kî ne. Hevalên wisa hene ku bi perê xwe nefes dane me ji bo çend seatan yan jî çend rojan. Pere dibêjim, bila neyê bîra we û mêjîyê we tevlihev nebe. Weke sadebûna jîyana me û hebûnên me, ev pere jî reqemên piçûk in. Gelek kurdên me carina di şevê de biqasî mesrefa me ya mehekê pere dixwin... Di nav vê tunetiyê de ev destek ji me re bûye mîna îlac...

Ez wan egîtên ku bi salane dest û mil dane me û ev xebata pîroz gihandine roja îro tebrîk dikim û bi dil û can ji wan tevan re silavan dişînim. Ew heval û hogirên ku ji wê rojê heta îro destê xwe kirine bin kevir û zahmetî kişandine û ev meşa gavek din pêş de birine bêguman merivên mezin in! Lewra ewan mîna însanên pîyasê jîyaneke rehet û sade nehilbijartin. ■

Johann Wolfgang von Goethe (1749-1832)

Ji Almanî: E. Akın


*K*ITÊBA* evînê ye,
ya bêhempa ji nav kitêban.
Min bi dîqet xwend:
Şabûn kêr rûpel,
gelek defter jan;
beşek li ser cihêbûnê.
Hevdîtin yeke biçûk î
nîvco. Cildên derdan
bi haşiyeyên dirêj
bêdawî, bêşînor.
Ey Nîzamî! – lê te dît rîya rast
di dawiyê da;
muamma xwend, ku kî dikare?
Bi evîna evîndaran.

* Ev şî'ra han bê sernivîs hatîye weşandin.

Xazel

Mimi Khalvati*

Ji Ingilîzî: Ali Karadeniz



li pey Hafiz

*H*erçend fireh be gulzarê zemîn, min bes
Yek gul û sîya mêwekê, bo min bes.

Naxwazim serweta pir, min nevê çîyê derew
Di durdîya camekê de îsîna heqîqetê bes.

Çi kare Bihuşt bide me parsekan
Û gedayan? Çi mestî, ku mey bes?

Were û rûnê li rex pêlan. Rûbar zuwa diherikin
Belê strana wan hildigirin, yek kolan bes.

Bo şa'irekî xeniqî der dunyaya kitêb,
Tenê yek kitêba berg şikestî bes.

Gava tu li vir bî, yara min, çî hê bixwazim?
Behsa îşqê tenê bi yek misrayê bes.

Bihuşt kare vewest. Ta tu vekî dergeh
Ne Bihuşt herçend xwedayî bes.

Min nîne derî bikim gazind. Weke Hafiz dibêje,
Ne xazelek ku nîşana wî bes?

* Mimi Khalvati li Tehranê hatiye dinyayê. Li Switserlandê mezin bûye û tehsîla xwe li Universiteya Neuchâtel kirîye û li Londonê Drama Centre û li School of African and Oriental Studies xwendîye. Navê çend kitêbê wê ev in: *In White Ink, Mirrorwork, Entries on Light, The Chine.*

Bi hêvîya nêçe sed hejmaran

Memê Alan

Bêguman, kovara Nûbiharê di dilê me de xwedîcihekî bêmînak e. Ew di jîyana gelê me de wek şoreşekê ye. Wê textekî zêrîn yê zimanê Kurdî di dilan de damezirandîye. Ew wek heyvek tije ya rewneqdar di şevên me yên tarî de derhatîye û wek tavêk têrgerm û têrtîrej di zivistana gel de derhilatîye. Ew bihara zimanê gelê min e ku di wê da bêhêjmar û bêpayan kulîlkên bêjeyan û wêjeyî vejîyane. Ew hişyarkera gelê min e ku bi sayeta wê em lixwe arqilîn û bi hestên netewî tije bûn. Bi wê tijebûnê, em hewl didin ku gelê me yê bindest û pelçiqandî li xwe mikûr be û vê rewşa xwe ya kambax biguherîne.

Belê, pir bi jan û keser be jî rastîyek li ber çavan heye. Ew jî, xwejbîrvekirin û devjêberdana doza bav û kalan e. Ew bav û kalên gorbehişt ku ji bo parastina vî gelfî û ji bo wendanebûna vî zimanî mal û canê xwe fîda kiribûn. Wan, hebûna xwe û serxwebûna welatê xwe parçeyek ji jîyan û bawerîya xwe hilbijartibûn. Li hember tunekerên vî gel û wêrankerên vî welatî jix-

we ve borîbûn û jîyana xwe avêtibûn qada mêranî û cangorîyê. Wan, ji bo herheyîkirina gel û welatên xwe, ji bo parastina maf û kesayetîya xwe, ji bo serberzî û serefrazîya xwe, ji bo jîyanek azad û rûmetdar, ji bo pêşvebirin û avadanîya niştîman, ji bo şanazî û kamranîya vî gelê sîtemxurê stûxwar, tekoşîn dan, fîda kirin mal û can, nav û nîşan dan li cîhan, mîrateyek hiştin li dûv xwe ku bi navê xwe Kurdistan.

Erê, ji wan bavûkalan yek jî Şêx Ehmedê Xanî yê kal bû. Wî di tekoşîna xwe ya niviskî de berhemên giranbiha li dûv xwe hiştin ku yek ji wan berheman *Nûbihara Biçûkan* bû. Wek têzanîn ku di vê berhemê de daxwaza Ehmedê Xanî ew bû ku ji bo zarokên Kurmancan, ligel zimanê xwe zimanê Erebi jî hîn bibin. Bi gor bawerîya min, yek ji sedem jî ew e ku Xanî xwestîye dewlemendîya Kurmancî jî bide selmandin û îsbatkirin. Herwiha, dîsa tê zanîn ku di derbarê Kurdî de Xanî di *Mem û Zîn* da jî gazî û hawara xwe anîye ziman. Ji bo çî? Ji bona ku

Dîsa rastîyek li ber çavan e ku bi taybetî Kurdên bakur gelectirîn polîtîze bûnin. Ev polîtîzebûna ne li angorê Kurdayetîyê ye. Belko, li ser Kurdayetîyê ve xebatmeşandin û rêxistinçêkirinê ji bo armancên cihê cihê ne. Ango, Kurdayetî, di nav vê polîtîzebûnê da tenê wek fîguranekî dixuye.



Ez di wê bawerîyê da me ku, ger Kurd bi zimanê xwe, bi taybetî ji di nav mal û malbatê da, di nav hev û hevalan de, neaxifin, ti car dilsozî û rasteqînîya xwe nikarin dîyar bikin û herwiha nikarin xwe di raya giştî û gelerî de bidin bicihkirin.

Kurd li hebûna xwe xwedî derkevin û di qada navnetewî de netewek bêziman nebe. Lewra ku, ziman tunebe, hebûn jî tune ye, kesayetî jî namîne. Bêzimanî, bênijadî ye; bênijadî jî pergendemayîna li serê cîhanê ye. Aha, di vê nuxtê de û di vê pêngavê da girîngî û hêjayetîya xwedîderketina li Kurdî derdikeve holê. Ev girîngîyek wisa ye ku, wek nexweşîyek giran û lezginî têkildarîyek ji destve dixwaze. Paşdeavêtin, gohnedayîn û sersewixandin, tenê mirinê leztir dike û dibe sedemê ji holêrabûnê.

Dîsa rastîyek li ber çavan e ku bi taybetî Kurdên bakur gelêkî polîtîze bûnin. Ev polîtîzebûna ne li angorê Kurdayetîyê ye. Belko, li ser Kurdayetîyê ve xebatmeşandin û rêxistinçêkirinê ji bo armancên cihê cihê ne. Ango, Kurdayetî, di nav vê polîtîzebûnê de tenê wek fîguranekî dixuye. Ne armanc û mebesta evreng Kurdan in. Destnîşanî û selmandina vê yekî jî ev e ku, di axaftin û têkilîyên rojane da Kurdî bi kar naynin û zêdetirîn bi zimanê Tirkî hewil didin. Ev yek jî duristî û dilsozîya van Kurdên polîtîzebûyî, di nêrîna gelê kurd û raya navnetewî de rexnedar û birîndar dike. Lewra, ne ku bi dehan, bi hezaran sîyasetvan, nivîskar û rêxistvanên Kurd li pîyasê henin û di nav he-

wildanan de ne ku hemû kar û xebatên xwe, heta berhemên xwe bi zimanê bîyanî dimeşînin ku vê yekî jî wek cudarengî dinirxînin. Di vê rewşê de, Nûbihar wek brûskêkê di serê van de vedide û wan vexwendî lixwe mikûrbûnê dike.

Ez di wê bawerîyê da me ku, ger Kurd bi zimanê xwe, bi taybetî ji di nav mal û malbatê da, di nav hev û hevalan de, neaxifin, ti car dilsozî û rasteqînîya xwe nikarin dîyar bikin û herwiha nikarin xwe di raya giştî û gelerî de bidin bicihkirin. Heya dikarin bila bêjin ku em Kurd in, em Kurdperwer û welatparêz in, ev gotin di pratîgên wan de dirize û pûç dibe; tenê durûtî û sextekarîya wan derdixe holê. Ji dervê vîya, tevgerên bi vî rengî, gelê Kurd ji dozê dûrdixe û bawerîya bi wan hildiweşîne. Divêt ev yek, wek seferberîyeke gelane, wek şerekî hebûn û tunebûnê were nixandin û li ser vî reng û rêbazî têkoşerî were meşandin. Ma êdî ne şerm e ji wan kesan re ku, navê zarokên xwe Kurdî datînin, lê pêra axaftina bi Kurdî qedexa dikin. Xebînet nine ku zarokên bi navê Zîlan, Dîlan, Şîlan, Şoreş, Bermal, Rûken, Rêzan û hwd. Ji axaftina bi Kurdî bêpar dimînin. Ma ne heyf û xebînet e ku di dîroka vî gelî da, di bin bandorîya sazû-

manek wiha rehperest û mêtînger de bi zor mafek bi dest gel dikeve ku qursên Kurdî tên vekirin; bi şanazî û merasîmên kêfxweşî ev vekirin tê pîrozkirin û bi salek şûn de kilîd tê lêxistin? Hem jî bi destên xwe... Ma ne rûreşî û şerpezebûnek e ku mafê weşana Kurdî tê bidestxistin û bi navberek yekmehî şûn de weşana ya têrawestandî, an jî ji pênc rojan dadikeve du rojan? Hem jî li Ameda navend û textê dilan...

Erê heval Nûbihar! Mirov naxwaze kul û keseran bîne ziman. Mirov naxwaze birînên kewandî xwînî bike. Ne tiştêkî durist e ku bi çêlkirina van kambaxî û nerindîyan hêvîya gel bişkînin. Lêhema ev jî rastîyeke ku divêt ev gel xwe dawêşîne. Bes êdî ev toz û gemarîya ji xwedûrketinê. Bes e êdî ev hişkbawerîyên îdeolojîk û çiravkên dûvikbûnê. Bes êdî bendewarî û stûtewandina li pêş hêzr û ramanên ne jime nin. Bes êdî kojan-dina hestîyên berlingan. Bes êdî lixwekirina qerpal û şekalên xelkê. Bes êdî êrîşkarîya ola pîroz ya Îslamê. Bes êdî henek û tinazkirinên bi eymet û kevneşopîyên gelî. Bes êdî nêrinên şaş û yekalîyên îdeolojîk. Bes êdî destavêtina şûr û mertalên xelkê. Derkevin li hev xwedî. Bimirin ji bona hev. Pişt bidin xebat û lebatên hev. Ji hev re kozîk û dahfîkan venedin. Nebin xayînên hev û gelên xwe. Bi çavên xelkê lihev nenêrin. Bi hev bawer bin. Bişkînin zencîrên koletîya nezani, xizani û dijhevbûnê. Dest bavêjin çeka herî giran û girîngiya xwendin û nivîsandinê. Hebûnîya xwe biparêzin bi axaftina zimanê zîmkatî yê şêrin û nazenîn. Bixebitin bi awayê rêkûpêkî yê rêxistinî û sazbandî. Xwedî derkevin li pêşeng û le-

hengên dîrokî yê gelerî. Bixwînin qlasîk û kevnaresyên xwe. Bi-meşin li dûv zana û zanyarên gelê xwe. Biparêzin rêk û rêçikên bapîrên xwe. Huner ne ewe ku çand û kevneşopîyan wêran û rewxa bike; huner ew e ku ligel pêşkeftîyên nûjen, em karibin hevstrandin û sentezekî bi kar bînin. Lewra, tunekirin û mandelêkirin hem hêsan e, hem jî ger şûna wan bi tiştên hêj baştir û hêjatir neyên tijekirin, ev yek dibê sedem û egerîya wêrankarîyek neveger. Naxwe, ji bo sazkirina bijangan, em çavan derneynin...

Rêheval Nûbihar! Herçend bi gazind û sîtem bim jî, lê tu zani-bî ku ev yek ji ber jana dil û kezê ye. Lê ji hêla Te ve ez bêgazinc û bêgîlî me. Lewra, Xwedê heye, ez herdem bi te serefraz û bi hebûna Te şanaz im. Nebes, hebûna te ji bo min û gellek gellek kesan hêvîyek mezin û herheyîn e. Xwedê dizane û em jî dizanin ku te heya niha tenê Kurdayetî parast, Kurdayetî anî rojevê û navûnîşana te jî bes bû Kurdayetî. Bi kurtî, tu gel û zimanê min î. Te rêkek da ber xwe û Te jixwe ta armancek danîşandin. Te xwe ji bîrûbawerîyên hişk û tundî dûrgirt; Te ling neavêt ber ti kesî. Te rastîyê xwe anî ziman û bi çewtîyan re mêjî neçelqandin. Ez vê xebata te pîroz dikim; her dem li pişt te destekdar û piştevanim: Tu her hebî, tekoşîna te bi ber û berketî be. Ji bo te ne hêjmarên sedîn, temenekî sedsalîn daxwaz dikim û alîkarîya Xwedayê Mezin ligel te be...


Bimîn di parastina Xwedê da...■

Du klasîkên hêja

Baba Tahîrê Uryan
DUBEYTÎ

بایات
بیوتی

Ji parî
Sabah Kara



Nûbihar

Omer Xeyyam
RUBAIYAT

رباعیات
عمر خیام



Ji parî
Sabah Kara



Nûbihar

Ji navnîşana me bixwazin
Tel: 0212 519 00 09
www.nubihar.com

Du klasîkên hêja



Ji bo xwestinê

Nûbihar

www.nubihar.com

info@nubihar.com

Çi dibêjin di heqê Nûbiharê de?

Lêpirsîn Mesud Giravî


Muayyed Tayyîb

-Xwedîyê Kovara Kepir û Bêpîrsê
Weşanxaneya Spîrêz-

Bi rastî jî cihê serferazî û şênazîyê ye ku komeka mirovên dilsoz bo zimanê xwe û çanda xwe li Stenbolê de şîyayne 100 hejmar ji kovareke derbêxin bi navê Nûbihar. Nûbihar navê wê wekî em hemî dizanîn Xaniyê mezin Ahmedê Xanî ev nave li ser ferhenga xwe kiribû, ev ferhenge erebî û kurdî bû Mebesta wî ji vê ferhengê ew bû ku dergehê jî bo zarokên kurd veketin zimanê erebî bizanin, zimanê erebî têbigihin, ji ber ku hingî zimanê erebî zimanê çand û rewşenbîrî bû, ji bilî zimanê ayîne/dîne xelkê me bû, ji bilî ku zimanê Qur'anê bû, her mirovek di çarçûvên perçên dewletên Îslamê de dijîya zimanê dişîya bi zimanî erebî danûstandin bikin. Helbijartina vî navî bo kovara Nûbiharê ewa ku wergeryaye ser rexsernatiya gelê kurd de xwendevanên kurd dîroka xwe nas bike û edebiyata klasîkî nas bike û ya nûdem jî nas bike. Tiştêkî dî ku Nûbiharê ji kovaren dî ferq dike ew e ku Nûbihar ser koka edebiyata klasîkî şîn bûye. Ewên ku tê de kar dikin jî şare-

zayîyeka baş di edebiyata klasîkî û ya nûdem de heye. Derxistina kovarekê bi rastî jî karkî cihê serferazî û şênazîyê ye. Em hemî dixwazin roj bi roj pêşkeftinê de bin, Nûbihar bibe dengê zimanê Kurdî û bibe bingehê hemî nivîskarên Kurd ku li ser rûpelên Nûbiharê hevûdu nas bikin.

Nûbihar kovarek ciwan e û ciwankêş e dilê mirov diçe xwendina wê. Navaroka wê ji hemî babetan pêk têt. Nûbihar profîla welgirtîye edebiyata klasîkî ye lê edebiyata nû jî jibîr nekiriye. Nûbihar îro ser hindêra ku belavbûna van kovaran wekî kovarekî Kurdî sanahî nîne. Lê Nûbihar evroke ser çar perçên Kurdistanê de tête naskirin. Yê ku Nûbihar nexwendine jî dizanin ku kovarek derdikevit li Stenbolê de bi navê Nûbihar. Nûbihar bûye bingehê Kurdperweriyê û zimanê Kurdî. Eve serkeftinekî gelek mezin e. Nûbihar ne tenê kovare, ji kovarekî mestir e. Em wek Kurdê vêrê dibêjin dezgeh yanî muessesa Nûbiharê bi rastî jî muessese ye. Çunkî xwedîyê ziman û edebiyata Kurdî derketin. Li ser 100 kovarê em 100 gul û nergisên biharê Kurdistanê dikeyne dîyarî bo hemî karkêrên û nivîskarên



Muayyed Tayyîb

Yên ku Nûbihar nexwendine jî dizanin ku kovarek derdikevit li Stenbolê de bi navê Nûbihar. Nûbihar bûye bingehê Kurdperweriyê û zimanê Kurdî. Eve serkeftinekî gelek mezin e. Nûbihar ne tenê kovare, ji kovarekî mestir e.

yên ku li ser van rûpelên Nûbiharê dinivîsin û wan kesên dilsoz û Kurdperwerê ji destpêkê hetta evroke berdeyam dikeyn. Hêviya 1000 hejmara dikeyn û bi sal salê di pêşkeftinê de bitin...■

Dr. Muhsin Doskî

Nivîskar

Em daxwaz dikin ne bes di mustewayê turkîya bitin belku bo wan dewletên cîran taybet hemî perçên Kurdîstanê de bête belavkirin.

Daxwaza serkeftinê dikim bo karmendêd kovara Nûbiharê. Her dem serkeftî bin bîrhatina jimara 100. ku niha derçitîn em pîrozbahîya karmendêd wan dikin daxwaza serkeftinê dubara bo wan dikim.

Bi rastî kovarek gelek gelek cihê xwe de ye kovarek gelek gelek jêhatî ye em daxwaza pêşkeftinê bo wan dikeyn.

Zêde rolî mamosteyan ayînî di Kurdîstanê da çî başur çî bakur role wana gelek gelek belav biken da bo xelkekî dîyar bitin ku ev millete dîndar e, dînerwer e hej dînî diketin û her wusa edebê Kurdî mêjûya Kurdî nîşanê xelkekî bidin ku em ne feqîr in, em ne yetîm û sêwî ne, me jî hazareke xwe heye, me jî

şîwarê xwe, hene me jî kelturê xwe heye.

Nîsbet belavkirina kovarî em daxwaz dikeyn ji karmenda kovara xwe sê heyv sê heyv belavkeyn gelek can e. Çunkî ya heyvane dê selbîyatê wî hebin û îşê lezê însan nikarîtin temam biketin; vêca eger ya sê heyvî bitin ku em dibêjin ya werzî an faslî evahîne cantir e dê bi dilê xwe mewzuatên xwo adetên xwo rutuş û tasmîma wî hemîyê dê gelek gelek can derkevîtin.

Em daxwaz dikeyn ne bes di mustewayê turkîya bitin belku bo wan dewletên cîran taybet hemî perçên Kurdîstanê de bête belavkirin.

Nîsbet babetên kovarê em hesdikeyn li gel behskirina li ser çand û hunerê Kurdî nefî demî da em hesdikeyn her qawmek zayîf û desteser hebitin di cihanê da behsa wan û keltura wan jî biketin bila ewana jî bo me belav bikeyn da ku em bizanin hindekên dî wek me hene.

Bi rastî ez ne gel hindê me edebî rojavaî ji me re tercumekeyn bêjine me eve heye li cem wan anku eve heye. Eger edîbek ecnebî hebitin behsa Kurda kirîbitin çî qayd nine bête tercumekirin ku filanî behsa me kirîye. Lê ne gel hindê me ku edîbek tenê behsa tiştê kirîye ku ewe çî peywendî gel me nine bes da pelê kovarê tije bin bêne belavkirin anku pelê kovarê da zêde bêne tercumekirin û pê naskirin ez ne gel vê me, ez gel hindê me ku bi tenê bo me dîyar bikeyn ew millîetên bindest ka çawa gehîştine mafê xwo.

Careke dî supasîya hewe dikim muwaffaq bin.■

Tahsîn Îbrahîm Doskî

Nivîskar

Nîşana hindê ye ku ewê egerên mane di navxwe de helgirtîne
 Û wê cihê xwe jî di qada rojnamevanîya kurdî da kirîye

Ez yek ji wan kesan im yê her ji serî were û ji nêzîk bi kovara Nûbiharê ya agahdar û cihê dilxweşiyê ye ku min hijmaraka nivîsînên xwe jî di vê kovarê de belav kirîne

Û bi hizra min mana Nûbiharê hetta jîyê wê gehîştîye hejmera 100 ê.

Nîşana hindê ye ku ewê egerên mane di navxwe de helgirtîne Û wê cihê xwe jî di qada rojnamevanîya kurdî de kirîye

Û tiştê bûye cihê dilxweşiyêmin ewe Nûbiharê şîyîyaye hizra dindarî û millet perwerîyê pêkve bigehînit û biselmînit ku dîndarîya durist ne dîjîya millet perwerîya durist e.

Em dixwazîn nubihar berdeyamîyê bidete rêbaza xwa û giringîyê pitir bidete belavkirina edabû û dîroka kurdî û berhem û serhatîyên edebî û dîrokî yê kurdî li bakurî bigehînitê alîyên dî kurdîstanê

Û giringîyake taybet bidete belavkirina wan belganame û nivîsînên peywendî bi kurdan heyîn yê ku arşîvên osmanî da heyîn da tarî ji ser wan layan bête hildan.

Daxwaza jîyekî dirêj bo Nûbiharê dikim ■

Rola kovaran û cîyê Nûbiharê

Ayhan Geverî

ayhangeveri@gmail.com

Ziman û edebîyatê mirov dikare gotin û nivîsê zêde û dirêj bike, lê di nava avakirin û çê-kirina edebîyatan de rola gelek girîng li ser milên kovaran e û divê bi mebesta sedemîn hejmara kovara me ez wê bibêjim...

Edebîyat û ziman qalibek e ku millet û neteweya xwedîyê wê edebîyatê, her tiştê xwe dirêjîte vî qalibî û çand û hûner û raman û her wisa hemû tiştên şexsî-civakî di vî qalibî de dimehîne. Ziman û edebîyata milletekî her wisa ayîneyek e ji bo dîtina dîrok û pêşeroja wî milletî. Ne tenê di jîyana civak û milletan de, di jîyana her însan de ziman her hebûye; lê her çend li ser bingeha ziman ava bibe jî edebîyat bi alîyekê ve jî civakî ye û zimanê civakan e ew. Edebîyat çî bi berhemên devkî ve be çî jî bi yê nivîskî be, bi her hal jî “ziman”ê mirovên civaka xwe hatîye pêk. Helbet alîyekê muhîm yê şexsî jî heye lê edebîyat piranî zimanê giştî û civakî ye...

Zimanê civakî, raman û hizrâ civakî ye jî. Ji bo pêşdebirin û bişkiwtina her zimanî, xwedîyên wî zimanî bi axivtin û an jî bi nivîsê ve wî zimanî divehînin. Lê zimanê civakî, anko edebîyat hindek dî bi rêkûpêktir û organîzetir e. Rast e ziman bixwe organîze û rêxistinek mezin e ku însan bêhay dikeve nava çalakîyên wê, ew jî ji tabî'îbûna zi-


man tê, yanî ziman fealîyetek xwezayî û sirûştî ye. Feqet edebîyat li gel vê sirûştê xebatek aşkera ye...

Li ser ziman û edebîyatê mirov dikare gotin û nivîsê zêde û dirêj bike, lê di nava avakirin û çê-kirina edebîyatan de rola gelek girîng li ser milên kovaran e û divê bi mebesta sedemîn hejmara kovara me ez wê bibêjim...

Kovar, gava ku mirov lê dinêre mirov dibêje qey tiştêkî nû ye û ew piştî çapxane û alavên modern hatîye meydanê. An jî mirov dişê bibêje ku ew tiştêkî modern û nûjen e. Ya rast ev gotinana rast in, lê gava ku mirov li dîrokên edebîyatan dinêre mirov di dîrokên berê û pêş de kovaran nabîne, lêbelê tişt û fealîyetên ku wek wezîfe û erka kovaran, hebûn. Lewra kovar çawa zimanek biruh û zînde ava dike, rojevek “nû” ava dike, di nava edebîyatên berê de jî kirinên wisa hebûn. Yanî di wextê berê de kovar nebûn lê her wekî ku mîsalen, şairên Ereban her sal pêşbazîya şîirê dikirin û heft heb şîirên bijarte (eqsemus-se-

ba) li diwarê Ke'ba Şerîf dialiqandin; yan jî em dikarin mînakana nazîreyên şairan bidin ku berêkdanên wan li ser rûpelên diwan û xezelîyatan derdiketin pêş... Belê ev mînakana niha gelek ji form û şekl û erka kovaran dûr xuya dikin, lê ya rast erkên mezin ên kovaran heman erk in ku bi xêra kovaran di nava wêjeyan û şair û nivîskaran de "meydan"ek û "bazar"ek çêdibe. Anko eger kitab û berhemên din di edebîyatê de behr û derya bin, weşanên wekî kovaran nehr û çem û rûbar in ku her dem diherikin û zindîyatîyekê didin edebîyat û ziman, derya û behran tije û gûr dikin...

Kovar her wisa çawa ku edebîyatekê ciwan û zinde dike her wisa rol û tesîra kovaran li ser şexsan jî gelek mezin e ku gelek însan bi kovaran ve dest bi weşandina berhemên xwe dikin,



Berga jimara 21. a Nûbiharê

Nûbihar ya rast berê her tiştî wek medrese yan jî wek mektebekê ye li ber herkesî ku berîya her tiştî ew tam jî li ser rêbaz û xettê Ehmedê Xanî ye ku ji bo parastin û berevanîya Kurdî de navê herî pêşdar her ev nav e. Nûbiharê navê xwe ji berhema Hezretî Xanî standîye ku Seydayê Xanî bi Nûbihara Piçûkan ve got ku zimanê Kurdan ne ji yê Ereban û ne jî ji yên din kêmtir û kêmeyartir e.

hetta bi xêra kovaran dibin nivîskar an jî şair... Li alîyê din ve jî kovar ji bo nivîskaran mektebên mezin in ku di kovaran de xwe digehînin û berhemên xwe jî divehînin û dimehînin... Yanî ji bo xwedankirin û perwerdekirina fikr û raman û hestan jî kovar wek baxên gulên in...

Ustad Cemil Meriç di nivîsek xwe de -bi ya ku di hizra min de maye- wisa digot ku, "ez berê di kovaran de dinivîsim û gava ku ew nivîs an jî meqaleya min hem demê xwe de hem jî di hizra min de giha û geheşt ew wê gavê hazir e ku bikeve nava kitêbekê û nivîsên wisa jî bibin kitêbek..." Her wisa ji bo pêşdeçûn û geheştina fikr û ramanan jî kovar xwedî rolek zindeker e ku berhemek di kovarekê de hatî weşandin her dem li ber xwedanê/a xwe berçav e...

Kovar mekteb e, kovar perwerdegah e, kovar pire ye ku di navbera mêjî û mêjû de, di navbera dewrê berê û pêşerojê de... Rola kovaran ya rast gelek girîng e lê bi gotina Cemil Meriç, "qedera kovaran" jî heye. Jixwe ma

kovar jî ne tiştêkî zinde û biruh bû... Lê mixabin gelek kovar zindebûna xwe pir caran tebdîlê mordebûn û mirinê kirine ku Ustad wisa dibêje di nivîsa xwe ya navê wê "Qedera Kovaran" de: "Kovaran qederek xerîb heye. Gelek caran bang li neslekê/nîşekê dikin. Paşt di xelwetgahên xwe yê mîşîn de ber bi îstirehetek ebedî ve diçin. Mexberêk heyecanên mirî. Lê em dikarin rûyê dewrekê di kovaran de bêmakyaj bibînin, ne di kitaban de. Kitab hinekê dîtir bo rûmetîyê ne. Ramanên di wan(kovaran) de wek nameyan in ku ji bo sedsalên ayende/tên dihêne rêkirin. Kitab gelek caran fikrên hatine mumya-kirin in. Kovar û rojname, dewrekê bi şimik û kiras ve (aşkera) îfşa dike. Ji ber vê seyaheta di kovaran de bo min ji seyaheta di kitaban de xweştir tê. Rêwîngîyek mehremtir û samîmtir. Hûn dikarin xweştir bikevin nava sikak û kolanên bajêr ên beder. Ji muzexaneyê pirtir wek dikana entîqefiroş, hetta barsivikîyek û gerîyanek aram li Kapalı Çarşı û Bît Pazarîyê..."

Ekol, Mekteb, Zanîngeh yan jî Medreseya Nûbiharê

Mirov bi qewlê Cemil Meriç eger bikeve seyahetek di nava kovar û rojnameyên Kurdî de, mirov dê rastê hin mînakên pîroz bê, her wekî Hawar, Ronahî, Jîn (1918), Kurdistan (1898), Rojî Kurd (1913), Roja Nû, Nûdem (1992) ... û ya rast rola wan hemûyan di ziman û edebîyata Kurdî de mezin e... Lê ev kovara ku niha di destê we de bi gelek alîyan ve cuda ye...

Nûbihar ya rast berê her tiştî wek medrese yan jî wek mektebekê ye li ber herkesî ku bera her tiştî ew tam jî li ser rêbaz û xettê Ehmedê Xanî ye ku ji bo parastin û berevaniya Kurdî de navê herî pêşdar her ev nav e. Nûbiharê navê xwe ji berhema Hezretî Xanî stendîye ku Seydayê Xanî bi Nûbihara Piçûkan ve got ku zimanê Kurdan ne ji yê Ereban û ne jî ji yên din kêmtir û kêmeyartir e. Ew, zimanê şaristanî û medenîyet û eşq û fikrê ye... Nûbihara me jî eynî wisa li ser rêya Xanî bi ronîya stêrkên esmanê Kurdî ên geş meşîya, dimeşê û dê inşallah hetta qîyametê jî bimeşe...

Nûbihar ne tenê kanîya zimanê Kurdî ye her wisa Nûbihar çawa ku Seyda di Medreseya Ishaqpaşa de feqî digehandin û radikirin her wisa feqî û seyda rakirin... Bi her awayê, wê rola Medreseya Kurdî pêk îna... Hemû berhemên klasîk û parêzvan û xemxwarên edebîyata klasîk li dor Nûbiharê civîyane... Eger li ser edebîyata klasîk anko ya mela û seyda û feqîyan bihête rawestan Nûbihar yekemîn navnîşan e û ew jî ne tenê di Bakur de hema di temamê Kurdistanê de wisa ye...

Nûbihar li ser ayîn û tore û rêbaza Kurdî meşîyaye û tu cara xwe ji adet û nirx û sincê Kurdî nedaye paş û her tiştê ku Kurdî bûye, Kurdewar bûye parastîye. Nûbiharê piştî xwe daye ber edebîyata kevin ya ku gelekî zengîn û dewlemend, lê Nûbiharê gelek şair û nivîskarên nûjen jî rakirine û ew di vê zanîngeha xwe ya nûjen de perwerde kirine...


Bi ya min rola herî girîng ya Nûbiharê ew e ku, di fikra Kurdî de di hizra Kurdan de wê şoreşek çêkirîye û anîye meydanê. Ew jî "model û paradîgmaya Kurdî" ye ku bi xêra Nûbiharê Kurdan xwe muhtacê fikr û modelên bîyanî nekirine û Nûbiha-

li Nûbiharê me) min xwe bi her alîyan ve wek Kurdekî hîs dikir û ez diketim atmosfera Kurdewar; hem jî min ji gelek heval û xwendekarên Kurd dibîhîst, ku wan li Stenbolê dixwend û gava dihatin Nûbiharê bi xweyatîya xwe dihesîyan û qalibên bîyanî-yetîyê ji ser xwe dihavêtin... Belkî ev alîyê Nûbiharê hêj nehati-be keşfîkirin lê Nûbihar bixwe di Stenbolê de wek Zanîngehek Kurdî ye, însan li Nûbiharê bi xwe dihesin û haya wan ji (xweyatîya) wan çêdibe... Bi vî awayî çawa ku manayek kelîmeya Nûbiharê fêqîyê nû/turfanda û şitl be, her wisa Nûbihar bi kirî-nên xwe ve jî tovên girîng diha-vêje ku di pêşerojê de ew dê bi-

Nûbihar li ser ayîn û tore û rêbaza Kurdî meşîyaye û tu cara xwe ji adet û nirx û sincê Kurdî nedaye paş û her tiştê ku Kurdî bûye, Kurdewar bûye parastîye. Nûbiharê piştî xwe daye ber edebîyata kevin ya ku gelekî zengîn û dewlemend, lê Nûbiharê gelek şair û nivîskarên nûjen jî rakirine û ew di vê zanîngeha xwe ya nûjen de perwerde kirine...

rê di nava mala me de, di nava me de û bi zimanê me ji bo me felsefeyek ava kirîye û em wekî millet û neteweyekê bi edebîyat û tore û tarîxa xwe ve hevnas kirine... Anko ji bo fikr û pêşeroja milletekê çî lazîm û pêdivî be Nûbiharê bi xemla Kurdewar pêşkêşî me kirîye. Jixwe însanên li dora Nûbiharê ne û ên ku zîyareta Nûbiharê dikin vê rastîyê baş dibînin... Min bixwe ev yek hem di jîyana xwe de dît ku gava ez li Nûbiharê bûm (ku hêj jî

bin fêqî û ber û berhem... Jixwe Nûbihar û qedrê Nûbiharê roj bi roj çêtir dihête zanîn û fêmkirin, anko Nûbihar bi hemû xweyatî û erka xwe ve li ber/pêş Kurdan dimeşe û hem bi hizr û raman hem jî wek sazîyekê di rêyek pir asê û bi asteng de bûye pêşevan û rêya wisa çetîn bi keda destan vekirîye û vedike... Li gel vê, dunyaya Nûbiharê û hizra Nûbiharê gelek fireh û cîhanşumul e, ku gelek Kurd jî vê yekê hêdî hêdî fêm dikin... Nûbihar rast e li



Berga jimara 25. a Nûbiharê

Gava ku mirov dikeve nava deh cildên Nûbiharê (99 hejmaran) mirov vê heqîqetê gelek baş dibîne ku Nûbiharê heta niha ji bo gelek hejmarên taybet û dosya, gelek pispor û zana û edîb civandine û fikrên wan bi rêkûpêk pêşkêşî xwendevanê Kurd kirîye... Her wisa bi vê munasebetê Nûbiharê di nava vê atmosfer û perwerdekirinê de rêbaz û metod nûşa mensubên xwe daye ku çawa di zanîngehekê de akademîsyen dihêne perwerdekirin...

ser xetek dînperwer û Îslamî ye lê ev xet û hizr ji dunyaya Kurdî û Kurdewar dûr nîne. Anko îslamîbûna Nûbiharê û kurdewarîya wê du tiştên ji hev cuda nînin, ew wekî du rûyên pelekê ne ku ji hev cuda nînin û nabin. Her wisa wekî pêşevanên Kurdayetî û Kurdîyê, wek Xanî, Melayê Cizîrî, Melayê Bateyî, Feqîyê Teyran, Mela Mistefa, Qazî Mehemed, Seyîd Riza, Şêx Seîd û Seîdê Nursî, vê kovarê jî rêbazek "xwerû" Kurdî qebûl kirîye û pejirandîye; yanî eger mirov bibêje di Nûbiharê de li dijî nîrx û pîrozî û jîyana Kurdî tiştêk heye divê mirov behsa insaf û wijdanê neke... Jixwe însanên ku "bitemamî" dikevîne dunyaya Kurdî, vê rastîyê baş dibînin...

Ligel vê, hejmarên Nûbiharê ên berê gelek bi surûd-amîz û sloganîk bin jî Nûbihara ku min nas kirî û ez têde xebitîme tu caran li ser rêya slogan û gengeşî û mîlmilanê nebûye. Nûbihar kovara milletê Kurd e ê ku hezar tofan dîtî, Helebçe, Enfal, qetlîyama Gelîyê Zîlan li ser seran de hatî... Kovara milletê ku ziman û her tiştê wan hatîye qedexekirin û pişavtin... Ev fotografê cehennem-mîsal li alîyekê, Kur-

dîbûna vê kovarê bixwe "slogan"ek bû û ji ber vê ew hejmarên berê jî rast bûn ligel wextê xwe û şert û mercên dema xwe... Lê dîsa jî Nûbiharê rêbazek ilmî û aqilane danaye ber xwe û wekî enstîtuyekê û sazîyekê dixebite...

Taybetîyek din ya Nûbiharê jî ew e ku Nûbihar ne tenê wekî kovar û weşanxaneyekê mînak û modelek baş e; ew her wisa wekî sazîyek Kurdî jî xwedî rolek mezin e û divê Kurd ji vê sazîyê ji xwe re modelekê derxin. Lewra ji bo sazîkirina sazî û dezgehên bingehîn Nûbihar nimûne û mînakek baş e... Eger em hema tenê li alîyê zanistî û akademîk ve lê binêrin em dibînin ku Nûbihar bi awayê xebat û organîzeyaya xwe ve dişibe universîteyekê/zanîngehekê... Jixwe mebest û armanca xebatkarên wê tiştêk wisa nîne û di vê îddiyê de nînin, lê gava ku mirov di çarçoveya edebîyata Kurdî de lê dinêre, mirov wê rastîyê dibîne. Lewra kirin û xebatên vê kovarê gelek pispor û zana û lêkolîner û edîb li dor xwe civandine û wek ekolekê wê ji bo zindebûna Edebîyata Kurdî xîm û bingehêk gelek saxlem û mukim havêtîye... Jixwe li zanîgehên bîyanî binêrin ma ev tiştê Nûbihar ji bo Kurdî û Edebîyata Kurdî dike, ew jî ji bo edebîyata xwe nakin...? Birastî ekolbûn û mektebûna Nûbiharê ji ber wê rola wê têt. Gava ku mirov dikeve nava deh cildên Nûbiharê (99 hejmaran) mirov vê heqîqetê gelek baş dibîne ku Nûbiharê heta niha ji bo gelek hejmarên taybet û dosya, gelek pispor û zana û edîb civandine û fikrên wan bi rêkûpêk pêşkêşî xwendevanên Kurd kirîye... Her wisa bi vê munasebetê Nûbiharê di nava vê atmos-

fer û perwerdekirinê de rêbaz û metod nûşa mensubên xwe da-ye ku çawa di zanîngehekê de akademîsyen dihêne perwerdekirin... Jixwe di nava rûpelên hejmarên Nûbiharê de gelek nivîsên li ser metod û rexneyê jî hatine belavkirin û ew jî şahidê vê ye...

Bi nezera min Nûbihar divê kirinên xwê ji îro şûnda bidete destpêkirin, her wekî ku qey heta niha tiştê nekirî... Lewra Nûbihar taze geheşte (14) çardasaliya xwe û taze xwînek ciwan û taze kete nava demarên wê... Lê Nûbihar hema tenê bi van 100 hejmarên xwe ve jî barê li ser milê xwe avêtîye, wezîfeya xwe anîye cih û eger hema hinde jî be, ev yek têra keyfxweşî û şana-zî û serfiraziya vê kovarê re bes e. Feqet wekî min gotî erka Nûbiharê taze destpê kirîye. Nûbihar jî îro pêve dê geştir û zindetir û bihêztir be... Lewra Nûbiharê gelek pispor gehandin û ew wekî lejne û koma akademîsyenan li dor fakulteya Nûbiharê bi cih kirin. Wêca jî nû ve ew pispor divê li Nûbiharê bi vî çavî bizivirin û bi qelemên xwe yên têrav û şaraza dest bi dewrê Nûbihara nû ya biberekettir û bi bertir û berhemtir bikin... Jixwe ligel van heqîqet û pesnan hêj karê Nûbiharê yê elzemtir û ferztir maye, her wekî weşandina hemû klasîkan... Mîsalen eger di Kurdî de hezar çaran jî Mem û Zîn û Nûbihara Pîçûkan, an jî klasîkên wekî Dîwana Melayê Cizîrî bêne weşandin, divê ev berhemana her ji nava weşanên Nûbiharê derbikevin... Lewra hem ev karê Nûbiharê ye û Nûbihar vî karî baş diîne cih; hem jî Nûbihar nûner û mume-silê vê dunyayê ye...

Hehecîk*

Xurşîd Rûşen

Si

isîyam ez vê sibê bi dengêkî xweş
Dîtîm hehecîk duakara basikreş

Wey mêvana nazik tu l'ser çavan re hat
Dilê min jî pê re hildihat û dadihat

Hehecîk mizgîn e biharê ew tîne
Bi dengê xwey şêrîn qeşayê dihelfîne

Vekin jê re pacan hat dema biharî
Bazdin pê re mêrgan bi kêf û bi yarî

(1992)

* Ev helbest piştî derhatina Nûbiharê hatîye nivîsandin.
Heta niha nehatîye weşandin.

Nûbihara Pîroz bi gelek zorî û meşequetan heta îro hat û geheşte hejmara xwe ya (100.) sedê... Ev tişt sebebê keyfxweşî û dilxweşiyê ye lê ew însan û dilsoz û sîyanetperwerên vê kovara ezîz dizanin ku ka heta sed hejmar hatine meydanê çend sed-hezar zor û azar hatine kêşan... Nûbihar li alîyekê ve jî bersiva pîrsa "Keda destan û ronîya çavan çîye?" ye... Sebra peyxamberan û îmanek qewî lazim e ji

bo karên wisa û jixwe Nûbiharê jî bi sedhejmarîya xwê ve hebûna wan tiştan îsbat kirîye... Her wisa çawa ku Hezretî Îsa gotîye "Însan tenê bi nan najîtin" hin tişt û pîrozî hene wekî Nûbiharê mirov nikare bêyî wan bijîtin... Belê Nûbihar ev jî nûşa me da û bi me da zanîn... Kovaran qederek xerîb heye lê inşallah dê qe-dera Nûbiharê baştir bît û dê bextê wê li gel wê yar bît...■

Jimara sedî ya Nûbiharê

Rojen Barnas

Biserketina wê ya heta niha li xwedî, koma redaksîyonê, nivîskarên ku mil dane ber vî barî û nemaze li xwendevanên wê pîroz dikim, hêvîya hê bêtir jîyan û dîtina gelek sed hejmarên dîtir dikim.

Nûbihar bi vê hejmarê jimara xwe ya sedî dibe serî, jîyanek rengîn li pey xwe dihêle û hêvîdar im ku pê bavêje derçika jîyanek zengîntirîn, di bergeh vekirina ji bo têkoşîna li ser ziman û edebîyata me ya mexdûr û mezlûm, rolek hêja bileyize.

Biserketina wê ya heta niha li xwedî, koma redaksîyonê, nivîskarên ku mil dane ber vî barî û nemaze li xwendevanên wê pîroz dikim, hêvîya hê bêtir jîyan û dîtina gelek sed hejmarên dîtir dikim.

Divê ji xwendevanên hêja re vebêjim ku hevnasîya min û Nûbiharê ji mehek –bi nîsbet îro 26.11.2006- zêdetir nîne. Bi nîyeta daxwazîya ji min a beşdarîya jurîya şîrê edîtor Suleyman Çevîk rojek bi telefonê li min gerîya û nîyeta xwe ji min re vegot. Li ser gotina min a nenasîn û bêagahîya min a Nûbiharê, camêr rê li min birî, tafilê ji min re bi postayê 12-13 hejmarên wê û du pirtûk şandin. Nivîsên teorîk-îdeolojîk ên mezhebî û terîqetî ne tê de, min yê dinê gişt xwendin. Hin jê hêvîya min geş kirin, hin jê bêhna min

derxistin, hin jê jî wek nas û dostên salên xortanîyê bi awakî rûçik guhartî derketin pêşîya min. Ji wana "Rabe ji xew! Rabe ji xew! Ey dildemê rabe ji xew! Firset firî teşbîhê kew / Ey dil xwe hişyar ke ji xew!" a di hişê min de di Nûbiharê de kulek kulek dikulîya. Dostek dinê jî "Ey av û av! Ey av û av! Ma tu bi 'îşq û muhbet î? / Mewc û pêlan davêy belav, bê sekne û bê rahet î." Niha ji ber pîrbûnê be çi?.. "bê îşq û muhbet" mabû. Bêguman ez şaş mam bê "îşq û muhbet", bê enerjî û heyecana evîne çawa dê bikare mewc ji mewcê, pêl ji pêlê belav bike, bi gujîn û gurrîn gêr bibe û biherike? Nasêk dinê jî qesîdeya Ebdurrehîm Rehmî begê Hekarî ya li ser Melayê Cizîrî bû ku di quncikê bîra min de ewha mabû: "Şîrazî di nav Fursa kêşa 'elema 'eşqê / Mela te bire ew can Hafîz pê bike meşqê. / Mela te wekî Hafîz Fîrdewsî nekîr ustad / 'Eşqê ji nû ve helkîr kurmancî te kir îcad / Pûlê di zexel kurdî te b'yeke nezere zer kir / Mala ku feqîr mabû tije dur û gewher kir." Ev hevrayê min î demên tenê mayî-

nê xuyan e ji ber salan ji aheng û lihevhatîbûnê ketibû, hatibû di nav rûpela Nûbiharê de veniştîbû.


Lê ji aliyê nostaljiyê ve bêhna min bi wan derket.

Kurmancîya Nûbiharê kurmancîyek xweş a gelêrî ye, lê lazim e hê xweştir bibe. Rastnivîsîna (îmla) wê di hin nivîsan de bêhna awayê erebî dide; daçek an lêkera (e) ya bûnê bi navdêran ve têne nivîsandin, bêguman ev şaş e. Redaksîyon divê jê re çare bibîne.

Di bêjezanîne de hin bêje di ferhengokê de kêman şaş hatine nivîsandin an maneya wan şaş hatine lêxistin. Xwendevan divê ji kovarê rastîyê hîn bibe û pê piştrast be. Di pêş de hêvîdar im ku ev bêne sererastkirin. Di vê mijarê de divê tiştek dinê jî nîşan bidim ku hin nivîskarên timî hin bêjeyan wek hevmane li pey hev datînin herwekî "helbest / hozan / xweşxwane". Ev hersê ne hevmane ne. Helbest gotinên stranê, xweşxwane bêjeyek çêkirî ya ji aliyê seydayê Cegerxwîn e ku bi maneya marş bi kar anîye û hozan jî bêjeyek joker e ku ji aliyê kurdên bakur ve di dewsa "ozan" a tirkî de tê bikaranîn; herwekî hozan Şivan, hozan Şiyar, hozan Fatê û hwd. û li Behdînan di şûna şîrê de bi kar tînin, ji şa'ir re jî dibêjin hozanvan ku ji binî şaş e. Li gora wê mentiqê Cegerxwîn hozanvan (şa'ir) e û Şivan, Şiyar û Fatê jî ku hozanên li bakur in, dibin şî'ir!?

Berhevkirina berhemên edebî yên nenas an jî yên ku ji aliyê herkesî ve nayên nasîn xizmetek mutewazî ya Nûbiharê ye, lêbelê xizmetek gelek hêja ye. Di nav wan de hîn ên ku ewê antolojîyên edebî yên kurdî bixemilî-

Berga jimara
30. a Nûbiharê



nin û zengîntir bikin hene û bêguman dê hebin. Ev xizmeta Nûbiharê sezayê pîroz kirineke taybetî ye.

Bi form, desen û çapa xwe Nûbihar kovarek paqij, bi kalîte, delal û bi rêkûpêk e. Ji aliyê hêjayîya berhemên edebî (şî'r, çîrok, gotar) ne seranser be jî hin tiştên hêja yên dilbij hene. Ev alî jî ji kovarê bêtir li ser şarezatî û ostarîya edîb û nivîskarên wê dimîne û ev jî tiştekî wisa ye ku girêdayê bi qabilîyeta nivîskar a ferdî ve ye.

Ez merivekî sosyalîstê li bas-kê çepê me û Nûbihar di cîha panîslamîst de diherike. Bawerîya dînî-sîyasî ya herkesî jê re, lê ku Nûbihar di warê ziman û edebîyata kurdî de amadeyê bûyîna baxçeyek serbest (liberal) be, hingê ezê jî carcarina bikaribim tê de karê 'eşêf, tevrik û belkî jî danîna şitlê rihan û nêrgizan bikim. Nebe jî ne xem e.

Dîsa jî mala hevkar û berpirsîyarên wê şên, dilê wan geş û destê wan xweş bin. ■

Stockholm, 26.11.2006

Kurmancîya Nûbiharê kurmancîyek xweş a gelêrî ye, lê lazim e hê xweştir bibe. Rastnivîsîna (îmla) wê di hin nivîsan de bêhna awayê erebî dide; daçek an lêkera (e) ya bûnê bi navdêran ve têne nivîsandin, bêguman ev şaş e. Redaksîyon divê jê re çare bibîne.

Xweştir e*

M. Emin Bozarslan

Tarixa nivisina helbestê:1962



*J*in xweş e; lê ger bî azadi nebe, bêxêr e ew
Gor jî wê jina bî dili, zoredari xweştir e

Xwendin û zanin xweş e; lê gel eger serwext neke
agir e, gel pê disoje; çavê tari xweştir e

Dewlemendi pîrr xweş e; lê ger jîbona gel nebe
rûmetek jê ra tune qet; bêdebari xweştir e

Suhbeta dost û hevalan ger jî dil be, pîrr xweş e
Lê neyari jî hevalîya b'sextekari xweştir e

Kar û tevger dî rîya gel û welêt da pîrr xweş e
Lê dî rê da nebe ger, bendewari xweştir e

Tendurusti pîrr xweş e, xasma dîgel wê jî xebat
Ger jîbo zewq û sefa be, hiledari xweştir ⁽¹⁾

Şayi û govend dî bin Alaya Rengin da xweş e
Lê lî bin alaya dijmin ah û zari xweştir e

Ser lî ber dijmin çu carek metewine, xortê Kurd
Bî şeref ser bê birrin jî, j'stûxwar xweştir e

Ger xebatek tu bîki, jî dil bike û baş bîzan
bendewari pîrr jî wi karê bî yari xweştir e ⁽²⁾

Ger gunehkar bi lî ber gel tu, inadê berde zû
Jî inada dî guneh da tobedari xweştir e

Şam û Bexda, hem jî Tehran û Enqere pîrr xweş in
Lê çî kim ez wan! Jî Şêro ra û Hekari xweştir e ⁽³⁾

* Di vê helbestê de li ser daxwaza nivîskar di cihê 'î'ê de me 'î', di cihê 'î'ê de jî me 'î' bi kar anîye. (Nûbihar)

(1) Hiledari: Nexweşi, nesaxi.

(2) Karê bî yari: Karê bî henek; karê ne jî dil.

(3) "Şêro" nasnavê M. Emin Bozarslan e; wi di hin helbestên xwe da ev nasnav bi kar anîye.

Sê xisûsiyetên Nûbiharê

Ehmed Akın

ehmedakin1@nefel.com

*Jibo qehremanekî bêdeng ji
Diyarbakirê*

Kovara Nûbiharê¹ bi vê hejmara hanê sed hejmar li dû xwe hîşt! Gotina klasîk ya ku bi munasebeteke ewha tê gotin ev e: Derxistina sed hejmaran bi kurdî li Tirkîye di tarîxa kovarvanîya kurdî de² xwedîyê cîyekî gelek bilind e û hêjayî pesnê ye. Lewra li Tirkîye ne karekî hêsan e ku meriv xêncî kitêbên kurdî kovareke periyodîk bi zimanê³ bavûkalên⁴ xwe derxîne.

Herçiqas ku ev gotina klasîk ji erdê hetanî e'zimanan rast be jî, derxistina sed hejmaran bi serê xwe tenê tiştekî îfade nake. Ev tişt bi tenê ne zêde bi me'ne ye, ji ber ku pirrbûna hejmaran di heqê rola kovarekê de tiştekî nabêje, yanê em bi zimanê ecnebîyan bibêjin: Kantîte û kalîte du tiştên cihê ne. Mesela em bi gelek kovaran –çi bi kurdî, çi jî bi zimanên din– dizanin ku emirdîrêj in, lê ne xwedîyê cîyekî mûhîm in.

Belê, mademkî ewha ye ma ez çima bi vê gotina klasîk bawer im? Ezê di vê nivîsa hanê

de pesnê kovarê nedim, lewra pesindayîn ji noqteyekê şûnda xisûsiyeta şexs û civata şûndamayî ye. Lê ezê li ser hin xalên Nûbiharê bisekinim ku bi min gelek mûhîm in û di tarîxa kurdan de hetanî niha kêma hatine dîtin:

1. Zimanê Nûbiharê zimanekî pak e.
2. Nûbihar ji gelê bê war re bûye war.
3. Nûbihar dijminatîya kesî nekirîye û xwedîye sîyaseta hev-dûfêmkirinê bûye.

Nûbihar: Mekteba ziman

Nûbiharê xwe li zimanê qisedanê girt û zimanekî sade û di nava gelê wî de tê qisedan bikaranî. Ev tişt gelek mûhîm e, lewra yanê ku kovar dan destên xwe dîtin ku ew bi zimanê ku ew bi dê û bavê xwe re qise dikin dixwînin. Hetanî dema Nûbihar derket gelek kovar bi zimanekî ji kurmancî nêziktirî Esperanto bû derdiketin (û hê jî hin ji wan wisa ne). Kovarên ku zimanê wan nêzikî zimanê qisedanêbûn gelek kêma bûn (wek mînakên baş em dikarin li vir *Nûdem û Hêvî-*

Nûbiharê xwe li zimanê qisedanê girt û zimanekî sade û di nava gelê wî de tê qisedan bikaranî. Ev tişt gelek mûhîm e, lewra yanê ku kovar dan destên xwe dîtin ku ew bi zimanê ku ew bi dê û bavê xwe re qise dikin dixwînin.

Lewra hinin “şoreşger”an dixwestin civaka xwe ji zimanê “arkaîk” xilas bikin. Ev ziman, ji alî-gundî û nezanan ve dihat bikaranîn û divîyabû meriv reformekê çêke. Îjar mînakek jî li ber wan hebû: Reforma kultur û ziman ya li Tirkîyê. Ji ber vê “kelîme” bû “bêje”, “dîn” bû “ol”, “tabîat” bû “xweza”... Em dikarin gelek kelîmeyên din li vir bijmêrin ku hin “zimannasên” me (ka li kû jî “zimannasî” xwendine ez nizanîm) çêkirine.

yê bibîrbînî, ku herdu jî mixa-bîn li derva derdiketin).

Lewra hinin “şoreşger”an dixwestin civaka xwe ji zimanê “arkaîk” xilas bikin. Ev ziman, ji alî-gundî û nezanan ve dihat bikaranîn û divîyabû meriv reformekê çêke. Îjar mînakek jî li ber wan hebû: Reforma kultur û ziman ya li Tirkîyê. Ji ber vê “kelîme” bû “bêje”, “dîn” bû “ol”, “tabîat” bû “xweza”... Em dikarin gelek kelîmeyên din li vir bijmêrin ku hin “zimannasên” me (ka li kû jî “zimannasî” xwendine ez nizanîm) çêkirine.

Ev tiştan han ji gelek alîyan ve problematîk bû: Ji alîye pedagojîk ve, ji alîye avakirina zimanekî standard ve, ji alîye belavkirina metnên bi kurdî ve û ya herî mûhîm ji alîye pêşveçûneke tabîi di ziman de.

Ji alîye pedagojîk ve ev problemeke mezin bû, lewra yên ku reformên ewha kiribûn xwedîyê dewlet, dezgeh û mekteban bû, lê yên me bi darê zorê du pel bi kurdî derdixistin. Ew jî bi zimanekî ku ji dunyayê der... Yên ku ev metin ji dê û bavên xwe re dixwendin, mecbûr diman wan

metnan cardin wergerfîn zimanê “gundîyan”.

Noqteya ku bi qasî vê jî mûhîm e mudaxaleya ji derva ya li ziman e. Xêncî çêkirina kelîmeyên teze hin însanan xwestin hin tiştan di gramerê de biguhe-rin. Mesela berî çend salan camêrekî wek zana û xwedîgotin tê nasîn di sempozyumekê de got ku divê em “mêbûn” û “nêrbûn”ê ji kurmancî bavêjin, ji ber ku ev tişt xususiyeta “cîvata şûndamayî” ye! Însanên bi vî mantiqî hereqet kirin nizanîbûn ku xêncî tirkan kesî ji derva ew-qas mudaxaleyî ziman nekirîye. Îjar em îroj dibînin ku tirkîaxêv nikarin metnên pêncî-şêst salî fêm bikin. Li hember vê li Almaniyayê zarokên şanzdeh-hu-vdeh salî metnên J. W. von Goethe (1749-1832), F. Schiller (1759-1805), H. Heine (1797-1856), li Ingiltereyê W. Shakes-

peare (1564-1616) ji zimanê eslî dixwînin.

Elbet hinin nivîskar hebûn ku ewqas tûj nebûn û xwe li zimanên bavûkalên xwe digirtin, lê Nûbiharê bi halekî gelek eşkere nîşan da ku gerek nake em li zimanekî din bigerin. Herçiqas ku em ne xwedî mekteb bin jî, zimanekî tê qisedan heye û bi vî zimanî meriv dikare metnên edebî ku sewîya wan ne ji zimanên din kêmtir e biweşîne. Elbet keda kekê **Sabah Kara** li vir gelekî mezin e: Me Baba Tahîr, Xeyyam, Mewlana bi kurmancîya wî xwend, şî-ir û meqaleyên wî ji me ra bûn mêzîna zeringer!

Nûbihar: Warê me

Nûbihar ji hezkirîyê kurdî re, xisûsen ji xortan re bû war. Zimanekî ku sirf li malê dihat qisedan û kilam pê dihatin distran îdi li ser kaxezê bû!⁵ Erê mektebên bi zimanê wan tunebûn, lê îdi ew li mekteban li sirayên dawîyê bi dizî di nav rûpelên kurmancî de wenda dibûn.

Îdi ew carna çîrokên Çexov, Rasim Özdenören, Mustafa Kutlu, Mıgırdiç Margosyan bi kurmancî dixwînin. Gava ew li Mona Roza ya Sezai Karakoç digerin, ew li arşîva kurdî mêze dikin, şîrên Sabah Kara îdi di mêjîyê wan de bi kurmancî xwe dilorînin. Bager, Sidîq Gorîcan, Berhîm Paşa bi kelîmeyên wan şî’ran dihûnin. Seîdê Kurdî îdi bi zimanê xwe xîtabî wan dike. Ew bi nivîsên Ali Karadeniz rexne û eseyan (ceribandin) dixwînin. Wer-

Xala sisêyan ku bi min mûhîm e ew e ku min hetanî niha di kovarê de ti nîvîsek nedîtî ye ku provokatîf bûye û dijminatî di nav însanan de belav kirîye. Ew her tim li pey edalet û hevdufêmkirinê bûye.

gerên X. Acar heyecana wergerê dide wan. Ew dosyayên li ser tarîx û cîvata xwe bi zimanê xwe dixwînin.

Bi hinin kesan ev tişt belkî kêm xuya dikan, lê tesîra wan ya pîskolojîk li ser nişkekê gelek mezin e. Em îro îdî dizanin ku gava zimanekî bixwaze bijî, divê ew di gelek hêlan de were bikaranîn; divê însan wî sirf di hêlekî de (kurmancî= zimanê malê) bikarneîne. Yên ku bi wî zimanî diaxîfin bira bikaribin bi wî zimanî mesela him li ser edebîyatê û him jî li ser ticaretê qise bikin.

Nûbihar: Cîyê hevdufêmkirinê

Xala sisêyan ku bi min mûhîm e ew e ku min hetanî niha di kovarê de ti nîvîsek nedîtî ye ku provokatîf bûye û dijminatî di nav însanan de belav kirîye. Ew her tim li pey edalet û hevdufêmkirinê bûye. Wek ku Ustad jî gotîye, dijminê me ye sisêyan "pe-xîlî ye". Ev kovara hanê di nava însanan di bûye pire û xweya ye guh daye dustura hanê ya Ustad: "Dest hev girtin, dest hev girtin, dest hev girtin".

Nûbihar: Ji îro şûnda

Divê Nûbihar ji îro şûnde bi tecrûbeya salan îdî gavên mezin-tir bavêje. Lê bi xwendevanên wê jî e'yan e ku gavên wê mixabin hineki biçûktir bûne. Ji dêvla ku mehane bibe heftename, ew bû sê mehane.

Ze'fîyetên mezin hene, ze'fîyeta herî mezin jî ew e ku gelê

me hê hînnabûye dezgehên xwe yên bi rêk û pêk ava bike. Mixabin ev karê qedirbilind jî para xwe ji vî tiştî digre.

Jibona ku ev rewş biguhere, pêşnîyazêke min heye. Ez texmîn dikim ku ew ê hinin kes bi pêşnîyaza mina hanê di binê simêla re bikenin (wê xwendevanên jin jî çawa bikenin ez nizanîm!):

Avakirina **"Weqfa Piştgirîya Nûbiharê"**

Wê endamên weqfeke ewha alîkarîya maddî û personel bidin kovarê û jê re di merhala ewil de ofîsekê bikin da ku ew ji derdê kirê xilas bibe.

Elbet wekî din tiştên ku meriv dikare bike pîrr in û xebatkar û dilsozê kovarê jî baş pê dizanin. Jixwe ez xwe di wê noqteyê de nabînim ku fikran bidim kesên din. Lê ez wek bav dixwazim bêjim ku eger em îdî jibo zarokên xwe **kitêbên li ser kaset/cdyan** û kitêbên li ser kaxezê çap nekin, wê rewşa me gelek xirab be.

Şiir hat, gotin qedîya:

"Tu nikarî kurdî û kurd ji hev
biqetîni
Ku xêra kurdan divî, divê
kurdî bixwîni
Mêro ji te dipirsim, ma eger
kurdî nebe
Ma tê kurd bi xwîna wan ji
tirkî veqetîni"

Sabah Kara



Berga jimara 31. a Nûbiharê

Têbinî

¹ Nîvîskarên me gelek caran „tam-lama eki“ya kelîmeya düyemin bikar-nanîn û tabîrên wek „Kovara Nûbihar“, „Weşanxaneya Nûdem“ dinvîsînin. Bi bawerîya min ev tişt şaş e û bîna tirkî jê tê. Ez nizanîm ka kî „heqlî“ ye.

² Ji ber ku Celadet Bedirxan „daçekên“ (Preposition) „da/ra /va“ bi şiklê „de/re/ve“ nîvîsandîye, çî bêje hema hemû kurd bi vî şiklî dinvîsînin. Lê bi qasî ku ez dizanîm di qisedanê da „a“yê bikartînin. Ji ber vê ez tereftarê wê me ku em bi „a“yê binvîsînin.

³ Ez were/wisa difikirim ku kurdan di binê tesîra tirkî de kelîmeya „zman“ kirine „ziman“. Wek ku tê zanîn di tirkî de di halê normal de di heceyekî de du hev konsonant nayên cem hev.

⁴ Kelîmeya „zmanê zikmakî“ ji ku derket ez nizanîm. Wekî ku Rojên Bar-nas di nîvîseke xwe de bi bîr tîne, em ji bîrê wê mefîhûme kelîmeya „bavûkalan“ bi kar tînin.

⁵ Elbet ez li vir kitêb û kovarên berê derketibûn danaynim alîyekî. Pîrranîya wan yan ji alîyê gelê me hatibûn nîvîsandin yan jî wergêrandin û bi qîmet in, cîyê wan di dilê me de ye. Lê belê ji ber ku pîrranîya wan li Ewropayê çap bûbûn, dîtina wan li Tirkîyê gelek zeh-met bû.

Bi hêvîya temenekî dirêjtir

Adar Jîyan

adarjîyan@mynet.com

Di dem û domahîya jîyanê de digel hin tiştên ku mirov pê xemgîn û bêzar dibe, hin tiştên ku mirov pê şanaz û bextewar dibe jî, hene. Li alîyê din jî gelek tiştên ku meriv bi derengî pê dihesse û kêfxweş dibe, hene.

Pêhesandina min a derçûna Nûbiharê ku duwanzdeh sal berê pêkhatibû, çendî derengmayî bû jî, gelekî hêvî û kêfxweşîyeke mezin dabû min. Belê ew derengmayîn çet ne ji destê min bû. Şert û mercên ku ez tê de bûm wê demê derfet nedidan min ku bi derketina kovareke xwerû bi kurdî bihesim û ji serî de wê bişopînim. Bi rastî wê demê haya min ji hin rojname û kovarên kurdî hebû. Her wiha min çend hejmarên *Rewşenê* yên ku pêşî nêvî bi kurdî û nivî bi tirkî derketibûn, bi dest xistibûn. Vê yekê dilînî û hestyarîyeke mezin ku nayê gotin bi min re gihandibû. Min li gorî derfetên xwe yên wê demê, ew dişopandin û nivîs û helbest jî ji wan re dişandin...

Rojekê ji rojan, ji bo ku hin pêdiviyên xwe yên rojane pêk bînim, ji bajarê Yozgatê çûbûm

bajarê Enqerê. Cara pêşîn bû ku li ber derîyê pirtûkxaneyeye mezin çavê min bi Nûbiharê ketibû. Him ji navê wê û him jî ji nivîsên ser berga wê min tê derxistibû ku ew kovareke xwerû bi kurdî ye. Ew hejmara 27an a ku bi nivîsa ser berga xwe ya ku bi "Xwexapandin: Tu Ji Me yî, Baş î; Ne Ji Me yî, Ne Baş î" hatibû neqîşandin, bûbû hinceta hevnasîna min û Nûbihara ku di dilê min de bihar vejîyandibû. Ji wê rojê û vir de bênavber Nûbiharê dişopînim, dixwînim, dinirxînim û jê sûd, hez û hêzê werdigirim. Û ji wê rojê û vir de ye ku ez him bûme xwîner û nûserê wê û him jî suxrevan û muhtelayê wê...

Tenê ne ji bo Nûbiharê jî; ez bi xizmetkarîya hemû kovar û rojnameyên ku di xizmeta çand û wêjeya gelê min de seferber bûne, şanaz û serbilind im. Belê bi egera derketina hejmara 100î ya Nûbiharê dixwazim nemaze hest û hizrên xwe yên der barê wê de bi xwîner û kedkarên wê re parve bikim. Ji bo vê yekê jî ez pêşî ji bo cehd û xebata wan î pîrozwer kedkar û xizmetkarên

Tenê ne ji bo Nûbiharê jî;
ez bi xizmetkarîya hemû
kovar û rojnameyên ku di
xizmeta çand û wêjeya ge-
lê min de seferber bûye,
şanaz û serbilind im.

wê pîroz dikim û di kar û barê wan de serkeftin û serfiraziyê dixwazim.

Nûbihar, berî her tiştî xwe bi navê xwe daye/dide hezkirin. Bi vî navê xwe him Nûbihara ramanwerê nemir, gorbihûşt Ehemedî Xanî bi bir dixê û him jî mizgînîya bihareke nû (nûbiharekê) dîyarî me dike. Ji hejmara pêşîn bigirin heta hejmara 99'an, ligel guherandina formatên wê yên cure bi cure, dîsa jî bi hemû dilgermî û xwînşîrîniya xwe, xwe dide hezkirin. Ji logoya wê bigirin heta berg û rengê wî, ji dîmenên wê yên rengîn bigirin heta hêma û nîmayên wê, ji nîgaşên wê bigirin heta nexş û nimûşên wê, ji şêwaza wê bigirin heta çawanîya wê ...hemû bi gewzîni û bedewkarîyeke hunerane ya bêpayan hatîye nexîşandin. Wekî ku li ser berga wê ya pêşîn hatîye nivîsandin ew, "Mehnameya Çandî -Hunerî - Edebî" ye. Ev hevok nasnameya wê ya aşkera bi her awayî derpêş dike.

Ji wê rojê ku min bi hejmara 27'an dest bi xwendina Nûbiharê kirîye û heta îro, çî cara ku di refêkên rojnamger û kovargerên bajêr de çavê min bi berg û rûpelên wê yên çilmisî û zermihîbî dikeve xemgînîyeke xerîb xwe li nava dilê min dipêçe. Belê piştî wê xemgînîyê jî du sê hejmarên wê hildidim û didim dost û yarenên xwe. Pêşî ez bi xwe û pey re jî bi dost û hogirên ku hevnasî dane Nûbiharê bi giştî, di vê qinyat û yeqînîyê de ne ku, bi pêşgotin û sergotarên xwe, bi helbest û nivîsarên xwe, bi nirxandin û hevpeyvînan xwe, bi danasîna zat û şexsiyetên navdar û payedar ên gelê xwe, hêjayî xwendinê ye.

Heta niha kesên ku ez wan dinasim û Nûbiharê dişopînin, kesî dev ji xwendina wê berne-daye. Belê rastî jî ev e ku wekî hemû rojname, kovar û kitêbên kurdî hindik kes Nûbiharê dixwînin û dibin hejmetkarên wê. Lewre hejmara bengî û dildarên Nûbiharê jî bi qasî hejmara evîndarên zimanê kurdî ye. Ev kêmanî ne kêmanîya Nûbiharê

Nûbihar, ji hejmara destpêkê û heta hejmara dawî, wekî xedemeyeke wefadar û cefakar di xizmeta vî zimanê şêrîn de weşana xwe didomîne. Çendî ku ji ber merc û derfetên neyînî, bi awayekî bêhedan û bêdeman li ber xwe dabe/dide û hebûna xwe parastibe/diparêze jî, car caran ji neçarî navber daye weşana xwe. Belê piştî bêhnvedaneke kurt, bi hirs û hêzeke xurtir rabûye serxwe û meşa xwe ya dûvdirêj domandîye. Îro jî her ku diçe, xwe nûtir û têkûztir dike.

û kedkarên wê yên fedakar û cefakar e. Kêmanî ya kesên ku xwe kurd dihesibînin, belê ji bo çand, wêje û kelepûra kurdî avê di nava xwe de naçeliqînin e. Bi rastî jî îro xwelêgirtin, lêxwedîbûn, xwendin û nivîsandina Nûbiharê û hemû weşanên kurdî li ser her kurdî deyn û wecîbeyeke mezin e. Îcar em werin ser xizmet û peywir, û vatîniya Nûbiharê û hin kêmasiyên wê:

A rast, di vê dem û domana dijwar de zêde devê min nagere ku ez rasterê arasteyî kêmasiyên wê bibim û bêhêvîti û reşbînyeke bêwext bi ser vî karê wê yî pîroz de bibarînim. Belê ji bo Nûbihareke têkûztir, rengîntir û zengîntir, dê çend pêşniyar û daxwazên min ên acîzane he-

bin. Belê berîya wê jî min divê ku ez pêşî gelek xêr û fêdeyên wê derbibîrim.

Nûbihar, ji hejmara destpêkê û heta hejmara dawî, wekî xedemeyeke wefadar û cefakar di xizmeta vî zimanê şêrîn de weşana xwe didiomîne. Çendî ku ji ber merc û derfetên neyînî, bi awayekî bêhedan û bêdeman li ber xwe dabe/dide û hebûna

xwe parastibe/diparêze jî, car caran ji neçarî navber daye weşana xwe. Belê piştî bêhnvedaneke kurt, bi hirs û hêzeke xurtir rabûye serxwe û meşa xwe ya dûvdirêj domandîye. Îro jî her ku diçe, xwe nûtir û têkûztir dike. Nûbihara bi zimanekî hêsan, zelal, xweser û xwerû, xwe di dilê xwînerên xwe de bi cih kirîye. Alîyê ku Nûbiharê ji weşanên din vediqetîne nefsbîçûktî, diltenikî û dilsozîya wê ya domdar û wefadar e. Nûbihar, mîna sura bayê xerbî ku di kelgerma havînê de pêl bi pêl xwe li ba dike û bi mizgînîya biharê re hênika hîyeke xemrevîn pêşkêşî jîyanê dike ye. Bi vê yekê re mirov him kamran û bextewar dike û him jî xêr û xêrdoşiyê belav dike.

Heta niha 9 cildên Nûbiharê yên têrtîjî û têrwate gihiştine ber destê xwînerên wê. Ev yek bi serê xwe nîşana xizmeteke qedîm û pîrozwer e. Hemû hejmarên wê di van cildan de rêzik bi rêzik li pey hev rêz bûne û di pirtûkxaneyên kurdî de cihê xwe girtine. Bi vê yekê re lîxwedîderketina Nûbiharê li ser me ferztir bûye.. Heke Nûbihar tunebûna, îro em ê jî, ji vê mîrate û gencîneya çand û wîjeya kurdî mehrûm û bêpar bimana. Ji bo wê divê her mirovê/a wêjeyan, hunermend, çandparêz û

kêf û şanazî wê dixwînim jî, ez hin caran babet û naveroka wê sivik û bi ser re dibînim. Yanî, divê Nûbihar xwe hinekî ji zimanê gel ê rojane reha bike û hêdî hêdî arasteyî zimanê nûjen ê entelektuel bibe. Lewre çî rewşenbîr dibe û çî jî ronakbîr; çî helbestvan dibe û ji nivîskar... heta niha tu kesî tenê bi zimanê gel ê rojane serkeftinên mezin bi dest nexistîye. Bêguman û bêniqaş jêdera ziman gel bixwe ye. Belê gel her gav nikare bi serê xwe zimanê xwe sererast û tîkûz bike. Ji bo pêşveçûna ziman û

pir bedew û balkêş in. Belê rengê hemû hejmaran pir nêzîkî hevûdune. Li aliyê din jî dirêjî û firehîya hemû hejmaran ne yeksanî hevdu ye. Yek ji ya din çend milîman kintir an jî dirêjtir e. Ev jî senifandina kovarê ya di refîkan de zorga dike.

Acîzane rexneyên min ên derbarê formata rastnivîsê de hene. Ev çend hejmar in (bawer dikim ji hejmara 95'an û vir ve) ku ez û çend xwînerên Nûbiharê bi vê yekê mijûl û eware bûne, belê me hêj tu serî jê dernexistîye. Tiştê ku me dizorîne jî tîpa "î" ya ku piştî "y" yê nerm dibe û li "i" dadigere belê tenê di Nûbiharê de nayê guhertin û wek xwe dimîne. Ev rêbaz û azîne di hemû weşanên kurdî de bi vî awayî hatîye qebûlkirin, û her wiha Nûbiharê jî ji hejmara yekê û heta ya 95'an bi vî awayî nivîsandîye. Îcar gelo sedem çî ye ku edîtorîya Nûbiharê ji nişka ve ev şêwaz bi serê xwe pejirandîye. Ev yek pir zorê dide xwendin û fêm kirinê jî. Bo nimûne; çima "azadîya mirov" wekî " azadîya mirov" an jî "jîyan" wekî "jîyan" hatîye/tê nivîsandin Heke ji bo vê yekê daxuyanîyeke berfireh(ya nivîskî) di Nûbiharê de were dayîn/weşandin dê baştir bibe.

Ji aliyê rastnivîs û hevokazîyê de ligel hemû ketin û rabûn, şaşî û hin xeletîyên din, (biçûk, mezin) Nûbihar wekî kal an jî pîreke porspî/rîspî û rûspî sed hejmarên qerase li pey xwe hiştîye û rûyê me tevan spî kirîye. Ji bo vê rûspîti û serbilindahîya wê, ez ji dil û can wê pîroz dikim û ji bo jîyana weşana wê temenekî dûvdîrêjtir dixwazim.■

Acîzane rexneyên min ên derbarê formata rastnivîsê de hene. Ev çend hejmar in (bawer dikim ji hejmara 95'an û vir ve) ku ez û çend xwînerên Nûbiharê bi vê yekê mijûl û eware bûne, belê me hêj tu serî jê dernexistîye.

gelperwer li Nûbiharê xwedî derkeve. Ji bo ku em bikaribin him xwe û him jî Nûbiharê xurtir û tîkûztir bikin; divê em him wê bişopînin, bixwînin û binirxînin û him jî wê rexne û sererastir bikin. Çimkî dêwer û berdeyamîya Nûbiharê girêdayî xwîner û nivîskarên wê yên hêzdar û domdar e.

Bêşik, pesinandin û ecibandina tiştêkî ji rexnekirina wî hêsantir e. Belê a rast rexnekirineke zaneyane û di cih de bêtir sûd û fêdeyê dide wî tiştî. Ji bo wê, hêja ye ku mirov hin rexneyên xwe derbibîre û wan wekî pêşniyar pêşkêş bike. Her çiqaşî ku ez Nûbiharê diecibînim û bi

wêjeyê hewcetê her gav bi pîsporî û perwerdehîyeke zanistî heye.

Nûbihar, bi destpêka weşana xwe him cih dide wêjeya klasîk û him jî ya nûjen. Ev ne tiştêkî neyinî ye. Belê ev yek hevahengî û lihevhatina naverok û şêwaza weşanê hinekî ditengijîne. Heke di heman hehejmarê de berhemên herdu cureyan li nik hev an jî di zik hev de neyên weşandin di qinyata min de dê baştir bibe. Piştî formata nû ev yek hinekî kêmtir bûbe jî hê bi temamî jê safî nebûye. Di heman hejmarê de du berhemên nivîskarekî him qelsîya naverokê bi bîra mirov dixê û him jî xwînerên wê zivêr û bêzar dike. Wêneyên ser bergê

Nûbihar adana berê çanda hezarsale ye

Zeynelabidîn Zinar

pencinar@bredband.net

Berî her tiştî ez bi dil û can sedhejmarîya **Kovara Nûbiharê** pîroz dikim, hemû karmend û alîgir û xebatkarên wê jî pîroz dikim û ji wan re, ji kovarê re serkeftin û serfirazî dixwazim. Her weha hêvîdar im ji Yezdanê dilovan ku ew tev ji siqûmat û bobelatên nebûkaran paristî bin û di nava aramî û eminatîyê de bijîn.

Bê guman Kovara **Nûbiharê**, Adana Berê Çanda Hezarsale ye ku îro gihaye jimara xwe ya Sedî.

Her weha Nûbihar ji ber ku pirrengî, pîralî û babetcihê ye; hemû çîn û bawerî û cûnên kurdayetîyê jî di nava xwe de hêwirandî ye; ewê ne ola xwe berteref kirîye û her û her li nijad û çand û toreyaya xwe jî domandîye. Ji vê yekê Nûbihar, ne bi rengê xwe, ne bi şêla xwe, ne bi têbînî û bawerîya xwe, naşûfe kovar û rojnameyên kurdî yên dî. Îcar mirov çiqas alîkarîya Nûbiharê bike jî, kême û hêja ye ku ew jîyana xwe bi hezaren sedhejmarîya xwe bidomîne.

Bêguman Toreya Medreseya Kurdî û Rêbaza Mele Seîdê Kurdî di Sedsala Bîstî de bûbûn sêwîyê îdeolojîyên cuda yên di nava Kurdistan.

Lê belê Nûbiharê bi vê xebata xwe da peyîtandin ku ew jî yek ji xwedîyên vê Doza Pîroz e. Ji ber hindê ewê bi zirp û zexma xwe çemberên zengarî şikandin, peykerên aşbetalî rûxandin, hebanên kavilwêranî dirrandin û xwe bi kurdperwertîya bi zîrektî da nîşandan ku bîr û bawerîyên wê di radeya yekemîn de hebûneke hezarsale ye.

Ha wisa çî tiştê ku mirov di nêv çarçoveya toreyaya kurdewarîyê de bixwaze, mirov bi hêsanî dikare di nava rûpelên Nûbiharê yên bihurî de dibîne. Îcar vê xebatê, hêlîna wê di radeya yekemîn de li nêv mêjûya kurdî vegirt û ewê xist nava qulçavkên dilê her kurdperwerî.

Hêvîdar im ku Kovara Nûbiharê her li xetta xwe ya pîroz berdewam be, xwedîti li xameyên jibîrkirî bike, rê û dirbên tarî li çavên melûl û kêmrühî zelal bike û giranî bide ser Toreya Kurdî û berhemên rojnedîtî derxîne xolê û pêşkêşê dinyaya medenî bike.

Silav û rêz, her serkeftî û berxweddar bin... ■

Hêvîdar im ku Kovara Nûbiharê her li xetta xwe ya pîroz berdewam be, xwedîti li xameyên jibîrkirî bike, rê û dirbên tarî li çavên melûl û kêmrühî zelal bike û giranî bide ser Toreya Kurdî û berhemên rojnedîtî derxîne xolê û pêşkêşê dinyaya medenî bike.

Nûbihar hilmek azadî ye

Felat Dilgeş

Ç

îrokek her weşana Kurdî heye. Her kovar, her rojname û her kitêbek Kurdî xwedan çîrokekê ye. Her xetek Kurdî ya nivîskî, berîya ku derkeve pêş xwendevan, di çend qonaxan re derbas bûye. Bêguman mebesta min ne ew qonax in ku ji bo zimanên din jî derbas dibin. Ez qala ezîyet û zehmetiyên li pêş nivîsandina bi Kurdî dikim. Wek kesekî ku çend şalên xwe di vî karî de derbas kirîye û piçekî hay ji vê rastîyê heye, ez dikarim bêjim ku bi Kurdî nivîstî û bi zimanê Kurdî weşanekê deranîn, vê weşanê li ser lingan hêştin û jîyandin, ne karekê hêsan e.


Berî her tiştî evîndarîyekê dixwaze.

Ev evîn, evîneke wusa ye ku li kuçê û li ser sergoyan bi serê xwe, bi hemdê xwe mezin nabe. Ev evîn nazdar e. Di himêzê de, di pašilê de, bi serî mizdanê, bi ramûsanê, bi avdanê, bi bîhnîrehî û bi berxwedanê mezin dibê. Ji vê evînê re bîhneke fireh, hilmekê kûr û dilekî pola lazim e. Herkes nikare xwe bide ber barê vê evînê û bi hêsanî ragire êşa vê birînê.

Her weşana Kurdî heye. Belê çî heyf e ku pîrrê caran ev çîrok, bi qasî çîrçîrok û çîrvanokekê kin û kurt e. Bi gotineke din ev çîrok, wusa bi rihetî nabe dîrok. Gellek caran bi bextireşî diçilmise û diqurmiçe, ji dergûşê nayê der. Ji biharekê nagihîje payiza paşîn, an ji zivistanekê dernakeve biharê. Ango naherike wek Nûbiharê.

Di karê weşangerî û nivîsana Kurdî de evînek weha heye û bi ya min evîna rastîn ev bi xwe ye. Em dikarin vê evînê wek evîna welat binav bikin.

Min got ku çîrokek her weşana Kurdî heye. Belê çî heyf e ku pîrrê caran ev çîrok, bi qasî çîrçîrok û çîrvanokekê kin û kurt e. Bi gotineke din ev çîrok, wusa bi rihetî nabe dîrok. Gellek caran bi bextireşî diçilmise û diqurmiçe, ji dergûşê nayê der. Ji bihare-



Berga jimara 36. a Nûbiharê

kê nagihîje payiza paşîn, an ji zivistanekê dernakeve biharê. Ango naherike wek Nûbiharê.

Çîroka Nûbiharê 14 salan berê dest pê kir. Rojên wê yên pêşîn, hejmarên wê yên serî û ew dilgermîya dilên ku li pey wê davêtin, ruhên ku bi ser wê de xwar bûn û li ser wê dilerizîn, wek îro li pêş çavê min e. Di navê re 14 sal derbas bûne û îro Nûbihar gihiştîye hejmara xwe ya sedan. Kek Sabah Kara, Suleyman Çevîk, Alî Karadenîz û çend canên din ên ku li pişt Nûbiharê bûn. Ked, xebat û berxwedana wan. Ez baş dizanim ku wan çi di vê rîya pîroz de feda kir. Berîya ku ew Nûbiharê li ser sênîyekê pêşkişî me bikin, ez dizanim ku ew çiqas cefa û ezîyetê dikînin.


Qet ji bîra min naçe. Du- sê sal berê, ez dîsa çûbûm hafa Nûbiharê. Hingê min kek Alî Karadenîz cardin wek hergav li pêş qompîtûrê dît. Belê vê carê, min bala xwe dayê ku çavên kek Alî, di hêlîna xwe de gellek kûr ve çûne. Min nexwest ku ez dilê wî sar bikim, belê ez gellek ber vê rewşa wî ketim. Axir min xwe ranegirt û min got, "Kek Alî, çavên te di kûr de çûne. Xuya ye tu gellek zêde li ber qompîtûrê dimîni. Belê divê tu piçekê siheta xwe jî bifikirî." Ew bi şermokî bişirî, serê xwe hejand, bi neçarî destên xwe vekir û heq da min. Belê çi bikim, rastîya me Kurdan weha bû. Divîya ku hînekan ji me bêtîr, heta ser destî qeweta xwe fedekarî bikira. Wê êvarê gava ku ez ji Nûbiharê derketim, qet huzûra min tunebû. Hê jî ev yek ji bîra min neçûye.

Kek Alî, nûra çavên xwe, ji bo ku piçekê li ber gelê xwe bike ronahî hêdî hêdî hunda dikir.

Çarîn

Rojen Barnas

-11-


 Erî kankol, dil kundirê beravê
 Dev betal kir çeççeçokên li aşa
 Bîr û raman bi çerxek şaqulî va
 Jêrejor e, wekî gola gamêşa

Lê Suleyman Çevîk? Çardeh sal e ku ew jî, ji bo ku Nûbiharê bigere jîyandin berxwedaneke nedîtî nîşan dide.

Erê, tam 14 sal. Di zimanê me de xortê çardeh salî dibêjin. Xortê çardeh salî ew kes e ku di jîyana xwe de gihiştîye qonaxa herî xweş û geş. Hingê ew di bihara jîyê(emrê) xwe de ye, jîyanek dirêj li pêş wî ye û ew bi hêz û bi karîna xwe, bi zendê xwe yê xurt dikare dinyayê bihejîne. Loma ez hêvîdar im ku

Nûbihar jî, bi çavê xortekî çardeh salî li xwe binêre û karvanê evîne ber bi armancê ve bimeşîne.

Ez çardah salî û hejmara Nûbiharê ya sedan ji dil û can pîroz dikim.

Bi hêvîya ku em qedrê vê xebata pîroz bizanibin, ez ji bo malbata Nûbiharê jîyekî dirêj û bi sedan hejmarên nû hêvî dikim. Ji bo min Nûbihar hilmek azadî ye; çimkî ew bi Kurdî ye. ■

Rê

R. Karakaya

Jîyan, rêyeke pir dirêj e...
Ji Xwedê pêve, kes nizane ka ewê di wê rê de li kîderê, çi derkeve pêşîya wî, ewê çi were serê wî...

Qedera herkesî, ji bo wî hatîye nivîsandin. Qedera min jî wisan... Li Mûşê ketîye rê, çel sal e li Stenbol berdewam e...

Ez li Patnosa Agirîyê hatime dinê... Bi gotina dayîka min, "Wextê berf diheliya" ez bûme... Piştî salekê, mala me çûye Dêrika Milazgirê... Milazgir, navçeya Mûşê ye.. Pênc salê min jî li wî gundî derbas bû... Paşê mala me çû Kopê (Bilanixê)...

Ji gundîyê me berê xwe da bajarîyê.

Bavê minê rehetî, Mele Abidê Pirkaşênî (Mehmet Abidin Karakaya), wî çaxî em pênc zarok li gunda, ji bona ku em ji xwendinê bêpar nemînin, bibû miftî.

Min sala 1959-60î li Kopê dest bi mektebê kir. Bavê min ê zana, wî çaxî ku pêşîya xwe nedîta, îro ez û heşt xuşk û birayên min, ka li quncikekî kîjan gundî emê heder bibûna.

Miftîyî Kopê, miftîyî Şaxik

(Çatak) a Wanê, miftîyî Hewag (Bozova) a Rehayê, miftîyî Suweydîye (Samandag) a Hatayê, miftîyî Beykoz a Stenbolê, mînanî lokomotîfekî, rê li ber me vekir... Me da xwendinê, dinê bi me da naskirinê. Tenê ne em zarokên wî, pir merivên me jî, bi hatina bavê min a Stenbolê, ji welat koç kirin.

Wan tevîyan jî zarokên xwe dan xwendinê, bûne xwedî kar, xwedî mal...

Ji aîla me hinek çûne Ewrûpa, li wan deran xwendin, bûne xwedî kar, xwedî mal...

Niha li Aleman birakî min, li Swêdê, Norwecê, Denîmarkê, xwarzîyê min, kurxaltîyê min, qîzvaltîya min, kurxalanên min, qîzxalanan min û zarokên wan hene...

Merivên me yên li Mûşê rûdiniştin jî koç kirin Wanê... Nêzîka sîh salî ye li wira bûnin xwedîkar, xwedî mal...

Bi xwendinê û bi hatina bajêre, jîyan li ber me fireh bû... Fikra me, nêrîna me, dîtina me, seba deh sal, bîst sal, pêncî sal, sed sal paşê zelaltir bû... Me gavên xwe bi zanebûn avêt... Me jîyana



xwe bi hesab da derbaskirinê...

Kerwan, bir rêya xwe de usûl
usûl dimeşe...

Pêncî sal buhurîn ku em ji
gund derketine... Lê di xewna
min de hê Dêrik heye, Tendûrek
heye, Pirkaşên heye...

Dêrik, gundekî dora Sîpanê
Xelatê bû...

Sibê ku ji xew radibûm, min
û Sîpanê ji dûr ve silav dida hev.
Serî wî, 365 roj, nava berfê, ewr
û mij û dumanê de bû... Car ca-
ran mij radibû, mîna hevaleyê
serê xwe nîşan dida, bi germî di-
kenîya...

Bi rindîya wî, bi cîrantîya wî,
bi hevaltîya wî dilgeş dibûm,
dilxweş dibûm.

Li welat, zivistanê nizanîbû

xelas bibe. Çîya, xanî, qelax,
lod, bêder, zevî, kaş û newal, bi
mehan di bin berfa spî de winda
diman.

Zivistanan dilê min, dikete
bîreke bê binî... Bîreke tarî û zi-
lûmat.

Heya ku bihara nû, serê xwe
nîşan dida...

Bihara welat gelek xweş bû.
Der û dorê gund, nava hêşînayî
de, nava kulîlk û sosinan de di-
ma.

Ku min li wê rindîyê dînihê-
rî, diketime xeyaleke bê emsal...
Gund li min teng dibû... Min
dixwest ku ez bifirim mîna çivî-
kekî, bilind bim û nava 'alemê
de winda bim...

Şayîyeke wisa mezin dikete

nava dilê min, tu kesî nikarîbû
wê lehîyê bide sekinandinê...

Pêncî û şeş sal e dilê min bi
wî awayî, di her bihara nû de di-
gihêje maşûqa xwe!

Çar biharên nû min li Wanê
dît, sala 1960-64ê de.

Bi metroyan berf... Şeş meh
rêyên girtî... Dawîya nîsanê de
helandina berfê...

Ji ber ava berfê Çemê Botan,
Çemê Sortkin, har dibûn. Xanî,
dar, kevir, mîh, bizin, çêlek, ga,
berx, însan, dev û dorên van çi bi-
keta destê wan, hildidan dibirin.

Nêzîkî Cizîrê xwe bi lez digi-
hihandin Dicleyê...

Behra Wanê, Sîpanê Xelatê,
Dêra Extemarê, çîyayên dev û
dorên Şaxikê...

Kulîlkên darên behîvan, sêvan, gêlazan... Gul û sosinê dev û derên mêrgan, bax û baxçan... Bi hezaran darên gûzan... Heya çav didît di newala Şaxikê da rêz dibûn...

Pezkovîyan, hirçan, guran, kewan, kevokan, maran, bi hezaran çivîk û kêzikan, li ser van çîyan digerîyan, zikê xwe têr di-
kirin, diçerîyan...

Sê biharên nû jî, li Rehayê kete jîyana min.

Li Rehayê berf tunebû li zivistanê serma û havînê jî germeke bi tîn, xwe li nava dilan dixist.

Bax û bexçeyên Hewagê, mîna îro ew çax jî bi nav bû li Rehayê.

Ku navê Rehayê derbas dibe, Gola Masîyan, menciniq a ku Hz. Brahîm pê avêtine nava êgir... Çîkofte û esmera ku jan avête dilê min tê bîra min...

Bi salan, bîst û çar saet bi xeyala wê rindê şewitîm. Min dilê xwe bi vê stranê sar dikir:

Esmer esmerê, esmer şîrîna min

Esmer esmerê, esmer delala min

Esmer, min dîbû li ser kanîyê
Awir jê veda, dîsa kenîya

Ramûsaneke xwe da min
Ji keyfa ez firîyam
Destê min wê rakir
Got: Bira, ma ev çîye?
Rabû û meşîya,
kî dizane ew kîye...

Li min meyza, ji dûr ve
Nêzîk bûm ji eşqa
Berda û meşîya
Dilê min êşîya

Destê xwe min avêtîyê
Got: Bira me ev çî ye

Salên Rehayê xelas bûn
1967ê de. Piştî wê, me xwe li
Enteqayê dît...

Delala Rehayê, çavreşa Rehayê, esmera Rehayê, roj û şev rihê min de, dilê min de, mejîyê min de...

Enteqye, Suweydîye (Saman-
dag) û Behra Spî...

Xortê çîyan, êdî xwe gihan-
dîye qeraxa behrê...

Mîna çîyayên welat, bi behrê
ra jî ez bûme heval û hogir...

Min ji behrê, behrê jî ji min
pîrr hez kir...

Patnos (Qerekliş), Milazgir,
Kop (Muş), Şaxik (Wan), Hewag
(Bozowa-Reha), Suweydîye (Ha-
tay), di wê rê de qonaxên pîrr bi
xatir in.

1968an û vir de jî jîyan li Ste-
bolê benê xwe badide... Bey-
koz, Bogaziçi, Beşiktaş, çel sal e
warê me yê nû ye...

Çend sal e penc şeş mehê
min jî li Bodrumê derbas dibe...

Behra Marmarayê, Behra
Reş, Behra Egeyê, her sal biharin
nû dîyarên min dikin.

Çavên me, êdî li Stenbolê
ber bi roava ye...

Lê min, zîmanê dayika xwe
yê xweş bîr nekir, bi xatirê
Nûbiharê.

Pêncî salîyê xwe da bi saya
Nûbiharê bûme xwedî berhe-
meke zîmanê zikmakî...

Nûbiharê rê li ber min vekir.
Ji min ra bû rêbereke pîr hêja...

Jîyana min xemiland, ruhekî
nû da min. Min rakire ser pîyên
min. Bi şîrînayî, bi zelalî, bi
delalî herf herf nava dilê min de
rêz bû...

Giheşte hejmara 100î...

Ji Xwedayê mezin daxwaza
min, bila Nûbihar bigihîje hej-
mara bi hazaran...

Bila, rêya Nûbiharê qet bê
roj nemîne. ■

Înna lîllahî we îinna ilêyhî racî'ûn

Dêya berpîrsîyarê giştî ê kovara me ê berê **Sabah Kara**

Ayşe Kara

roja 28ê Çirîyapaşîna 2006an wefat kirîye.

Xwedê wê rehmeta xwe şad bike û sebrê bide malbata wê.

Nûbihar medreseyek e

Ebdulhadi Botî

ebdulhadi@hotmail.com

Ez dibejim Nûbihar medreseyek e. Îro kesek nikare tesîr û bandûra wê li ser edebîyat û çanda Kurdî, li ser xûhürt û rewşenbîrên Kürd inkar bike. Bi sedan xûhürt ji vê medresê mezûn bûne û hijmara rewşenbîrên kû divê medreseyê da cih digirin roj bi roj pêşdetir diçe. Ev jî mizgînîyek xweşe ji gelê Kürdra.


Wekî ku kârek girîng girêdayîê bidestkirina feydeyek berçav û miweqet be ew kar nadome. Lewra an bidestkirina wê feydê an jî bi jibêhêvîtîyê disekine. Belê wekî ku ew kar ji bona xizmeta de'wakê be, bê guman wê berdewam be, li tu asteng û derava naalîqe. Bi rastî xwedanê van karên wisa hêja kê in. Mirov bi zahfî tercîha karên zûfeyde dikin. Ji lew hejmara xebatên ku têne qebûlkirin û bi rastî cih digirin jî hindik e. Vêca Nûbihar, ji destpêkê heta îro xizmeta de'wayek pir girîng û hêja dike. Vê xizmetê ji ber ku lazim e dike û bes. Ji ber vêyekê Nûbihar pazdeh sal e didome û nasikine. Ser astengî û zehmetîyan ra derbas dibe û wan şunde dihêle. Ev hêz û qewet ne karê qeweta maddî ye, ev tev de bandûra semimîyet, durustî û ixlâsê ye.

Ez dibejim Nûbihar medreseyeke. Îro kesek nikare tesîr û bandûra wê li ser edebîyat û çanda Kurdî, li ser xort û rewşenbîrên Kurd înkâr bike. Bi sedan xort ji vê medresê mezûn bûne û hejmara rewşenbîrên kû divê medreseyê de cih digirin

roj bi roj pêşdetir diçe. Ev jî mizgînîyek xweşe ji gelê Kurd re.

Wekî ez îro Nûbiharê dibînim bîra min el-Menar a Reşîd Rîza, el-urvetu'l-Vuska ya Cemaluddîn Efxanî û Sebilu'r-Reşad tê. Minakên ku Nûbiharê têxe di rêza van kuwaran de zehfin hewceyîye gotine nakin. Çawa evan kuwaran di dema xwe da inqîlab û guhartinên mezin di fikr, raman û şexsîyeta xendevan û rewşenbîrande kirine Nûbihar jî vê guhartinê di xwendevan û rewşenbîrên Kurd de dike. Ez bi vê munasebetê îtiraf dikim ku Nûbiharê bandûrek zêde li raman û fikrên min kirine.

Nûbiharê serê pêşîyê çira xwe li Fatihê di bin valeyîya derinca avayîyekî de pêxist. Ez tu cara jibîr nakim wekî ku cara yekem ez çûm zîyareta Nûbiharê li vî cihê hewqas zêde mutewazî de medresên Kurdistanê yên şikeft hatibûn bîra min û hingî heyecanek zêde ez girtibum. Min ji xwe re gotibû; "Ma ev qedera Kurda ye eceba li gunda xwendin di şikefta de ye û li bajara nivîsdandin di binê derincên avahîyan de ye." Belê



Berga jimara 40. a Nûbiharê

Roj bi roj çira Nûbiharê geştir bü û êdî ronahîya wê gihaste tevên Kürda. Çend sedemên kü Nûbihar pêşxistî hene zahf giringîn hêjaye kü her mirov van sedemên kü ez ji wanre dibêjim pîrensîp bêxe bingehê raman û jîyana xwe.

ev rewş ji min re medarê îftixarê hat û ew quncika ku tê de maseyek û çend kursîyên kevne ji min re ji qesrekê jî xweştir hatibûn.

Roj bi roj çira Nûbiharê geştir bu û êdî ronahîya wê gihaste tevên Kurda. Çend sedemên ku Nûbihar pêş xistine hene zahf giring in hêja ye ku her mirov van sedemên ku ez ji wan re dibêjim 'pîrensîp', bêxe bingehê raman û jîyana xwe. Ev pîrensîp jî ev in:

a- Nûbiharê tu caran konê xwe neveda ser ava şêlû, bi qeder taqeta xwe, xwe gihande serkehnîyê. Ji wir vexar û jiwir ava zelal pêşkêşê xwendevanan kir.

b- Nûbiharê weke erdê rona-

hîya bîyanîyan nestand û weke heyvê ronahîya dîtiran belav nekir. Nûbihar weke rojê ronahîya xwe belav kir, lewra ew bi xwe rûnahî ye.

c- Nûbiharê pertal û çekên tu kesî li xwe nekir û li xwe nepêça. Nûbiharê metaê xwe pêşkêş kir û firoşt, metaê tu kesan pêşkêş nekir.

d- Nûbiharê xwe ji mîrasa netewî dûr nekir lewra dûrketina ji mîrasa netewî li gorî wê windabûn e, heyîna di destê xelkê de ya wê nîne û xwestin û parsekî mirin e.


e- Nûbiharê bi eqlê xwe fikirî û qîmet neda eqlê ji kîs xelkê. Lewra di zanî ku ew zîyan e.

f- Nûbiharê tu caran selewat li ser despotan neda. Lewra di zanî ku ev ne karê eqilmendan e.

g- Nûbiharê tu caran xwe bêhêvî nekir û li ber tengahîyan asê nema. Di her wext û di her rewşê de li xwe sebir pêça, bi hêvî fikra xêrê kir û rêya xwe berdewam kir.

Ji ber ku Nûbiharê bingehê xwe li ser van pîrensîban danîye, her wext nûye kevne nabe û lê nabe payiz. Kulîlkên wê rengereng in û gîyayê wê hêşîn e. Hêvîya min ew e ku ev rewş bê qutbûn dewam bike

Bi munasebeta hijmara Nûbiharê ya sedan ez pêşîyê xebatkarên wê yên fedakar, nivîskarên wê yên hêja û xwendevanên wê yên delal pîroz dikim. Çavên gelê Kurd ronî be û rêya wî her wext vekirî be. ■



Nameya
MEHMED UZUN
 ji **Nûbiharê** re

05.11.2006 / ...
 Salma

HEVALÊN DELAL,

Û Z JI DIL Û CAN HEJMARÊ 100'AN A
 NÛBIHARÊ PÎROZ DIXIM Û J' KOVARA WE
 YA DEWLEMEND Û BEDEW UMREKÊ DÎRÊS'
 DIXWALIM.

Ji 30 KOVAREKE XWERÛ KURDÎ SEB
 HEJMAR, BÛÇEREKE GELEKÎ QIRING E. HÛN
 BI' SER KETIN Û WE SEB HEJMAR WESAND!
 HÛN HER BÎJÎN.


HERWEKÎ KU HÛN JI DIZANIN DILÊ
 MÎN HER BI' WE RE YE Û DAXWAZA DILÊ
 MÎN BERKETSÎN Û SERFIRAZIYA WE YE.

Û Z WE DÎSAN BI' COŞ PÎROZ DIXIM
 Û BI' SEDAN HEJMARÊN XÛ JI 30 NÛBIHARÊ
 DIL DIXIM.

TZÛT SÎLASEN MÎN ÊN GERM...

MEHMED UZUN

9 CILD, 94 HEJMARÊN NÛBIHAR



ARŞÎWEKE HÊJA

Cildê

10.

amade dibe

Çi dibêjin di heqê Nûbiharê de

Mehmet Rauf Çiçek

Ji bo bibe bihare gel, dengê wêjeyê, dengê çandê, dengê kurdî, dengê aştiyê, dengê xweşiyê, dengê bratiyê û dengê heqiyê bi slogana; "ne zalim be ne mezlûm!" di payîz de nûbihar bû.

Sal 1992 payiz...Dinya di nav tevgerên lez û bez de ye. Tirkîye di nav vî rengî tevgeran de ye. Îdeolojî jî bi vî rengî. Kurd her wisa...

Li Tirkîyê bi destpêka 1992 yan de sancuyên guhertinê û li hember vê yekî teesubek dijar heye.

Bi piştgirîya Serokkomar Turgut Ozal Komara Duyem tê guftegokirin. Rewşenbîr, rojnamevan, nivîskar û bernamekarên televîzyonan di van gutegoyande cîh digrin. Civatê de xwestina jîyanek nû, rûpelek nû, nêrînek nû heye.

Di vê nav berê de hêzên tarî, dijmînê ronahiyê, qatilên azadîyê vala nasekinin. Ji bo roj venebe, jîyanek nû pêk neyê ew ji di nav tevgeran de ye.

Gel tevî hemû astengîyan dîsa bi hêvî bû. Hêvîyek ji wan hêvîya;

ji bo asoyek nû,

ji bo perspektîfek nû,

ji bo bibe bihare gel, dengê wêjeyê, dengê çandê, dengê kurdî, dengê aştiyê, dengê xweşiyê, dengê bratiyê û dengê heqiyê bi slogana; "ne zalim be ne

mezlûm!" di payîz de nûbihar bû.

Di hejmara yekem de Nûbihar manîfestoya xwe wiha raber kiribû:

- Kovarek xwerû kurdî
- Perwerdekirina zimanê kurdî û nîşandina edebîyata kurdî,
- Dengê mazzûman, dengê gelê bindest.


• Alîgirîya mafên mirov û taybetî mafên kurdan,

• Li pey şopa Seidê Kurdî bi cîh anîna şîreta wî a: "Xwendin xwendin, xwendin. desthevgirtin, desthevgirtin, desthevgirtin."

Di payiz û zivistana 1992an de biharek da jîyandin.

Nûbihar salek xwe tije dike. Zalim matmyîne. Bawerên ku piştî çend hejmara wê kovar weşana xwe nedomîne. Bawerî ewe ku çand, huner û wêjeya kurdan tune. Gel lê xwedî dernekeve. Bawermend bi van karan mijûl nebin. Divên kurd li ziman û çanda xwe xwedî dernekevin. Bawer dikin ku kurd nizanin bi kurdî bixwînin û binivîsin. Divên ên kovarên derdixin ne bi xwedî îradeyek mezinin.

Ew bawerîya wan pûç derket. Nûbihar di rêya xwe a dûr û dirêj



Berga jimara
50. a Nûbiharê

de meşîya. Ji rêya dabû ber xwe derneket.

Ji 92an heta 2006an pir tişt guherîn û qewimîn. Tovên birakujîyên heta asta herî bilind dirêj bûn. Bi hezaran mirov li ber bayê birakujîyê wunda bûn.

Li Tirkîyê derbeyek postmodern bû. Azadî gelek hatin astengkirin. Mirovan şerpeze kirin. Ji rêberên gel hinekan şehîdkirin, hinekan avêtin heps û zîندان.

Nîjatperestan anîn desthilatdarîyê. Rêya alozî, înkarkirin û tunekirinê danîn ber gel.

Nûbiharê di rêya xwe a dûr û dirêj de li hember hemû bê îmkaniyan li ber xwe da. Di hinek deman de dereng derket lê tu car bê hêvî nebû.

Nûbiharê di rêya xwe a dûr û dirêj de li hember hemû bê îmkaniyan li ber xwe da. Di hinek deman dereng derket lê tu car bê hêvî nebû.

Lewra Nûbihar; gîyana bihara xwe, ji mirovahatiyê girtibû,

Wê koka xwe bi bawerîyê av dabû,

Ew Nûbihara Ahmedê Xanî bû,

Ew serbilindîya bawermende bû,

Ew armanca Saîd û Îzzettîn bû.

Ew zimanê gelê xwe bû,

Ew bihara gelê xwe bû,

Nûbihar niha di sala xwe a 15 de ye. Bi hejmara 100 î derdikeve ber we. Ew bi hemû nîrxên ku ji we standîye bi serbilindî me silav dike.

Min bi vê mabestê ji heval û hogira pîrsek kir. Dixwazim bersivên vê pîrsê bi were pervekim:

Pirs:

Kovara Nûbiharê jibo we tê çî wateyê? An jî kovara Nûbihar çî tine bîra we?

Mucteba Baravî

Uppsala/Sweden

Kovara Nûbiharê hem bi sedem navê xwe û hem jî bi sedem yê ku bi her tiştî xwe dan bin barê wê û berdewamkirina wê, xwedîderketina dîndar û alimên kurd ya li netew û pîrsgirêka kurdî tine bîra min.

An jî vejîn û geşbûna tovên ku alimên mîna Ehmedê Xanî û Seîdê Kurdî di mejî û sînga gelê xwe de çandibûn tine bîra min.

Dibistaneke seretayî ku me xwe lê fêrî xwendin û nivîsandînê kir tine bîra min.

Gulistaneke ku herkesekî dîlxwaz, kulîlk an jî darên xwe tê de, ji bo hemdemên xwe û nîfşên dahatû çandin tine bîra min.

Kovareke ku têkilî û hevparîyek ji oldarî û netewhezîyê re dît tine bîra min.

Kovareke ku ta niha tu hêl û hêzên kurdî û kurdistanî ji tundî û tûjîya wê tengezar nebûne tine bîra min.

Kovareke ku digel hemû bêderfetî û tengezarîyên cûrbecûr karîbûye 100 biharî bi xwendevanê xwe di temenekî kurt de bide jîyandin tine bîra min.

Kovareke mîna mirovekî bi temen û tecrûbeyên xwe sedsalî lê bi hêz û taqeta xwe di sîh û sê salîya xwe de be tine bîra min!

Hêvîya min ew e ku temenê te yê dinê ta qiyamet rabe berdewam be û hêza te mîna kesên behîştî tu carî kêma nebe û her tim ray û ramanên hemdem û pêşkeftî di rûpelên te yê sipî de bibîşkuvin.



Berga jimara 60. a Nûbiharê

Av. Şükrü NALBANT

Izmîr

Kulîlka berfînê... •

Mahmut Oktar

Mamoste-Amed

Yekane mînaka bi berhema
xwe nîşandina gelê mezlûm. •

Selahattîn ARSLAN

Karmend/Mûş

Nûbihar, raman, nêrîn û çanda
kurdan e. Em dizanin ku nûbihar bi-
hara nû ye û vebûna kulîlkên nû ye.
Kîjan netewe dibê bila bibê netewe,
ziman, çand û kevneşopîya xwe ni-
zanibe ew netewe nikare xwe bipa-
rêze. Em bi nûbiharê ji nûve jîn bûn.
Bawerîyek mezin da me. •

Yunus AÇIKGÖZ

Mamoste/Dîlok

Kovarek ewqas dem weşana
xwe bi vê naverokê didomîne re
rêz digrim. •

Rukîye ÇÎÇEK

Amed

Nûbihar; kovarek îslamî û kur-
dî. •

Muhammed Rohat ÇÎÇEK

Xwendekar (9 Salî) /Amed

Kovara nûbihar, tiştên dînî û
nivîsên xweş tîne bîra min. •

Mustafa DEMÎKIRAN

Mamoste/Amed

Îfadekirina Zimanê Kurdî ye. •

M. Alî ÇOBAN

Mamoste/Amed

Xwe Îfadekirina Kurdan û pêş-
vebirina çand û zimanê kurdî ye •

Serhat YILDIZ

Ji bo fêrkirina zimanê kurdî ba-
wer im peywîrek baş kir. •

Selîm AKÇARA

Rêvebîr/Amed

Ziman û çanda me ye. Îslamê
bi rengêk cûda dide nasandin. •

Osmanoca

Riha

Di rêya ku bawer dike de di-
meşe. Di nav kovaran de tekena
ye. •

Mîrze Mihemed

Farqîn

Ji bo nivîs û xwendinê cîhek
taybet digre. Bi awayek erênî di-
meşe. •

Zîlkif XEŞHÊÎ

Mamoste/Lîce

Nûbihar deng û rengê miletek
mazlûmê. Her meha nîşana paşe-
roja geş û xweşa miletê ye. •

Sîtkî ZÎLAN

Parêzer/Amed

Nûbihar derûnîya çanda me
ye. Zimanek dilovan û dengê ne
bîyanîye. Pêwîst e ev deng olan
bide û gel û rewşenbîran hambêz
bibe. •

Selahattîn ÇOBAN

Parêzer/Amed

Nebêjin em nizanin. Bixwînin,
ger hûn nexwînin hûnê tim neza-
nîbin. Nûbihar ji me re bû mek-
tep, bû dibistan. Spas ji bo te em
fêrî nivîsîn û xwendina zimanê
Kurdî kir. •

Nesîp YILDIRIM

Parêzer / Serokê Mazlumder a şa-
xa Amedê

Nûbihar ol, ziman, çand û
edebîyata kurd e. Ewqas salên
dirêj bi îstîqamet rêya xwe şopan-
din karek bi rûmet û girîng e. Ser-
keftin. ■

Gula payizê Nûbihar

2006/12/08

Nûbihara ezîz û delalî, tu ketî çarde salîya xwe. Mîna xewnên şevan tê bîra min hev-nasîna me. Tu gulek di payizê de bişkivî bû û ez jî bi ber bayê rojava ketibûm û hatibûm gîhabûm Stenbolê.

Di rojek germa havînê de li kuçên Stenbolê em leqayê hevbûn. Dostanîya me ewqas pêşve çû ez rojekê nikarîbûm bê dîtina te bibama. Min hesreta xwe bi te belav dikir. Bîhna xwe bi te freh dikir. Gava hindik dima Stenbol min bi fetîsîna tu dihatî hawara min, *Hawar* a hemdem. Tu ji bo sedan xortên wek min ku ketibûn kuçê Stenbolê, sitar e, hêvî û war bû.

Hevala hêja te em gîhandin qonaxa eyînê, te em kirin xwedîyê vîn û nivîsînê.

Ma tê bîra te yekem car gava min ji bo te nivîsî "Teqez hûn jî behitîn li hember vê hevokê" gerîndeyê go "te go çî".

Çi roj me borandin. Ez bi dizî dihatim dîtina te. Min ji bo dîtina te carnar ders terk dikirin, hevalê din dixeyîdîn

Tu bayî te ji cihê te ne leqandî, tu navî tu ne tirsandî. Te ne zalîmtî û ne jî mazlûmtî qebûl kir. Rastî û diristî bû rêhevalê te. Lê ew sebr û fedakarîya te. Her dem bû mînak û nîşane.

Carnar hevalên te çêbûn lê çilmîsîn, çûn. Tu ne ya hewesên demdemî bûy, xwedîyê vînek esasî bûy. Rîçikên te xwe berda ji Stenbolê gîhaşt çaralîyê welêt.

Di nava tunetîyê de çardeh sal. Lê te qet li xwe dananî. Tu serbilind û serfiraz jîyayî.

Gul ta ku bû dar zivistan û payizên dijwar dîtîn. Carnar ji tu kesî re tişteke negot lê carnar jî kir hawar û qîrîn. Dengê wê gîhaşt bin xetê, çû derket serê çîyayê agirîyê. Şivanê ber peza, paleyên nav reza tu kirî paşîla xwe. Wek nan û av tu ji xwe neqetandin. Ne tenê vana helbet ku bajarîyan jî tu hewandî. Carina ji zarokan re bû

zarokîstan, ji bêzar û zimanan re bû ziman.

Nizanim ka kes salvegerên te pîroz dikin an na? Tu, wefakarîya tu kesî jibîr nakî.

Ma tu dizanî ez zewicîm. Bûm xwedî zarok. Min navê qîzek xwe Nûbihar lêkir. Her çiqas ew di biharê de Xwedêdabe jî min got bila bi navê te bijî. Deng tê te min navê te li qîza xwe kir. Li ba me, li van deran wusa dikin ji bo nav bijîn navê hezkirên xwe li zarokên xwe dikin. Bi vî hawî nav radikin. Ka min nizanîbû ez çî bikim ji bo te ev hat bîra min.

Ma gelo cirkî em ji hevûdu qetyane tu çawayî? Ka bêje ta vê hejmarê te çî dîn? Êdî xebera te sê mehan carekî digrêm. Ewîl em tim pevra bûn. Ez her roj dihatim dîtina te. Dûv re mehê carê didîtî. Her cara min tu didîtî ji ya berê baştir bûy. Lê nuha bi tenê sê meha carekî xeberê digrêm ji te.

Tu dizanî qîza min ya mezin jî ji nivîsîna nameyan pir hez dike û her roj bêrîkên me tijî name dike. Min ew bi çîrokên te mezin kir. Niha bi zimanê te dipeyîve û çarîna te ji bo xwuşka wê ya nûbihar rêz kiribû jiber kirîye. Eger rojekî ew jî bi zimanê te ji te re nameyekî xêz ke tu zanibî ew berhema te ye.

Ez ji dîr ve te dişopînim. Lewra dur ketim ji te. Rê û dirb ket navbera me lê tu hîn di dilê min de bêhemta yî. Heval tînin îdî xebera te. Dibêjin ew gula di payizê de vekirîye bûye dar û ew dara Nûbiharê wê bera sedî bide. Şaxên te ji me re sî, gulên te ji me re bîhna mîsk û ember, dengê te ji me re banga azadîyê.

Dosta ezîz, hevala sadiq; Xwedê bike em hîn pir xeberên xêrê ji te bigrên.

Umrê te dirêj û rêya te vekirî be.

Hevalbendê te
Selaheddîn Şivan

Derketina 100 jimareya Nûbiharê hîvîya di dilan de geştir dike

Cankurd

Navê "Nûbihar" pevxistinek kevin e, di zimanê kurdî de. Seydayê hozanvan û hişmend, Ahmedê Xanî, pirtûka xwe ya ferhengî ji bo fêrkirina zarokan bi "Nûbihar" navkirîye. Ew ferheng ji aliyê şagirdên Kurdan ve bêtir ji 200 sal dihate ezberkirin. Melayên Kurdistanê li ser vê ezberkirinê bi tundî radiwestîn. Mixabin, niha pir hindik Kurd dikarin 4 malikan ji wê "Nûbiharê" bixwînin, bê ku pirtûk li ber wan be.

Berî niha bi 10 an 11 salan, gava cara pêşîn min kovara "Nûbihar" dîtîye, ew bo min bûyerekek mezîn bû. Li bajarê Kölnê li Almaniya bû. Min ji wê rojê de bizava xwe kir, ku ez hemî hejmarên wê bi dest xwe xînim, û ji qabê "bergê" pêşîn ta bi yê paşîn bixwînim. Min gelek caran ji kovarê re gotar û helbestên xwe hinartin. Her car gava hejmarek a ji wê diket destê min ez dilşad dibûm. Min bi kêmtirîn 2 nûserên wê jî naskirin, ku ez bi dostanîya wan jî serbilind im.

Îro, min bihîst ku jimareya 100ê li qada wêjevanîya kurdî li ser zimanan e. Ev nîşana xeba-

tek pir mezin û sebr û tewata xebatkarên wê ye, tevî ku ewan di rewşên nebaş de, bi histobarîya xwe ya dîrokî radibin. Li para mezin a neazadkirî ji welatê me yê di bin zorê de, her weha ye, gava yek xwe bide ber xebatek wêjevanî û çandeyî, kes piştvanîya te nake, kes harîkarîya te nake û berhemên te nayin kurrîn. Tiving, kasêt, cil û berg, tenbûr û her acetek dî, ji pirtûk û kovaran bêtir tînin standin. Xebata ji bo zimanê Kurdî her di tengavê de, di tarîyê de, di hejarîyê û bedrewştê de ye. Lê dîsa jî Nûbiharê 100 hejmarên xwe dane hev, kirine qeftek gulên geş û bînxweş û dane dest yara xwê: Welatê xwe.

Nûçeya 100 jimareya Nûbiharê, hêvîya di dilê min de û di dilê hemî Kurdên nişterperwer de bi paşeroja zimanê me yê dayikê, mezin û geştir dike... Bila hûn ji me re her bimînin sax û berhemdar, hemî xebatkarên Nûbihar a giranbiha û kîbar, çî yên berê çî yên niha. Em di wê bawerîyê de ne, ku hûnê baxê gulên "Nûbiharê" ji neteweya xwe re biparêzin. ■

Cîyê kovara Nûbiharê

Ferîd Îzol

feridizol@yahoo.com

Di wêjeya kurdî de, Nûbiharê xizmeteke mezin kirîye. Ji Xweda yê herî mezin re hemd û sipasîyên bêdawî... Wexta Nûbihara rengîn dest bi weşanê kiribû, li Stenbolê çend hejmarên wê li ba min hebûn. Di jîyana gel kurd de navê Nûbiharê ne xerîb e. Di nav gelê me de, Nûbihara rengîn bi awayekî cîyê xwe yê dîrokî girtîye. Ev jî nîşana wêjeya kurdî derdixe holê. Rêyêke dûr û dirêj bû. Lêbelê, kêmasî jî hebûn û wek her karî... Tu tişt bêkêmasî nîn e. Hebûna gel bi ziman û wêje ve girêdayî ye. Dîroka Nûbiharê pir rengîn e. Barekî gelek giran û bi zahmetan jîyana Nûbiharê dihat meşandinê. Wek tê zanîn di her karî de zahmetî hene. Belê, rêya zor û zahmetan jî, yek caran bi rahmetî û bereketê ve tê xemlandinê...

Êdî Nûbihar xortekî 14 salî ye...Di edebîyata kurdî de, karekî nûjen û hemdem pêkanîye. Xemlandina civaka kurd bêguman bi zanebûna zimanê kurdî ve girêdayî ye. Ji geşkirina vîna neteweyî re xizmeteke pir mezin e. Rê û rêbazên wêjeya nûjena kurdî bi awayekî hemdem pêş de bir. Nûbihar îro êdî kakilê edebîyata kurdî ye. Zimanê kurdî yê şêrîn li ber astengan jî, qedexebûnê jî, pelîseyê (nasîb) xwe girtîye. Ji ber vê têkoşîna demdirêj ji bo gelê me, ev hebûna, vejîna wêjeya neteweyî ye. Êdî ne xema me ye, zimanê kurdî bêxwedî nîn e...


Belê, eger îro li Tirkîyeyê çapemenîya kurd ev rêya dûr û dirêj daye ber xwe û li ser vê rêya bi kelem û ştirî dimêşe û bêguman çapemenîya kurd

êdî xurtirîn bûye. Ev ne xewn e, ev serkeftineke dîrokî ye. Di civaka me de eger guherîn û veguherîn hêdî be jî, ev jî tişekî ji rêzê ye. Di rewşa bindestan de, mixabin ev wisa ye. Ji têgihîştina gel re dem divê. Wexta ku gel me, li mîrata bav û kalên xwe xwedî derkevin û zordestên vî welatî wê çî bikin?

Pir caran mirov di vî warî de difiki-re. Gelo ev xewn e, an rast e? Di jîyana kurdên KT de, kovarek hejmarê xwe ya 100 î derxîne û jîyana xwe bidomîne. Di dîroka kurdên KT de, ev yek e. Îro kovara Nûbiharê êdî bûye çavkanîya wêjeya kurdî a nûjen e. Em pê kêfxweş û bextîyar in. Di wêjeya kurdî de, ji bo hemû kurdan navnîşan e. Dilên birîndar, rêya gilî û gazincan, rebenî û belengazî êdî em ji dil û mêjîyan xwe de derxînin. Wateya jîyana me bi zimanê kurdî xweş û rind e.

Peyveke gelek xweşik û narîn e. Nûbihar rêya zanebûn û têgihîştina gel e. Îro pêwîst e ku gelê me jî, şa bibê û pê serbilind be. Di vî warî de, evîndarên zimanê kurdî barekî gelek giran li ser milên wan e. Belê, di rewşa me de, êdî guherînen mezin hene. Gelê me jî, li gorî şert û mercan tevdi-gere. Zimanê kurdî hebûna nasnameya neteweyî ye. Nûbihara rengîn di jîyana gelê kurd de, cîyekî xweş girtîye.

Înşallah wê jîyana xwe bidomîne. Em li mîrata xwe xwedî derkevin. Kakilê wêjeya kurdî Nûbihar e...■



Berga jimara 70. a Nûbiharê

Hejmara Nûbiharê ya sedan

Murad Celalî

muradcelali@gmail.com

Ji destpêka jîyanê vir de di her dem û dewrê de mirovan li gor şert û mercên xwe, alav û navgînan ragihandinê, têkilîyê saz kirine û bi kar anîne. Hinek deman merivan mirov kirine qasid şandine cîyê ku dê xeber bê şandin, carna agir hatîye bi kar anîn, carna gogerçinan karê navgîniyê kirîye û hê gelek tişt hatine bikaranîn. Wekî me got, şekl û awayên navgînan li gor derfet, pêşketin û mercên xwezayî peyda bûne. Roja me ya îroyîn de hejmar û awayên peywendî, ragihandin û têkilîyê pir in. Hinekên berê dihatine bikaranîn, gelekî girîng bûn êdî îro hema hema hatine jibîrkirin û belkî çend sal şunde heke ji bo nostaljiyê nebe qet dê neyên bikaranîn. Ji bo vê name mînakek gelekî baş e. Lewra wekî tê zanîn di dîroka peywendîyê de name pir hatîye bikaranîn, tewr ya sereke ew e. Ji ber di derbarê nameyê de gelek lêkolîn hatine kirin, di têkilîyê de navgîneke hêsan e. Bi rastî kovar û rojnameyên îroyîn jî cureyek ji nameyê ne.

Dema min di dibistana navendî de dixwend, apekî min li

Enqerê zanko dixwend. Her çaxê ku dibû betlane dihat malê, carê carê ji me re, zarokên malê re pirtûk, kovar û bandên teze dianî. Loma çaxê ew dihat kêf û eşqekê me digirt, ji bo me dibû roja şahîyê. Lewra îlam tiştê li para me biketa. A wê hingê, cara pêşîn min di nav pirtûkên wî de li gel hinek pirtûkên kurdî Nûbihar jî dîtibû. Lê wekî gelek zarokên kurd min jî nizanîbû bi awayekî rind, bi hêsanî bi zimanê dayika xwe bixwînim, têbigihêjim. Lê dîsa destê min lê sar nedibû, min dev jê bernedida, ji serî heta dawîyê perên wê diqulibandin, li kûderê nivîs, rêzikek kurt a ku çavê min lê bibirîya ezê bikaribim bi hêsanî bixwînim û fêhm bikim bidîta ez bi wê mijûl dibûm. Çaxê min hinekî fêhm bikira, ser rast bikira jî, wê hingê min çend caran ew nivîsa li cem xwe de dixwend paşê min diçû ewna ji kalik û pîrika xwe re dixwend. Piraniya wan jî helbestên kurt bûn.

Belê wekî gelek zarokên kurd min jî bi vî şeklî, piştî ku ez mezin bibûm fêrî zimanekî bîyanî bibûm, pêrgî Nûbihar a ku bi zi-

manê min dinivîsî hatibûm. Ji wê rojê, wê hingê şunde li kûderê ez çav bi kîjan kitêb, kovar û yan tişt-tekî bi kurdî bihatama min bi baldarî bala xwe didayê û didimê.

Li Îdirê ku bajarê zaroktîya min lê bihurîye çend pirtûkfiros hebûn, lê di wan yekê tenê de berhemên kurdî û di derheqê kurdan de dihatine firotin. Lê ewna jî pir kêr bûn. Ez jî diçûm wêderê carna li ser ligan carna jî li ser kursiyekî rudiniştim çend lehza çav li wan digrand û li wêderê cîyê runiştinê jî hebû me li wêderê sohbet jî dikir.

Nûbihar

A ez bi vî şeklî hînî xwendina kurdî bûm. Dema ez hatime Stenbolê, li zanîngehê ji her fikir û îdeolojîyê xwendekar hebûn. Loma jî her rêxistin û destê neçîrvanê wan li pey xwendekarên teze bûn. Lê ev ne mijara me ye. Rojên pêşîn ji bo min hinekî nerind bûn, bi tengasî derbas bûn. Lewra nas û dostên min kêr bûn, hema bêje qet tunebûn, lê berêka ez hînî wir, heval û hevaltîyên teze peyda bûn. Berêka min hawir nas kir û bûme beledê wan deran. Rojekê li gel hevaleyê em rabûn çûne cîyê Nûbiharê. Me bi çavê xwe navenda wê dît û dilê xwe rihet kir. Lewra ew di dilê min de bibû keserek. Lê mixabin wan çaxan kovarê ji ber qeyrana aborî weşana xwe dabû rawestandin. Ango dibistana mina zimanê dayikê hatibû girtin. Lê Xwedê heske dê demeke kin de dîsa destbi weşana xwe bikiriba. Her çendî ji bo me xwendevanên Nûbiharê kin nebe jî piştî du salan dîsa dest bi weşana xwe kir. Lê bi form û pergaleke nû. Nûbi-

har berê mehê carekê derdiket. Îcar êdî sê mehan carekê derdiket. Hejmara rûpelan zêde bibû, ebadê wê mezin bibû. Yanî bîhnvedana dusalan kêrî Nûbiharê hatibû. Jixwe gelek caran meriv ji bûyer, biryar û hwd. dibêje ev tişt ne rind e, tu lê dinihêrî dibe sedema encameke qenc. Qisa Nûbiharê jî ew bû.

Ji roja sifte heya îro kovar bûye derfeteke mezin ji bo me kurdên bakur. Lewra li vê taxa me, weşandin û çapkirina kovar û pirtûkên kurdî, ji ber gelek sedemên ji hevûdu cûda bi zehmet e. Him belavkirin, firotin û reklama wan ne hêsan e, him jî hatinî û mesrefê wan têra xwe nakin. Ji ber vê gotî kes û kesên ku mil didine ber vî kar û barî li gel xebata manewî, ji hêla maddî ve jî keda xwe bidine ser. Lewra heya îro hezar heyf hê bazara kurdî ne-edilîye, nav û deng nedaye. Ji ber wê meriv bi wî karî tenê nikare debara xwe bike. Loma kes û kesên bi weşangerîya kurdî ya bi xurî bi zimanê kurdî dikin di hêla aborî de piştîsikestî ne. Hatînîya wan bi tam têra mesrefên wan nakin. Ji ber vê, yan karê wanê esasî tiştêkî din e û yan jî li ber vî karî de bi xebateke din re jî mijul dibe. Birastî ev, ji bo herkesê bi kurdî re eleqeder dibe wisa ye. A ev yek jî dibe sedema gelek nehênîyan, rêliber qencî û serkeftina vî karî digire, şewq û hêza merivan dişkîne. Lê dema kesên bi biryar, jêhatî, xwedî li daw û doza xwe derdikevin hebin ev pirsgerêkana nikarin bibine asteng, wate bi şeklekî tîn çareserkirin. Nûbihar di hawirêkî weha dijiwâr, bi asteng de derketîye û îro vaye gihiştîye hejmara sedan. Bila-emrê wê direj be û gelek sed hejmaran bibîne. Lewra kesên dil bi keser, bîrewer, ji bo mafê gelê

xwe tédikoşin bi navgînîya wê bîr, ray, fikir û pêşniyarê xwe radigihînine civaka xwe. Gel, xwendevan jî bi derketina wê xwedî agahî dibin, fêrî gelek tiştên teze dibin, bi dunyê dihesin. Bi sê mehan carekê be jî kovareke ku bixwînin destdixin, bi çand, wêje û hunera xwe dihesin û bibîrtînin. Berhemên kevn û nû yê wêje, mêtû û hunera kurdî dixwînin. Xort, ciwan û kesên nû dest bi nivîsê, ceribandî û helbestê dikin, xebatên xwe bi saya wê pêşkêşî raya giştî dikin. –Ez jî yek ji wan im.– Bi vî şeklî kovar di navbera gel de dibe qasidê peywendî û ragihandinê û ev jî karekî hêja û bi rûmet e.

Di vê babetê de mirov dikare gelek tiştan bibêje, lê ev ne cîyê wê ye. Di dawîyê de ez dixwazim taybetîyeke Nûbiharê bibêjim. Her çendî çapemenîya Kurdî ya bakur qels be jî her dem hebûye û weşana xwe kirîye. Lê di hêla olî de ji bilî berhem û xebatên mela, seyda û şagirdên medresên kurdan, wekî kovar, rojnameyan weşana kurdî nebûye û yan jî em haj pê tunene. Cara pêşîn bi Nûbiharê bi vê dest pêkirîye û berdeyam dike. Belkî di van çend salên dawîyê de hinek kovar, weşanxane û malperên oldar derketibin, lê yan zimanê wan xurî kurdî nîne, yan bi demeke kurt derketine û yan jî derfet nedîtine bennasîn. Ji ber vê hindê bi vê taybetîya xwe ve jî Nûbihar tekane ye. Lê daxwaz û hêvîya me ew e ku ji vê şunda ev qada girîng vala nemîne, hevrê û hevkarên Nûbiharê zêde bin. Di vê rêya dirêj û bi renc de mil bidine hevûdu bimeşin û pêşeroja me ronî û geş bikin. ■

Nûbihar û kurd

Dr. Naci Kutlay


Kurd di Rojhilata Navîn de, yek ji wan civakên herî kevn in. Çarê Çirîya pêşîn 2006'an de Parlamentoya Yekîtiya Awrûpayê, rapora xwe ya derheqê Kurdan niqaş û qebûl kir. Di raporê de hanî ziman û got; Kurd netewekî dinyayê yî bi nufûs mezin û bê dewlet e. Belê nivê wan li Tirkîyayê, yên mayî li Îraq, Îran û li Sûriyayê dijîn. Li Qafqasyayê jî hene, lê belê ne pir in. Van demên dawî de wek netevêk in.

Bê şansîya Kurdan, di bin bandora wan dewletên qewî yên cînar de man. Mînak, li dijberî Bîzansîyan bi Selçûkîyan ve bûn yek. Jîyanê ew mecbûrî vê rewşê kiribû. Li hemberî Farsên Sefewî, Osmanîyan girtin. Şah Îsmayîlê Sefewî, di 1501'ê de Dewleta Aqqoyîniyan ji holê rakir. Rewş bo Kurdan berve başbûyîne çû. Di halê etnikî de, li heremê de Kurd ji berê pêştir her rihet bûn. Dewleta Sefewîyan bi ol şîî bûn. Beşek ji Kurdên Sunnî ketin bin bandora Sefewîyên Şîî û xwestin bi Osmanîyên Sunnî re bijîn. Koçberî Anadolîya rojhilat bûn. Hinek Elewîyên Tirkman, ji Anadolîyê derbasî Îranê bûn. Osmanîyan zordestî li Elewîyên Tirkman dikir. Lewra ew koçber dibûn. Qulipandina kû bibin Tirk-Tirkbûn- ji Rojhilata Anadolîyê

dest pê kir. Her çiqaş rojhilata Anadolîyê berî Anadolîya Navîn û Rojava bûn Tirk jî, lê li Anadolîya Rojhilat piranî Kurd bûn.

Ne hewcedariye û ez jî naxwazim qala dîroka Kurdan, ya van 500 salên dawî bikim. Lê belê her tim di dilê merîya û di hişê me de derbas dibe kû dîroka Kurdan bi sêrî de û bêteref û rastî bê nivîsandinê û nirxandinê. Çiqaş ji destê min hat, min xwest kû di vî warî de hine tiştan pêk bînim. Lê dîsa jî bê qompleks gerek bînim li ser ziman, ji destên min gelek tişt nehat.

Ez dibînim kû hinek heval, ev çend salin, di nav şert û şûrtên pir giran de bin jî, kovara Nûbiharê çap dikin û hejmara 100'î di destê we de ye. Ya rastî ne hêsa ye. Çima ne hêsa ye? Ya yekemîn, Kurdî nivîsandin û xwendin qedexe bû. Hela hela xeberdana Kurdî jî. Wê çaxê berhemên baş, edebî, ilmî û hemdemîn nikare bîne holê. Pîsporên kû van karan bikin, kêman in. Ya dudîya, yên kû van berhemên bixwînin her zêde pir kêman in. Bazara çapemendîyê û pirtûk nivîsandinê qels e. Pêş de çûyin bi vê bazarê ve girêdayî ye. Sêyemîn, dewlet û dezgehên resmî, bi tabetî û tundî zordestîyê li ser mijarên Kurdî û olî dikin. Nûbihar jî him Kurdî ye û him jî



Misilmanpewer e. Çaremîn, yên kû dikarin bi elifbêya latînî bixwînin û zana û xwendiyên Kurd in, hemû jî di dibistanên Tirkîyê yên lâiq û modern de xwendine. Lewra bi ruh û can (psîkolojîk), xwe gelekî di nav van ramanan de nabînin. Pêncemîn, yên kû vê kovarê didomînin, bi hejmar kêman, dewlemend nînin, debara xwe ya rojane bi zehmet pêk tînin. Xênjî van sedeman gelek pirsgerêkên din jî hene. Lê ya şeşemîn, Misilmanpewerên Tirk û yên ji ne xelqên Kurd, xwe ji hevalbendên Nûbiharê dûr digrin, bi çevê sar li wan dinhêrin. Lewra dibêjim kû, ev kar, karê domandina Nûbiharê tiştekî taybet e û bi qedr û qîmet e.

Ezê li ser rewşa sîyasî ya dema van salên dawî bisekinim. Lê belê dixwezim tiştekî taybet bînim bîra hevalên kû Nûbiharê derdixin û nivîskarên kovarêne. Pirs min eve; çima li ser babeta Elewîyan jî nasekinin? Elewîyên Tirk hene, yên Kurd hene. Pirsgerêkên wan ne kêman in. Di van mehên dawîyê de sê-çar televîzyonên Elewîyan vebûn. Duzgun Tv, Sû Tv, Cem Tv. Min jî ew mêze

kirin. Bûyer bi serê xwe tiştekî girîng e. Dîrok, civakî, sîyasî û bi hêlên wan ên din nehatin nirxandin. Gelek mezinên wanên dîrokî jî Kurd in. Sunnîyên Tirk, Kurd û yên din dikarin Elewîyan jî niqaş bikin. Ebûl Wefayî Kurdî zana û mezinekî Elewîyan e. Ebamuslîmî Xoresanî, Suhrawdî û Xallacî Mansûr jî. Pir kes nizanin kû ev kesan Kurd in. Lê ez hêvî dikim, dîtînen Elewîyan, Kurdîya wan, têkilîyên Kurdên Elewî û Sunnî bîn nivîsandinê û lêkolîn kirinê. Birayê delal Silêman Çevîk li ser vê mijarê bisekine, yê kêmasîyekê bîne cî.

Necmîye Alpay di rojnama Radikal'ê de (17.09.2006) dinivîse, dibêje kû pirsgerêka Kurd li Tirkîyê hat niqaş kirin, lê li ser pirsgerêkê "xebirdan" nebû. Mabeza Wê, xebirdana esasî û rastî ye. Bi dîtina min rast dibêje. Ew kesên xweyî nîyetên baş jî di nav de, pir kes di gotînen xwe de li ser tiştên berçav û konkret nasekinin, tiştên nedîtbar (soyut- nemûshahas) tînin ziman. Ser de jî Kurd, ji bo tengasîya demoqrasîyê û tîrsa zagonên cezayê her zêde dîqqet dîkin û ew jî tiştên mûsexes xebirnadin. Eva neheqqî ye, lê belê şert û şûrt wisa nin. Li Tirkîyê kesekî mîna Zola derneket, di doza Dreyfus de bû mînak. Gelo Kurdan çima ev kar nehanî cî? Gotin hêsa ye. Li dijî Kurdan hîssên pêşdarazî (Önyargı) pir in. Zagon bo Kurdan her tund, tûj û bêînsaf tîkî kar hanîn. Lewra Kurd her zehmet xwe îfade dîkin. Eger yên kû bi eslê xwe Tirk in, her zêde mil bidin bin demokratbûn û guhastîne, rewş yê her zêde baş bibe.

Çar salan berê, AKP di hilbijartinê de ser ket, bi serê xwe tenê hukumat damezirand. Bo kû Tirkîyê têkeve Yekîtiya Awrûpayê gele guhartin û zagonên nû ji bo

demoqrasîyê pêk anî. Tengasîyên civakê bi van guhastinan kêman bûn. Demoqrasîxwez û Kurd kêfxweş bûn. Bûrjiwazîyên mezin û orte, karker, xwendewan û oldarên kû di bin bandorê de bûn, dilgeş û rûken bûn. Lê belê yên ku li dijî Yekîtiya Awrûpayê, demoqrasîyê û Kurdan bûn, kêfxweş nebûn. Bûyera "Susurluk"ê di tarîyê de ma, Hukûmata AKP'ê her çû sist bû û bipaşveçûyînin dest pê kir, gav bi gav paş de ma. Bûyera Şemdinanê demeke girîn bû. Hukûmat bi dil û can û adil nêzîkî bûyerê nebû. Li ser sebebên esasî nesekinî. Bûyer hat li ser piştta du-sê kesên karpiçûk de ma. Dozdarê Wanê ji kar havîtin. Pavejoya guhastin û pêşerojê di cîyê xwe de sekinî. Bayê Yekîtiya Awrûpayê jî nema. Hemû kes ketin şikê, gelo ev ba yê dîsa alîkar bibe an na? Partiyên Tirkîyê hemû her zêde bûn nijadperwer. Oldar jî ne kêfxweş in. Ev partî û hukûmat her ku çû li dijî pirsgerêka Kurd derketin. Kuştina hakîmê Şûrayî Dewletê jî quwwet da van kesan. Qanûna Cezayê, Madda 301 bû bela serê azadîxwezan, kes nikare dîtînen xwe eşkere bike. Nikare binvîse û xeberde. Koma vezîran jî wek du alî ne. Hinek ji wan alîkarê tûjbûn û tundbûnê ne. Nijadperestî û Senteza Tirk û Îslamê, di nav şerekî bênav de ne. "Ülkücü" û AKP hesabê pêşerojê dîkin. Partiya kû xwe sosyal-demokrat dihesibîne, di nijadperestîyê de hemû partiyên din şûn ve hîştîye.. Dijî demoqrasî, guhastin û azadîya fikrên nûjen derdikeve.

Serokê Komarê û Artêşa Eşkerî jî faktorên girîng in. Ev payîza yê ji payîzên din cure be. Wek payîzên din nîne. ■

Panzdeh sal gotina “kurdî-kurmancî”: Nûbihar

Salihê Kevirbirî

rojnameger@hotmail.com

Belê 15 sal ne kêr e! 15 sal, 100 hejmar... Di weşangerîya miletên pêşketî de, her çiqas 15 sal maweyeke kurt be jî, di weşangerîya kurdan de, bi weşana kurdî 15 sal maweyeke têrtije û demdirêj e.

Di weşangerî, rojnamegerî û kovarogerîya kurdî de hin weşan hene ku bûne klasîk. Gelek caran mirov dixwaze li ber destên xwe bibîne. Sûdwegirtina ji wan berheman çêjeke mezin bi mirovan re dide peydakirin. Bo nimûne Hawar, Ronahî, Kurdistan. Her çiqas li gorî van berhemen binavkirî, xwedîyê temeneke kurt be jî em dikarin navê Kovara Nûbiharê li van berheman zêde bikin. Li gorî bîr û boçûna min, Nûbihar jî ketîye nêv klasîkên kurdan!.. Ev 15 sal in ku Nûbihar, bi gotina “kurdî-kurmancî” bi me re ye, dibe mêvanê pirtûkxaneyê me ya kurdewarî. Dibe mêvanê dilê me yê “tî û birçîyê” zarbêjîya edebî. Bêyî ku xwe bispêre hêz û derdorê, 15 sal berdewamîya berdevkîya gotina kurdî, kurdewarî, ramyarî, edebî ne karekî hêsan e. Gelek caran jî bû pêşengê manewîyata îslamîyên kurdewar û klasîkên medreseyan.

Belê 15 sal ne kêr e! 15 sal, 100 hejmar... Di weşangerîya miletên pêşketî de, her çiqas 15 sal maweyeke kurt be jî, di weşangerîya kurdan de, bi weşana

kurdî 15 sal maweyeke têrtije û demdirêj e.

Di destên min de jimareya pêşîn ango jimareya yekemîn a Nûbiharê heye. ‘Nûbihara Rengîn’, ‘Nûbihara Miradan’. Çend agahîyên teknîkî yê jimareya yekemîn dixwazim bi boneya 100’emîn jimareya Nûbiharê bi we re parve bikim:

Li ser berga pêşî ya kovarê ev agahî hene:

Nûbihar, “Mehnameya Çand û Huner û Edebîyatê”, Hejmar: 1, Sal: 1, Çirîya Pêşîn (Cotmeh) 1992, Biha 8.000 TL (Lîreyê Tirk). “Ne zalim be, ne mazlûm!” sernavê berga navborî ye. Berg, bi xêz ango tabloyeke Hebîb Sadiqî yê bi navê “Habîl û Qabîl” hatîye xemilandin. Di kunyeya kovarê de; Mahmût Yarlug wekî Xwedîyê Kovarê, Sabah Kara, Berpirsîyarê Giştî, Suleyman Çevîk, Berpirsîyarê Nivîsaran û M. Arifoglu jî wekî Midûrê Dezgehê hatine destnîşankirin. Kovar li navnîşana “Fevzipaşa Cad. Başhoca Sok. 49/1 Fatih-İstanbul” dest bi weşanê dike û maweyeke dirêj di heman navnîşanê de xebata xwe berdewam dike.

nûbihar



Berga jimara 1. a Nûbiharê

Li gorî hêz û qeweta xwe, bi awayê giştî dikarim analîza wan bikim. Xweş-halîya min a li ser Nûbiharê li ser sê esasan e. Yek; rêkûpêkîya weşangerîyê, didu; kurdî-kurmancîya wê ya rewan û herikbar, sisê; welatperwerîya li ser bingeha mazlûmîyetê...

"... Mirovê ku heq bixe bin lingê xwe, pê bilind nabe. Heq li ser pîyan bilind dibe û bilindvanê xwe jî bi xwe re bilind dike. Di heq û heqîqetê de, bilindvan û bilindbû yî bi hev re ne. Wextê bilindvan heq bilind kir, heq jî bilindvan bilind dike..." Ev beşek ji pêşgotin ango nivîsara yekem e ku bi navê Nûbiharê hatîye nivîsandin û bi van hevokan jî bidawî dibe: "Xwişka delal û birayê hêja! Heger kovara me Nûbihar vê hesret û arezûya bihara biratî û heqanîyetê di dilê me de heşîn û geş bike, besî me ye. Bi hêvî û ûmêda wê xweşbextîyê... Selam û rehmêt û bereketa Xweda li ser hewe be..."

"Ne zalim be, ne mazlûm!" sernavê nivîsara duyem a kovarê ye ku ji hêla Sabah Kara ve hatîye nivîsandin. Her wiha di jimareya binavkirî de bi navê; "Ey gelî kurdan" (Mela Seîdê Kurdî),

"Jiyanname û têkoşîna Bedîuzze-man Seîdê Norsî" (Suleyman Çevik), "Newaya mutrib û çengî" (Mela Ehmedê Cizîrî), "Rojnama 'Volqan' û 'Cemîyeta Îttîhadî Muhammedî'" (Osman Tunç), "Milettek şîzofren" (Mersabîzade), "Du qise ji jîyana Pêxemberê Ekrem" (Azad), "Serhildan / 1" (Bager) nivîsar û helbest cih digirin. Li hêla din Berpirsîyarê Giştî Sabah Kara, bi Serokê Mazlum-Derê M. İhsan Arslan re gotûbêjeke cêdar kirîye di heman hejmarê de.

Me di destpêkê de got, gelek caran bû pêşengê klasîkên medreseyan. Nexasim nişên salên 1990'î ku ez bi xwe jî yek ji wan im, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Mele Ehmedê Batê, Baba Tahîrê Ūryan, Sîyahpûş û gelek navên din ji Nûbiharê fêr bû, guh da beyt, qesîde û helbestên wan. 15-16 salî bûme, dema jimareya yekem a Nûbiharê derketîye. Heta ji min tê, bi taybetî di 10 salên dawî de hewl didim xwe bigihînim tevahîya hejmarên Nûbiharê. Bi qasî dizanim ji 9 cildên kovara rengîn, xwedîyê 6-7 cilda me. Dewlemend im yanî..!

Di warekî de ji xwe amil im; ji weşangerîya kurdên bakur haydar im. Bi taybetî dikarim bibêjim ku min hay ji weşangerîya piştî salên 90'î baş heye. Li gorî hêz û qeweta xwe, bi awayê giştî dikarim analîza wan bikim. Xweşhalîya min a li ser Nûbiharê li ser sê esasan e. Yek; rêkûpêkîya weşangerîyê, didu; kurdî-kurmancîya wê ya rewan û herikbar, sisê; welatperwerîya li ser bingeha mazlûmîyetê...

Gotineke xweş; 15 sal, 100 hejmar...

Hêvîyeke xweş; 150 sal, 1000 hejmar!..

Çima na? ■

Can li pêş te her saet dirize û şîn dibe



Mewlana Celaeddînê Romî

Ji farisî: Hayrullah Acar

Can li pêş te her saet dirize û şîn dibe
Ji bo cankî ji yekî wek te ma gazin dibe?

Tu pêl kêderê kî ji axê şîn dibe serek
Bo serkî ji yekî wek te ma destberdan dibe?

Roja ku bifire can, ji lezzeta bêhna te
Can zane û can zane ku j'dost çî bîn radibe


Yek dem ku xûmara te ji serê min biçe der
Sed car axîn dike ser; her mûyek nalan dibe

Min xanî tev vala kir, ku ji barê te dagrim
Kêm dibim lê 'eşqa te, pirr dibe, zêde dibe

Canê min li pey 'eşqa Şemsû'l-Heq ê Tebrîzî
Mîna keştîyan bê ling, di behrê rewan dibe

Pîr û Dûr

Berken Bereh



Li kûrahîya şeva bi şewet diherike
neçarim li ber serê êşa xwe
dûr im ji xwe qasî stêrkan,
pîr im li vir bi qasî çîyan

sêwîyek im, ji bilî êşê kesekî min tune ye
li dilê min î sincirî û kavil

mêrga bayên ciwan, çîmenên gumreh
dibêje rizîne bagera di dilê min de
hemû rêl û deşt birçiyê bédengiyê
hemû siwarî û berbû kor û şeht
hemû robarên diherikin ji sîngê şevê
havêna pêşerojêke xizan dimeyînin

bêpaxav û bêminet digere dolaba heyatê
dizeliqê li asoya şevê ji bîr kirî
awirên min î sar û hewca nalîna dilê min

mîna zarokê deqên wî jê hatî standin
rûniştim li bin dara bîranînan
girîyam bi serpêhatîya xwe ya tehl re

Mîna hîva çardê mehê

Selîm Temo

D

i dîroka Komara Tirkîye de tu kovara Kurdî ya edebî ewqas emir nekir. Ava bû çarde sal *Nûbihar* heye. Gava mirov li nava 99 hejmaran de digere, bîhna pêvajoyê jî tê, dengê pîyên edebîyata Kurdî jî. De ka bêjin çima? Ew bela ku di pêvajoya navbera 1992 û 2006an de radîkalîzmê şûna xwe da normalbûnê. Loma di hejmarên serî de ji edebîyatê zêdetir îdeolojî hebû, bersivdan û pirs hebûn.

Nûbiharê di vê pêvajoyê de çi kir, çi guhart? Gava mirov li ser vê pirsê bifikire, divê pêşî qala demokratîya kovarê bike. Bi xêra *Nûbiharê* mesafa nav ronakbîrên Kurd ji holê rabû. Ji komunîsta bigire heta olperesta mirov her navî dibîne, li ba min ev yek pirr muhîm e. Mîna ku sed şibak li hewşekê binihêrin.

Li ba min ya duduya, zanîna kevneşopîya Kurdî ye. Çimkî di civata Kurdî de çepa Kurd serdest e û xwe li ser hîmên çepa Tirk ava kirîye, ku mirov bide pey şopê, heta Kemalîzmê diçe. Ev tev li ser redda kevneşopîyê digîjine hev. Bijarte û bohêmên Tirk, berê xwe dane Rojava. Lê

Kurdên me maşella ji wan jî derbas kirine! Divê bê zanîn ku Kurd Rojhilatî ne û bi taybetî jî di derbarê edebîyatê de ji kevneşopîyê zêde tu tiştên wan nîne. Hebûna *Nûbiharê* kevneşopîyê bibîr anî, wê derxiste holê, da zanîn. Kesên mîna Tehsîn Îbrahîm Doskî, M. Xalid Sadinî, Ali Karadeniz, Süleyman Çevik, Selman Dilovan, Sabah Kara, Cûdî, Gevêrî, Ewînî, Derêşî, Rebîn, Biradost, Diljar, Dilzar, Warlî, Dilxêrî ûyd. mîrateke mezin danîn ji bo nifşên nû. Ev nav tev bi elfaba Erebi dizanin, helbest û pexşana klasîk nas dikin. Mîna ku Heyzebûna *Mem û Zînê* dibêje, “tu tişt bi tena serê xwe çênabe”, edebîyata Kurdî ya nûjen jî bêyî mîrat û kevneşopîyê ava nabe. Hinek ji helbestvanên nifşa nû bela ‘li ser koka xwe heşîn nabin’ tiştên wusan ecêb dinivîsîn.

Ya sisîya, zimanê *Nûbiharê* paqij e, nerm e; dasî tê de tunin. Mîna ku di *Memê Alan* de dibêje “Kurmançîya gewr”. Herweha Kirmanckî (*Zazakî*) jî “roşin” û zelal e. Tabîî di metnên olî de, di helbestên klasîk de zimanekî

Ev nav tev bi elfaba Erebi dizanin, helbest û pexşana klasîk nas dikin. Mîna ku Heyzebûna *Mem û Zînê* dibêje, “tu tişt bi tena serê xwe çênabe”, edebîyata Kurdî ya nûjen jî bêyî mîrat û kevneşopîyê ava nabe. Hinek ji helbestvanên nifşa nû bela ‘li ser koka xwe heşîn nabin’ tiştên wusan ecêb dinivîsîn.

giran heye. Lê di pîranîya pexşan de ziman gelek sade ye. Ew gelemşa ku mirov di kovarên xortan de dibîne tune. Ne jixwe divê wusa be; mesele gelek rexnegir û edebîyatnas dibêjin ku di helbesta Tirkî de helbestvanên herî tarî û kûr Edip Cansever e. Deka em rabin li hemû helbestên wî binihêrin ka peyveke ecêb ku mirov nizane çi tebarete, heye an na? Derdê edebîyatê ne veşartin e, ayankirin e. Ê pergâlên vê yekê ziman e û ziman jî divê bête sehkirin, ji vê zêde edebîyat tune. Hema bêje di her hejmara *Nûbiharê* de ferhengokek heye. Yanê em ê him zimanek ava bikin, him jî berfireh bikin; bi ya min manî ya vê yekê ev e.

Belê divê edebîyata klasîk bê zanîn, lê kopyekirin awayekê din e. Edebîyata klasîk mîrat e, lê divê mirov wêna bi şêwe û zimanekî nû bidomîne, ne ku dubare bike. Ji vî alî ve qisûrên *Nûbiharê* hene. Mala wan ava, lê heyran pirî melên me diltenik in, gava destên wan bi alî pênûsê ve diçe, nezîre li pey nezîreyê tên. Dem dema helbesta nûjen e îdî, divê ev bê zanîn. Ez xulamê wan bim, lê ku seyda û

meleyên me dev ji helbesta klasîk berdin û derîyê xizneyên xwe ji me re vekin wê ne çêtir be gelo? Em zanin ku di destê melê herî feqîr de jî xizneyên ecêb hene. Ku evana bêne transkrîptekirin, ew ê karê nîfşên nû hêsantir bibin. Yan ku ne bi Kurdî bin bila ji kerema xwe re wergerînin Kurdî. Nasname, rabirdû (mazî) û dahatûya (hatin) me di wan pertûkan de veşartî ye. Edebîyata klasîk û ya nûjen di eyarekê de be, wê dewlemendî bêtir xuya bike, wê pirsgirêk zûtir çareser bibin. Ji bo vê yekê jî divê çi metnên me hebin ji alî pisporan ve derkevîne holê.

Bi vê cewetê dixwazim hejmara sedemîn jî pîroz bikim. Sergêjayîyên van karan pîr in. Ew bela ez dost û hevalên ku di ber kovarê de dane pîroz dikim. Mala wan ava be. Pêşî ser navê xwendevanekî, peyre jî ser navê nivîskarekî dixwazim sipas bikim ji *Nûbiharê* re. Ji ber ku ez bawerim gelek xort, mîna min, bi saya kovarên wusa ber bi zimanê xwe ve çûn, edebîyata xwe nas kirin, bûn muptelayên tama zimanê xwe.



Berga jimara 86yan a Nûbiharê

Belê divê edebîyata klasîk bê zanîn, lê kopyekirin awayekê din e. Edebîyata klasîk mîrat e, lê divê mirov wêna bi şêwe û zimanekî nû bidomîne, ne ku dubare bike. Ji vî alî ve qisûrên *Nûbiharê* hene. Mala wan ava, lê heyran pirî melên me diltenik in, gava destên wan bi alî pênûsê ve diçe, nezîre li pey nezîreyê tên. Dem dema helbesta nûjen e îdî, divê ev bê zanîn. Ez xulamê wan bim, lê ku seyda û

Di edebîyatê de çavek dûrbîn: çîrok

Ayhan Geverî

ayhangeveri@gmail.com

Wekî edebîyatên din ên cîhanê, edebîyata Kurdî di wextek normal de dest bi nivîsê nekirîye. Mîrov vê gotinê ji bo edebîyata Kurdî ya klasîk belkî nekare bibêje, lewra edebîyata klasîk ya nivîskî her çend em bibêjin bi qasê ya devkî nebe jî ewqas jî jê paşdatir û kêmtir nebû, ku wekî Evliya Çelebî behsa hejmara destnivîsên Kurdî ên di mala Mîrê Hekarî û yên di mala Mîrê Zaxo de bûn dike û dibêje wî çaxî di kutubxaneyê Sultanê Osmanî de jî ewqas destnivîs tunebûn... Edebîyata kevin ya Kurdî gelek dewlemend bû, lê edebîyata nûjen hema em bibijên van salên dawî de ligel nivîsê ve muşerref û nasyar bûye. Wêca ev 'dewrê transê' ku di navbera edebîyata devkî û ya nivîskî de ye û hêj jî tesîra wê dewam dike, wekî gelek tevlihevîyan meseleya 'çîrokê' jî bo me kirîye çîrok û mesele. Lewra di Kurdî de çîrok ew tişt û serpehatîyên berê bûn ku mezinan ji me re digotin. Jixwe li cem me kelîmeya "çîr" ku koka çîrokê ye, bi maneya 'meselê' ye û hêj jî mîsalen dihête gotin "Çîra wî gelek dirêj e." Wêca ew "çîr-ok" a ku bi

maneya 'mesele, hikayet, serpehatî' (ku tirkî dibêjin "masal" yan jî "halk hikayesi", bi inglizî jî "story"...) bû dê çawa ji çîroka nûjen an jî ji 'kurteçîrokê' cuda biba? Hilbijartina çîrokan li cihekê, navê wan bixwe jî 'mesele' bû...

Lê her çiqas hem çîrok, hem jî kurteçîrok ji bo vê awaya edebî bihête gotin jî, min jî çîrok bikaranî ku dibe ku em dişên ji bo herdu awayên gotinê jî 'çîrok' bibêjin, hem ya wek serpehatîyan hem jî ya nûjen... Lê jixwe ev mesele ne tenê li ser navê vê awayê ye jî, her wisa di nava naverok û vehonandina çîrokan de jî ev mesele derdikeve pêş...

Çîrok yan jî vegotin, bi "gotin" û "deng" ve heye ku ev jî em dikarin bibêjin malê Rojhilatê bû/ye. Anko gotin û mesel û vehonandina çîrokan di Rojhilatê de xwe digehîne demên gelek kevin. "Berê gotin hebû..." gotinek muhîm bû; lê di navê Rojavaya kevin/berê de jî, wekî pêşengên edebîyatê, berê bi gotinê ve derketine meydanê, her wekî Homeros... Lê di ragihandin û vegotin û vehonandinê de ferqên

Lê her çiqas hem çîrok, hem jî kurteçîrok ji bo vê awaya edebî bihête gotin jî, min jî çîrok bikaranî ku dibe ku em dişên ji bo herdu awayên gotinê jî 'çîrok' bibêjin, hem ya wek serpehatîyan hem jî ya nûjen...

Her wisa li ser çîrokê em dikarin, ligel nêrînek bo tarîxa edebîyata Kurdî, vê pirsê bipirsin: “Ka gelo di edebîyata Kurdî de awayên nivîsê çawa derketine meydanê, awayên nivîskî edebîyat bixwe afirandîye û ew anîye meydanê; an jî bereqş, edebîyatek hazir û amade hêdî hêdî awayên nivîsê qebûl kirîye û ew awayên nivîsê bikarîna-ye?”

cuda di navbera herdu dunyayên Rojhilat û Rojavayê de heye... Jixwe çîroka ku mijara me ye û ya em li ser radiwestin ji ber van ferq û cudahîyan e ku em nikarin wê bi awayek xweş binirxînin û li ser biaxivin. Mîsalen eger em îro tenê çîrokên di Nûbiharê de hatine weşandin hemûyan danên ber hev em dê di alîyê vehonandin/fictif û vegotinê de gelek ferqan bibînin. Wêca ev ferqa jî di nava çîroka edebîyatên ku “çîrok” a wan pêşve çûye de gelekî eşkeretir e û herdu çîrok bi şeklek baş ji hev cuda bûne. Lê di edebîyata Kurdî ya ku ji gelek qonax û astengan re derbasbûyî û ji nû ve ligel nivîsê xwe domandî û ya ‘gotinê’ êdî hêdî hêdî cihê xwe bo nivîsê hêlaye de ev ferq hêj tam kifş nebûye, sînoren van herdu gotinan gelek nêzîk êkûdu ne. Çîrok yan jî kurteçîroka nûjen, her wekî romanê em dikarin li ser

navê awaya Rojavayî binav bikin. Lewra fictif/vehonandin yekemîn sedem û sebeb e, feqet çîroka Kurdî fictif li alîyekê hêj jî bi devkî tête nivîsîn...

Çîrokên berê, di nava şevbêrkên dengbêjan de an jî di nava mesnewî û hikayatên klasîk de derbas dibûn. Tiştên dihatine gotin para pirtir li ser qisseyên Qur’anê, Mesnewîyat, Şehname û meseleyên wisan bûn. Yan jî serpehatî û qisseyên wekî ‘Mem û Zîn’, ‘Xec û Sîyabend’, ‘Leyla û Mecnûn’, ‘Fexrê û Stî’ yan jî ‘gotinên’ efsanewî, dînî û pendname bûn, metelok bûn. Yanî çîrok bûn ew jî lê çîrokên “ên din”, meseleyên “kesên din ên berê.” Lê çîroka nûjen di vir de cudahîyek mezin heye. Lewra êdî gotin şexsî ye û ew ligel hest û ragihandina çîrokvan ve heye. Anko mesele “mesela ên din” e dîsa lê “ên ku gelek nêzîk me”... Hetta gelek caran “mesela me” ye... Yanî êdî pirtir ji nava jîyanê...

Eger bi çavek wisa li çîroka Kurdî bihête nêrîn birastî jî çîroka Kurdî hêj li ser rêya gotina klasîk e. Hetta çîrok li alîyekê, romana Kurdî bixwe jî bi alîyê vehonandinê/fictifê ve hêj Rojhilatî ye, ku her çend awayê romanê bi temamî awayek Rojavayî be jî... Helbet sebaba yekemîn li gor min ev e ku di edebîyata Kurdî de “deng” ji nivîsê pêşdetir bûye, û di sedsalên dawî de jî nivîs paşdetir maye ku jixwe çîroka nûjen

a cîhanê jî di van sedsalên dawî de bûye mijar û awaya ku pirhatîye bikaranîn. Wêca ev dewrê cudabûna (“dewrê transê”) di nava deng/gotin û nivîsê de ji bo Kurdî hinekê derengtir destpê kirîye...

Çîroka Kurdî belkî hêj tam negeheştibe asta nûjen û fictif nekirîye armanc lê birastî jî li gor min çîroka Kurdî hêj “dengê” xwe winda nekirîye û eger çîrokvan jî hay ji vê yekê be, rewş û pêşeroja çîroka Kurdî dê gelek geş û baş be, lê helbet divê çîrokvan êdî nebe ‘çîrokbêj’ lê bila tenê bibe çîrokvan. Yanî eger tewş û mîzana wê wisa bihête çêkirin û zanîn...

Her wisa li ser çîrokê em dikarin, ligel nêrînek bo tarîxa edebîyata Kurdî, vê pirsê bipirsin: “Ka gelo di edebîyata Kurdî de awayên nivîsê çawa derketine meydanê, awayên nivîskî edebîyat bixwe afirandîye û ew anîye meydanê; an jî bereqş, edebîyatek hazir û amade hêdî hêdî awayên nivîsê qebûl kirîye û ew awayên nivîsê bikarîna-ye?” Yanî helbet divê bersiva wê pirsê di nava tarîxa edebîyatê de bête dan. Ku gava em li edebîyata Kurdî ya kevin/klasîk ve dizivirin em dibînin ku berhemên Kurdî yên klasîk ên di destê me de, hema em bibêjin seranser hemû bi nezm in, yanî şîir in. Wêca ev form û şekl û awa, hem li gel zewqa edebî heye hem jî li gel dewra wê edebî-

çîroka Kurdî bihête nêrîn birastî jî çîroka Kurdî hêj li ser rêya gotina klasîk e. Hetta çîrok li alîyekê, romana Kurdî bixwe jî bi alîyê vehonandinê/fictifê ve hêj Rojhilatî ye, ku her çend awayê romanê bi temamî awayek Rojavayî be jî...



Ahmedê Xanî

yatê... Mîsalen wekî hemû civa-kên Rojhilatî, Kurdan jî di edebî-yata klasîk de awayên wî wextî çî bin û kîjan şekl û form berrewac bin ew karîname. Yanî em dikarin bibêjin Ehmedê Xanî 'mesel û çî-roka' Mem û Zînê dikarî bi şekl û awayek din ve jî binivîse, lê di wî hal û dewra ku Xanî ew nivîsî de şeklê mesnewîyê pêşdetir bû...

Eger em bi vê nezerê li "çî-rok" a nûjen ya Kurdî jî binêrin eynî tişt ji bo îro jî mewcûd e ku çîrokvanê Kurd di nava atmosfera vê edebîyatê de ye. Helbet dê çîroka Kurdî ya nûjen de jî kêma-

Ya rast ji bo derbirîn û îfadeya hestên me, yê em millet ve xwedan wan hest û bawerî û nirxan in, çîrok baştirîn û rasttirîn ayîne û neynûk e ku di çîrokê de ew hemû dihê-ne dîtin. Her wisa ji bo pêşdebirin û rehetkirina ziman jî çîrok xwedî rol û ehemîyetek mezin e. Çi ya klasîk be çi jî ya nûjen be di her çîrokê de çîrok û meseleya me heye û di warê ziman û fikra hevpar (eqlê kolektîf) ya di ziman de veşartî, her wekî îdyom û pêşgotinan, gelek numûne û referans derdikevine meydanê.

sî yan, jî 'mesele' hebin, lê her dî-sa divê ev jî di nava vê atmosfer û halê edebîyata Kurdî de bihête dîtin û nêrîn... Lê fictif li alîyekê, divê li ser şekl û mijara çîrokên Kurdî jî bête raswestan. Yanî fer-qa çîroka nûjen ya Kurdî çîye ji çîroka nûjen ya Tirkî yan jî ya Farisî, Almanî û Ingilizî...? Mesne-wîya Mem û Zînê ji alîyê awayê ve wekî gelek mesnewîyên Farisî, Erebi yan jî yê Tirkîya Osmanî

hatibû nivîsîn, lê ew ligel vî şek-lekê "hevpar" bi vehonandin û mijar ve Kurdî bû. Her wisa Kur-dîbûna çîrokê jî helbet berî her tiştî bi zaman ve girêdayî ye ku çîroka ku bi Kurdî hatiye nivîsîn çîroka Kurdî ye. Lê rûhê çîrokên Kurdî de ev tişt di çî raddeyê de?

Birastî mirov dikare hejmara pirsên wisa zêdetir bike, lê divê bersiva wan pirsan bihête dan ku çîroka Kurdî bikeve ser xetkeke rast û durist. Lewra bêguman di "çîrok" a milletekî de mirov dikare her tiştê wî milletî peyda bike. Çunkî çîrok mêjî û mêjûya mille-tî ye, di çîrokê de rûh û fikr û hest û ramanên çîrokvan yan jî lehen-gê/a çîrokê bi aşkerayî derdikeve pêş. Bi vî awayî ve jî çîrok her wisa dibe pêşeroja milletî. Lewra çîrok hem bi awa û hem jî bi mi-jar ve, şekl û awayek tije û 'kon-santrê' ye. Yanî ne wekî şîrê ye ku exleb gotin li paş şekl û sem-bolê ye; yan jî ne wekî romanê ye ku gotin li pêş e... Yanî di na-va awayên nivîsê de belkî awaya ku herî "milletperwer" û "gene-tik" her çîrok e... Her çîrok xwe-dî mijarek e û di her çîrokê de jî jîyana însanekî yan jî ya çend în-sanan heye, wêca ev jîyana ku di çîrokê de "li cihekê, di wextekî de û bi şiklekî" derbas dibe bix-we hêjayê pûtedan û balkêşiyê ye. Lewra jîyana ku di çîrokê de ye gelek caran ji nava jîyanê ber bi çîrokê ve çûye yan jî gelek ca-ran ew jîyan ji jîyana rojane rast-tir û birûhtir e. Eger em ligel ro-manê muqeyeseya çîrokê bikin û gotina romannivîsê meşhûr Stendhal ya ku di Sor û Reş de bî-nin bîr ku digot: "Roman neynû-kek e ku rê bi rê li caddeyê(jîya-nê) tê gerandin." em dê bikaribin wekî Stendhal bibêjin, çîrok jî pencereyek e ku jîyanê em di wê pencereyê de temaşe dikin. Em

Ya rast ji bo derbirîn û îfadeya hestên me, yên em millet ve xwedan wan hest û bawerî û nirxan in, çîrok baştirîn û rasttirîn ayîne û neynûk e ku di çîrokê de ew hemû dihêne dîtin.

bi vegotina çîroknivîs ve û bi temaşeya di vê pencereyê de jîyanê çêtir fêhm dikin ku her çîrokan alîyekê cuda yê jîyanê ber me vedibêje/vedike. Jixwe însan di jîyana xwe ya rojane de ji ber ku rasterast di nava jîyanê de ye, gelek alîyên jîyanê nabîne û ji jîyana însanên din bêxêber e. Însan jîderveyê gelek "jîyanan" e, wêca çîroknivîs van rastîyên li pişt vê jîderveyê keşf dike û ên ku bixwazin di vê pencereya wî/wê de wan rastîyan dikarin bibînin. Ligel wê, keşf û îfşaya wan rastîyan li gor romanê di çîrokê de gelek xweşiktir e. Lewra çîrok ne wekî romanê bi "hîle" û "xeyal"ê ve dihête vehonandin, yanî çîrok li gor romanê "rasttir" e û hetta ji romanê masûmtir e, çîrok bêguman bêguneh e...

Eger em vê carê jî bi qewlê Ustad Cemil Meriç bibêjin, çîrok qêrîn û qêjîyek e ku însanên bêdeng di nava jîyanê de vê qerîn û qêjîyê berdidin. Çîrok gelek caran bi êş û janê ve heye, gelek caran êşên me yên veşartî derdike, gelek caran birînen me yên daxirî dîsa bi jan dike. Çîrok hem dengê me yê di nava me de û ê ku çîroka me têde veşartî ye, hem jî dengê "ên din" e, çîrok hem bixwe bi awayek taybet axiftinek e ku dengê vê axiftinê dengê nas e wextê em dibihîzin, lê ew dengê ku em kêmbihîzin... Çîrok hem tarîx hem jî pêşeroj e, ku însan dikare bi çîrokê ve têkilîyên ne "ser-realîst" lê ên "ser-wext" pêk bîne...

Ev taybetîyana bixwe çîrokê

muhîmtir û girîngtir dikin ku divê di edebîyata Kurdî ya nûjen de çîrok bi hêztir û pirtir pêş bikeve, wekî ku tehlîlker û rexnegîrê çîroka Tirkî, Semih Gümüş jî li ser antolojîya Hasan Kaya gotî: "Helbet ji bo ku Kurdî bibe zimanê edebîyatek pêşveçûyî pêdivî ye ku gelek wext derbas bibe, lê çîrok, kurttirîn û esastirîn rê ye ku ber wî tiştî ve diçe. Çîrok, demara xwînber ("atardamar") e bo edebîyata Kurdî ya nûjen, û bila ew bibe pêşeng. Ji bo nivîskarên nû "Bila berê bi çîrokê ve bihête destpêkirin" bihête gotin û ev edebîyata ciwan xwe ji xem û barên siyasî ên vî dewrî bide paş, xwe tenê di nava xebat û têkoşîna afirandina xîm û nixên edebîyata nivîskî de bibîne; da ku ji dewrek paştir li xwe bizivire û roja îro wekî ronensansa xwe bibîne..."

Ya rast ji bo derbirîn û îfadeya hestên me, yên em millet ve xwedan wan hest û bawerî û nirxan in, çîrok baştirîn û rasttirîn ayîne û neynûk e ku di çîrokê de ew hemû dihêne dîtin. Her wisa ji bo pêşdebirin û rehetkirina ziman jî çîrok xwedî rol û ehemmiyetek mezin e. Çi ya klasîk be çî jî ya nûjen be di her çîrokê de çîrok û meseleya me heye û di warê ziman û fikra hevpar (eqlê kolektîf) ya di ziman de veşartî, her wekî îdyom û pêşgotinan, gelek numûne û referans derdikevine meyanê. Yanî divê di edebîyata Kurdî de ev çavê "xweşbîn" û "dûrbîn" nehête girtin, divêtin bihête ronîkirin...

Not: Ev nivîs ji pêşgotina *Antolojîya Çîrokên Nûbiharê* ya ku Ayhan Gevê amadekirî û li ber çapê ye, bi kurtî hatîye wergirtin...

Ferqa Nûbiharê*

Ahmet Aras

Zivistana 1993ya bû. Lî Izmirê ez çûbûm cem naseki. Ew bî xwe ji rojnamevan bû. Em hinekî rûniştin, me demeki xeberda, wê demê kovareke lî ser masa wi bala mîn kişand. Navê wê Nûbihar bû. Mîn dest avêtê, berbe xwe kişand û pîrsi: "Lo lo ev çî ye?"

Camêr bersiv da got: "Abê ew kovareke kurdi ye, kovareke baş e."

Mîn hêdi hêdi rûpelên Nûbiharê welgerandin û lê nihêri, Behsa Xwedê, pêxember, din imanê dîkir. Nivîsek ji lî ser Seidê Nûrsi bû. Dî rûpelên din de ji hinek xetên Erebi hebûn. Mîn kovar girt û paş da avête ser masê û mîn got: "Eman eman bîra wana ji mîn dîr bîn, jî mîn ra ne lazîm e!"

Ew heval ji merveki çep bû, got: "Abê avana cuda ne, wanê ku tu dibêji, jî wana ninin."

Mîn jê ra behsa serpehatîyên xwe yê berê kir û sebaba ku nîha ez dixwazim jî wan dîr bisekinim mîn jê re got.

Lê lî ser pêşnîyara wi hevali mîn çend hejmarên Nûbiharê xwend.

Tîştê ku dî seri da bala mîn kişand, ev kovara kovareke kurdi ye heqiqî bû. Jî seri hetani

dawyê hemmû nivîs bî kurdi bûn. Bî vê rewşa xwe jî wan kovarên kurda yê dî ji cuda bû. Pîranya wana nivî kurdi û nivî Tîrki bûn û çirto-virto bûn. Bî pîrani hayê wan jî Kurdiyê tunebû û lî ser sloganên karên xwe dimeşandin, Nûbihar dî eynî wextê da kovareke cîdî bû û jî mîzanpajê bigrê hetani bicikîrîna nivîsan, bî zîmanê xwe va kovareke tîkûz bû û karê xwe bî rêk û pêk dimeşand.

Ew kesên ku lî dor vê kovarê hatine ba hev, dîncî nebûn ew kurdên muxlîsên dîndar bûn. Paşê ez bî wan ra hevnas bûm, mîn gelek cara bî Suleyman Çevik, bî rîhmetiyê Mela Îzedin, bî Ali Karadeniz û bî hevalên vanên dî ra sohbet kir, mîn tu carî dî derheqê kesên dî (ew dujminê wan be jî da pîrseke xerab jî wana nebîhist. Ew bî her tîştê xwe va Kurd in, loma ez jî wana hez dîkim û jî wan ra serkeftinê dixwazim. Ez her tim dibêjim, ez bêtir jî Kurdên Êzdi û Kurden dîndarên muxlîs hez dîkim. Çimki -baweriyên wanên oli çî dîbe bîla bîbe- ew bî her tîştê xwe va Kurdên heqiqî ne.■

Nûbihar kovareke cîdî bû û jî mîzanpajê bigrê hetani bicikîrîna nivîsan, bî zîmanê xwe va kovareke tîkûz bû û karê xwe bî rêk û pêk dimeşand.

* Dî vê nivîsê de lî ser daxwaza nivîskar di cihê 'î'ê de me 'î', di cihê 'î'ê de jî me 'î' bî kar anîye. (Nûbihar)

Nûbihar, biciwe hezaran wisar

Roşan Lezgîn

Ez vana qey hewce nêkeno ke ez qalê weşangerîya kurdkî bikera? Çunke wendoxê kurdkî, kesê ke weşananê kurdkî taqîb kenî, zaf ra tay aşnayê nê rewşî yê. Yanî, baş yeno zanayene ke wendiş û nuştîşê kurdkî, rewşê weşangerîya kurdkî senîn o.

Eke wina bo, no ziwano ke bi hezaran serrî no welat de ameyo qisey kerdene, do kefenê ro xo bipêşo, bê ke hewce bi zehmet dîyayîşê kendena yew mezeli estbo, xo bi xo, peyê xo bişano ma û şo hey şo!

Ez vana qey, mîyanê kurdanê Vakurî de kurdkî wendiş û nuştîş -sey yew tercihî- zarûriyet nîyo, sîyasî yo. Çirê? Wina bîyo ke êdî kurdkî cuyê kurdan rê yew ihtîyac zarûrî nîya. Êyê ke kurdkî nusenî, wanenî û heta ke qisey kenî zî, hesasîyetê xo yê millî ra kenê (Werre bi ê kesî ke şinana-meyê xo yê rastikênî ra haydar o). Sebebê xo, bindestîye ra yo! Eke dewleta merdimî çin bo, ziwane merdimî rê yew statu nêbo, perwerde bi ziwane merdimî nêbo, çerxê heyatî ziwane merdimî reyde nêgeyro, çi qîymetê ziwane merdimî esto?! Hîç!...

Belê, eke ma bi no çim biewnin ziwane xo ra, tena nê perspektîfî ra ma temaşeyê ziwane xo bikerin; bi no qayde û nê şertan de, no hal û hewal de bena ke ma bawer bikerin êdî qet ih-

tîyac bi zwanê ma çin a. Eke winî yo, ma fek ziwane xo ra veradin. O ziwano ke zorî reyde ma ser o ameyo ferz kerdiş (tirkî?), ma xo bierzîn verara ey, besê ma yo. Beno?!...

Eke wina bo, no ziwano ke bi hezaran serrî no welat de ameyo qisey kerdene, do kefenê ro xo bipêşo, bê ke hewce bi zehmet dîyayîşê kendena yew mezeli estbo, xo bi xo, peyê xo bişano ma û şo hey şo!

Bêguman ma zanê ke dinya fanî ya, her çî rê yew umr esto. Key ke rojê xo pîrî bîy, do mîyan ra wedarîyo. Ziwan zî sey yew fenomenî, helbet fanî yo, vindîbîyayîşê însanîyetî reyde do ziwani zî mîyan ra wedarîyê; ziwane serdestan zî, ziwane bindestan zî. Ziwanê zaliman zî, ziwane mezlûman zî...

Labelê ma zanê ke Homayî fam û feraset de, aqil û îzan de tu cîyayîyêk mîyanê mîletan de nêkerda. Senî ke merdimî seypê yê, mîletî zî yewbînî ra berzê yan nizmêr nîyê. Coka tu ziwan zî yewna ziwani ra girdêr yan qijekêr nîyo. Labelê kamî ke qîymet da ziwane xo, kamî ke

ziwanê xo kerd ziwano resmî, ziwane înan û mîletê înan bîyî qîymetin.

Eke merdim şînasnameyê xo ra haydar bi, û zana ke ziwane merdimî şînasnameyê/şexsîyetê merdimî tayîn keno, a game hol zano ke ziwane baw û kalan çend muhîm o.

Qîymedarîye û bêqîymetîye, ehemîyet dayene de bellî benê. Eke to qîymet û ehemîyet da çîyê, helbet do o çî qîymetin û ehemîyetin bo. No ziwane ma yo ke ziwane serdestan ra (tirkî) qet zî kêmi nîyo, no ziwano ke ma aîdê ey ê, no ziwano ke baw û kalanê ma pê qîsey kerdo û heta bi roja ewroyî ameyo resayo bi ma, eke ma ey rê wayîrîye bikîme, ma ro ziwane xo miqate bîme, ziwane ma heta roja ke yew ferd, yew însan ma ra bîmano, heta roja qîyametî do no ziwane nê welatî de biciwîyo.

Verê cû, vajîme ke tîya ra davîst-hîris serrî ra ver, ziwane ma herçiqas ewro ra vêşer yasax bi zî, la talûkeyê vindîbîyayîşî, mîyan ra wedarîyayîşî hendayê ewroyî nêbi. Çunke, şarê ma mîyanê tebîetê xo de, herrîya xo ser o bi. La nika demografîyaya kurdan Kurdistanê Vakurî de raşanîyaya. Şaro kurd vila bîyo. Coka, no heyam de, tîya ra pey eke ma qîymet nêdin ziwane nuşteki, ma wendiş û nuştîşî reyde ziwane xo nêseveknin êdî no ziwane nêşeno biciwîyo. Wendiş û nuştîşî zî bi sayeyê kovaran û kitaban aver şîno û vila beno. Heta roja ke ziwane ma bibo yew ziwano resmî, bibo wayîrê

yew statu, kovarî û rojnameyî û kitabî, seba ziwane ma her yewe sey yew dize (qele) yê; birc û barû yê.

Birc û barûyê ke ziwane ma sevenkenê û aver benê ra yew zî kovara *Nûbihar* a ke bi ziwane ma (kirdaskî û kirmancî) weşanîyêna.


Nûbihar, seba ziwane ma, seba kultur û edebîyatê ma xebatêda erjaya keno. La çîyo tewr muhîm zî no yo ke, xebata xo de bîistîqrar o. Her xebate de îstîqrar zaf muhîm o. Xebata îstîqrarêna bawerîye dana merdimî. Coka ez hêvîdar a ke *Nûbihar* senî ke nika hûmara xo ya 100. pîroz keno, îşella do hûmara xo ya 1000. zî pîroz bikero.

Dewlete û tay merdimanê mixanetan yew îmajî bi no qayde kerdibi sereyê şarî de, seke xebata kurdayetî teberê dîne İslamî de ya, kurdayetî tena xebatêda komunîstîye ya. Labelê *Nûbihar* bi xebata xo no fikro şaş ke elenîya şarê kurdî de bi, pûç kerd. No cephe de *Nûbihar* wayîrê rûmetêkê girdî yo.

Nûbihar, bi sayeyê dostan û sînayoxanê xo îmkananê teknolojî ra zî weş îstîfade keno. Yew keyepelê enternetî (web sîte) zî saz kerdo. Bi no qayde êdî merdim hîna weş şeno *Nûbihar* ra îstîfade bikero.

Sey qala peyêne, ez hêvîdar a ke ma heme ro aîdîyetê xo wayîrîye bikerin; ro ziman û kurdayetîya xo heta bi heta wayîrîye bikerin û sey yew kurdî biciwîyin.

Dîyarbekir - 07. 11. 2006



Berga jimara 55. a Nûbiharê

Nûbihar, bi sayeyê dostan û sînayoxanê xo îmkananê teknolojî ra zî weş îstîfade keno. Yew keyepelê enternetî (web sîte) zî saz kerdo. Bi no qayde êdî merdim hîna weş şeno *Nûbihar* ra îstîfade bikero.

Dexlê to bena

Ö. Faruk Çetinkaplan

*A*wzîmekî teqenê
Îney herikyenê hunik hunik
Îney benê Ferat, benê Dicle
Hewqî roneyenê
Gûlî abyenê mi xîyal di
Kêberê Cennetî abyenê
Gûlî her dem benê teze
Durîra bejn û bala to kewna mi çimî
Rezandê Îremî di / Beyntardê Cennetî di

Ez naştê Siratî
Ti aştê pirdî dê
Hendê Cennetê tora nezdî
Hendê Cehnimê tora durî
Gunya kesî cemidyena
Ne tîjî menda, ne istarey
"Bismîllah" vana, gamên erzena
'Emelo xirab prêsyeno mi lîngan
Dexlê to bena Ya Rebbî!

Ne dar, ne ber
Kes kesî nêzano / çim çimî nêvînenno
Dexlê to bena Ya Nebî!

Cu û merg

W.K Merdimîn

Bê zerrî û bê haya
 Reyeyê ma kewt na dinya
 Ma barê xo na ro
 Merg ra cu, cu ra merg
 Hem cu, hem merg..
 Ganî ra merde, merde ra ganî..
 Huner oyo ke ti bizanî
 Beşkî biwanî..
 Kam yew sînayeyî ma merd,
 Taye hêvîyê ma zî tede berd.
 Hinî kamî se kerd.
 Her kesî goreyê xo şimit û werd.
 Meşkê xo tede şa,
 Tayên kilm, tayên derg
 Keye kerd.
 Ge qehrîya, ge bi şa..
 Viraşteyê Homayî her ganî
 Mûr û mar, gend û gemar..
 Merd û namerd, sîm û zerd..
 Emrêko pênavite vîyarna
 Ha kilm, ha derg
 Cuwîya û merd.
 Xo vîr ra meke, bizan!
"Kullu men 'aleyha fan!"*
 Belê!
 Payîzo peyen ê emrê xo de
 Ma çend ling şa erd,
 Ma se kerd, nêkerd
 Heme çî xo rê kerd derd..
 La,
 Peynîya peyên de
 Homayî
 Sey xo kerd!

***Humara 99.nê Nûbihar de
 yew şîrê W.K Merdimînî
 xeletî ra**

sey şîrê Ömer Faruk Çetin-
 kaplanî weşanîyabi (neşr bi-
 bi).

Semedê na xeletî ma şair û
 wendoxanê xo ra uzir waze-
 nî.

Cor de no şîr ma newe ra
 hey neşr kenî.

Nûbihar

Gulane-2006

Amîd û Dîcle

Hasan Huseyin Çevik

*T*u daketî ji zozanan ji serheda
Ey Dîcle tu nasekinî derî kû da
Ser linga derbas dibî te silav neda
Bê silavê te dost nedî di vê rê da

Dîcle bang kir li ser mi duman û mij e
Ser mi berf û baran cî cî gujiguj e
Qehra çîya li ber mi erd diheje
Tim surgûn im talîhê rojek rehet neda

Amîdê bang kir ey Dîcle hela hela
Pir digêrî te dî wek mi metîn kela
Umrek dirêj mi kişand pir derd û bela
Xun wek çema xortê delal pir bûn feda

Dîcle bang kir kewa gozel şîrreşîr e
Ez rêwî me Amîd bira guhê mi kerr e
Çêl û çûka day ser piştta mi venagere
Tim surgûn im talîhê rojek rehet neda

Amîdê go li zozana berf helîya
Te da ber xwe erd û bexçeyê gundîya
Te tijî kir bax û bostan bi axa çîya
Gelo bo çi keskî ji te ra nifir neda

Dîcleyê go qaz û quling difirîyan
Em ezêlî dîyar dîyar digêrîyan
Kedera me Ceylanîyê Zaxurîyan
Ji me re yek î ey însan şah û geda

Kirmanckî (zazakî) û edebîyata wê

Roşan Lezgîn

Kirmanckî (Zazakî) ne ku tenê yek ji dîyalektên zimanê kurdî ye, di-be ku kevintirîn zimanê kurdan be jî. Lêbelê nisbet bi dîyalektên din, a ku zêdetir bo nivîsandinê dereng ketibû û niha xetereya windabûna wê heye jî dîsan kirmancî ye. Ji lewre me divê her tim kirmanckîyê aktuel bikin.

Di vê nivîsê de ez dê çend dîmenên vê dîyalekta me ya qedîm raxînim pêş çavan.

Aidîyet

Dîrokzanê navdar Yaqûtî zêdetir ji heft sed sal berîya îro de dinivîsîne ku "Dumbilî" yan jî "Zaza" eşîrên kurdan in. Yaqûtî li berhema xwe ya navdar *Mu'cemul Buldanê* dibêje, "... Kelehên wan gelek pêt in. Kelehên Beşnewîyan û Bohtîyan û Zazayan digihêne hev. Kurdên ji eşîra Dumbilî (Zewwaz) zêdetir li çîyayên bilind dijîn..."¹ Bi rastî jî kurdên kirmanc ji qedîmî ve û hîn jî li zozanan, li çîyayên asê û bilindên Kurdistanê dijîn.

Kirmanc, yanî kurdên zaza xwe "Kird" angû, "Kurdên xas" dizanin û di hemû serhildanên mezin ên kurdan de, bo numûne,

Serhildana Mele Selîm Efendîyê Zaza ya li Bidlîsê (1910-1914), Serhildana Qoçgirîyê (1920-1926), Serhildana Şêx Seîd Efendî (1925-1926), Serhildana Dêrsimê (1937-1938), ku ji bo avakirina Kurdistanê serbixwe bûn, kirmancan bi tevayî serî hildane û di vê dozê de her tim serkêşî kirine. Her wiha di hemû tevgerên kurdeyatîyê yê di nîveka dawîn a sedsala 20. de û niha jî kurdên kirmanc her aktîv in di nêv xebatên sîyasî yê Kurdistanê de.

Demografyaya Kirmanckî-axêf

Kurdên kirmanc texmînen li dora 3-4 mîlyon nufûsî ne û li sêzdeh bajarên Kurdistanê Bakur ku niha ji aliyê îdarê ve di nav sînorên Tirkîyê de ne, dijîn. Ev sêzdeh bajar ev in:

1. Batman (li navçeya Hewêlê),

2. Bidlîs (li navçeya Motkîyê),

3. Çewlîg (li navçeyên Azarpêrt, Bonglan, Çêrme, Dara Hênî, Gêxî, Kanîreş û Xorxolê)

4. Dêrsim (li navçeyên Çemişgezek, Mazgêrd, Pêrtage, Pilemuriye, Pulur, Qisle û Xozatê)



5. Dîyarbekir (li navçeyên Çêrmûg, Erxenî, Gêl, Hêni, Hezro, Licê, Pasûr, Pîran û Şankuşê)

6. Erzingan (li navçeyên Îlîç, Kemalîye, Kemax, Mose û Têrcanê)

7. Erzirom (li navçeyên Aşqele, Çad, Hesenqeale û Xinûsê)

8. Meletî (li navçeyên Putirge, Erebgirê)

9. Mûş (li navçeya Gimgimê)

10. Riha (li navçeya Sêwregê)

11. Semsûr, (li navçeya Aldûşê)

12. Sêwas (li navçeyên Qengal, Zara, Ulaş, Îmranlî, Dîvrîgîyê)

13. Xarpêt, (li navçeyên Depe, Maden, Mîyaran, Pali, Qovancîyan, Sîvrîce û Xulaman)

Ji van bajaran li hinekan, bo numûne, li Çewlîg û Xarpêt û Dêrsimê pirranî kirmanc in, lê li hin bajaran jî bes li navçeyekê yan jî li herêmeke piçûk hene. Li derveyî van bajaran, li hindêk bajarên din, bo numûne, li Sariza

Qeyserîyê, li Qirşehîrê, li Aksaraya Qonyayê jî beşek ji kurdên kirmanc (zaza) hene.²

Navên Dîyalektê

Ev dîyalekta kurdî çar navên xwe hene:

1. Kirdkî

2. Kirmanckî

3. Dimilkî

4. Zazakî

Beşeke mezin ji kurdên kirmanc zêdetir "kirdkî" kar tînin û xwe jî wek "kird" didin naskirin. Li Dêrsimê jî "kirmanckî" kar tînin û xwe jî wek "kirmanc" didin naskirin. Beşeke hindik jî xwe wek "dimilkî" û zimanê xwe jî wek "dimilkî" didin naskirin. Beşek jî xwe wek "zaza" û zimanê xwe jî wek "zazakî" bi nav dikin. Ji van navan peyva "zaza" bi giştî ji derve de tê gotin, ango kirmanc bi xwe vê peyvê zêde kar naynîn. Lêbelê ji ber ku peyva "zaza" gelek hêsan tê bilêvkirin, niha bi giştî ji bo kurdên kirmanc ev peyv tê karanîn.

Di encama xebata standardîzekirina vê dîyalektê de ji van navan "kirmanckî" maqul hatîye dîtin³ û niha di warê nivîsînê de ev nav tê karanîn. Ger peyva "zazakî" bête karanîn jî, rastir e ku wek "kurdîya zazakî" bête karanîn. Her wiha, ji bo dîyalektên din jî ev awa navlêkirin bête xebitandin hîn rastir e. Bo numûne, "kurdîya kurmanckî" û "kurdîya soranî" û hwd. Ji bo civatê jî "kurdên zaza", "kurdên kirmanc", "kurdên soran" bêne gotin hîn rastir e.

Ol (Ayîn/Dîn)

Meriv dikare bibêje ku nîvek ji kirmancan musulmanên sunnî ne û nivê din jî hema bi giştî elewî ne.

Kirmancên sunnî ku bi giştî xwe wek "kird" û zimanê xwe jî "kirdkî" bi nav dikin li çiyayên asê yên li navenda Kurdistanê, ji Motkîya Bidlîsê bigirin heta bi Aldûşa Semsûrê akincih in. Kirmancên elewî jî bêhtir li jora bakurê Kurdistanê, ji Gimgima Mûşê bigirin heta bi herêma Qocgirîyê akincih in ku teqîben navenda wan Dêrsim e.⁴

Taybetîyên Zimanî

Kirmanckî (Zazakî) nisbet bi dîyalektên din ên kurdî taybetîyên zimanên kevnare hîn zêdetir di xwe de diparêze. Kirmanckî bi tevayî zimanekî zayendî ye. Hemû peyvên kirmanckîyê nêr, mê û pirhejmar in. Hema bibêjin ku bi giştî peyvên kirmanckîyê di halê xweser (halê sade) ê peyvê de jî zayend (nêrîtî û mêtîfî) û pirhejmarîya xwe dîyar in. Heta ku di karan (fîl) de jî ev taybetmendî bi vî awayî ye. Çend îstîsna ne tê de, peyvên mê bi giştî bi dengê "e" diqedin û peyvên pirhejmar jî dengê "î" digrin. Bo numûne:

Dar (nêr)

Dare (mê)

Darî (pirhejmar)

Îcar di kurmanckî de her sê nav jî di halê xweser ê peyvê de wek "Dar" têne nivîsîn. Lewre heta ku peyv di nêv hevokê de neyete xebitandin, di kurmanckî de meriv tê dernaxîne ku gelo ka peyv nêr, mê yan jî pirhejmar e, belam di kirmanckî de peyv bi tena serê xwe jî taybetîya xwe dide nîşan. Ev taybetmendî qedîmî bûyîna dîyalektê jî nîşan dide.

Ji alîyê koka peyvê ve jî texmînen heştê der sedî (80 %) bi dîyalektên din ên kurdî re yek e. Ji alîyê forma peyvan ve jî kirmancî û soranî û devokên rojhilatî

ye. ⁹ Li wan deman Şêx Selaheddîn Firaî jî ji bo murîdên xwe broşurek bi navê *Beyatname* bi alfabeya latînî nivîsandîye û bi nihênî belav kirîye. ¹⁰ Dîsan, hindek melayên din ên wek Mela Mehemmed Elîyê Hunî, ¹¹ Mela Kamilê Puexî, ¹² Mela Mehemedê Muradan ¹³ û hindek melayên din jî bi alfabeya erebî mewlud yan jî qesîde û helbest nivîsandine.

<u>Kirmanckî</u>	<u>Kurmancî:</u>
	<u>Serhed/Botan/Rojhilat</u>
Verg	Gurg
Hingimîn	Hingivîn
	<u>Binxet/Berrî</u>
	Gur
	Hingiv

Ji alîyê rêzimanî ve jî nisbet bi kurmanckîya Binxetê û Berrîya Mêrdînê di navbera kirmanckî û kurmanckîya Botan û Behdînan û Şerhed û Rojhilatê de pêwendî-yeke nêzîktir heye. Bo numûne:

erebî 400 nusxeyên wê li çapê ketine. *Mewludê Kirdkî* 16 beş û 756 rêzik e, her rêzik 11 kîte ye. *Mewludê Kirdkî* cara pêşî ji alîyê Malmîsanijî ve ji alfabeya erebî transkîrîbeyî alfabeya latînî bûye û li Ewropayê hatîye weşandin. ⁶ Pişt re ji alîyê Mihanî Licocî ve

<u>Kirmanckî</u>	<u>Kurmancî:</u>
	<u>Serhed/Botan/Rojhilat</u>
Mi to ra va çi?	Mi te ra go çi?
	<u>Binxet/Berrî</u>
	Min ji te re çi got?

Lêbelê, li van salên dawîyê bi pêşketina kurmanckîya Berrîya Mêrdînê û Binxetê, yan jî di encama nivîsandina li van salên dawîyê ku dûr ji zanîn an jî aşnabûna kirmanckîyê pêk hatîye, piçek dûrahî ketîye navbera herdu dîyalektan. Ger nivîskarên kurdî aşnayê hemû dîyalektan bin dê zîmanê wan jî bêhtir nêzikî hev bibe.

Edebîyat

Di kirmanckî de kevintirîn metnê ku tê zanîn, kitêba Peter Îvanovîc Lerchî ye, ku ji devê hindek camêrên kirmanc (kurdên zaza) ên ku ji Nêrîba Hêneyê (Dîyarbekir) ne, li şerê Qirimê wek dîl ketine destê artêşa Rusya ya Qeyser, ev metn hatîye nivîsîn û di sala 1857an de li Petersburgê çap bûye. ⁵

Li welat jî, cara pêşî metna ku hatîye nivîsîn *Mewludê Kirdkî* ya Seydayê Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) ye. Ev mewlud di roja 25ê Adara 1899an de li Çaxaneya Lîtografyayê bi alfabeya

bo alfabeya latînî hatîye transkîrî-bekirin û di sala 1994an de li Stenbolê ji alîyê Weşanxaneyê Firaî ve ji nû de çap bûye. ⁷ Ev metn, ji bo Edebîyata Kirmanckî wek yekemîn metnê qebulkirin.

Mewludê din jî, ya muftîyê Sêwregê Mela Usman Efendîyê Babijî ye. Ev metn jî di sala 1906an de hatîye nivîsîn û pişt re destnivîsên wê dikevin destê Mîr Celadet Bedirxanî û ew jî di sala 1933an de li Şamê bi alfabeya erebî çap dîke. ⁸

Ji ber qedexekirina zîman a li Tirkîyê demêke dirêj bi vê dîyalektê nehatîye nivîsandin. Her wiha, ji ber ku kurdên kirmanc bes li nava sînorên Tirkîyê ne, ji lewre li deverêke din jî bi kirmanckî nehatîye nivîsandin. Lêbelê em li van salên dawîyê pêdîhesin ku li welat di salên 1970-80an de hin berhem di nepenîyê de hatine nivîsandin. Ji vana yek *Eqîdetu'l Îman* a Mela Mehemedê Mela Evdulxefûrê Hezanî ye ku li derdora Dîyarbekirê, bi taybet di nav melayan de belav bû-

ye. ⁹ Li wan deman Şêx Selaheddîn Firaî jî ji bo murîdên xwe broşurek bi navê *Beyatname* bi alfabeya latînî nivîsandîye û bi nihênî belav kirîye. ¹⁰ Dîsan, hindek melayên din ên wek Mela Mehemmed Elîyê Hunî, ¹¹ Mela Kamilê Puexî, ¹² Mela Mehemedê Muradan ¹³ û hindek melayên din jî bi alfabeya erebî mewlud yan jî qesîde û helbest nivîsandine.

Ji salên 1970an û virdetir di nêv kurdan de bi pêşketina sîyasetê re îcar xwendevanên mekteban dest bi nivîsînê dikin. Cihêtiyên di navbera kesên ekola mekteban û ekola medreseyan de ev e, ku ev ekola nuh zêdetir bi fehmeke sîyasî-netewî tevdiqere û alfabeya latînî ya Celadet Bedirxanî dixebitîne. Navdartinê û çalakîrîyê vê ekola nuh M. Malmîsanij e. Ji bo kirmanckî rola wî di şîbe rola Celadet Bedirxanî ku di standardîzekirina kurmanckî de lîstibû. Jixwe, yekemîn metnê modern û her wiha yekemîn ferhenga kirmanckî (zazakî) Malmîsanijî amade kirine. ¹⁴

Xebata Standardîzekirîne

Bêguman çawan ku di kurmanckî de gelek devok (şîwe) hene her wisan di kirmanckî de jî devok gelek in. Lê meriv dikare bi awayekî giştî kirmanckîyê bike du devokên mezin:

1.Devoka Dêrsimê

2.Devoka Çewlîgê

Devoka Dêrsimê bi giştî kirmancên elewî pê diaxifin û devoka Çewlîgê jî meriv dikare bibêje ku kirmancên sunnî pê diaxifin. Îcar, ji bo standardîzekirina kirmanckî ji sala 1996an û bi vir de xebatên gelekî hêja tene kirin û ev xebat roj bi rojê bi awayekî biîstîkrar her berdewam dibin.

Xebata standardîzekirina kirmancîyê li derveyî welat, li Swêdê di sala 1996an de dest pêkir. Deh-panzdeh rewşenbîrên kirmanc ên ji deverên cihê-cihê ku xwe wek "Grûba Xebate ya Vateyî" bi nav dikin, li ser vê dîyalektê her berdeyam dixebitin. Vê koma xebatê serê pêşî encama kombûnên xwe wek broşûrê belav kir lê dû re kovara Vate derxist. Vê koma xebatê ta niha 13 car ji bo standardîzekirina kirmancîyê komî ser hev bûye û li dora 7.000 peyvên di formeke standard de tesbît kirine ku vê yekê pêşî li nivîsîna vê dîyalektê vekirîye.

Di standardîzekirina kirmancî de ji krîterên hilbijartin an jî tesbîtîkirina forma peyvên yek jê ev e ku divêt dîyalektan nêzî hev bikin, bo numûne, beranberî peyva "artik" a tirkî kurmanc dibêjin "êdî" û soran jî dibêjin "îdî", di kirmancî de jî formên "hendî, hindî, hînî, hêdî, êdî" tên gotin. Îhtîmala mezin ew e ku di zimanê kurdî de forma bingehîn "hendî" be. Bêguman di hemû zimanan de her ku çûye form siviktir bûye û di zimanê me de jî



ev wisan e. Ji alîyê sivikbûnê ve forma "êdî" ji forma "hendî" siviktir e. Her wiha tercîhkirina vê forma sivikbûyî (êdî) di nêv dîyalektên kurdî de muşterekîyetê jî bi xwe re tine û di warê têngiştinê de hêsanîyê dide me, ji lewre niha kirmanc jî di warê nivîsînê de wek forma standard êdî vê peyvê wek "êdî", ango bi forma muşterek a kurdî dinivîsin¹⁵.

Kovara Vate ku dengê vê komê ye û xwerû bi kirmancî derdiçe, heta niha 26 hejmar jê der-

Kovara Vate ku dengê vê komê ye û xwerû bi kirmancî derdiçe, heta niha 26 hejmar jê derçûne. Ferhengeke kirmancî-tirkî û tirkî-kirmancî ku ji peyvên ku wek standard hatine qebulkirin û ji formên heyî yên din amade bûye, du car hate çapkirin. Û kitêbek bi navê "Rastnuştîşê Kirmancî (Zazakî)" ku di warê nivîsandina kirmancîyê de qaydeyên rêzimanî sererast dike jî ji alîyê heman komê ve hatîye amadekirin û weşandin ku ev encamên xebata standardîzekirina kirmancîyê ne.

çûne. Ferhengeke kirmancî-tirkî û tirkî-kirmancî ku ji peyvên ku wek standard hatine qebulkirin û ji formên heyî yên din amade bûye, du car hate çapkirin. Û kitêbek bi navê "Rastnuştîşê Kirmancî (Zazakî)" ku di warê nivîsandina kirmancîyê de qaydeyên rêzimanî sererast dike jî ji alîyê heman komê ve hatîye amadekirin û weşandin ku ev encamên xebata standardîzekirina kirmancîyê ne.

Kovara Vate ji alîyê Grûba Xebate ya Vateyî ve di havîna sala 1997an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiribû, ku hemû hejmar li welat jî çap bûn.

Ji derveyî kovara Vate, hema ji kovara Hawarê bigrin û bi vir de di gelek kovarên ku bi kurmancî derdiçin de jî her tim kirmancî hatîye nivîsîn û hê jî wisan e, her wiha weşanxaneyên kurmanc jî cihêtiyekê naxînin navbera kitêbên kurdîya kurmancî û kirmancî. Lêbelê divêt mirov vê yekê destnîşan bike ku heçî kurdên kirmanc (zaza) bin zû fêrî kurdîya kurmancî dibin yan jî di warê famkirina ji kurmancîyê de zêde muşkuleyên wan çêna bin belam heçî kurmanc bin, famkirina kirmancîyê bo wan gelek giran e, yan jî zêde xwe naêşînin ku ji kirmancîyê fam bikin an jî pê biaxifin. Ev jî ji bo kurdan rewşeke nebaş derdixîne pêş ku kurdên kurmanc û kurdên kirmanc (zaza) di xebatên komeleyetî de yan bi axiftina kurdîya kurmancî pêwendîyê bi hev re datînin yan jî ji bo têngiştinê bi tirkî biaxifin. Îhtîmal e sedemek jê ev be ku di encamê de her kurdîya kurmancî zal dibe, hingê qismek ji kurdên kirmanc xwe ji kurdîyê bêrî dikin û doza "Zazacîyê" dikin. Bêguman qaydeyên kirmancî ji kurmancî giran-

tir in, ev jî dibe sedemek ku di warê famkirinê de ji bo kurdên kurmanç muşkule hebin. Giranbûna qaydeyên rêzimanî jî, jixwe, wek gelek taybetmendiyên din şahidîya kevnarebûna dîyalekta kirmanckî dikin.

Hindek Agahîyên Din

Weşanxaneyek bi navê "Weşanxaneyê Vateyî" ji sala 2002 û vir de li Stenbolê dest bi xebatê kirîye ku heta niha 19 kitêbên kirmanckî çap kirine.

Bêyî kitêbên telîfî, gelek kitêb ji zimanên bîyanî bo kirmanckî hatine wergerandin û her wiha ji kirmanckî jî kitêbek bi navê "Sedefe" bo swêdî hatîye wergerandin û du car çap bûye. Kitêbeke din ji vê dîyalektê bi navê "Binê Dara Valêre de" jî bo kurmanckî hatîye wergerandin.

Lîsteya Kitêban

Ez dê lîsteyek ji kitêbên weşandî ku çavkanîya wê kovara Vate ye, pêşkêş bikim lê divêt ez vîya bibêjim, kirmancên ku xwe ji kurdan hesab nakin, xwe tenê wek "zaza" dibînin û alfabeke cihêtir dixebitînin, bêguman berhemên wan jî belav bûne lê di vê lîsteyê de nîn in. Ên ku xwe kurd dizanin, heta niha zêdetir ji heştê (83) kitêbî bi vê dîyalektê çap kirine. Ji van kitêban çendên sereta naveroka xwe dînin, lê yên modern bi giştî edebî, dîrokî, sîyasî û hwd. in. Ez dê lîsteyê li gorî rêzîkirina alfabetîk a navê nivîskaran pêşkêş bikim*.

—Alan Dilpak & Lerzan Jan-dîl, *Binivîsne! Nîyade! Birengne!*

—Alan Dilpak & Lerzan Jan-dîl, *Wendene Roştî ya*

—Aydin Bîngol, *Kejê*

—Azad Dilêr, *Dîyarbekiro*

Xopano

—Azad Dilêr, *Ez Çizviz Nêzana*

—Çeko, *Razarê Dimilkî*

—Çetîn Satıcı, *Azebe*

—Çetîn Satıcı, *Roja Sîpîye*

—Daniel Defoe (Tadayox: J. Îhsan Espar), *Robinson Crusoe*

—Denîz Gunduz, *Dersê Kirmanckî (Türkçe Açıklamalı Kürtçe (Kirmancca/Zazaca) Dil Dersleri)*

—Denîz Gunduz, *Hîkayeyê Koyê Bîngolî*

—Denîz Gunduz, *Kilama Pêpûgî*

—**Derheqê Kirmanckî (Kirdkî) de Kombîyayîşê II. ê Stockholmî**

—**Derheqê Rastnuştêna Kirdkî (Kirmanckî) de Kombîyayîşê Stockholmî**

—Durmaz GBV, (Çarnayox) *Emr Saba Emr*

—Feyza Adabeyî, *Estaneke Sêwregî*

—Fuat Dogan, *Hesret*

—Grûba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Tirkî-Kirmanckî (Zazakî)/ Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî*

—Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)*

—Gunilla Wolde (Tadayox: Haydar Diljen), *Emma Şina Tixtorde Dindana Heti*

—Gunilla Wolde (Tadayox: Haydar Diljen), *Emma ya Tixtorî Heti*

—Gunilla Wolde (Tadayox: Haydar Diljen), *Tûte yo Pasta Virazeno*

—Gunilla Wolde (Tadayox: Haydar Diljen), *Tûte yo Şino Teber*

—Hamdi Özyurt, *Dergûş Çira Berbeno?*

—Hamdi Özyurt, *Dîvdîv*

—Hamdi Özyurt, *Lajeko Zimbêlin*

—Hamdi Özyurt, *Sedefe*

—Haydar Diljen, *Ziwanê Ma Alfaba*

—Haydar Işık, *Memik Axa wo Dêrsimij*

—Huseyin Karakaş, *Omid Esto*

—Îlhamî Sertkaya, *Min Hesretan de Mevirde, MESO*

—Îlhamî Sertkaya, *Zerîya Min To de Mend*

—J. Îhsan Espar, *Beyi Se bena?*

—J. Îhsan Espar, *Tanî Estanikî û Deyîrê Ma*

—M. Kamîl Puexî, *Mewlîdî Nebî*

—Malmîsanij & Mehmet Uzun, *Rindê Baxçeyê Kaloyê de*

—Malmîsanij & Mehmet Uzun, *Rindê Vana Ê Min a*

—Malmîsanij, *Ferhengê Dimilkî-Tirkî*

—Malmîsanij, *Ferhengekê Kirdkî-Pehlevkî-Kurmanckî*

—Malmîsanij, *Folklorê Ma ra Çend Numûney*

—Malmîsanij, *Herakleitos*

—Malmîsanij, *Pîre û Luye*

—Malmîsanij, *Rindê Heywanan Nas Kena*

—Malmîsanij, *Rindê Kincan Xo ra Dana*

—Malmîsanij, *Rindê û Keyeyê Xo*

—Maruf Yılmaz, *Ahmey Temî - Fistonik*

—Mehmet Gülmez, *Seyit Riza: Dersîm'ra ve Dare Estene*

—Mela Ehmedê Xasî, *Mewlîdê Kirdkî*

—Mela Mehemed Eliyê Hunî, *Mewlid & Yûsif û Zelîxa & Qesîdeyê Kerbelayî*

—Mela Mehemedê Mela Evdulxefûrê Hezanî, *Eqîdetu'l-Îman*

—Memê Koêkorta, *Berxa Mi Xerîbîye de*

—Memê Koêkorta, *Lawika Cîrê Vacî*

—Mesut Özcan, *Dersim Zaza*

Atasözleri

—Mesut Özcan, *Zazaca Türkçe Sözlük*

—Muhemedê Kavarî, *Dîwanê Muhemedê Kavarî*

—Munzur Çem (Amadekar), *Antolojîyê Hikayanê Kirmanckî*

—Munzur Çem, *(Roportajî) Kulê 38î*

—Munzur Çem, *Ferheng Kurdi-Tirkî (Zazakî)*

—Munzur Çem, *Hawara Dêrsimî*

—Munzur Çem, *Hewnê Newroze*

—Munzur Çem, *Hotay Serra Usifê Qurzkizî*

—Munzur Çem, *Kirmançça (Zazaca) Gramer*

—Munzur Çem, *Luye be Biza Kole ra*

—Munzur Çem, *Tayê Kilamê Dersimî*

—Qamerê Alî (Kamer Söylemez), *Adir û Asme*

—Reşit Kara, *Roc*

—Reşit Kara, *Vora Koy*

—Roşan Lezgîn, *Binê Dara Valêre de*

—Roşan Lezgîn, *Dêsan de Sûretê Ma Nimite*

—Roşan Lezgîn, *Ferhengê Îd-yomanê Kurdkî*

—Roşan Lezgîn, *Halîn*

—S. Verroj & Abdurrahman Uçaman, *Ferheng/Vajname Kurmancî-Hewramî-Dimilî-Senen-dajî*

—Seîd Verroj, *Ferheng: Kurmancî-Dimilî-Tirkî*

—Seîd Verroj, *Folklorê Kurdî-Kurmancî û Dimilî*

—Seyîdxan Kurij, *Filî û Gulzar*

—Şêx Selaheddîn Firat, *Be-yatname*

—*Tevgera Rizgarîya Kurdistan (TEVGER), program*

—Turan Erdem, *Ferheng: Zazakî-Tirkî/Tirkî-Zazakî*

—Usman Efendîyo Babij, *Bî-yîşa Pêxemberî (Mewlûda Nebî)*

—Victor Hugo (Tadayox: J. Îhsan Espar), *Notre-Damea Parîsî*

—W. K. Merdimîn, *Dîwan*

—Wedat Kaymak, *Elfaba Zaza: Ez Ti O/A*

—Wedat Kaymak, *Istanekî Zazakî*

¹ Yaqûtî, Mu'cemul-Buldan, Çapa Misrê, Cilda çaran (4.), r. 415 / Binihêrin li; Yekta Lezgîn & Roşan Lezgîn "Vanê 'Şaîrî Sey Ecacê Pêlê Behran a...' Ê Mi, Ez Anî Nîya", Vate: Kovara Kulturî, Hejmar: 16, Zivistan-2000, Stockholm, r. 33-53

² Malmîsanij, Kird, Kirmanç, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Weşanên Deng, 1996, Stenbol / Malmîsanij, "Destpêka Edebîyata Kirmanckî (Zazakî)" Gotarên Konferansa Edebîyata Rojhilata Navîn û Pirçandiyê, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Sermawez-2004, Stenbol, r. 39-43

³ Grûba Xebate ya Vateyî, *Rastnuştîşê Kirmanckî*, Weşanxaneyê Vateyê, 2005, Stenbol / Malmîsanij, Kird, Kirmanç, Dimilî veya Zaza Kürtleri, Deng Yayınları, 1996, İstanbul / Malmîsanij, "Destpêka Edebîyata Kirmanckî (Zazakî)" Gotarên Konferansa Edebîyata Rojhilata Navîn û Pirçandiyê, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Sermawez-2004, Stenbol, r. 39-43

⁴ Ji bo agahiyên berfireh binihêrin li; Çem, Munzur, *Dersim'de Alevilik*, Weşanên Pêrî, 1999, Stenbol

⁵ Espar, J. Îhsan "Çend Nuştay û Kitabê Kirdkî" Zend: Kovara Lêkolînî, Hejmar: 1, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Payîz-1996, Stenbol, r.44-48 / Malmîsanij, "Arêkerdax: Peter Îvanovîc Lerch, "Qewxê Nêrib û Siwanî"" Hêvî: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 3, Sibat-1985, Parîs, r. 109-111 / Malmîsanij, "Arêkerdax: Peter Îvanovîc Lerch, "Qewxê Nêrib û Hênî"" Hêvî: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 5, Gulan-1986, Parîs, r. 88-91 / Malmîsanij, "Arêkerdax: Peter Îvanovîc Lerch, "Çend Tekstê Dimilkî (Zazakî)" Hêvî: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 6, Tebax-1987, Parîs, r. 69-79 / Malmîsanij, Ondokuzuncu Yüzyılda Kird (Zaza) Aşiretleri Arasındaki Çatışmalar, Studia Kurdica, No: 1-3, Nisan-1985,

Paris, r. 72

⁶ Espar, J. Îhsan "Çend Nuştay û Kitabê Kirdkî" Zend: Kovara Lêkolînî, Hejmar: 1, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Payîz-1996, Stenbol, r.44-48 / Malmîsanij, "Ehmedê Xasî, "Mewlidê Nebî"" Hêvî: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 4, Êlon-1985, Parîs, r. 75-97

⁷ Xasî, Seydayê Mela Ehmed, *Mewlûdê Kirdkî* (Transkîrîbekerdiş: Mihani Licokic), Weşanxaneyê Firat, 1994, Stenbol

⁸ Babij, Usman Efendî, *Bîyîşa Pêxemberî (Mewlûda Nebî)*, Şam, 1933 / Bedirxan, Celadet, "Zarê Dimilî û Mewlida Usman Efendî", Hêvî: Kovara Çandîya Giştî, Hejmar: 2, Gulan-1985, Parîs, r. 10

⁹ Yekta Lezgîn & Roşan Lezgîn "Vanê 'Şaîrî Sey Ecacê Pêlê Behran a...' Ê Mi, Ez Anî Nîya", Vate: Kovara Kulturî, Hûmare: 16, Zmistan 2000, Stockholm, r. 33-53

¹⁰ Malmîsanij, "Şêx Selaheddînê Şêx Seîdî û Beytaname" Vate: Kovara Kulturî, Hûmare: 16, Zimistan-2000, Stockholm, r. 4-16

¹¹ Hunî, Mela Mehmed Elî, *Mewlid - Yûsif û Zelîxa - Qesîdeyê Kerbela*, Weşanxaneyê Vateyî, 2004, İstanbul

¹² W. K. Merdimîn, "Werrkîna Inî Melay Mumtazî Biumînî Yew Ca, Derheqê Nuştîşî Zunî Xwi de, Tarîxî xwi de Eserêk Bînuştîni" Vate: Kovara Kulturî, Hejmar: 18, Havîn-Payîz 2002, Stockholm/Stenbol, r. 82-94

¹³ W. K. Merdimîn & N. Celalî, "Ez Ina Zê Yew Mûsîbetêk Vînena" Vate: Kovara Kulturî, Hejmar: 21, Payîz-2000, Stockholm/Stenbol, r. 4-32

¹⁴ Malmîsanij, *Zazaca-Türkçe Sözlük / Ferhengê Dimilkî-Tirkî*, Weşanxaneyê Jîna Nû, 1984, ...

¹⁵ Grûba Xebate ya Vateyî, *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî) - Tirkî*, Weşanxaneyê Vate, 2004, Stenbol, r. 20, 224

* Di amadekirina vê gotarê de ji bo alîkarîya wî gelek spas ji kekê J. Îhsan Espar re.

Not: Ez dibêjim sedemîn (100.) hejmara Nûbiharê bimbarek be. Ê ez hêvîdar im ku netewa kurd hezaremin (1000.) hejmara Nûbiharê jî bibîne. (R. Lezgîn)

Leyletul Qedr = Şeva Qedrê fezîleta şeva qedrê

Mela Muhammed Bêrkevanî


Xwedayê min! Bi qasî dilopên baranê û sêlha ber çem û behran û tayên gîyayan û pelikên daran dirûd û silav li ser Wî zatê pak û ehl û sihabe û malîyên wî û li ser yên ku di qencîyê de rîya wan bişopînin jî, bin hetta ku teyr û tûr bixwînin û şev û roj li pey hev bên..

Hemd ji Xwedayê Kerîm û Dilo- van, Comerd û Dayende re be, ez bi devê xwe dibêjim û bi dilê xwe jî yeqîn bawer dikim ku ji El- lah Teala pê ve tu îlahên bi he- qîyê tune ne, Ew yek e, bêşerîk û bêheval e, bêhevî û bêzewal e, dîsa ez bi devê xwe dibêjim û bi dilê xwe jî yeqîn bawer dikim ku Muhammed jî bende û peyxam- berê Wî ye, ewê ku li biwara ba- wermendan dilovîn û diltenik e. Xwedayê m! Bi qasî dilopên ba- ranê û sêlha ber çem û behran û tayên gîyayan û pelikên daran di- rûd û silav li ser Wî zatê pak û ehl û sihabe û malîyên wî û li ser yên ku di qencîyê de rîya wan bi- şopînin jî, bin hetta ku teyr û tûr bixwînin û şev û roj li pey hev bên... Amîn! Amîn!.

* Piştî vê kurtepêşgotinê, em vegerin ser mijara xwe: Divê em misliman guhê xwe baş bidin ser rehmeta Xwedê Teala ya ku di ayetên "Sûretê Qedr" de li ser me barandîye/ dibarîne. Divê em baş guhê xwe bidin ser xêr û bereket û xelata vê şeva pîroz a ku tê de Qur'ana pîroz nazil kirîye ku tê de jî hîdayet û rehmet û ji hev û du cudakirina heq û batilî heye...

Xwedê Teala di vê şeva mubarek de mirovatî ji bextreşî û bedbextî û şeqawetê xilas kirîye... Belê, şeveke bimbarek û bi kêr û bêr e... Feyde û qencîyên wê pir in... Yek ji çêtirîyên wê jî ev e ku ew ji hezar heyvî çêtir e. Dîsa yek ji bereketên wê ye ku yê bawerîyê pê bîne û xêr û sewaba xwe li cem Xwedê Teala hesab bike û wê sax û ihya bike jê re gunehên wî yên ku berê kirine tene efûki- rin. Dîsa yek ji xêr û bereketa wê ye ku yê wê ihya bike û sewaba xwe li cem Xwedê Teala hesab bike, Xwedê Teala dê kar û barên wî serrast bike û guneh û kêma- sîyên wî veşêre û kî jî bi dilekî hazir û xalis tê de dûa bike, Xwe- dê Teala dê bersiva dûaya bide û daxwaza wî bîne cih...

* Şeva Qedrê, ji ber girîngî û qedrbilindîya wê ye ku ew bûye navê sûretêkî Qur'ana Kerîm... Ew ji hemû şevên salê çêtir e. Lewra di şeva qedrê de nûr û xu- yayîyên pîroz û xêr û bereketên îlahî yên ku Xwedê Teala wan li bawermendan dibarîne hene... Di şeva qedrê de milyaket dadi- kevin erdê û hettanî sipêdeyê lê dimînin... Zehî çî şevek qedrbi-



Ellah Teala di bara fezîlet û xêr û bereketa wê de gotîye:
 “Ha, Mîm.. Ez, bi wê kitêba eşkerekar sond dixwim ku; me ew di Şeveke Pîroz de daxistîye ji bo ku em bi wê (mirovan) hişyar bikin.. Di wê şevê de, her karê bi hikmet tên veqetandin.. (Ew), bi fermanekî ji bal me ne.”

lind û mezin e! Ellah Teala çiqas xêr û qencîya vê ummetê xwestîye ku ew ji bo wê dîyarî kirîye...

* Ellah Teala di bara fezîlet û xêr û bereketa wê de gotîye: “Ha, Mîm... Ez, bi wê kitêba eşkerekar sond dixwim ku; me ew di Şeveke Pîroz de daxistîye ji bo ku em bi wê (mirovan) hişyar bikin... Di wê şevê de, her karê bi hikmet

tên veqetandin... (Ew), bi fermanekî ji bal me ne.” (1)

* Ellah Teala di bara çêtirîya wê ya ji hemû şevên salê de jî di ayeteke din de gotîye: “Bêguman e ku me Qur’an di Şeva Qedrê de şandîye xwarê. Ma tu dizanî ku Şeva Qedrê çi ye? Şeva Qedrê, ji hezar mehan çêtir e. Di wê şevê de, di bara her kar û barî de ferîşte û Rûh (Cibraîl) bi destûra Xwedayê xwe dadikevin (erdê)... Ew şev selametî û aramî ye... Hetta hilatîna sipêdeyê dewam dike.” (2)

Mirov dikare wan mijarên ku sûretî ew destnîşan kirine -bi kurtî- wiha şîrove bike:

1- Kitêba Xwedê Teala Qur’ana Pîroz ya ku dê mirovatîyê bigihîne dilşadîya dinya û axretê di şeva qedrê de hatîye şandin. Ew Qur’an a ku ji dilan re ronahî, ji rihan re zihûm û goştgirtin, ji derdan re şîfa û ji însanetîyê re jî jêdera bextîyarîyê ye...

2- Şeva qedrê ji bo wan dilên ku bi îbadet û taetê xwe dibezin bal Xwedayê xwe û berê dûa û nîyaz û zarezar û laklakên xwe didin Rebbê xwe, ji hezar mehên ku tê de şeva qedrê nîn e, çêtir û bi kartir e.

3- Şeva qedrê şeva wê rûmet û mezînatîyê ye ku tê de milyaket û canbexş (Cibraîl) dadikevin ser erdê û wan mislimanên ku ji Xwedayê xwe re îbadetê dîkin silav dîkin, beşdarî îbadetên wan dibin û wan tebrîk dîkin.

4- Şeva qedrê şeva wê biryarê ye ku hetta sala werê tiştê ku dê bibe û biqewime Xwedê Teala qerara wan dide û hukimê wan vedibire.

5- Şeva qedrê şeva xilasî û rizgarîyê ye ku hetta sipêdeyê tobeya tobedaran tê qebûlkirin û mexfîret û rehmeta îlahî li mislimanan dibare...

Ehmed bi senedeke sehîh ji Îbnu Umerî- Xwedê ji herduyan razî be- ragihandîye ku gotîye, peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- gotîye: "Yê ku lê bigere, bila di şeva bîst û heftan de lêbigere.."

* Xebat û qencî û îbadet û taet û nimêj û xwendin û zikr yên ku di şeva qedrê de werêkirin ji qencîya di hezar mehan de ku tê de şeva qedrê tune ye, çêtir e...

Şeva Qedrê kîjan e?

* Pir xêr e ku mirov di fer û kiteyên dawîyê yên meha remezanê de lê bigere... Lewra Peyxamberê Dilovan -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- di dehekên dawîyê yên remezanê de lê digerrîya...

* Di bara dîyarkirin û bi navkirina şeva qedrê de ji muctehîd û alimên îslamê re raman û fikrên cuda cuda hene... Hin alim hene ku li gorî wan ew şeva bîst û yekê ya Remezanê ye... Hin ji wan hene ku li gorî wan ew şeva bîst û sisê ya remezanê ye... Hin ji wan hene ku li gorî wan ew şeva bîst û pêncê ya remezanê ye... Hin ji aliman hene ku li gorî wan ew şeva bîst û heftan ya remezanê ye... Hin ji wan jî hene ku li gorî wan ew şeva bîst û nehê ya

remezanê ye... Hin ji wan jî hene ku li gorî wan ew di kiteyên dehekên dawîyê yên remezanê de ye...

Lêbelê pirranîya wan di vê qenaetê de ne ku ew di şeva bîst û heftan ya remezanê de ye... Li gorî ku em ji wan delîlên ku dê li jêrê binin û rêz bikin fehm dikin fikra herî xurt û xwedan delîl ya wan aliman e ku gotine; ew di şeva bîst û heftan ya remezanê de ye...

1- Ehmed bi senedeke sehîh ji Îbnu Umerî -Xwedê ji herduyan razî be- ragihandîye ku gotîye, peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- gotîye: "Yê ku lê bigere, bila di şeva bîst û heftan de lêbigere..."⁽³⁾

2- Muslim û Ehmed û Ebû Dawud û Tirmizî ji Ubeyy kurê Ke'b ragihandine- Tirmizî ew sehîh jî dêrîyaye- ku gotîye; Ez bi wî Xwedayî kim ku ji Wî pê ve tu îlah tune ne, ew di remezanê de ye- sond dixwar û awerteyî jî nedixistîyê- Ez, bi Xwedê kim ez dizanim ka ew kîjan şev e. Ew şev e ku peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- şîreta saxkirin û rabûna wê li me kirîye. Ew şeva bîst û heftan e... Nîşana wê ev e ku tav di sibeha roja wê de sipî derkeve û jê re rohnîya zêde nebe...⁽⁴⁾

3- Ji Îbnu Umerî -Xwedê ji herduyan razî be- hatîye ragihandin ku hin zilam ji sihabîyên Peyxamber -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- şeva qedrê di xewnên wekhev de şeva bîst û heftan dîtin... Vêca peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- got: "Ez dibînim ku xewnê we bi şeva bîst û heftan re ahengsaz hatîye... Naxwe yê ku li şeva qedrê bigere bila di hefte-

kên dawîyê de lê bigere... " Buxarî û Muslim ragihandine...⁽⁵⁾

4- Ji Aîşe -Xwedê jê razî be- hatîye ragihandin, gotîye: "Peyxamberê Xwedê Teala- Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- di dehekên dawîyê yên Remezanê de diket îtîkafê û digot: "Di dehekên dawîyê yên Remezanê de li şeva qedrê bigerin... " Buxarî û Muslim ragihandine.⁽⁶⁾

5- Ji Aîşe -Xwedê jê razî be- hatîye ragihandin ku: "Peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- gotîye: "Di kiteyên dehekan yên dawîya Remezanê de li şeva qedrê bigerin... " ⁽⁷⁾

6- Ji Aîşe -Xwedê jê razî be- hatîye ragihandin, gotîye: "Gava diket dehekên dawîyê yên Remezanê Peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- şev sax fikir û ehlê xwe jî hişyar fikir û xwe ji bo îbadetê vala fikir û xwe ji kulfetên xwe dûr digirt." Buxarî û Muslim ragihandine.⁽⁸⁾

7- Ji Aîşe -Xwedê jê razî be- hatîye ragihandin, gotîye: "Peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- di Remezanê de pir hewldana îbadetê fikir ku ew hewldan di xey-

"Gava diket dehekên dawîyê yên Remezanê Peyxamberê Xwedê Teala -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- şev sax fikir û ehlê xwe jî hişyar fikir û xwe ji bo îbadetê vala fikir û xwe ji kulfetên xwe dûr digirt."

rê wê de nedikir û hewladana îbadetî ya ku di dehekên dawîyê yên wê de dikir ku ew hewldan di xeyrê wan de nedikir... " Muslim ragihandîye ⁽⁹⁾

* Îmam Xezalî gotîye: Şeva qedrê, bi roja pêşîn a serê meha remezanê tê zanîn. Wek numûne; heke serê remezanê bi roja yekşemê, yan jî çarşemê dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û nehê ya remezanê de ye. Heke serê remezanê bi roja duşemê dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û yekê ya remezanê de ye. Heke serê remezanê bi rojên sê-

xwe li cem Ellah Teala) bijmêre, jê re gunehên wî yên ku buhurîne têne bexişandin." ⁽¹¹⁾

Xelîfe Yûsuf, di pirtûka xwe ya bi navê "Îrşadul Îbad" ya bi zimanê Kurdî nivîsî û amade kirîye de sê mertebeyên saxkirina şeva qedrê eşkere dike û wiha dibêje: "Mertebeya bilindtirîn a saxkirina şeva qedrê ew e ku; bi îbadet û taet û nimêj û dûa û pir xwendina Qur'ana Pîroz û dana selewatan li ser Peyxamberê Merheme-tê -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- saxkirina timamê şevê ye...

Îmam Xezalî gotîye: Şeva qedrê, bi roja pêşîn a serê meha remezanê tê zanîn. Wek numûne; heke serê remezanê bi roja yekşemê, yan jî çarşemê dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û nehê ya remezanê de ye. Heke serê remezanê bi roja duşemê dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û yekê ya remezanê de ye.

şem û îne dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û heftê ya remezanê de ye. Heke remezanê bi roja pêncşemê dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û pêncê ya remezanê de ye. Heke serê remezanê bi roja şemîyê dest pê kiribe şeva qedrê di şeva bîst û sisîyê ya remezanê de ye. ⁽¹⁰⁾

Fezîleta Rabûn û Saxkirina Şeva Qedrê

8- Buxarî û Muslim ji Ebû Hureyre -Xwedê jê razî be- ragihandine ku Peyxamber -Dirûd û silavên Xwedê Teala lê bin- gotîye: "Kî, şeva qedrê rabe, bawerîyê (bi xêra wê) bîne û (xelata

Saxkirina navîn û asayî ew e ku; bi taet û îbadetî pirranîya şevê sax bike...

Saxkirina hindik û kêmtirîn ew e ku; nimêja eşayê bi cemaetî eda bike û hewl bide ku nimêja sibehê jî bi cemaetî eda bike... ⁽¹²⁾

Dûaya Şeva Qedrê

9- Ji Aîşe -Xwedê jê razî be- hatîye ragihandin ku wê gotîye, min got: Ya Resûlallah! Ji kerema xwe ji min re bibêje, heke ez zanibim şeva qedrê kîjan e, ez çi tê de bibêjim? Got: "Xwedayê min! Tu efûkar î, ji efûkirinê hez dikî, min jî efû bike..." Tirmizî ragi-


handîye û gotîye; ew hedîseke sipehî û sehîh e... ⁽¹³⁾

Xwedayê min! Ez bi ber sûc û gunehên xwe tîm, gunehên min pir û bêjimar in, kêmasî û eybên min jî pir in.

Xwedayê min! Ez jar û belengazê rehma te me, ez feqîrê berdergehê dilovanîya te me, ji Te pê ve tu penah û stargeha min nîn e, heke Tu degehê stara xwe li ber min bigrî êdî kî heye ku min bihewîne, heke Tu min qebûlî rehma xwe nekî kî heye ku piştî Te ew min bighîne Te, heke Tu min ji rehma xwe mahrûm û bêpar bikî/bihêlî qey kî heye ku bide min, heke Tu min ji xwe dûr bikî qey kî heye ku min nêzikî Te bike, ji Te pê ve ez tu rebbê dîtir nas nakim, ez ji Te pê ve tu xwedayên din nas nakim, ez ji Te pê ve arîkarîyê jî ji tu kesî din naxwazim, ez ji Te pê ve îbadetê ji tu kesî din re nakim, Tu yî, yê ku ez aferandime û yê ku rizqê min jî didî, Tu yî, yê ku nimet li min kirîye û yê ku mefa û rehetî û şîfayê dide min, nimetên Te bi şev û rojê li ser min dibarin, ji nimetên Te re tu hed û hesab nîn e, ez ji cenabê zatê pakê Te hêvîdar im ku Tu di vê şeva pîroz de li gunehên min bibuhurî, şaşîyên min rast bikî, milletê me ji dîlî û bîndestîyê xilas bikî, welatê me azad bikî.

Xwedayê min! Şîfayê bide nexweşên me, serbestîyê bide girtîyên me, derman bide xwedan derdên me, arîkarîyê bide deydaran me...

Xwedayê min! Dîne min ji min re rast bihêle ku ew parastina karê min e, dinyaya min ji min li hev bîne ku pêjîna min tê de ye, axreta min ji min re saxlem bihêle ku paşwexta min bi bal wê ve ye, jîyana min ji min re bike



Ev şev, ew qas mezin e ku rastîya wê sînorê têgihîştina beşerî derbas kirîye: “Ma tu dizanî ku Şeva Qedrê çi ye?..” Hîç pêwîstî nîn e ku em wê, bi çîrok û çîvanokên ku di bara şeva qedrê de li nava xelkê belav bûne ve, girêbidin jî..

zêdebûna her xêr û qencîyê, mirina min jî ji min re bike îstîrahegeha ji her şer û xirabîyê.

Xwedayê min! Ez rehma te divim, bi qasî miçkirin û belkirina çavan jî min nespêre nefsa min a bedemel.

Xwedayê min! Her kar û barê min ji min re rast li rê bibe, ji Te pê ve tu îlahên bi heqyê tune ne, Tu dilovan î, Tu dilovîn î. Amîn! Amîn!

Şîroveyeke Balkêş û Surdar

* Di bara Şeva Qedrê de şîroveyeke pir balkêş û surdar a xwedîyê “Zîlal”ê heye... Ji ber girîngîya wê ya zêde û feydedarîya wê em dixwazin wê vegeerînin Kurdî û digel hin jêbirinan wê biguhêzin wê nivîsarê û li xwendevanê xweşdivî eşkere û erz bikin da ku ew jî feyde jê bibînin... Şe-

hîd Seyyid Qutub -Rehma Xwedê Teala lê be-wiha dibêje: “Navê wê şeva qedrê ye... Dibe ku maneya wê teqdîr û tedbîr be... Dibe ku maneya wê qîmet û meqam be jî. Ew herdu jî bi wê bûyera mezin a kaînatê; bûyera Qur’an û wehî û peyxambertîyê re ahengsaz in... Di vê kaînatê de bûyereke ji wê mezintir û rasttir nîn e... Her wiha di jîyana evdan de bûyereke ku mîna wê teqdîr û tedbîrê bêhtir nîşan bide jî nîn e... Ew ji hezar mehan çêtir e... Di cihên Qur’anê yên mîna van de hijmar wê reqemê tenê nade zanîn... Şeva Qedrê, di jîyana mirovan de ji hezar hezar heyvan çêtir e... Gelek meh û gelek sal derbas bûne û bêyî ku hin ji wan berhem û guhertinên ku wê şeva pîroz û xweş di jîyanê de hiştine, bihêlin...”

* Ev şev, ew qas mezin e ku

rastîya wê sînorê têgihîştina beşerî derbas kirîye: “Ma tu dizanî ku Şeva Qedrê çi ye?... ” Hîç pêwîstî nîn e ku em wê, bi çîrok û çîvanokên ku di bara şeva qedrê de li nava xelkê belav bûne ve, girêbidin jî... Ew bi hîlbijartina Xwedê Teala ya wê wek destpêk ji bo daxistina Qur’anê û wek destpêk ji bo rijandina vê nûrê li kaînatê tevî û wek destpêka bi cihkirina aşîyê ya ku ji rehmeta Xwedê Teala rijîyaye ser dilê beşerî û jîyana mirovatîyê, û wek destpêk bi eqîde û raman û şerîet û edebên ku Qur’anê ew di naveroka xwe de girtine û ew haştîyê li sererd û di wijdanan de belav dikin û bi daketina milyaketan û Cibraîl - Eleyhî Selambî destûra Xwedayê xwe tê de û bi hesab cinsê xwe digel wan bûna wê Qur’anê ya ku di heman şevê de nazil bûye û bi belavbûna milyaketan ya di navbera asîmanî û erdê de ya di vê festîvala kaînatê de ya ku peyvên Sûretî bi awayekî balkêş wê teswîr dikin ew şeveke mezin e!... ” (14)

Jêder:

- 1- Sûretê Dûxan: 1-5
- 2- Sûretê Qedr: 1-5.
- 3- Fiqhus-Sunnet, cild 1, rûpel: 418.
- 4- Fiqhus-Sunnet, cild 1, rûpel: 418.
- 5- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1190, rûpel: 304
- 6- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1191, rûpel: 304
- 7- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1192, rûpel: 304
- 8- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1193, rûpel: 304
- 9- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1194, rûpel: 304
- 10- Îrşadul Îbada Kurdî, rûpel: 170...
- 11- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1189, rûpel: 304
- 12- Îrşadul Îbada Kurdî, rûpel: 169...
- 13- Rîyadus-Salihîn, hijmara hedîsê 1195, rûpel: 304
- 14- Fîzîlalil-Qur’an, cild 6, rûpel: 3945

Mirin bêberbûr e

Zilkîf Xweşhêvî

Tu rastî dilê mirovî ewqas ji dunyayê sar nake, tu êş hinavê mirovî wisa ker ker, pirtî pirtî nake ji bilî mirinê. Mirinên ku li durê min diqewimîyan mîna dubarebûna efsaneyên salane bûn. Lê ez niha têdigihîjim ku mirin çiqas xelesa xwe li dora mirovî teng dike ew qasa jî ji kincên çîrokîyê derdikeve û dibe xencereke kalani di nav dilê mirovî de diçike. Belê, dilê min, hinavê min hemû hucreyên min di wê kêliyê de jan didan. Xwedê dizane ji du saetî zêdetir bû ku ez li ber derfê jura nexweşxanê qelewîska rûniştibûm. Ji ber ku jana hinavê min zêde bû, min tevza çokê xwe hest nedikir. Li derve tijî însan hebûn li hundir ji termekî ciwan û çend kesukarê wî yê dilwêranbûyî.

Mirin her tiştî berevajî dike, hemû hesaban diteribîne, hemû xwezîyan dişkîne, temamê kîna û dijminatîyan dimirîne. Hestên min, kîna min û çîroka min a nîvcomayî jî beravajî bûn. Min dê bi xeyda xwe bersîvê bidana wî û bi çîroka xwe jî heyfê jê bistendana. Lê êdî çû, ew jî çû, tolhildana bi çîrokê jî çû. Careke din dilê min

êşand, kesereke din li min zêdekir. Dîsa ez li berxwe ketim, min renc li xwe barand û wî ez dam ber tîrê poşmanîyê. Xwezî wisa nebûna, bi vî awayî ev çîrok neqedîyana. Xwezî dîsa ez biçûma, min dilê wî xweş kirana, lomeyên wî careke din daqurtandama. Ez çi zanîbûm mirin ewqas nîşgav e û bê berbûr e.

Na, nabe piştî vê bûyerê êdî hukmê wê çîrokê nema. Ez dê wê biçîrînim û bihavêjim. Erê rast bû lêbelê rastîyeke ji wê mezintir ew da jibîrkirn: MIRIN.

Dilê min jê şikîyabû, ez jê xeydîbûm û heta xwe rast nekirana min dê pê re xeber nedana. Lewra êdî bawerîya min bi soz û gotinên wî nemabû. Ji bo tiştên biçûk karibû bi mehan bi salan poza xwe bilind bike. Helwesta wî ya dawî ku nedihîştin eta min biçe mala bavê min wî li ber çavê min reş kiribû û min pêwendîya xwe jê birandibû. Lê mirinê pêwendîya min ji wê hêrs û kîna ku ji bo wî çê bûbû yekser birî û di ser de ez deyndar derxistim ez dil şewitandî û perîşan kirim.

Dana êvarê bû xeber hat, gotin Erqanî qeza kirîye. Ez li ser ni-

mêjê bûm. Hemû malî di hewarî-yê de çûn. Ez jî di pey wan de birêketim. Gava min nêzîkî li nexweşxanê kir komeke giran ji mirovan gihîştibû hev. Di nav wê qerebalixê de, ji nîşgav çavê min bi eta min ket. Temtêla ku tê de bû her tiştî dîyar dikir. Çîrpînî ji dilê min çû, tîreke zirav û tûj hînavê min girt. Ez bê taqet berew eta xwe çûm, ew jî berew min hat. Min ew hîmbêz kir, destê wê kir nêv destê xwe. Bi deng digirîya û dixwest biçe hundirê nexweşxanê. Min destê wê girt, bir heta ber derîyê nexweşxanê. Lê tu kesî nedigirtin hundir. Ez bi xwe nizanîbûm çî bikim, taqeta min tunebû ku ji yekî bipirsim ka çibûye yan jî çî hatîye serê kê. Di nay wê geremolê de nasek di ber guhê min de hêdîka gote: "Erqanî rehma kirîye, eta xwe ji vir dûr bixe baştîre." Lê xuşka min ku destê wê di nêv destê min de bû neditebitîya, digot "Hewarê! min berdî ez wî bibînim." Dîya min a çavbîhistir jî destê eta min girtibû digot "Qurban megrî, ez qurbana serê te, megrî." Di wê navê de texsîyek hate li ber me rawestîya û çend jinên nas û dîya min, eta min kirin nava xwe, wê li texsîyê kirin û berew malê birêketin. Zîkê eta min li ber devê wê bû, nêzîk de dê Xwedê zarokê bidana wê. Lê bê mirada min, rastî tofaneke weranker hat. Eta min ji ber nexweşxanê çû lê dengê wê di guhê min de çîngîni dikir "Dayê, dayê, dayêê..."

Di wan keltîyên ku ez li ber derîyê jura ku termê zavayê me tê de bû rawestîbûm di guhê min de her çîngîniya "dayê dayê" hebû. Vê peyvê bêyî vîna min ez birim destpêka wê çîroka nîvcoma-yî ku niha lehengên wê, di çîrokeke bê derew de rolên diltezîn dileyîstî.



Li ber bîreke dev vekirî wek çuwaleke helisandî xwe kumîşandibû ser hev. Ji dev û lêvê wê xwîn mîna kanîyê dihat xwarê. Qerpalên porê wê belawela bûbû. Histir mîna çemekî jehrîn ji çavên wê dibarîya. Hîqîkên girîyê misêwa ew dihejand. Bi çavên ewrîn li her sê zarokên xwe dinêhêrtin. Keçik mezin bû ji birayên xwe mezintir bû. Gote wê: "Dayê megrî, megrî dayê, em herin hundir dayê, serûçavê xwe bişone dayê, ez biçim bangkim pîra xwe bila ji te re pembû û qolan-ya bîne. Megrî dayê çî dibe megrî. Her du kurik bi dengê digirîyan û tenê digotin: Dayê, dayê, dayê..."

Zarokên çîrokê dîsa bi dawa

dîya xweya giryan girtibû û dayê dayêya wan bû. Lê vêca gazinc ji bavî nebû, gazinc ji bo bavî bû. Vê dîmena ku çend deqîqe paşê dê çêbibûna dev ji min bernedida. Dengên xwarzên min ên sêwî mîna di kerika guhê min de olan bide dihatin min. "Dayê digotin çî bûye bi bavo dayê?" Çend roj paşê dê kurê biçûk bigirîyana û dê kurmê bavê xwe bikirana, dê zarokan di kuçeyê de jê re bigotana bavê te mirîye, ew kirine binê herîyê. Dê kurik bigirîyana û bihatana ber dîya xwe û dê jê re wisa bigotana: "Dayê! min bêrîya bavo kirîye, haydê em biçin cem bavo. Zarok dibêjin bavê te kirine binê herîyê, bira, bavo kirine binê herîyê dayê?"

Li ber jura termî ez di xwe de sar bûbûm. Dilê min ecêb diçizîyan, heşê min bê pergâl deperpîtiyan. Her dîmenên ku xîyala min dadanîyan ber çavê min, êş dibarand. Erqan bi wê çalakîya xwe ya şêtane hat ber çavê min ku wê çaxê min tu wateyê nedabûyê. Kêreke kalanî kiribû destê xwe, pêşîra xwe veçirandibû. Di hewşa mala me de ji dîya min re digot: "Jinexal hûn wê nedin min welah ez ê xwe bikujim." Dîya wî, dîya min, jinmamên min û du xuşkên wî bi hezar lavayî kêrê jê sendin lê vêca ji şerman û hêrsan ji pîyan kete xwarê û di xwe de çû. Di kêlîya ku jin li ser serê wî quricî bû ez çûm min wê kêra mezin girt ji tirsana da pey xwe û min kêrê bir verşêda mîna zarokên çîroka nivcomayî.

Her du zarokên lawîn destê dîya xwe girtibû, keçikê kêra destê dîya xwe jê sendibû, di pey xwe de verşêdida. Di alîyek de ji dîya xwe lava dikir, di alîyekî din de jî çî dihatin devê wê ji bavê xwe re digot û digirîya. "Xwedê ji dev û lêvê te jî xwîn bihîne, tu jî bigirî mîna dîya min. Oy Xwedê oyl!"

Xanimê li zarokên xwe mêzedikir û bêtir dilê wê xira dibû. Awirekî wê li bîrê bû awirekî wê li zarokên wê. Di nav rewşa xwe ya kambax û di nav dilê xweyê peritîyê şefqetdar de mabû. Rewşa wê digot bîr... xwe bihavêje bîrê! Carek e, xwe bihavêje û xilas bibe. Êdî ne derew ne birçîbûn ne jî kutan... Xwe berde cîhaneke xerîb; lê mîsoger baştir, asantir, aramtir... Lê zarokên wê angoyên wê, hebûna wê digot berxwedan hindêk din tebat, hedan, sebir. Ya Sebûr!... Xwe havête ser zarokên xwe, piştî xwe da bîra dev vekirî û xwe kişand hundir, hundirê malê, mala

şer û pevçûnê, mala tirs û kînê, mala zordarî û birçîbûnê.

Erqan mirovekî xerab nebû lê xulqekî wî yê xerîb hebû. Gava su dibû mîna lehîyek bilind dibû û di wê demê de çî bihatana pêşîya wî didan ber xwe û dibir. Lê kêlîyeke paşê poşmanîyê ew dikir erd û herf, ew şermîn û şerpeze dikir.

Di salên pêşîyên zewaca xwe de wek teyrekî cenetê bû, derdê wî hew gotegota dîya wî bû. Lewra bi taybet ji bo xebatê dîya wî pir dida ser, nedihîşt rojek jî bêhn bide xwe yan jî bi hevîna xwe re biçe cîyek. Dîya wî sermîyana mala wan bû, qurîş bi qurîş pê re hesab didîtin û vê rewşê piştî zewacê ew gelek ditengizand.

Piştî sê salan dîya wî wefat kir. Çi bû ji vir pê de bû. Ji biçûkî ya xwe vir ve cara pêşî ew dibû sermîyanê malê. Wê disîplîna giran a dayîkê ji ser rabûbû. Êdî kesek ku wî bi zorê bişeyîne kar tunebû. Perê xwe da hev, zêrên xwe firot û got ez ê pê ticaret bikim. Hevalekî wî ticaret dikir, lê ew bi xwe jî baş nizanibû çî karî dike; lê hevalî wî digot: "Ez karê konfeksiyonê dikim, raste cîyekî min tune ye lê ne hewceye cî hebe ji karê ku ez dikim re. Ez di navbera kargehên mezin û firoşerên xwecîhî de karê tomerî dikim. Pêşî distînim bi maweyeke mehane yan jî du mehane difroşim didim firoşerên xwecîhî. Pêdivîya min pê tune lê ku tu dixwazî perê xwe bide min ez ê zêdetir mal bînim, kara wî em ê wek bira peya bikin." Ev pêşîyar gelek xweşa Erqanî çubû. Piştî ewqas salên xebatê yê bê navber dê biketana rehetîyê. Girt hemû pereyên xwe da hevalê xwe. Wisa bawerî bi vî karî û bi hevalê xwe anîbû ku çû zêrên eta xwe û yê baldur

za xwe jî ji wan send û da zilamî.

Salek di nav rehetîyeke ku heta nuha tu car nenasîbû de jîyanekê aram bihurand. Her meh diçû kara xwe ji hevalê xwe disend û perê xwe bi dilê xwe xerc dikir. Vê rewşê ew kiribû haletê sekrê ku haya wî ji tu tiştêkî çênedibû. Lê piştî salek kanî zuha bû. Hevalê wî rojek jê re got: "Mirovek, perê min revandîye divê ez biçim Îstanbûlê û bi şopa wî bîkevîm." Heval çû lê êdî venegeerîya. Piştî salekê din vêca ew bi şopa hevalê xwe ket lê Xwedê ew bidana. Piştî mehek ger û lêkolîn bi destê vala vegeerîya ser zarokê xwe de.

Cirkî ku şopa deyndarê xwe wînd kir rewşa wî ya aborî û her weha psîkolojîya wî berew xerabîyê çû. Pê giran dihat ku biçe mîna berê bi yewmîyan li çayxaneyek bixebite. Bi salan vî karî kiribû û bi têra xwe jê aciz bûbû. Piştî eşkerabû ku perê wî hatîye revandin, eta wî û bi taybetî baldura wî hatin doza zêrên xwe kirin. Lê ne pere hebû ne jî zêr. Erqanî, carê tiştêk dida ber rûyê xwe, mixabin sozên ku didan yek jî bicî nedihat. Rastî derketibû meydanê, vê rastîyê hem hizûra mala wî hem jî aborîya mala wî xera kir. Hevîna wî ji ber zêrê xuşka xwe pê re pevdiçû. Serata ji acizîya xwe ji mal derdiket diçû çayxaneyek heta saetên dereng xwe egle dikir. Lê piştî çend mehane li derve jî sirê wî îfşa bû, êdî her kesî bi dilekî rehet deyn nedidanê. Wisa bû ku perê çay jî pê re nema. Jina wî dida ser ji bo ku di karek de bixebite. Lê di xwe de nedidîya ku bixebite. Gava dihat mala xwe bi kêmasîya pêdawistîyên malê û bi gotegotên jina xwe re rûbirû dima. Ji ber vîya bêhn lê diçikîya û radibû bi jina xwe ya reben diket.

Cî lê teng bûbû. Mal, zarok, kesukar, tax, cîran market, qesab tev bûbûn gur û bi canê wî ketibû. Ji hemû tiştî direvîya û xwe dihavêt derwazeyên nenas. Di vê navê de bû ku wê qezaya kambax çê bû. Bi zilamê partiyê re çûbû cîyek, li wê çûbû dîyarê xanî ji bo rastkirina antêna televizyonê, di wê kêliyê de lingê wî şemitî bû û ji xanî ketibû. Lingêkî wî hur û xamêlo bûbû, sê parsuyên wî digel milekî wî şikîya bû. Bi mehan li erdê ma. Li bêçaretîya madî bêçaretîya bedenî jî zêde bû. Pîrî şevan su dibû bi jina xwe diket, piştî şer û pevçûnê ji tengavîyê serê xwe dikir nava balîfek û digirîya heta di xwe de biçûya digirîya. Vê rewşa neguherbar bi vî awayî dirêj dikêşa.

Peywendîya min û wî di van salên nexweşîya wî de xurtir bû. Gava pêwîst dikir carna min jî ew dibir nexweşxanê, digerand. Hin şevan ez li mala wan dimam û heta sibehê me digel hev sohbet dikir. Min di van sohbetên me yê rengîn ên pîr mijar de ew baş nasî bû. Çi xetayê ku bikirana îtîraf dikir û poşmanîya xwe jî derdibirî; lê heman xetayî dîsa dubare dikir. Di vî alîyî de nikarî bû xwe qontrol bike. Lewra hêrs, hezkirin, şewat û kîn di dilê wî de asta herî jor de bû, ev hestîyarî nediketîn bin emrê aqilî. Min wek destek pêşniyar û dîtîne xwe jê re digot û pîrî caran diket bin tesîra min jî. Lê weku min got pêlên hestên wî nedihîşt fikrekî nû yan jî demîneke teze di heş û dilê wî de cî bigire. Gotinan mîna sitraneke hezîn li kevîyên dilê wî dixistin û wînda dibûn. Carek min wî biribû nexweşxanê û ji wê em çûn mala min ku ez û hevalên xwendekarên zankoyê bi hev re diman. Li wê min behsa felsefa xwe ya jîyanê jê re kir bi

Demsal

Bamed Serdar

*D*ilê te mêrga biharê bû
Çav li te şikandibû havînê
Di çar navberan
Dildarî li van deran demsalek bû

Bi bîr tînim payizê
Neqşên dilê min li kirasê canê te xemilîbûn
Bi qîzanî mîna bêhna jinekê
te xwe berdabû ser rûyê min

Pir li te dikir nîsanê
Şil dikir kezîyên te
dilopên li ser pelên lêvên te
tu dizanî
bê ez çawa digindirîm çavên te

Çiruskeke keldanîbûm li berfa zivistana çavên te
Di nava germahîya xeyalên tenik û destên şilkirî
min xwe berdabû dewla dilê te

awayekî ku fam bike. "Jîyan tenê bi jîyana dunyayê pêknedihat, axiret hebû, Xweda hebû, hesab muqader û îbadet pêwîst bû." Çendek paşê ji min re gotibû: "Wê rojê gava tu çûyî, te destnimêj girt, min got ez jî rabim destnimêj bigirim, min xwe şemirand jî lê gava tu di ser min de vegeyayî, hatî jura ku ez tê de bûm ez jê gerîyam. Hema ez soz didime

te, ez ê rojek dest bi nimêjê bikim û dê ev yekcarî be, êdî ez ê tu car neterikînim."

Li ber deriyê jura nexweşxanê van gotinên wî hatin bîra min. Dilê min bêtir pê şewitîya. Mirinê muhlet nedabûyê, nesekinî bû ku li xwe varqîle. Wisa nîşgav hatibû û ew biribû, ew bê wext girtibû û em şaş û metal hiştibû.

Piştî sê salan ku bi ser linga

ket ji ber deynan mecbûr ma mala xwe anî Licê cem bavê xweyê ku tenê mabû di binê xaniyê xwe de. Lê anîna malê bi dilê wî nebû. Lewra wî û bavê xwe ji berê de nedikir serê hev. Piştî vê têkçûna wî û dayîna hinek deynên wî ji aliyê bavê wî de û di ser de betalî û bê karîya wî, dê nava wî û bavê wî xerabtir bikira. Tiştên ku jê ditirsa dihatin serê wî. Bavê wî her nifira lê dikir û pê re şer dikir. Vê bê hizûrîyê jî ku derdek nu bû li ser derdê berê du sal dewam kir heta ku kete karê şarevanîyê.

Nêzîkê salek bû li şarevanîyê dixebitî. Hêdî hêdî deynên xwe didan, têkilîya wî û malîyên wî jî baştir bûbû. Piştî wê qezayê karkirin pê zor dihat lê dîsa ji halê xwe memun bû. Di şarevanîyê de beşa karê wî hêj nedîyar bû, ji ber hindê carê wî didan ser karek. Van çend rojên dawîyê şarevanîyê wan ji bo derxistina qumê şîyandibû Çemê Sarimê ser ocaxa qumê. Vê sibehê cirkî mala xwe anî bû vir de cara pêşî bû ku bi bavê xwe re taştê kiribû û wî biribû ber otobosê. Bavê wî ji bo şîna kesukarekî wan çûbû Çewlîgê. Piştî maweyek çûbûne ser karê xwe û dest bi karê xwe kiribû.

Piştî nivroyê çend xort ji bo seyranê hatibûn ber çem û di ava çemî de avjenî kiribû. Hew dîtîbûn ku qîrînî ji aliyê xortan tê. Erqan pêşîya hemuyan de bezî bû û xwe berdabû avê, lawik derxistibû. Lê lawik bi xwe nehesiyabû. Di wê kelecane de Erqanî dest havêtibû telefona xwe ku gazî ambûlansê bike. Lê telefonê nekişandîye, ji hêrsan girtîye telefonê li erdê xistîye û ji pîyan ketîye. û êdî ranebûye.

Çiqas nas û dost hebû dihatin ber nexweşxanê û diçûn, lê hêj jî karê dozger û doktor bi term re

neqedîyabû û nedihîştin kes term rake yan jî bibîne. Li ber derfî dengê hewar hewarek hat û ji nişkave qerebalixek mezin çê bû. Dengê xuşka Erqanî bû. "Hewarê bira! hewarê bira! dê zarokên min êdî ji kê re bibêjin xalo, hewarê bira! Ji min re mebêjin mirîye! Ez ê xwe bikujim hewarê bira!" Xuşka ku ji çar biran yek jî nemabû dikir xwe bikuje. Îla digot "Min berdî ez birayê xwe bibînim! Hewarê bira!" Lê nehiştin birayê xwe bibîne û wê bi zorê ji nexweşxanê derxistin.

Bavê wî yê belengaz jî piştî çend saetan ji Çewlîgê ser hewarîya kurê xwe de hatibû. Gotin jê çenedibû. Du sal berê kurê xwe yê mezin kiribû binê herîyê; bûkeke ciwan û çar nevî mabû û çend sal berê jî jina xwe wîndî kiribû. Ji herkesî pirtir wî mirinê dinasî. Kurekî xwe di erdhêja Licê de wîndî kiribû, salek berîya erdhêjê de jî kurê xweyê herî mezin ji ber ku cixare kişandibû sîle kiribû û lawik ser wê sîleyê de zerik bûbû û çend meh paşê miribû. Piştî mirina herdu


kurên xwe digel ku halê wî xweş bû jî êdî tu car cilên paqij û nû li xwe nekiribû. Tu kesî wî dev kenîn nedîtibû. Nediçû civata însanan ne jî ji Licê derdiket diçû cîyek, heta van çend salên dawî.

Bavê bêçare xwe li kuncikek kumişandibû ser hev û hew li erdê mêze dikir. Awirê wî wîsa asê mabû û haya wî ji tu kesî tunebû.

Nizanim çiqas wext derbasbûbû, min hew dît derîyê jurê vebû, min xwe di ber derfî de kir û ez derbasî hundir bûm, çend zilam li dora term civîya bû û hin kesan tiştan dinivîsand. Tenê serê wî ji der ve bû, rûyê wî çil reş bûbû, xwîn li ser poza wî û li ser aliyekî rûyê wî hişk bûbû, çavê wî girtibû. Êdî min tiştêk nebihîst... Heşê min xumênî dikir....

Birina term de ne dengê girîne, ne jî dengê hewarê hat min. Min tenê rûyekî reş ê xwîn lê hişkbûyî diditîn. Wê rojê heta ku şev di ser min de hat min çiqas mirov dît li ser rûyên wan de xwîna hişkbûyî hebû û haya wan tu kesî ne ji wan, ne jî ji wê xwîne hebû. ■

Kent'in ışıkları



Tel: 0212 519 00 09

Ji hemû zanyar, meşayix, serok û zilamên Kurdistanê re daxûyanîyek derbarê meşrûtiyetê de

Bedûzzeman

Werger: SUAT ORAK

Ey warisên pêxember, alim û şêxên Kurdan!

Li vîr –ji navenda hikumetê– ez li we tembe dikim: Van demên dawî de, ewrên tarî yên fikra zordestîyê; rindî û bilindîya roja îslamê ji ber nêrînan veşartibû. Digel vî, ev fikra îstîbdadê wisa kiribû, qaşo îslamîyet alîyê ecnebîyan ve li ser rêya pêşveçûn, dad û azadîyê wek astengek hatibû qebûlkin. Haşa, sûmme haşa..! Lewra di warê azadî, wekhevî û dadmendîyê de pêkanînen misilmanên dewra berê, delîleke zelal e ku şerîeta xerra; azadîya mafan, dadmendî û wekhevîya hiqûqê digel hemû lazimîyên wan, di nav xwe de dihewîne. Yekrençîya mumînan li ser îbadetê mijara me teyid dike. Lewra şerîet, ji ber ku ji kelama ezelfî hatîye, wê heta ebedê bidome. Çawa ku pêxemberan bi wehyê bingeha sazûmana dîn avêtin û qaîdên wî ava kirin, muctehdan bi îctîhadên xwe hikûm jê deranîn, hûn jî van hikmên adil li gor şert û mercên zeman rave bikin, bixebitînin...

Ey leheng-xweza serok û rêberên Kurdan!

Heta niha hûn bûne peyrevên padîşah we ji nezanîna milletê îstîfade kir, bi zorî û tundî li ser gel hikûm kir. –jixwe îstîbdad û zordestî mehkûmê belav û pûçbûnê ye– hemin Padîşah pêşengê we ye, dîsa bidene pey wî. Lewra padîşah êdî dixwaze

milletê xwe bi awayek zanyarî û dadmendî bigerîne. Bi rastî evreng îdare, xwedîyê umrekî ebedî ye... Bi milletê xwe re şûna zordestî û zilmê, bi zanîn û edaletê derbas bikin. Bedel tirsandinê, evîn û hezkirinê qaîm bikin da ku serokatîya we berdewam be.

Welhasil; mîrê me* hemin kurkê xwe yê gîranbiha ji milletê xwe re şabaş kir, hûn jî wî ebaya kevn û kifikî, bi cilê edaletê re biguherînin.

Ey wekî şêrên girêdayî, zilamên Kurdan!

Heta niha hûn ji du alîyan ve hêsîr bûn: Yek; fermanên zalimane yên hikûmeta zordest, ê din, xesb û xeretên hin zaliman. Bi saya vê şoreşa mezin, hûn êdî azad in. Her yekî we di alema xwe ya taybetî de wê bibe padîşahê, bes hûnê bi fermanên adilane yên hikûmeta meşrûta û meşrû'e re îtaet bikin, tevî mafên kesên din nebin. Her yekî hûn bûn xwedî selnetekî taybet. Xîret bikin da ku ji destên we dernekeve. Bi hêz û quweta zendên xwe di rîya yekbûna gel de kar bikin û çiqas ji destên we tê, alîkarîya meşrûtiyetê bikin... Qenc bizanin ku xelasî û azadîya me, bêguman ê tevî gelên misilman, xasma yên osmanîyan bi yekbûna millet ve qaîm e.

Ey gelî Kurdan!

Çavên xwe vekin, êdî sibe. Û hişyar bin. Da ku fikrên xe-

rabkar ji nakokî û belavebûna we îstîfade neke. Cewhera yekbûna millet, di rîya nexweşîyên xwe yên beredayî de erzan nefiroşin. Nexwe hemû millet û îslamîyet wê ji we gilîkar bibe. Dem û dewran, bo tefandina dijberî û xir û cirra we, bivê-nevê wê şemaqekî li rûyê we bide. Bi gotinên we, ger hûn zêde ehlê namûs û xîret in, berî şemaqxwarinê, wan îxtîlaf û nevînan ji nav xwe de derînin. Vê yekê jî baş bizanin; medenîyetê ji çar alîyan ve we dora we girtîye. Li hember erîşên medenîyetê hûn nikarin weşeta xwe xelas bikin.

Hem bi vî peyva "weşet"ê aciz nebin. Lewra pêşî, ji nefsa xwe re dibêjim. Sûc jî ê hikûmetê ye. Tiştê ez dixwazim; namûs û rûmeta Kurdîyê biparêzin, derbarê xebat û xizmetên meşrûtiyet û edaletê de, li pey Arnavûtên leheng û egîd ve herin. Rewşa niha, ji her kesî zêdetir bi xweşî û rehetîya me re tê. Lewra zêdetirê hemû gelan, em Kurd in ji îstîbdadê zerar-dîde... Ev rojên xweş, herwekî ji me xeyidî bûn û em alîyê rabirdû ve sernişav bibûn. Mizgînî li we: Demeke herî nêzîk de, gişt mederseyên Kurdistanê wê dîsa ava bin û li derên bê medrese jî, yên nû dê vebin....Wesselam. ■

* Padîşeh Abdulhamid.

Resmên şevê

Wê çaxê bixebitin ji bo sadaqata şevê
Îmana xwe bi şevê bikin
Qelbên xwe bişon
Û wana teslimî dilê şevê bikin.

Mihail Nuayme

Sever Işık

Roj aqlî; şev qelbî ye, mekana rojê aqil e; mekana şevê dil e, roj/ronahî rasyonel in; şev/tarî îrrasyonel in, roj apolonîst in; şev dionysosîst in, roj dîdaktîk in, şev lîrik, roj epîk in; şev romantîk in, Roj gotin e; şev sikûnet e û di serî de "bêdengî" hebû gotîye Bhagavad Gita. Roj hezî ye; şev eşq e, roj kilameke bideng; şev melodîyeke bêdeng û aram e. Roj beden e; şev ruh e. Roj dîtî; şev veqetî û lêgerî e.

Roj şehwet; şev hesret in.

Şev dem dijwar a bi tirs e, di mabeyna rojhilînê/zayînê û rojavayî/mirinê de. Şev wexta bêden-gîyê, melankolîyê, mirina munbît, kûrfikirîn û hîskirin û bihîstî-nê ye.

Şevê! Parestgeha bê ser û bin. Xanîyê bê derî, lîman û benderan kaçaxcîyan, behra tarî, veşara evîndaran.

'Xeyalê şevê yê bi tirs mabeyna erd û esmanan tijî dîke

Bi feryad û fixana xwe şev, kilameke bi jan e û diherike rojê.

Sultan bi şev textê xwe

terk/wenda dîkin.

Behr bi şev radikevin/diwelî-din.

Dayik bi şev lorîna dibêjin.

"Fahîşe bi şev kemîna vedî-din. Bakîre bi şev dibîşirin."

Gunehên bi roj tîn bikaranîn bi şev tîn îtirafkirin.

Tabîet bi şev îbadeta xwe di-ke. Hebûn di hembza şevê de ra-dikeve û xwe dihebîne.

'Gerek e însan mîna şevê bîn mîna şevê kûr, mîna şevê fireh, mîna şevê kûr, mîna şevê bê-deng'

Gelo şeva ku em behsa wê di-kin derîyê xwe li her kesî vedike.

Ma melodîya şevê yê tenik her kes dikare bibihîse?

Gelo şev ji hemû kesên xwe dispêrên hembêzê re dostekî sa-dîq e?

Şev tual e herkes dikare res-mên xwe bi qelemeke spî li ser rûyê şevê çêbike.

I. ÎXANET/ÎLLEGALÎTE Pares-geha tirs û şadîyan, dema ji nû vebûna kul û xeman, bir û hêvî-

yan, paşeroj û pêşeroj e şev. Bi şev xeyal bi azahî bi per dibin bi hewa dikevin, difirin, dil xwe bi jana dihebînin, hêvî derdikevin rêwîtiyê, hezî, kîn, nefret, xurur û îxanet şev bi serbestî kuç kolanan dadigrin, zeht dikin. Bi şev dil dibin yek, her tişt dûrî qanûnan tê dengê. Wekhevîyeke îllegal hummê xwe didomîne.

Wexta zeîfketina qanûnan e şev. "Ev mazeretekî muthîş e ji bo îxanetê" gotîye şair. Hemû qaçaxê qanûnan bi alîkarî û hevalîya şevê îllegalîte îcra dikin; milîtan ji kozika xwe, evîndar ji cîyê/nivîne xwe derdikevin. Qaçax û xaîn bi şev li ser karê xwe ne û parestgeha şevê, bi hemû zagon û duzenan re henek û tinazên xwe dikin. Fahîşe bi dilekî rihet xizmeta xwe pêşkeşî ketîyan, zewqger û zenpereyan dikin. Qatîl bi destê şevê karê xwe bi cih tînin. Bi kurtebirî gunehar gişkî li benda medeta şevê ne.

Şev wexta bazara îqtîsada guneharîyê ye. Hemû însan şexsîyeta xwe rast, bin tarîfiya şevê de xuya dikin, ya di dilê xwe de aşkere dikin. Îxanet/îllegalîte/xerabî rûyê şevê yê yekemîn e.

Şev/tarî çendin bi tirs bin jî, qasî roj/ronî ne bi tirs in; lewra hemû parestvanê sisteman bi roj li ser pîya ne; esker û artêş ji bo êrîşê berbangê dipên. Hukûmdar hukmê xwe îcra dikin. Zagon bi roj çêdibin, îcra dibin. Însan bi roj li qîşle û dibistan û zanîngehan hînî mirin û kuştinê dibin.

Şev ku parestvan dikevin xewê wekhevîyeke dijwar hukmê xwe didomîne ku qral û kole dibin yek û sazîyên îktîdaran tîn sabotekirin. Wekhevîkirin halekî şevê ye. Şev hemû îxaneta vedişêre.

Şev wexta raketina sistemê ye. Sîstem di xew de ne; qereqol, polîs, artêş, ekser, fêrmend, pat-



Şev wexta raketina sistemê ye. Sîstem di xew de ne; qereqol, polîs, artêş, ekser, fêrmend, patron, karker, wezaret û îbadetxane. Îktîdar çendîn bi hêz dibe bila bibe, nikare bi temamî nufûzê şevê bike. Qaçaxê qanûnan, revok, ticarê zewqê, bazirganê jahrê û hemû beşdarê cûre jîyanên qedexê bi şev neşv û nema dibin. Ji bin erdê derdikevin, di bin veşarî û kufra şevê de dijîn.

ron, karker, wezaret û îbadetxane. Îktîdar çendîn bi hêz dibe bila bibe, nikare bi temamî nufûzê şevê bike. Qaçaxê qanûnan, revok, ticarê zewqê, bazirganê jahrê û hemû beşdarê cûre jîyanên qedexê bi şev neşv û nema dibin. Ji bin erdê derdikevin, di bin veşarî û kufra şevê de dijîn.

Şev hîyerasî tune dike. Ku roj ronî diqulibe ser şevê, kolan û mekan gişkî dibin yek.

II. MELANKOLÎ halekî şevê ye wexta gurubê melalîyê di paşîla xwe de diguhezîne. Rojavayî remza payiza umr e. Soringa bergehê; sorîya gewez; dem dawîya

jînê! Melankolî rêhevalê payiz û pelg weşanê ye. Ê hemû weşan, ketin, hilweşîn bi huzn in/melankolî ne.

Melankolî demek wusa ye ku, bi şev tiştê di bin hay û huya rojê de terka jîbîrbûnê bûyî û hatine qewitandin, û di çerqa heyata bê merhamet de hatî hêrandin, tiştên di derî re hatin qewitandin, di bace re bi şev diherikin hundir, derdor seranser îhata dikin.

Benîadem bi şev ji wesf û statûyan dûr e, însan bi şev rût û repal e, şev merzel e. Bi ten û tin/bi can û ruh însan bi şev tena serê xwe ye, muhasebeya heyatê bi şev tê dayin.

Roj monolog, şev dîyalog e. Dîyaloga ruhî ye. Însan dikare bi saya wê dakeve kûrahîya ruhê xwe û tiştê dilê xwe derxîne berava jînê.

Melankolî resmeke şevê ye
Melankolî halekî eşqê ye; ev hal çî xweş li ehlê şevê tê.

Şev straneke melankolîk e; ev strana aramî di dil re diherike çoleke ebedî û bêbinî.

Şev dema melalîyêye ya helbestvan û hesretkêşane, kemala bêferhengî û hêvîya dilketîyane. Wexta şevê şair û dilketî bi yelkena tarîfîyê cilê arzuyan li xwe dikin, noqî kurahîya heyatê dibin. Di behra bi pêl de mîna kaşîfeki serkeft bi qazınca xêr û bereket, bi morî û mircan vedigerin roj ronahîyê.

III. BEDENGÎ seîfonîya şevê ye. Zimanê şevê, zimanê bêdengîyê ye; şev lal in, "gramera bêdengîyê." şev, muzîka bê kelîme ye, zimanê dar û ber, teyr û tuyur, giha û tabîetê ye. Divê gemar û zengarê ji dil û çavan û guhan çekin wê melodîya bêdengîyê guhdar bikin. Divê em guh bidin bangdana şevê, dengê şevê ku ji xwezîyên bihurî, ji dilinîyên şikestî, ji hêvîyên pak, ji xeyalên saf, ji ava bin lingan re diherikî, ji berf û baranên barî, ji roja bi tîn, balindeyê difirî, ji nebat û heywanetan bilind dibe, ji hemû tiş-

tên zîkra xwe bêdengî dikin bilind dibe û diherike dil.

Bêdengî ruhê melodîya şevê ye. Şev dema melalîyê ye ya helbestvan û hesretkêşa ne, kemala bêferhengî û hêvîya dilketîyane. Wexta şevê şair û dilketî bi yelkena tarîfîyê cilê arzuyan li xwe dikin, noqî kûrahîya heyatê dibin. Di behra bi pêl de mîna kaşîfeki serkeft bi qazınca xêr û bereket, bi morî û mircan vedigerin roj ronahîyê. Gerege ehlê şevê qîmeta şevê û pahaya wê zanîbin. Şev medcezîra dilê muedîbane; Roj ya taciran; şev ya şairane.

Roj şixûl; şev rawestane, roj çavê dibinî; şev guhê guhdar e, dilê hestyare. Şev dostekî wefadar e razan vedişêre, ser xerabîyan digre roj gelek bedewîyan vedişêre şev aşkere dike, mahîtab û stêrk xemla şevê ne û dibin kufra rojê de nayên xuyakirin. Şemala asîman bi şev xuya dibin.

Şev demên me yê nînsanî ne lê her ku diçe em êdî şeva ji wenda dikin. Talankerî kapîtalî şev ji îşxalkirin. Talana wextê êdî karekî bi qazinc e. "Bazirganê wexta vala/boş" şev bi dest xistin.

Em koleyê ji bo hilbirinê/îstîhsale hatin formatkîrin, bi roj ji bo debareke derew direvin, dibezin, dikevin, dimirin, her tişt ji bo meşandina duzen e. Li şunkar her tişt tabîyê îznî ye; xwarin, vexwarin, çûyin-hatin, rabûn-rûniştin. Hasbihal û muhabbet bi şev mumkun e. Roj ya patrona ye, loma jî em li hêvîya şevê ne ya, mixabin faalîyetên rojê êdî şevan ji îşxal dikin. Îktîdar dixwaze, kar û bar, hal û hewal, zewq û janê, dîmen û bergeh, rengê rojê biguhezîne şevê; çunkî îktîdar ji şevê hez nake. Dixwaze ku nufûze her derê bike. Şev; dema rawestî nê ji koleyê çêşa endusrîyalî re serbestî û azadî ye. Koleyê nûjen

ancax bi şev dikarin xan û mana xwe, zar û zêçên xwe bibînin, lê binêrin û hembêz bikin.

Roj dema pêşbazî û reqabeteke dijwar e û ev pêşbazî mîna aşekî rih û bedena însan dihêre.

IV. MIRIN şeva heyatê ye. Însan bi şevê mana mirinê dibihîse û dihese. "Heyat şerabeke ku bi qedeha mirinê tê vexwarin." Jîn ji mirinê re rê ye. Şev halekî mirinê ye.

Şev xwedî adalet e, him sul-tan him kole di hembêza şevê de radikevin û eynî xewnê dibînin. Mirin halekî şevê ye; çunkî mirin mehkemeya jîyanê ye û muthîş bi edalet e, 'li welatê mirinê, qral û kole eynî mesafê dibînin', li eynî cihî disekin.

Heyat bi roj dewam dike, lê bi şevê mana xwe dibîne. Û jîn bi mirinê qaîm e. Hema mirin bi tirs e jî, çunkî qîyameta heyatê ye. Mirin ji ew resmên şevê yek e ku bi edaleta xwe ya dijwar bi xof e.

Herkes bi mirina xwe dijî. Eger ne mirin bûya maneya tiştê nedîma. Evîn, lêgerîn, rêvîngî, endîşe, şer û aşî, roj û şev, debara dinyayê, barbarî û însanîyetî... hwd tiştên heyat pê qaîm û muhîm, bi hebûna mirinê digihêjin maneya xwe; mesela mirin tune bûya însan tiştêk wenda nedikir û li pê tiştêkî nedîrevîya. Jîyan bi saya mirinê dimeşe; lewra însan dixwazin berî mirinê bijîn.

– Mirinê xwe bi rengê şevê pêçandîye,

Şev halekî mirinê ye
Mirin halekî şevê ye
Şev halekî jînê ye
Jîyan halekî şevê ye. ■

Wendayîyên mirov an gera li dûv xwe

Zübeyir Çoban

zubeyircoban@hotmail.com

G

er...

Ger nebe eger...

Eger însan li xwe negere...

Û mîrov ser xwe de vene-
ger...

Macera/serborîya însan bi gerê dest pêkir. Lewra bav û dîya me Adem û Hewa di şûna xwe de nesekinîn. Xweda sînorek da ber wan û bi zimanê hîkmetê ji wan re got "evan welatê min e. Li kêfa xwe bimeyîzînin. Min ji we re her tişt serbest kir. Lê li dora dara qedexe negerin. Ez dizanim hûn xwedî nefis in û çavê nefisê tim li xirabîyê digere."

Mixabin, bav û dîya me ji wî emrî xeflet kirin û rêyeke nû li ber xwe û zarokên xwe vekirin. Û Xweda ji wan re got "we hîkmeta min û masûmîyeta xwe wenda kir, biçin welatekî min ê din li wendayîyên xwe bigerin."

Rê li ber wan wenda bûn. Bi salan li hev gerîyan. Wan him hevûdu him jî efva Xweda dîtîn. Lê hevûdîtina wan nebû dawîya gerra însan.

Însan çiqas zêde bûn wendayîyên wî jî ewqas zêde dibûn. Û ji mîrovê ewil hetta mîrovê dawîyê gerreke bêsekin dest pê kir.

Li pir tiştan gerîyaye mirovatî. Hinek li Leylayan, hinekên din li Mewla gerîyane. Berê xwe dane cîh û qîtaên kifş nebûn hinekên din. Bi zîmanê hîkmet û felsefê bi şopa mirovahîyê ketine kesên xwedî meraq. Li dû mal û milk gerîyane gellek kes. Şeytan bi dû mal xirabîya însanan ket. Pêxemberan umrê xwe di şopa filitandina însanan da qedand.

Mirov li dû armanc û wendayîyên xwe dikeve rê û şopa. Çine wendayîyên mirov? Mirov dikarin bêjin ecêp wendayîyên xwe?

Her kesek gora xwe wendayîyên wî hene. Hinek li dû zarotîya xwe digerin. Xwe dikşînin nav hesaban û de'wê li xwe dikin. Bi pirsan li dora jîyanê digerin û dikolin, digrîn, xwe kaşê ber neynikan dikin û li rûyê xwe ê gunehkar dimeyîzînin û de'wa rûyê zarotîya xwe a masûm li neynikan dikin. Dûv re fam dikin ku neynik kerr in, dengê wan li cama neynikan dikevin û şûn de vedigerin.

Hinekan li dû kêfxweşî û şahîya xwe û malbata xwe jîyan ser û binî kirine. Şev û roj ji bona wan direvî, dikevî, radibe, dişu-

xili û digerî. Mixabin ya bi bêwe-fayîyê ji wê xewê şîyar dibe, yan jî bi fanîtîyê. Lewra tiştêk di qerara xwe de namîne û dibedile, diguhere, dimire, diçî ji destê însên. Yan qedr û qîmetek heq dike nabîne ji wan, yan jî têra wê hezkirin û wefayê nake zeman an jî jîyan.

Kesên din di şevan de bi tenê-tîya xwe re tenê dimînin, xîyal û xewna tevlihev dikin, hêsirên çawa diherikînin hundirê xwe. Bangî hêvîyên xwe dikin û li ber xwe kom dikin. Mîna zarokên sêwî dibîne hêvîyên xwe û yek bi yek destê xwe di serê wan didin. Hinekan re dest bi axaftinê/qisedanê dike û wan xurt dike, hinekan jî ji jîyana xwe derdixe û ber-bê tinebûnê bi rê dike.

Kesên din weke şivanekî piçûk, çawa li berxa xwe a wenda digere kerî bi kerî, bi tirs û hêvî, wiha digere li dû bîr û bawerî, kesayetî û armancên xwe.

Îsmail tî bûbû û bi girîyê xwe digerîya, Hecer bi şefqeta xwe li çola. Rihma Xweda bû zemzem û ser wan da barî.

Weke Musa, ji bo qewmê xwe lî Tûrî Sîna digerîya li dû Rihma Xweda. Heta vegeerîya Harun digirya. Lewra qewmê wî li Xwedakî di digerîya.

Dibêjin gerr, bi eslê xwe çûyîna li dûv Leylayê ye. Herkesek gora xwe Leylakek wî/wê heye. Û her wisa Leylaxa min jî.

Ecêp mirov dikarin ji xwe re bibin Leyla an jî na?

Ger bersîva vê pirsê min "na" be, ev çax Mecnûnbûna min jî tesdîq dibe. Lewra Mecnûn xwe têke şûna Leylayê êdî tu şek namîne ji bo bêhişbûn û dîn bûna wî. Min wer fam kir kû ez Mecnûn im.

Mîna zarokêkî di tarîtiya şeva imrê xwe de li listikên xwe ê

wenda bigere li xwe digerîyam.

Li pey xwe dîgerim tim, şev û roj, bi xew û di şîyarî da

Rastê şopa xwe natîm rojekî Qet lî tî dera

Leylaxa xwe ez bûm û li xwe digerîyam. Lê min xwe di rê û şopên qewmê xwe ê bê xwedî da dît. Lewra min li kûr mêze dikir rêyên me û qedera me bi hevra di têkilîyê de bûn. Ev têkilî bi şikilî wisa bû min xwe nikarîbû ji gelê xwe cudakirana û tenê bihesibandana.

Şûndamayîna min bi bindestîya gelê min re, tirsên min bi zordestîyên li ser wî re, xewnên min bi xîyalên wî re û derbên zarotî-

Şûndamayîna min bi bindestîya gelê min re, tirsên min bi zordestîyên li ser wî re, xewnên min bi xîyalên wî re û derbên zarotîya min ên kû li ser min heta niha bi tesîr in, bi birînên wî re tevlihev bûn.

ya min ên kû li ser min heta niha bi tesîr in, bi birînên wî re tevlihev bûn.

Kul û kederên min ên min diqaîlî bû ez pêra baş bikim û ji ser xwe rakim, tu nabêjî xwîna ku ji birîna welatê min diherike û axîna êşên welatê min e ku ez jî mîna her ferdekî qewmê xwe di bin bandora wan birîn û axînan de mabûm.

Heyfa ku îro ez/em di vî halî de mame/mane. Rêç û şop naskirin bi serê xwe karekî mezin û grîng bû li ba min. Lê qest û mebest a min ji gerê ne lêkolînek

kevneşopî an jî naskirina kal û bavan e. Di nav pelên dîrokê de kesayetî ya min û gelê min wenda ye. Naxwe mîna hinek sosyolog û dîroknasan nîşan dane, ger gelê min di wexta xwe de medenîyeteke qedîm îxraç kiribe çima îro ewha mîna pezek gêj xwe her carê di kêra şivanekî dide, yan jî her carê xwe bervê gurekî dikîşîne.

Fam dibe kû Mecnûn ne ez tenê me di vê çolê de. Lewra çolên ez bi mecnûnîya xwe tê da wenda dibûm de li hinek avîyan/vahayan rast dihatim. Weke Mela, Feqî, Xanî, Nehrî, Berzençî, Bedirxanî, Barzani, Şêx Seid, Seidê Kurdî û her wiha bi hezaran kes li dû vê wendayîya me çûne û qasêk rastê şopa hatine ji bo kesên mîna me li dû wan diçin, di wan rêyan de wenda nebe nîşanên mezin danîne.

Min nikarîbû hemû nîşan bixwandana. Hima qasêk xwandana min qîm dikir fam dibû ku wan rêberan wan pîştaran wiha bangê pêçûyen xwe dikirin;

Heyvek e çardê royî bû evîna me

Keçek e çarde sali nav fedîyan de

Xîyalek e hezar sali û xewnek e bê dawî

Evîna Mem çawa di zîndanê de kemilî

Zîn wisa bi derda xemilî
Ger tu Mecnûn bî li çola
Her derekê te dibe Leyla

Her derekê min Leyla.
Leyla dibarin ji jorda
Leyla êrişê min dikin ji der û dorda

Li vir Leyla
Li wir Leyla
Û Leylaxa min a mezin
Te navê xwe dît yan na
Min li her derê kola...■

Nan

Wolfgang Borchert*

Ji Almanî: E. Akın

Ew ji nişka ve ji xew rabû. Seet dudu û niv bû. Ew li wê fikirî, ka çima ew ji xew rabû. Ha, belê! Li mitbaxê yek li kursî qelibîbû. Wê guhên xwe li mitbaxê girt. Her der bêdeng bû. Gelek bêdeng bû û gava wê destê xwe li ser nivînan gerand ferq kir ku ew vala ye. Ev tişt bû ku evqas bêdengî çêkiribû: Girtin û dayîna bêhna wî. Ew rabû pîyan û di tarîya malê de xwe kişand mitbaxê. Ew li mitbaxê rastî hev hatin. Seet dudu û niv bû. Wê tiştêk spî li ber dolaba cemedê dît. Wê devûdor ronî kir. Ew bi kirasan li ber hev bûn. Bişevê. Seet di dudu û nivî de. Li mitbaxê.

Li ser maseya mitbaxê tebaxa nan hebû. Wê dît ku wî ji xwe re nan jêkirîye. Kêr hê li ber tebaxê bû. Û li ser tebaxê jî hûrikên nan hebûn. Gava êvaran ew diketin nav cîyan wê hertim pîneyê masepaqijkirinê dişuşt. Êvaran. Lê niha li ser wî pîneyî hûrikên nan hebûn. Û kêr li wê derê bû. Wê hîs dikir ku sermaya fayansan bi wicûda wê re hildikişîya jorê. Û wê berî xwe ji tebaxê wê de kir.

Wî got "Min got qey tiştêk li vir bû" û li mitbaxê li devûdorê

xwe mêze kir.

Wê got "Hinek deng hatin min jî" û pê re jî ferq kir ku ew di kiras de gelek kal xwîya dike. Di salê xwe de. Şêst û sê salî. Biroj carna ew cîwantir dixwîya. Ew fikirî, ku jina wî gelek pîr xwêya dike, di kiras de ew gelek pîr xwêya dike. Belkî ji ber porên xwe weha dixwîyê. Jin bi şevê ji ber porên xwe pîr dixwîyên.

"Diviyabû te sol bikira nigên xwe. Were¹ tu pêxas î li ser fayansan. Tu yê bicemidî."

Wê li wî mêze nedikir, ji ber ku wê nikarîbû qebûl bikira ku ew derewan dike. Ku ew piştî sî û nehsalîya zewacê derewan dike.

Wî cardin got "Min got qey li vir tiştêk bûye" û bême'ne ji koşeyê dizivirî û li ya din mêze dikir û digot "dengê hat min. Min got qey li vir tiştêk bûye."

"Dengê hat min jî. Lê waye tiştêk nine." Wê tebax ji ser maseyê rakir û hûrikên nan ji ser rûyê maseyê paqij kir.

Bi dengêkî ji xwe ne bawer wî ew gotin cardin got: "Belê, wayê tiştêk nine."



Wolfgang Borchert

Ew hat alîkarîya wî: "Ka lo were. Ew li ber derî bû. Ka lo were nav cîyan. Tu yê niha sermayê bistînî. Li ser fayansên sar."

Wî berî xwe bi pencereyê ve kir. "Belê, rast e, ew ji derve bû. Min got qey li vir e."

Wê destê xwe bir şartêla ronîyê. Ew fikirî ku divê ew niha lambeyê vemirîne, were nebe wê ewê cardin li teboxê mêze bike. Wê got "De were lo! Çirik² di bayê de li dîwar dixîne" û pê re lambe vemirand. "Miheqeq çirik e. Wexta ba hebe, ew tim dihece." Di tarîyê de wan xwe gîhandin odeya raketinê. Nigên wan ên tazî şelpînî ji erdê dihanîn.

Wî digot: "Erê, ba bû. Bişevê ba dihat."

Gava ew di nav nivînan de bûn, wê got: "Erê, şevê pê de ba dihat. Bi ihtimalek mezin çirik bû."

"Erê, min got qey li mitboxê bû. Bi ihtimalek mezin çirik bû." Wî bi dengê ku mîna ew di xew de bû ev tişt digotin.

Lê wê ferq dikir ku dengê wî çiqas bi zîz dihat, gava wî derew dikir. Wê got "Çiqas sar e, divê ez xwe têxim binê orxanê. Şeva te bimîne xweş" û hêdîka bawuşk hatinê.

Wî jî got "Ya te jî" û dewam kir "Erê, îdî gelek sar e".

Dûv re bêdengîyek çêbû. Dû gelek deqîqeyan deng hat wê ku ew bêdeng û bi dîqet dicû. Wê bi zanebûn bêhna xwe kûr û yekoyek digirt û dida, ji bona ku ew pê nehese ku ew hê hişyar e. Lê cûtina wî ewqas tabî bû ku ew li ber di xew re çû.

Gava rotira³ dinê ew hat malê, wê çar kerîyên⁴ nan zêde da ber wî. Heta wê çaxê wî sirf sê

kerî dixwar.

Wê got "Tu çar kerîyan bixwe" û pê re ji ber lambeyê xwe da alî. "Ev nan xweş min naçe. Tu yekî zêde bixwe. Xweş min naçe."

Wê dît ku ew serê xwe bi ser teboxê de xwar dike. Wî serê xwe bilind nedikir. Di vî wextî de gunehê wê bi wî hat.

Wî bêî ku serê xwe bilind bike got "Tenê du kerî nan? Du nikarî tenê du kerî nan bixwi!"

"Tabîî kî. Êvaran nan li min nayê. Tu bixwe lo, tu bixwe."

Encax du gelek wextî re wê li ber maseyê li hinda lambeyê cî girt.

**Wolfgang Borchert nivîskarekî almanî ye. Ew di sala 1921an de li bajarê Hamburgê hatîye dinê û di 1947an de li Baselê mirîye. Di xortîya xwe de ew kitêbîroş û dû re jî leystikvan bû. Ew di sala 1941an de wek leşker tevî şer bû. Ji ber hinin îfadeyên di mektûbên wî de ew li leşkerîyê wek tehdît hate dîtin û heşt mehan di hepsê de ma. Dû re bi îdamê hat mehkûmkirin û cezayê wî bi şertê ku ewê sirgûnî Rusyayê bibe hate te'cilkirin..Di sala 1945an de bi nexweşiyên kronîk ew şûnda hat Hamburg a xerabbûyî. Demekî ew wek asîstanê rejîsorîyê xebitî, lê nexweşiyê pêşî ji wî ber neda. Ji bona ku ew tedawîyê bibîne, dost û hevalên wî ew şandin Îsvîçreyê. Lêbelê ew gelek derengî ketibûn: Nexweşîya wî îdî gelek giran bû. Ji bo nivîsandinê sirf du sal mabûn. Wî kurteçîrok û eserên tîyatroyê nivîsand. Di eserên xwe de wî tesîra şer ya li ser însanan hanî ziman. Gava qala kurteçîroka almanî ya li dû şerê cihanê ye duduyan dibe navê W. Borchert bi Heinrich Böll, Siegfried Lenz û gelekên din ve miheqeq tê gotin.*

Ji wêjeya devkî du çîrok

Dilşad Mutî

Necar û Mîrê Botan

Dibên demekê Mîrê Botan li necarekî hate xezebê û jê xwest ku ew di rojekê de heft bar ardê xîzarê çêbike. Mîr ji necarî re got, heke ew heta sibê vî karî pêk neyne, wê serê wî bête jêkirin. Li gor îmkanên wê dewrê ev yek di şevkê de ne mîmkun bû. Her çi qas necar li ber xwe bida jî, qey di rojekê de barek ardê xîzarê pêkbanîya. Necar dêhn dayê ku ev yek nemîmkun e. Ji lew bêhêvî û bi xem berê xwe da mala xwe.

Dema çû malê pîreka wî wekî her şev şîva wî jê re hazir kir û anî danî ber. Lê dêhn dayê ku zilamê wê qewî bêmade û li xwarina xwe şabî nake. Ew jî kete meraqê û ji zilamê xwe pirsî:

–Mêriko Xwedê xêr bike, ev îşev çî hewale te ye, tu welê bêmad î? Derdek te heye. Divê tu ji min re bêjî.

–Hermet wallahî hal û mesela min û mîr ev e. Ger ez heta sibê daxwazîya wî pêk neynim, serê minê bêjêkirin.

Pîreka wî ya bi aqil û bîrbir hinekê bi xwe de hesand û pişt re li zilamê xwe vegerand:

–Necar! Razê wekî hercar. Heta sibê mîr dimre, dimîne evdal.

Lê kengî xewa necêr tê. Tîrsa mirinê zehmet e.


Hinga sibê di fecra sibehê de, den-

gê tep-repa lingê hespên eskerên mîr tê, necar ji xem û xeyalên xwe hilvecinîqî û tîrsa wî lê mezintir bû. Li derfîdin dixwazin ku necarî bi xwe re bibin. Berî ku derî vekin necar ji pîreka xwe re dibêje:

–Hermet wallahî eva eskerên Mîr hatin ku min bibin. Xîlasîya min nîne. Ez dixwazim ku tu heqê xwe li min helal bikî. Emanet zarokê min.

Necar hazirîya xwe dike û derdikeve ber derî. Dema ku necar derdikeve, eskerên mîr dibêjin:

–Necar, mîr. Divê tu bi lez tabûtekê ji mîrê me re çêbikî.



Dersek ji Behlûl

Tê gotinê ku rojekê Behlûl dixwaze kurê xwe yê ber bilûxê bi darsa heyatê perwerde bike û dibêjyê:

–Kurê min, hespê xwe ji cîyê wî derîne û bi cil û kurtan bike da em hinekê ji xwe re li dinyayê bigerin.

Kurê wî ya bavê xwe dike û hespê xwe hazir dike.

–De bi hefsarê hespê xwe bigire û bide peyî bavê xwe. Û baş guhê xwe bide ser dinyayê kurê min.

Behlûl û kurê xwe ji mala xwe rê digirin û berê xwe didin welatên bîyanî.

Hinga di nava gundekî re diçin, dinêrin ku komek însan wê li ber dîwarekî ji xwe re civîyane û sohbet girtine. Berî ku Behlûl di ber wan re bibûre, kurê xwe tew-

sîye dike da ku baş guhê xwe bide ser wan. Silav li wan dîkin û di ber wan re dibûrin. Dengê wan tê ku ji hev re dibêjin:

–Hûn dibînin ku însan çawa ye. Fêrsekî hespa bi wan re ye. Lê dil nahêlin li hespê xwe siwar bibin.

Hinga ku ji gund derdikevin Behlûl dibêje:

–Kurê min te dengê wan kir? Vê şitexaliyê biêxe guhê xwe de û jibîr neke. De ka îcar were em li hespê xwe siwar bibin kurê min.

Herdu li hespê xwe siwar dibin û berê xwe didin gundekî dî. Eynî bi wî awayî dêhn didinê ku dîsa komek ji gundîyan li ber dîwarekî ji xwe re civîyane û sohbet girtine. Behlûl û kurê xwe bi siwarî wan silav dîkin û di ber

wan re dibûrin. Hinga di ber wan re dibûrin dêhn didinê ku dengê wan tê ku dibêjin:

–Ka li van meyzênin! Qey qet tirsan van ji Xwedê nîne? Herdu tirtirê mêra çawa li wî feqîrê heywan siwar bûne.

Hinga ji gund derdikevin Behlûl dibêje kurê xwe:

– L a w ê

min vê gotinê jî biêxe guhê xwe. De ka vêcar ezê peya bim û tu li hespê xwe siwar bimîne.

Kurê Behlûl li hêsp siwar û Behlûl jî bi hevsarê wî û girtî berê xwe didin nava gundekî dî. Dîsa dinêrin civatek ji gundîyan vedayîye û silavê li wan dîkin û di ber wan re dibûrin. Dema ku di ber wan re dibûrin dengê wan dîkin ku yê dibêjin:

–Dêhna xwe bidine van însanan. Yê xort û law li ser piştê hespê keyfa xwe dike û ew feqîrê dî bi wê îxtîyarîya xwe ve hefsarê hêsp jê re dikişîne û bi ling dimeşe.

Çaxa ku ji gund derketin, Behlûl ji kurê xwe re dibêje:

–Kurê min, vê gotinê jî biêxe serê xwe. De ka vêcarê tu peya bibe û bide hefsarê hespê xwe, de wekî van camêran gotî bavê te yê kal hinekî ji xwe re siwar bibe.

Behlûl siwar û kurê wî bi hefsarê hespî girtî û berê xwe didin gundê li pêşîya xwe. Hinga di nava gund re diçin, dimeyzênin ku dîsa hinek gundî li derekê ji wan ji xwe re civîyane. Silav li wan jî dîkin û di ber wan re derbas dibin û diçin. Wextê ku ji wan derbas dibin guh didin dengê wan ku dibêjin:

–De ka li van binêrin. Ev nehîte mêra çawa ji Xwedê natirsê ku li hesp siwar bûye û tîfalê feqîr xulamîya wî dike û bi pîya hefsarê hespî jê re dikişîne.

Ji gund derketin û Behlûl bang dike kurê xwe.

–Te dît lawê min. Me çawa kir, me nikarî ji gazind û gotinên însana xilas bibin. Yanî kurê min, meriv çawa bike, her hinekên, ji derekê, kêmasîyekê ji meriv re çêbikin.”■



Doxtorê însan, pisporê zeman: Seîdê Nursî

Nevzat Eminoglu

Derheq sedhejmarîya Nûbiharê de çend gotin

Nûbihar. Hêvîya Ahmedê Xanî. Tovê ku Xanî reşandibû.

Nûbihar. Wesîyeta Bedîuzeman Seîdê Nursî.

Lewra ewî, halê zimanê Kurdî, rewşa edebîyata Kurdî ya bêxwedî û perîşan didît û digot, "bêxwedîtî ya zimanê we, gilî yê we, li welatparêzîya we dike."

Piştî gelek salan ew tov şîn bûn. Bi sedan fêkî dan. Ew şîret hatin cîh. Li ziman hate xwedî derketin. Bi Kurdî meala Quranê ya pîroz derket. Jîyana Pêxember hat nivîsîn. Kitêbên hedîsê li Kurdî hatin wergerandin. Risale yên Nur tercumeyê Kurdî bûn. Klasîkên rojava rojhilat, refên pirtûkxana Kurdî xemilandin...

Nûbiharê, xebatkarê wê bi dil û can pîroz dikim. Bi hezar canî pîroz dikim. Dîrokek dan destpê kirin. Dîrokek hat nivîsîn.

Ew hêvî û wesîyet pratîze bûn. Fêkîyên cûrbecûr, reng û reng gihîştin. Bûn bax û baxçe û bostan. ...

Ji paşerojê, deng û sedaya

"henîen lekum/ noşî can be. We pîroz dikim." hat.

Ji ber ku Nûbihar di alîkî de encama wesîyeta Bedîuzeman e, gelo me ew û zanyarî ya wî ya mezin bi başî da nasîn. Lewra digel miletê Kurd û umeta Îslamê, di vê dewra medenîyet û modernîteyê de, alema însanîyetê jî pir û pir muhtacê tespît pêşniyarên wî yên ilmî û însanî ne.

Heyf û mixabin ku ew çareserî yên wî yên giring, me bi temamî li alemê neda nasîn.

Adeta, me ew û mesajên wî yên alemgiştî, di nav îxtîlaf û keşmekeşî û kêmasîyên xwe de, veşartî hîşt.

Lewma hin taybetî û nêzîkta-yîyên orijinal yên Bedîuzeman û Risaleyên Nur dixwazim bi xwendevanên Nûbiharê re parve bikim. Da ku di vî warî de bibe gavek û pêngavek nu.

Mijara sereke û bingehîn: însan

Zana û alîmên dewra zaroktîya Seîdê Nursî, ji ber gotin û tewrê wî yên xarîqe, jê re gotine **Bedîuzeman**. Yanî xarîqeyê ze-

Li gor Bedûzeman, sê terîfdar û delîl hene ku rebbê me, bi me didin nasîn. Ji wana yek însan û kaînat e. Herdukên din jî, yeka wî Qurana Kerîm a Pîroz e û ya din jî pêxemberê me Hezretî Muhammed eleyhîs selat û wesselam e.

man, bêmislê zeman. Îcar gava merîv kitêbên wî Rîsaleyên Nûr dixwîne û mitale dike, mijarên ku li ser sekinîye û bi awa û nêzîkbûna li meseleyan, tê xuyan ku ew û Rîsaleyên wî, bi rastî **dixtorên însan in û pisporên zeman in.**

Mijara serekeya ku ustad li ser sekinîye însan e. Mahîyeta însan, daxwazên însan, tirs û endîşeyên wî, aql û qelbê wî, ruh û heyata wî. Yanî hemû mijar li ser însan dizivire. Belê zanist û ilmê modern her der keşif kir, fetih kir. Lê keşfa însan bîra kir. Hemû tabîat û feza bi kitkîte lêkola. Lê însan hê jî meçhul e. Wek mûammakî li holê ye. Ji bo lêkolînê sahaya herî bakîr, dest lêneketî dîsa însan e. Ya ecêb, ya herî girîng jî însan e. Lewra însan mifte û dendîka her tiştî ye. Ku însan were nasîn, rastîya her tiştî dertê holê, zelal dibe. Ustad Bedûzeman însan wek fêkî û navenda kaînatê terîf dike. Bi nasîna însan destpêdike. Nasîna însan, kirye bingeha lêkolîna xwe. Ne ku maddeya însan, goşt û hestîyê wî. Bereks li ser taybetîyên ku însan ji hebûn û zindîyên din vediqetîne, hûr û kûr di-sekine. Li ser aqil, qelb, wijdan,

hest, ruh...Profesorek evê taybetîya Bedûzeman awha tîne ziman: "alîyê Seîdê Nûrsî yê herî girîng, îlhama xwe ji Qurana girîng, dewra xwe û problemên zemanê xwe rind naskirîye, çav-nêrîyekî baş kirîye û meseleyên xwe **sipartîye rastîya însan.**" (Prof. Dr. Abdullah Özbek Selçuk Unîv. Uluslararası Bedûz-zaman Sempozyumu, İstanbul)

Belê meseleyên xwe dispêre rastîya însan, lewra însan li ber çava ye, delîlekî şênber e. Însanê vê dewra modern bi piranî tiştê şênber diha rind fehm dike. Tiştê rîwayet û neqil, insanê dewra me ya ku teslîmîyeta wî şikestîye, pir îkna nake.

Li gor Bedûzeman, sê terîfdar û delîl hene ku rebbê me, bi me didin nasîn. Ji wana yek însan û kaînat e. Herdukên din jî, yeka wî Qurana Kerîm a Pîroz e û ya din jî pêxemberê me Hezretî Muhammed eleyhîs selat û wesselam e. (Gotina Nozdehan) Ji van hersên terîfdaran ya ku bi bingehîn û piranî li ser disekine, însan û kaînat e. Lewra însan digel kaînatê delîleke şênber û objektîf e. Gava delîl û nîşan, li ber çavan û objektîf be, encama ku ew delîl bide nîşandan, rastîya

ku ew delîl tîne holê, rasyonel e û ji subjektîvîzmê dûr e. Ev delîla ji herkesî re, çi dîndar, çi bêdîn, çi musulman, çi nemusulman, carî ye. Ji herkesî re eynî ye. Wek mînak: Bedûzeman di cihkî de awha dibêje: "ku çav sen'et bibîne, çavên basîretê/aqil senetkar nebîne pir xerîb û gelkî nexweş dibe." (*Mesnewîya Nûriye*) Him, ji şênberê çûyîna encama neşênber, bêhtir muqnî ye. Lewra ji sebebên ji bûyeran diçe encamê. Yanî "tumevarim e" ne "tumdengelim e." Aqil dikare teqîb bike, bişobîne. Ji bo herkesî eynî encamê dide. Derbarê vê rêbaza han de akademîsyenekî awha dibêje: "Seîdê Nursî merivekî wusa ne ku bi êş û elema heywanên mesûm re jî elemdar û xemgîn dibe. Qasî ku ez dibînim di tarîxa fikrîyata Îslamî de belkê qe tu eserek bi qasî Risaleyê Nur bi kaînatê re, bi "alîyê wê yî estetîk" re ku felsefeya dîn wek "delîlê estetîk" bi nav dike, bi nêzîk ve eleqedar nebûye." (Prof. Dr. Mehmet Aydın. Dokuz Eylül Unîv. Sempozyuma nav derbasbûyî.)

Bedûzeman awha dibêje: "ev kaînat, ev alem kitêbeka mezîna a menîdar e. Însan jî fêkîyê dara evê hebûnê ye. Melum e ji ber ku fêkî perçeyê darê yê herî hêja û yê herî ji kokê dûrtir e, taybetî û xasyetên hemû perçeyên darê di xwe de dihewîne. Her wuha dendîka ku armanca bingehîn ya çêkirina alemê jî, dîsa însan e." (*Asayê Musa. Meseleya Heftan*)

Ustad gava însan terîf dike, ew bêkesî û meçhûlbûna li ser însan radibe, şaşîti û bêxwedîtîya li ber însan wenda dibe, aql û ruh û qelbê însan nefes hildide. Lewra ustad li ser pîrsa ku li her

derê û her demê û aniha jî aqlê her însanî ji xwe dipirse û meşxul dike, disekine dibersivîne. Pirsar "ez kî me, çi me? Ji ku tîm? Di-çim ku?". Ew çax aql û fikrê însanê ku dinav lêgerînek dijwar de ye û nizane li ser çîye û ber çîye, bi bersîva maqul ya van pirsan, tê ser hemdê xwe. Di kaînatê de rade û rola xwe dibîne, hîn dibe. Paşeroj û pêşeroja wî rohnî dibe.

Li gor wî "însan ayetel kubraya evê kaînatê ye. Yanî di kaînatê de nîşan û navend e. Însan nusxekî wusa camî ye, yanî dendikeke bi bergeh e ku Xwedê Teala hemû navên xwe bi însan dide zanîn.

Însan weke dendikekê ye. Li wê dendikê ji qudrêtê cîhazên manewî û giring; ji qedere programên zirav û hêja hatîye dayîn.

Însan di alîyê tevger û kirinê de û di hêla xebata maddî de heywanekî zeîf e û mexluqekî aciz e. Lê ew însan di alîyê înfîal û qebûl û dua û sual ve, di vê xana dunyayê de mêvanekî ezîz e.

Însan muhtacê pir tiştên li kaînatê ye û bi wan ve eleqedar e. Îhtîyaca wî li her derê kaînatê belav bûye. Daxwazên wî dirêjî he-ta ebedê bûne.

Însan di vê kaînatê de dişibî-he/dimîne zarokêkî pir nazîk û nazenîn. Di zeîftîya wî de quwetek/hêzeke mezin û di aciztîya wî de qudretek mezin heye. Lewra bi quweta ewê zeîftîyê ve û bi qudrêta ewê aciztîyê ve ye ku ev mewcudat musexerê (berdest, bi nemr) wî bûye.

Him madem em bi çavê xwe dibînin û bi aqlê xwe fehmdikin/têdighêjin ku însan fêkîyê vê dara kaînatê ya herî dawî û here bibergeh e û ayeta herî mezin/kubra ya Qurana kitêba kaînatê ye û mêvanê here mukerem û muhterem yê koşka kaînatê

Însan weke dendikekê ye. Li wê dendikê ji qudrêtê cîhazên manewî û giring; ji qedere programên zirav û hêja hatîye dayîn.

ye". (Gotina Bîst û Sisêyan)

Evana çend numuneyên piçûk in ku derheqê nêzîkbûna Bedûzeman ya li însan de, wek dilopek ji deryayê ye. Da ku ji bo ên Bedûzeman tam nexwendine û nizanin re, fikrêkî bide, di vî warî de bibe rêbertîyek. Lewra ê serwest re/arif re îşretek bes e.

Metoda nêzîkbûnê: îkna û zanistî

Çawa mijara wî ya bingehîn însan e, herwaha awa û usula wî, rêbaz û metoda wî jî însanî ye, ciwanmêrî ye. Yanî ilmî ye, zanistî ye; bi hîkmet e, bi hezî ye/şefqet e. Dîsa di vî warî de awa dibêje: "Ji ber ku însan fitraten/di xulqîyeta xwe de, muke-rem e/pîroz e, li rastîyê digere. Carna batil dikeve destan, heq dizane û di hembêza xwe de vedîşêre. Gava heqîqetê dikole, bêhemdê wî, dalalet dikeve ser qafê wî; wek rastî/heqîqet zen dike, dike serê xwe." Li gor wî, ji ber ku însan ezîz e, lazim û şert e ku awayê nêzîkbûna li însan, bi hezî be, bi muhebet be, bi îqna be. Di vî warî de awa dibêje: "Însan fitraten medenî ye, serkeftina li hember medenîyan, bi îknayê ye. Wek hovên ji gotinê fehm nakin

bi zorê nîne." (Îctimaî Dersler)

Pêşketina zanistê û teknîkê gelekî giring dibîne û zef qîmetê didê. Evê pêwistîyê awa tîne ziman: "Aferim ji xîreta perwerdeya kêrhatî û xebata fen û zanistên jêhatî re...Ku bi meyla lêgerîna rastîyê û hubba/hezîya însanîyê û nêzîktayîya bi însaf, derxiste holê. Astengên li hemberî rastîyê zîr û zeber/belawela kir û dike." (Muhakemat)

Rêbaza Rîsaleyê Nur, nezîhane û nazikane û qewlê şîrîn e. Em fedayîyên muhabetê ne. Ji dijminatîyê re wextê me tune ye." (Lema'lar, Makaleler) Akademişyenekî ku li ser wî lêkolînên giring kirîye awa dibêje: "Seîdê Nursî di nav mutefekîrên Îslamî de, yek ji pêştatîrîn kesên xwedî giranî û kurahî dihesibînim. Ne mumkun e ku meriv, ew **hurmet û hezîya însan** ya kûr ku bi fikrên Bedûzeman ve tîne, nebîne. Awayê tekoşîna Bedûzeman ne bi tekoşîna çekdarî ye. Bedûzeman merivekî ciddî ye ku li ser mijarên ciddî hûr dibe. Kûrahî û serfirazîya Bedûzeman ya sosyolojîk, di fehmkirina wî ya xezîneya dînî û çandî ya Îslamî ya dewlemend de kom dibe. Hilbijartina min ya Bedûzeman wek mijara

bîyografîyekê, qasî ku ji bo firehî-ya asoya fikrî ya wî ya Îslamî ye, problema evê dunyayê berîya yê din hemuyan femkirina wî ye.” (Prof. Dr Şerîf Mardin Amerîkan Univ. ABD. Sempozyum...)

Li gor wî, tiştên însan ji mexluqên din cihê dîkin, aqil û wijdan e. Derbarê tiştên ku van herdu hestên însanîyên bîngêhîn, dighîne rastîyê de awha dibêje: “tava /nura aqil, ilmê fen ne. Ronahîya wijdanê, ilmê dîn e. Bi hevrebûna/yekbûna herdikan, rastî dertê holê. Gava ji hev veqetin, ji ya ewil hîle û înkâr, ji ya din jî korekorbûn û teasub dertê.” (Munazarat)

Tê xuyan ku ilm û zanistê ji bo destxistina rastîyê lazîm û şert dibîne. Him jî wek armanc û taybendmendîyek însanî destnîşan dike. Ew di vê derbarê de awha dibêje: “Her tişt li gor mahîyetê, girêdayî ilmê ye. Armanca hatina însan ya li vê alemê, pêşketina bi ilmê û dua ye. Helbet mirovahî wê dawîya dawî de birîje ilm û fennê. Wê hemû hêza xwe ji ilm û zanistê bigre. Hukm û hêz jî wê bikeve destê ilmê.” (Gotina Bîstan û Bîst û Sisêyan)

Li hemberî hînbûna bi ezberê ye. Dijî teqlîdê ye. Lewra ezber û teqlîd, ji neşuxulandina hiş û fikrê derdikeve. Ji pasîvbûna aqil tê. Ew dibêje ku: “Em ehlê hal in. Namzedên îstîqbal in. Yanî em însanê vê demê ne. Ber bi pêşerojê ve diçin. Teswîr û xemilandina îddîayê, me têr nake. Em delîl dixwazin.” (Muhakemat)

Di Munazaratê de jî awha dibêje: “Bêyî ku mîhengê xin, tu gotinekê hilnedin. Lewra gelek gotinên qelp di ticaretê de digerin. Kes nabêje dewê min tirş e. Qe tu nebaşek nabêje ez nebaş im. Xwe alîyê heq dide nîşandan. Heta gotinê min jî, ji ber ku min

gotîye, bi husnê zen wusa bi temamî qebûl nekin. Nexwe her tiştê te gotinê, rê nedinê ku têkeve dilê we. Li mîhengê xin.” (Munazarat)

Di kitêba *Mektubatê* de gava pîrsa wek: “çima di Risaleyên Nurên ku te ji Qurânê nivîsîye de, hêzek, bandorek heye ku di gotinên mufesîr û aliman de nadinê heye?” dibersivîne, awha dibêje: “ji ber ku ew şeref aîdê Qurânê ye û aîdê min nîne, bê perwa dibêjim ku belê bi piranî wusa ye. Lewra gotinên ku hatine nivîsîn, teqlîd nîne tehqîq/lêkolîn e. Dewa nîne. Digel de’wê, delîl e. Yanî meseleyan tenê îddîa nake, bi tevî îddîayê îspata wan jî dike.” (Mektubat)

Gotinên xwe bi zanistî, aqlên û hîkmeten îspat dike. Di vî warî de jî, bixwe gelek bawer e, bi însaf e. Mesela di Gotina Dehan de, heşrê, yanî saxbûna piştî mirinê li gor aqil û mantiq îspat dike. Paşê bangî yê bi aqil û objektîf tevdiagerin, dike û wuha dibêje: “Ger bixwazî hatina axiretê, wek hatina biharê bi awakî qet’î fehm bikî, li Gotina Dehan û Gotina Bîst û Nehan’ ya derheq axretê bi dîqet binêre, bibîne. Ger wek hatina biharê bawer nekî, were tilîya xwe çavê min re ke.” (Gotina Dehan) Di cîhkî din de jî awha dibêje. “Rîsaleyê Nur, muşterîyan nagere. Li ber wan nagere. Aqilê wan hebe, ewê bigerin bibînin. Him divê ew lava bikin.” (Lema’lar)

Bedîuzeman bi Rîsaleyên Nur tenê bangî musulmana nake. Tenê bangî bawermendan nake. Muxatabê wî, her kes e. Muxatabê wî, **însan e**. Çi bawermend, çi bêbawer; çi musulman, çi xeyrî musulm. “Rîsaleyê Nur dibêje, kî dubî bila bûbî; binêre, bibîne. Tenê çavê xwe veke. Rastîyê tema-

şe ke. Îmana xwe ya ku mifteya seadeta ebedî ye, xelas ke.” (Kas-tamonu Lahîkas)

Wuhareng bangî baqilan, bangî zanyaran dike. Bes ku însan be, bes ku aqilê wî hebe. Lewma îro pirtûkên wî her derê dunyayê tên xwendin. Li pirê zîmanê dunyayê yê sereke hatîye wergerandin. Li zêdetirî 40 zîmanê hatîye tercumekirin.

Bi vê gotina wî ya menîdar ya bi Farisî dixwazim nivîsa xwe biqedînim: “Pes kunem çûn, zîra keen ra însan bes est. Bangê dî gerdem, eger der dîh kes est. Yanî ji bo yê baqil, gotinên min bes in. Min bangê gund kir, şayet li gund yê ku dengê min bibhîsin hebin...” (İçtîmâî Dersler) ■



Ronekbîrê kolikê Hecî Uzêr

Remzi Çakın


Apê Hecî ku xwendina xwe li Mekê qedand şunde, dîsa zivirî welatê bav û kalan Kolikê.

Hecî Uzêr Efedî di sala 1900î de li êrdima Semsûrê (Adiyaman) li gundê Narincê hate dinê. Niha Narince nahîya Kolikê/Kahta ye. Apê Hecî di salzarokîya xwe de li cem Hecî Efedî* dest bi xwendinê kir. Apê Hecî jî wek her kurdê sunî, bi alîyê Mislîmanîyê ve girêdayî Dewleta Osmanî bû. Lê, Dewleta Osmanî, ji serhildana M.Kemal şunde hat e xwar. Komara Tirkî a nû bi ser ket û hêdî-hêdî siyaseta xwe ya nû bi kar anî. Di nav şoreşa komara nû de şoreşa şebqê jî hebû. Bi vê şoreşê kum, egal, fes, çarşef, hatin rakirin û qedexekirin. Ên ku li xwe nekirin an hatin cezakirin, an jî derwelat bûn. Ji ên ku derwelat bûn, yek jî apê Hecî Uzêr bû. Apê Hecî, bi bawerî û têkilîya Hecî Efedî çû Misrê, li Unîversîta el-Ezherê, îlmê Îslamî xwend. Dû re hat Mekê li Cimata Îslamî xwendina xwe berdewam kir. Ku li wir jî xwendina xwe qedand şunde, di sala 1954an de vegeftîya Tirkîyê. Li cihê û warê bav û kalan, li Kolikê jîyana xwe berdewam kir.

Ez dixwazim bi kurtî hinekî Kolikê bidim nasîn: Kolik qeza

bajarê Semsûrê ye. Kolik cîhekî dîrokî û kozmopolîtîk e. Çîyayê ku roj herî baş lê hiltê û diçe ava Nemird an jî bi navê gel Çîyayê Bêlî (Nemrut), Şikeftên Pîrînê, Medenîyeta Hevpar, a ku Med, Pers û Makedonan damezirandî Konê Gîyan (Komegana Medenîyeta) ên li Kolikê ne. Li Kolikê sê eşîr bi cih bûne. Eşîra herî mezin Reşî ye, du re Mirdês û Bêzik tê. Ev her sê eşîr jî Kurd in. Eşîra herî mezin Reşî e. Di nav eşîra Reşî de 16 eşîrên pûçîk hene. Ev eşîrana hin Sunî, hin jî Elewî ne. Bê van eşîran, kêm be jî, Ermenî û Suryanî hene. Di nav gel de, ji van re dibêjin "File" (gawir). Lê niha ew malbatên file hemî bûne Mislîmanên sunî. Ji wan malbata, pir malbat, ji Mislîmanan hîn zêde Mislîmanên sunî ne. Lê feqet ev malbatana çawa hatine wî halî ev jî meseleke ker û lal e.

Apê Hecî ku xwendina xwe li Mekê qedand şunde, dîsa zivirî welatê bav û kalan Kolikê. Lê, li ber şebqê çû, bi şewqê hat nav gelê Kolikê. Gelê Kolikê bi rewşa nû gelek ecêp ma. Apê Hecî, di demeke kurt de rewşa xwe ya



Ez bawerim di navbera 1950î û 1960î de çavêşek giran di nav gel de peyda bûbû. Gelek mirov jî, ji wê êrdimê kor bûn. Ji bo wê, korên Semsurê bi nav û deng in. Apê Hecî bi îlacê xwe yê çava, ev bela giran jî li ser Kolikîyan ve derbas kir.

nû di nav gel de bi cîh kir. Apê Hecî bi malbatên File û Elewîyan re dostanîya xwe danî. Qe-dir û qîmeta wan hîn zêde kir. Navê lawê xwe yê yekem kir Îsa, navê qîza xwe ya yekem jî kir Meryem. Ev raman û dîtina apê Hecî, di nav gel de jî cîh girt û bû dîtinek nû. Çima ku apê Hecî di nav gel de him alîmekî dîn, him dadmendekî heqîyê, him aqilmendekî herî bilind, him loqman û hekîmê gelê belengaz, him jî kurdekî bi dilê gel bû.

Apê Hecî Kurdî, Erebî zanîbû, lê qet Tirkî nizanîbû û qet jî hîn nebû. Şêxîfî, axatî, pozbilindî qet nekir û qebûl nekir. Destê xwe, an jî cilên xwe nedan paçkirin. Bê malbata vî tu kesî destê wî zatî paç nekir. Rojekê li

çarşîya kolikê apê Hecî destê xwe dane paş piştta xwe bi rê diçe, jinek jî, bi dizî paş ve destê wî maç dike. Apê Hecî vedigere, destê xwe dirêjî wê jinê dike û dibêje: "Aha pê de jî.....!"

Apê Hecî, ji xocetîyê pirtir, ji bo gel gelek nexweşîyan re îlac çêdikir. Îlacê çava, îlacê mîdê, îlacê kulan, îlacê şewatê, îlacê serêşê û gelek êş û nexweşîyên din re îlaç. Wî zatî ji tu kesî pe-re negirtin. Gelek mirovan jî fêyde ji wan îlacan dît û xweş bû.

Di navbera 1950î û 1960î de çavêşek giran di nav gel de peyda bûbû. Gelek mirov jî, ji wê êrdimê kor bûn. Ji bo wê, korên Semsurê bi nav û deng in. Apê Hecî bi îlacê xwe yê çava, ev bela giran jî li ser Kolikîyan ve derbas kir.

Apê Hecî, him li mala xwe, him jî li gelek malan rudinişt û cimata top dikir. Lê, li mala axa û began rûnedinişt. Li şûna wî, li mala fileyan, mala Elewîyan, mala feqîrê çavtêr û sekmanê masîya bû. Di wan cimatan de, zêde-zêde meselên jîyanê dihatin xeberdan. Apê Hecî ji gel re ramanên xwe dianîn ziman. Gel jî, pê bawerî dianî. Ez bi bawerî dibêjim eger apê Hecî bixwesta, pir hêsanî kanîbû bibûya şêxekî pir murîd û dewlemend. Lê, ne di jîyana xwe de, ne jî li dûv xwe tişteki zêde nehişt.

Apê Hecî li Kolikê cîranê axayê eşîra Mirdês Hecîsusivê bû. Axa rojekê mewlîdê dide xwendin, bangî apê Hecî jî dike. Apê Hecî diçe mewlîdê, lê tasa xwe ya şerbetê jî bi xwe re dibe. Axa dibêje, "apê Hecî ev çîye? Ma tas li vir tunebûn ku te ev tasa bi xwe re anîye." Apê Hecî bersîva axê dide: "Ez dizanim ku tas li mala te hene, lê feqet, ez di tasên we de şerbetê venax-

wum. Ez hatim mewlîda te, çima ku tu cîranê min î. Lê feqet, we pir zulim kir. Ji bo wê fêra-xên we heram in."

Apê Hecî, dar û pagên ku di nav gel de bûbûn zîyaret jî hemî xira kirin. Ew darên ku rizîn hemî qut kirin û anîn zivistanî şe-witandin. Êdî zarok jî, bê tirs derdikevin wan cîh û waran. Apê Hecî, li himber şêxên ku, xwe re murîd çêdikirin jî derket û xebat da. Bi gotina: "Hûn siftê xwe xilas kin, paşê vî gelê bê heş xilas kin" Apê Hecî li himber Şêxê Menzîlê jî derket û xebatî. Ji bo rûmeta wê xebatê Şêxê Menzîlê di nav gelê Kolikê de zêde murîd nedîn. Ez naxwazim Şêx di vê nivîsînê de bidim nasîn. Bila ew jî, wêna Zan be. Tenê ez bêjim ku şêx ji derve hate Kolikê.

Apê Hecî têkilîya xwe bi şoreşgerên Kolikê re jî xweş bû. Şoreşgerên Kolikê jî gelek qedr û qîmet didan apê Hecî. Wê demê şoreşgerîya rêxistina Kawa, li Kolikê û li gundê der û dora Kolikê xurt bû. Mînaka ku ezê bidim, li wan gundan, yekê derbas bû.

Dawetek şoreşgera dibû li wan gundan yekî, Apê Hecî jî di nav xilatwana de hate wê dawetê. Dawet, ji dawetên berê cûdatir, bi kilamên nû û kevn wek serhildanekê bi coş derbas dibû. Leşkeran ji derê gund, dawet bi dûrî ve çav dikir.

Êvarî, ji şivê şûnde, cimat, li gore salên xwe li çend malan top bû. Cemaeta me xorta, li mala Awikê, cemaeta kalan jî li mala xwedîyê dawetê top bû. Apê Hecî, siftê di nav cemaeta mala xwedîyê dawetê de bû. Kalkê pêşgirê gund şorê digre dibêje:

—Apê Hecî daxwazek me ji te heye.

Apê Hecî dibêje:

—Bêjê weko

—Apê Hecî em camîya gund çêdikin, lê ser vekirî ma. Çima ku perê me bes nekirin. Gundî jî êdî pere nadin. Ku tu ji me re li nav gund bigerî, gundî yê peran bidin.

Apê Hecî bi hêrs bersîva wî dide:

—Ma weko ez tahsîldarê te û mizgeftê me, ku ez ji te re li nav gund bigerim û ji bo mizgeftê peran top kim. Perê we bes nekirin ser bi axê bigrin, bila ên dûv we re jî axê rakin, ser bi çimentoyê bigrin. Xêr, ji bê we kesî re lazim nabe. Gundîyên feqîr, ji bo min rizqê zar û zêçên xwe bide camîyê.

Ji ber wê daxwazê ku camîya gund dihat çêkirin, xortên gund jî dixwestin ku di çêkirina mizgefta gund de bişixulin. Lê wî kalî nedihîşt ku xort bişixulin. Çima ku xort şoreşger bûn. Xorta, pêşnîyarek dianî ji kalê re, madem ku em qomînîst in, hûn bi me re tev naşixulin, rojekê hûn bişixulin, rojekê jî em bişixulin, lê kalê ev pêşnîyara jî qebûl nedikir. Apê Hecî jî ev mese-la kalê bîhîstibû. Apê Hecî bi hêrs radibe ser xwe, dibêje, "weko yêk min birin mala Awikê Komûnîst." Çiqas ku cimat dibê na jî, apê Hecî hat mala Awikê.

Li mala Awikê jî hemî şoreşger kom bûne û li ser şoreşgerîya welat xeber didin. Bi qîmeteke giran cimata şoreşgera, apê Hecî dan serê cimatê. Apê Hecî wek zaneyekî Marksîst, bi şoreşgeran re kete peyivînê. Zêde-zêde şoreşgera pirs ji apê Hecî dikirin. Apê Hecî jî bersîva wan dida. Pirsra giran û dîrokî, li ser damezirandina Kurdistanê bû.

"Apê Hecî tu xebata Kurdîstanê çawa dibînî û ê çawa bi

serkeve?"

Apê Hecî bersîv da:

"Ez li ber soreşa şebqa M. Kemal çûm, mala Xwedê Mekê, min Unîversîte jî li wir xwend. Min karîbû li wî welatî hîn jîyanek baş derbaske. Lê min şebqa da serê xwe ez hatim welatê xwe. Ji bo çi?"

Ji bo welatê xwe. Dîsa ku min bixwesta, minê Tirkî hîn kir, ezê di warê dîyanetê de bihatama cîhyekî bilind. Lê min nekir çima? Amîn Maaloof bersîvê dide: "Ji hêla dagirkeran ve, zimanê gelê ku bindest kirî hînbûn hunerek e. Bi hêla gelê bindest ve, zimanê dagirkeran hînbûn lê daxistin, heta îxanet e." Min zanîya xwe hemî ji bo gelê Kolikê xerc kir. Ez Tirkî nizanîm û bi Erebbî jî xeber nadim. Ne dostê axa, şêxa û mirovê hikmatê me. Ez dostê feqîra û mirovê baqilim.

Hûnê çawa bi serkevin:

"1-Hûnê bawerîyê, bi xwe bînin û li ser hukmê xwe sîyaseta xwe bi rêxin.

2-Hûnê di tu şertan de, zulmê li feqîr û belengazan nekin.

3-Hûnê heqîyê, li ser neheqîyê çênekin.

4-Hûnê li dijî cemaetê, jîyanê saz nekin, Jîyana we û rama-na we bila yek be.

5-Hûnê sîyasetê: li ser karê, nezaniyê, feqîrîyê çênekin.

6-Bila têkilîyê we bila ê bi şexsiyê bin.

7-Kerî nekin û kerî nebin, pozbilindîyê ji bo gelê xwe nekin, kes nabe dêya mirovan, mirov jî, dîyaka xwe nade kesî, dîya te çi ji te re hiştîye, ew ê te ye.

Weko bê vê, xebat bi ser na-keve."

Ez niha li van gotinan mêze

dikim, niha jî gotinên apê Hecî rastîyê xwe qorî dikin. Wê çaxê, em zêde li ser van gotinan nese-kinîn. Çima ku em Marksîst bûn, apê Hecî ne Marksîst bû. Gelek tişt hene ji bo apê Hecî ku mirov binivîse, lê ez pêşerojê de dixwazim li ser apê Hecî lêkolîneke dirêj bikim. Dîsa jî ez dixwazim apê Hecî bi du mînakên kurt sax kim.

Apê Hecî sekmanekî masîya-yî baş bû. Lê torê pêvtir qet seyda masîyan nedikir. Rojekê dîsa diçe ber çemê Kolikê masîyan, mêze dike ku mirovekî dinamît avêtîye masîya, masî hûr-mezin hemî bi ser avê ketine. Apê Hecî dibêje: "Weko va ne seyd e, ev gû xwarinî ye."

Li paş 12ê îlona 1980ê bû, ez li lîseya Kolikê nefî lîseya Amedê bûm. Ez li Amedê digirim, min lawê apê Hecî Îsa dît. Me hev xêrşayî anî, min pirsî: Xêr be Îsa? "got xêr e, Hecî baba lingê xwe şikand, min ew anî nexweşxaneyê." Ez û Îsa tev çûn ba apê Hecî. Apê Hecî, li malekê mîvan bû. Min bi desta girt silav kir, wî jî ez xêrşayî anîm, li bavê min pirsî û ez li kêleka xwe rûniştandim. Wê maweynê de çend kesên ku ez jî nas dikim hatin wê malê ba apê Hecî. Ew kesana, îşte dostê apê Hecî yê "file" bûn. Nav xwe de pere top kiribûn, ji bo nexweşîya apê Hecî. Gelek pere bûn. Apê hecî ew perena qebûl nekirin. Bi rica û minet, bi vî babetî qebûl kir. "Bila perê we ê li virbin ezê herim nexweşhanê ku çiqas pere lê çûn ezê xerc kim, ên ku li berman jî hûnê dîsa di nav xwe de parve kin"

Apê Hecî di sala 1997ê de çû ser heqîya xwe. Xwedê rihmeta xwe lêke, şûna xwe cenet be. Apê Hecî, hîn ku wefat neki-

ribû, wesîyeta xwe li kurê xwe kiribû.

Min bibin Narincê defin kin, dorhêla qîwa min jî şîn nekin, bila wek tirba, ê edetî û îslamî be. Tirba min nehêlin ku bibe zîyaret.

Niha gora apê Hecî, wek wasîyeta xwe li Narincê ye. Ne zîyaret ne jî ê bi çîn e.

Apê Hecî heta ku çû ser heqîya xwe, bi meaşa xwe ya xocetîyê diligê xwe kir. Di navsalfîya xwe de kulfeta (jina) xwe mir. Çû dişa/baltuza xwe hanî ser za-

rokên xwe. Ji herdu xwayîngan 4 zarokên xwe hene. Niha lawê xwe Îsa wek bavê xwe xoce ye, li gundekî ku tu xoce lê nas kin. Wek bavê xwe welat parêzekî baş e. Zarokên din ez zêde nas nakim.

Şûna apê Hecî, li Kolikê tim û timê tal e. Bi xwe çû lê kirê xwe, rastîyên xwe hîn di nav gel de germ in.

* **Hecî efendî:** Li êrdima Kolikê de alîmekî paqîj e. Şêxîti nekir lê mirovê ku diçin vî derî ne hindikin. ■

Alî û Zehra di betlanê de

Rojbin Özkan

B

i Navê Xwedayê Mezin

Di bajarekî de xwişk û birayekî hebû. Diçûne dibistanê û dema betlanê hatibû. Alî û Zehra sibê zû rabûn taştê xwarin dayikan wana ji herduyan re got:

–Eger ku qarnên we serkeftî bin emê we bişînin kîşwerza¹ bapîrê we.

Paşê jinikê zarokên xwe bi rêkir. Zarok çûne dibistanê. Ji momostayên xwe qarnên xwe girtin.

Mamoste:

–Ez bi serkeftina we gelek serbilind im.

Alî û Zehra bi kêfxweşî hatin malê. Qarnên xwe nîşanê dayik û bavê xwe dan. Bavê wan:

–Emê sibê we bişînin ba bapîrê we.

Bû sibe Alî û xwişka xwe çûne kîşwerza bapîrê xwe. Kîşwerzê de gelek heywan hebûn. Alî û Zehrayê di bajêr de ewqas heywan nedîtibûn. Li kîşwerzê hesp, ker, mirîşk, pisîk, kûçik, pez û gelek heywanên din hebûn. Zehra û dapîra xwe her sibê diçûne pînikê hêk di-anîn, Zehrayê ji mirîşkan gelek hez dikir. Alî jî car cara bi bapîrê xwe re diçû camîyê û kêyfa wî gelek ji nimêjê re dihat.

Rojekê muxtarê gundê cîran hate mîhvanîya wan. Ji bapîrê zarokan re got:

–Sibê gundê me ve navbera zarokan de emê pêşbazîyekê² bafirokan çêkin ez dixwazim herdu neviyên te jî werin. Ba-

pîrê wan bang li Alî û Zehrayê kir û got:

–Hûn dixwazin têkilê wê pêşbazîyê bibin.

Alî û Zehra wisa şabûn, wê şevê ji şabûnan qet ranezan. Sibê di wextê elinde Şîyarbûn. Bi bapîrê xwe re bafirokekî çêkirin. Zehrayê ji bapîrê xwe re:

–Kalo eger em di vê pêşbazîyê de serkeftî bin tuyê çi xelatê bidî me?

Bapîrê wî got:

–Bexika min divê berê hûn serkeftî bin, ezê xelateke sûrprîz bidim we. Herdu zarokan bafiroka xwe girtin û bi bapîrê xwe re çûne gund. Bîst zarok beşdarê pêşbazîyê dibûn. Mamosteyê werzîşê jî amade bû.

Alî ji xwişka xwe re got:

–Înşallah emê vê pêşbazîyê bigrin.

Mamoste bang li zarokan kir:

–Zarokên hêja hemû werin vêderê.

Zarok hemû hatine ba mamostayê xwe. Paşê zarok di rêzekê de rawestîyan û pêşbazî bi fitika mamoste dest pêkir û zarokan bafirokê xwe bilind firdan. Bapîrê Alî û Zehrayê gelek bi kelecana neviyên xwe temaşe dikir û dilê xwe de dua dikir. Bafirokên reng bi reng di asîman de difirîyan. Alî û Zehrayê tevê zarokên li dû bafirokên xwe ketin. Mamoste bafirokan rind temaşe kir; dît ku waye na va bîst zarokan de bafiroka Alî û Zehrayê bilindtir bûye û dûr çûye bang li za-



rokan kir û got:

–Zarokên delal berî her tiştî ev pêşbazî ji boy kêfxweşiyê bû boy beşdarîya we ez gelek spas dikim. Emê we hemûyan xelat bikin lêbelê xelata mezin boy hevalê we Alî û Zehrayê re ye.

Paşê zarok ketine rêzê destê ma-mostayê xwe ramûsandin û xelata xwe girtin. Alî û Zehrayê jî xelata mezin girtin. Paşê bi bapîrê xwe re hatin kêşwerzê. Zehrayê bi lez pakêta xelatê vekir, lê mêze kirin du heb kêruşkên zindî hebûn. Zehra û Alî bi kêfxweşî herdu kêruşk girtin hambêza xwe.

Dapîra zarokan jî neviyê xwe pîroz kir û ji mêrê xwe re got:

–Emê çi xelatê bidine zarokan! Mêrik kenîya û bersiva xêzana xwe da:

–Tu qet meraq neke min xelata zarokan zû de amade kirîye.

Alî ji bapîrê xwe pirsî:

–Kalo te wî wextekî kurt de çawa

xelat amade kir?

Bapîrê wî:

–Min û pîrîka we berîya hatina we ya wira ji we re hinek dîyarî kirîbûn. Niha wextê dayinê ye. Piştî peyva mêrik pîrîka zarokan du pirtûkên ku qala jîyana Hezretî Muhammed (a.s.) dikir da zarokan. Alî û Zehra gelek spasîya kalik û pîrîka xwe kirin.

Roj û şev li pey hevûdu derbas bûn. Herdu zarok vê dema betlanê de gelek wextên xweş derbas kiribûn. Rojekê bavê wana hat kêşwerzê zarokê xwe bibe bajêr. Ji zarokên xwe re got:

–Dema vebûna dibistanê hat. Eger hûn bixwazin ezê her sal we bînim vira.

Zarokan:

–Em jî dixwazin hemû betlanên xwe li ba bapîr û dapîra xwe derbas bikin, digel ku em li vir pir bextiyar in.

Paşê Zehrayê herdu kêruşk anîn nîşanê bavê xwe da û got:

–Babo ez dixwazim kêruşkan bînim bajêr.

Bavê wî bersiva keça xwe da:

–Bexika min tu û kekê xwe diçine dibistanê wextê we namîne; ji ber vê yekê mixabin em nikarin kêruşkan bibin bajêr; tu hez dikî emanetê pîrîka xwe bike heta salekê dinê ewê ji te re xwedan bike.

Zehrayê li pey peyva bavê xwe, ji dapîra xwe re:

–Pîrê tu ji kerema xwe re li keruşka me xwedan bibî.

Dapîra wî daxwazîya neviyê xwe qebûl kir.

Paşê bavê wan got:

–Wextê çûyinê hat. Herdu zarokan destê dapîr û bapîrê xwe ramûsand û xatîr xwestin. Bapîrê wan ew ramusan Alî û Zehra di dibistanê de gelek serkeftî bûn û di nav civakê de jî pir dihatine heskirin. ■

Çûk û sofî

Seyda Ronahî

Dem demeka gelek zû da
 Di çaxa pêxember Silêman da
 Yekî bi rîh û şaşik,
 Li xwe kiribû cubekî xweşik.
 Dimeşîya bi rê da mîna bawermenda
 Çûkek jî diçêrîya ji wî wê da
 Çûkê got: Vayê hanê ku têye;
 Yan mella, yan şêx, yan sofî ye,
 Ez nafirim ew tada li min nade,
 Ku min bibîne ê rûyê xwe bade.
 Ku hate nêzîk, tu nabe ku di dest wî da
 Kevirek hebû, û li çûkê dada
 Çûkê zor zorî xilas kir rihê xwe,
 Firîya çû cem Silêman kir gilîyê xwe
 Silêman zanîbû bi zimanê teyr û tû
 Got: Ji min ra wayî weynin vir zû...
 Ferman rakir pêxember Silêman
 Ku ji derdê çivîkê ra bibe derman
 Girtin hanîn cem pêxember,
 Qey tu dibêjî ewaye serbaş û rêber.
 Silêman got: "Te çima kevir avêt li çûkê
 Te lingê wê şikand ji kokê?"
 Sûcdar bû nikarîbû bide bersiv
 Çûkê ji êşa lingê xwe dikir çîve çîv.
 Hz. Silêman fetwa da got: "Hûn jî bînin
 Lingê wî jêkin li ber çûkê deynin..."
 Çûkê got: "Ez qebûl nakim;
 Bi şikandina lingê wî dilê xwe şa nakim
 Bînin biqusînin riha wî,
 Jê deynin şaşik û cibbê wî,
 Bira bi halê wî kes bawer neke
 Qisas ji min ra ne lazim û ne gerek e."
 Herkesî şora çûkê baş dî
 Rêya sofî û rewşa wî şaş dî.
 Cibbe û şaşik jê dakirin,
 Porê wî qusandin rîyê wî kur kirin.

Got: "Niva kes bila pê nexape,
 Va mirovekî xayin î dilxirab e."
 Em jî bi pirîyan gelekî xapîyan
 Xelk li heyvê, em mane bi çarpîyan,
 Ku em bigirin ji me ra pir baş e,
 Çivîkê da me derseka belaşe...



Evîneke Zor

Gülistan Çoban



*W*enda me li çîyayê hesretê
Li vî welatê sar
Li vê zîndana tarî
Li van şevên esaretê

Tu bîra min tê
Û xatirxwestinek bêdil
Tu bîra min tê
Û çavên şîl
Tu bîra min tê
Û gulîyên bêgul

Bûme rêwîyê kanîya nemira
Bûme siwarê li dû nameyeke wenda
Li du çîlkên hêstir digirim
Hatîye veşartin

Di nav rûpelan de
Dengê te dihat
Ji dilê şevan
Pir sal û zeman
Wek xewn û xîyalên bi mij û dûman
Lê hatim nehatim negîyam te
Çi menzîlek dûr
Çi birînek kûr
Çi evînek e zor bû tu...

Wefata

M. Îsmet Kiliçaslan

windahîyek e ji civakê re

M. Reşîd Irgat



M. Îsmet babet û hêjayê van rêzerengdêran bû, lewra pîvane ji bo hêjan, rêzdarî û rûmetê ne mal, nav û cîgeh (meqam)in, belkî hin tevgerên oldarî, xuristî (exlaqî) û dilovanin, ji xwe wî adrewanî ev xalên hêja didêra.

Nûnerike asoya zankoya medreyên Kurdistanê, parêzvaneke cangorî ji bo mafên jar û benderan, dawereke (sembol) dilovan ji bo dilxweşî û aşîyê; seydayê Mele Îsmet Kiliçaslan heyf û mixabin di serdemeke hewcedar de, ji nava me bar kir û çû ber fermana Xwedayê cîhanaferîn. Civaknaseke agahdar, wêjenûseke zanyar dosteke mirovahîyê û bawermendeke rasteqîn pişta xwe da vê cîhana xapînok û çû ser dilovanîya Xwedayê mihriban. Aştîxwazeke dildar û xêrxwazeke gel û welat û netewparêzeke biryardar tevê daxwaz û mirazan koça xwe ya dawî kir.

Bi rastî jî seyda M. Îsmet babet û hêjayê van rêzerengdêran bû, lewra pîvane ji bo hêjan, rêzdarî û rûmetê ne mal, nav û cîgeh (meqam)in, belkî hin tevgerên oldarî, xuristî (exlaqî) û dilovanin, ji xwe wî adrewanî ev xalên hêja didêra. Ew mirovekî hinnav paqij, xwerû û xwedî bîr û bawerîyeke resenî bû di warê olî û netewî de. Wî doz dikir û digot ku Îslam oleke nûjen, nûdem û gerdûniye, lê belê hin kesan wî ola paqij ji bo berjewendîyên

xwe yên kesayetî, konevanî, cîgeh û karên xwe xebitandine, ev jî bê rûmetîyek e li hember ol û oldaran. Ew gelek ji durûtî (rîyakarî), nav û rengdanê diêşîya û tim di vê mijarê de dikoşîya.

Belê rûmet rêz û sermayeyê mayinde û herî hêja pêkanîna fermânên Xweda, xweparastina ji qedexeyên wî û destveanîna evîndariya gel e. Temenê dirêj ne bi sal, meh û rojan e, belkî bi paşvehiştina mîrateya navekî qenc û dîrokeke paqij e. Koçdawî jî ne bi veqetîneke fizîkî ye, belkî bi pêkneanîna kar û xebatên qenc ji bo ol, gel û welat e. Seyda temenek û jîyanek gorî kir ji bo rajebexş (xizmet)ên olî û netewî, mîna melatî, seydatî, aşîyên navbixweyî, çand û wêjeya gelê xwe.

Ji van sedeman em dikarin bibêjin ew her çi qas di nava me de berbiçav xuya neke jî, lê wê her tim ew bi rêz û dilovanî (rehmet) di dilên gel, dost û hevalên xwe de bi bîr bê. Lewra wî ji xwe di dilên dildaran de koşka evîndariyê veda bû. Ev karê her lehengî nîn e ku bikarî çîten konê aşîyê, dilxwazîyê û evîndariyê daçikînit. Ceng û pevçûn hêsantir e ji

aştî û bexişandinê, aştî û aştîxwazî karê dilêr û qehremanan e.

Seyda mirovekî wêjenûs û ci-vaknas bû, wî ev taybetî ji medrese-yên Kurdistanê wergirtibû. Lewra medrese bi gel re peywendîdar, jîyana medresan jî bi jîyana gel re têkildar e. Di jîyana medresan de kevneşopîya kurdî, ziman, wêje, rêzik û rêwersmên kurdî bingeh in. Şagirdên medresan û ciwan bi hev re dijîyan, belkî jî ji wê sedemê bû ku medrese hatin girtin. Her medreseyek gencîneyeke çand û wêjeya kurdî bû û her seydayek jî dergevanê wê gencîneya durdane bû.

Kurtejiyenîgarîya seyda

Seyda di sala 1932yan de li gundê Çorsêna li ser Tetwana Bedlîsê çav li jîyanê vekir. Sala 1946ê, sala damezirandina komara Mehabadê bû. Seyda M. Îs-met ji bo xwendin, hînkari û hîndekariyê hat medreseya bavê min Seydayê Mele Ebdussemedê Xorosî. Wî maweyê 12 salan fêrbûna zanistên olî, wêjeyî û hin beşên din pêk anî û di sala 1958an de, destûr û destûrnameya medresê, ji bo melatî û seydatîyê ji seydayê Mele Ebdussemed wergirt û li gundeke Tetwanê bi navê "Pîrûs" dest bi peywîr (wezîfe) ya xwe kir. Wî ji vê salê ta sala 1992yan bi fermî û bê fermî û bi navber ev kar li çend gundên parêzgera Bedlîs, Mûş û Wanê domand. Li dawî ew di sala 1992yan de, ji sazîya Dîyanetê karkinar bû û li Îzmîrê cîwar bû. Ew berçav bi temen xuya dikir, lê bi vîn, bi raman û bi dil zinde û hemdem bû. Mirovekî bê nefis û têr zanîn bû.

Hevnasîna min û seyda

Me bi raman û hişmendî sala 1958ê hev nas kir, lê me di pêşî de jî, bi boneya (munasebeta) medre-

sê hevûdu dinasîya. Em bi hev re bûn xwendekarê rojnameya "Dicle Firat", em di sala 1964an de bûn endamên PDKT û beşdarê hîlbijartina Zîya Şerefhanoglû ji senatoyê bûn. Sala 1967an em tevê hevalên Tetwanê çûn xwepêşandana Êlihê bi navê Dogu mî-tînglarî û me bi gelek kesên navdar re hevdîtin pêk anî. Sala 1971ê em bûn endamên PDKLT, lêpîrsîn, lêgerîn û binçavî derbas kir.

Sala 1992an Enstîtuya Kurdîya Stenbolê hat damezirandin, em bi hev re bûn endamê wê sazîyê. Sala 1995an ez jî ji karmendîya sazîya Dîyanetê karkinar bûm û êdî em bi hev re diçûn civînên Enstîtuya Stenbolê û vedigerîyan Îzmîrê. Ev rêwîtiya me gelek xweş û şêrn derbas dibû, em li Stenbolê diçûn serdana hin sazî û hin kesan.

Me gelek caran serdana "Nûbiharê" jî bi cih dianî, bi xebatkariyê wê re hevaltî û dostaniyêke biratî ava bûbû û em ji xebat û weşanên wan sîdwar dibûn. Rojekê Seyda ji min re got, gava ku em diçûn "Nûbiharê" medrese û jîyana feqîtiyê bi bîra min dikeve û ez gelek xweşhal dibim, sedem ku ew bêhna medresê vedidin, reng û durûfê şagirdên medresan didin.

Me bi hev re hin kar û xebatên nivîsarê jî, pêk anî. Mîna transkîrîpeya dîwana Feqîyê Teyran û wergera sê berg (cild) dîroka navdarên Kurd ji farisî bi kurdî û me radestê Enstîtuya Stenbolê kirîye li ber çapê ye. Hin xebatên me yê xweser jî hebûn, lê dîsa em bi hev re di nava aheng û hevaltîyê de bûn. Hevaltîya wî gelek hêja, sîdwar û bê hempa bû ew mirovekî xwedî kesyetîyêke mînakdar bû nefspiçûk û têrzanîn bû.

Em xar û jor hevalên hev yêncî salan bûn, ev hevaltî ji

peywendîyên ramanî, netewî, hevpişeyî û ximîtî pêk dihat, lê ya herî resen şaxa ramanî û netewî bû. Di navbera vê hevalbendîyê de hîç tu caran dilê me ji hev nedima. Lê sed mixabin wî em hiştin û piştta xwe da me, ev e rengê vê jîyana xapînok.

Koça dawî a seyda

Roja sisêyê Tebaxa 2006ê Seyda li Îzmîrê di encama bûyereke trafîqê de, mixabin piştta xwe da jîyanê û dost û heval di xem, jan û keserê de hişt. Roja çarê Tebaxê em ji hêla girseyeke giran ji gel, dost û hevalan ve, ji bo çûyina welat hatin birê kirin. Roja pêncê Tebaxê em bi rêwiresmek e gur û germ li Tetwanê hatin pêşwazîkirin. Seyda bi beşdarîya hejmareke gelek zêde ji gel, heval û pişevanên (Meslekdaş) wî, li gundê wî Çorsêna li ser Tetwana Bedlîsê, radestê axa welatê wî ya ku, ji bo wî mebest û evîndar bû, hat kirin û li wir hat veşartin. Bi rastî wê dîmena xemgîn bandoreke giran li ser beşdarîyan hişt. Bextewar im ku hemû rajebexş (xizmet) û giîmanên (wecîbeyên) wî yê olî û civakî bûn para min. Lê xemgînim û bi jan im jî, ku min hevaleke dîrîne, dilovan û rêzdar wenda kir, li wir hişt û piştta xwe dayê.

Çend rojan serxweşîya wî li gundê Çorsên domîya, paştî jî li Îzmîr û Sitenbolê bi dawî bû. Bi vî awayî Seyda tevî miraz û daxwazan telvê karwanê bê mirazan bû. Hêvîdar im ku ew keser û kovînan di dilê wî de man, bibin para gel, dost, heval û malbata wî. Hêvîdarî ji Yezdanê Mihîrban ku wî bibexşîne, gora wî bi pertewa (nûr) xwe ronî bike, behîsta xwe bixe para wî, tebat û aramîyê bide malbat, dost û hevalên wî. ■

Ji keçeke qerd, veweşînine xurt

Ayhan Meretowar

N

1

avseroyên ku zemanê berê, li şahî û geşiyên Kurdistanîyan de rast keçên kezîzer hatibin, baş dizanin ku şêl û pêla wan bi çi awayî bû. Ha vê helbestnûsa ciwan a bikelekel, ew rojên mişt biharî ku êdî tenê di hîşê me de ma ne, anî bîra min.

Her moceke wê ya ku li ser keraxên behra helbesta kurdî daye, bi xwe re dîmenên mercanî kaş kirine hember çavê wan temaşevanên ku ji tirsan newêrin xwe berdin binê wê ava zelal, henûn û tînegermî.

2

Behsa helbestvana me ya ber kemalê dikim. Wê rojê – îsal meha hezîranê- li malkitêba Avestayê rastî çend pirtûkên helbestan hatim ku hemû keç/jin bûn. Hemû helbestnûs jî nas bûn; bes gava çav bi navê Gulîzerê ketim, bê hemdî min ev gotin ji devê min ê ku gazeke ji hev çûbû derket: “Wey Gulîzer, te jî mil da ber barê edebîyata kurdî!”


Di hîyameke ku gelê kurd tewrû nade kurdînûsan, destê dewlemendan naçe cêva wan ku çar

banqnotan bidin heqê pirtûkekê û rûyê çar nivîskarî, ji ber baş û têrxwendina pirtûkên wan nekenîyaye de, weha ji nişkan ve, li meydana edebîyatê, bi vî awayî kurdîperwer derketina vê kedkarê, dil li min şad kir.

Min jî xwest vê dilgeşîya xwe, bi çend heval û hogirên xwendoxên kurdîyê re parve bikim.

Gulîzer, keçeke Amedî ye ku bi helwesteke xwe ya ser helbesta kurdî, di cîhana edebîyata kurdî de, nav û deng da ye. Digel temenê xwe yê bîst û heft salî, li hember helwesta şairê navdar, berhemdar û hînekî extîyar E. Huseynî – min hêvî heye ku E. Huseynî li min negre – ku wextakî destê xwe ji şimaya helbestê şûstibû, wê bi kezîyê xwe yê “kurkirî” di kelekela Ameda reşgîrêdayî de, li nivê orta meydana, wek siwarekî Merwanîyan, gotibû terp û derketibû pêşîya wî û ev helwesta wî, bi yek carekê pê dabû berdan. Kiribû ku ev şairê me, bi hevpeyvîna xwe ya ku di kovara W, hejmara 10an de hat çapkirin, bajarê Amedê, pê (bi vê keçîkê û vê helwestê) sembolîze bike.

Behsa helbestvana me ya ber kemalê dikim. Wê rojê – îsal meha hezîranê- li malkitêba Avestayê rastî çend pirtûkên helbestan hatim ku hemû keç/jin bûn. Hemû helbestnûs jî nas bûn; bes gava çav bi navê Gulîzerê ketim, bê hemdî min ev gotin ji devê min ê ku gazeke ji hev çûbû derket: “Wey Gulîzer, te jî mil da ber barê edebîyata kurdî!”



Min bi heft zimanan
 Ji heft jinên di tengasîya zayinê de
 Duayan berhev kir
 Ji bo hatina te
 Nizanim Xwedê bi kîja zimani dizane?

3

Ev kitêba wê ya yekem ku bi navê "Kezîyên Jinebî" di nav weşanên Avestayê de îsal derket, bi sernavê heftê û heşt helbestan, ji kûrahîya dilê xwe yê kul, têra xwe dike pilepil. Ev pilepila wê ya ku seraser bi zimanê keç, dayik û jinan dagirtîye, bûye bersiv ji wê bendewarîya ku em li hêvîyê bûn.

Kelîmeyên mîna *jinebî, kezî, kiras, dîya heft lawan, bûkik, gulî, jina di tengasîya zayinê de, pêşîr, qelen(d), berdêlî, porê sor î sosinî, xelat, bûkanî, xîşrên bûkê, bûka malê, bûka zikliberdev, bi şîr vekirin, malzerok, zarokên berşîr, bi çarlepikan ketin, berbûrî û xwazgînî*, dilê xwendevanên

kurdî yên makî – heke bendê bin – şad dike. Tevî vê kedê, di tiştêkî din de jî çalakî kirîye: Kurdîya heta niha ya edebîyata me, bêhtir kurdîya mêtîyên nêr bû; bi vê rapêrîna Gulîzerê, kurdîya "mê" jî, bi xurtî ket edebîyata me û bi bawerîya min kurdî, dê bi kurdîya mê, bi vî gelî xwe bide xwendin. Lewre zayenda navê "kurdîyê" bi xwe jî mê ye.

Hêza ciwantîya wê, di reng û rûyê berhemên wê de dixuyê. Bîst û du caran peyvika "evîn"; bîst û sê caran jî peyvika "dil"î ketîye van helbestan. Rêzikên wê, weke temenê wê, ciwan, şipl û bi coş in.

"Berê

Gava şev bihata xwazgînîya hêrsên min

Qelenê wan bi heft gundan bû

Niha di dawetan de pişderî jî nastîne"

Hêza vê şaîra me, hinekî jî, ji bransa wê ya ku ew, mamosteya ziman û edebîyata îngilîzî ye tê.

Ji hêmanên helbestî yên mîna aheng, wezin, hunerên edebî û hêmanên muhtewayî ve, pir ji nava xwe razî dixuyê.

Helbestên wê ku gişt li ser wezina azad/serbest hatine hû-

nîn, tehma wezineke veşartî dide merivan. Ew ahenga navbera peyvik û wan gotinên bav û kalkan ku bûne ruh û can ji cesedê hunerên wê yên edebî re, hêzeke xurt daye naveroka helbestan. Giranîya mijarên wê, li ser hest û tevgerên jin an jî keçên "welatevîn" in ku bi sirûda "herine pêş" tê zanîn,

Şêwaza wê, li ser piştta bine-mala wê ya ku kakilê kurdî di xwe de dihewîne, ava bûye. Vê şaîrê, piştta xwe bi kurdanebûyîna bavê xwe yê ku karkerekî kurdî ye û dayika xwe ya ku kurdîya xwe bi cengawerî ji pêkutîya zimanê serdest parastîye, rast kirîye.

Ev geşedana serê çend salan a edebîyata me, çî qas lawaz û qels be jî, jê re bûye avantaj. Bi gotineke hê bêhtir nêzî rastîyê, wê ev pêşveçûna zimanê me yê nivîskî, karîye ji xwe re bike kan û piştekan.

Wê, xweserîya xwe, bi kila-man parastîye û bi pisporî daye ser şopa helbestên kilaman. Jixwe ka her kes pê nizane ku piranîya kilamên wan dengbêjên me yên "mêr" ji tevna jinan derketine. Kes nikare mandel bike ku edebîyata me ya devkî, bi sed salan li ser piştta jinan bûye, bi şî-nûrka wan gur û geş bûye û bi vî awayî hatiye gihîştîye roja me.

Kelîmeyên mîna *jinebî, kezî, kiras, dîya heft lawan, bûkik, gulî, jina di tengasîya zayinê de, pêşîr, qelen(d), berdêlî, porê sor î sosinî, xelat, bûkanî, xîşrên bûkê, bûka malê, bûka zikliberdev, bi şîr vekirin, malzerok, zarokên berşîr, bi çarlepikan ketin, berbûrî û xwazgînî*,

Tevî kilamên dengbêjan ku kanên helbesta kurdî ne, "Kezîyên Jinebî" bi tehma xweş a edebîyata devkî, ji çîrokan jî, tamijîye.

"Ji zaroktîya wî re kulmek xar dişînim."

"Min heft çarşem ceh da berê jî"

Rêzikên alîterasyonê yên mîna

"Xatirxwestina te bu[bû] gulle ji gulîyên Gulê re

Gulîyên zer
Mane bê fer"

û "Li ser dilê min dîlanê dîkin" jî, ji ber çavê merivan wenda nabin.

Çend gotin û rêzegotinên bêxwedayî jî ku dil li xwendevanên Xwedênas teng dike, qedir li berhemê kêr kirîye.

"Min bi heft zimanan

Ji heft jinên di tengasîya zayîne de

Duayan berhev kir
Ji bo hatina te

Nizanim Xwedê bi kîja zimanî dizane?"

Nakokîyên rastnivîsînê

Di cîcîyan de peyvika "kîjan" e; cîcîyan jî bûye "kîja". Peyvika "qelen" jî, geh "qelen" e geh jî "qelend" hatîye nivîsandin. Di rûpelê 15an de, peyvika "xatir xwestin"ê bu du awayan e. Yek bi awayê "xatir xwestin" ya din jî, bi şelê "xatirxwestin"ê hatîye nivîsandin. Ev jî nakokî ye.

Qertafa dariştinê "bê" jî xelet hatîye nivîsandin:

"Peyvên te dewlên bê xem" Ji ber ku kelîmeya "bêxem", ji kelîmeya "dewlên" re bûye sîfet/rengdêr, divîya ku bi hev ve bihata nivîsandin.

Heinrich Heine (1797-1856)

Ji Almanî: E. Akın

*K*AL BÛ EW PADÎŞAH*,
porspî û dilgiran,
kal û feqîr ew padîşah
girtîye jineke ciwan.

Bedew bû ew xort,
aqilsivik, por rengê zêran.
Bi dêrîyê hevrişim digirt
ê qiralîçeya ciwan

Nas dikî tu kilama kevn?
Dixwîye wisa şêrîn, wisa mehzûn!
Bêçar bûn; herdu jî mirin,
û ji hev pir hez dikirin.

* Ev şî'ra han bê sernivîs hatîye weşandin.

Ji alîyê tewang û pêvekên bireser û lêkeran ve jî, xeletîyeke ciddî heye:

"Min bi heft zimanan
ji heft jinên di tengasîya zayî-
nê de
duayan berhev kir"

Peyvika "duayan" ku biresera vê hevokê ye, li gor hêmana "kirde"yê, em nikarin bitewînin yan jî pevekên pirjimarîyê pê ve bini-

vîsînin. Ji ber ku kirde – ku cînavka "min" e – tewandî ye, em nikarin bireser ku peyvika "dua" ye, bitewînin. Divîya ew xwerû bi-maya.

Di heman hevokê de, lêker ku peyvika "berhev kir" e jî, dê wê qertafa pirjimarîyê ku "-in" e, bigirta.

"Min bi heft zimanan
ji heft jinên di tengasîya zayî-
nê de
dua berhev kirin" ■

vae victis 1: lome

Selîm Temo

*g*ava genim seridîn, gava jan danî
li pey maran bimeşe
ez ku birîn im, xwe dax dikim
tu bi benên xav xwe girêde

pirsek deyne
mîna qisûrên xwe mezin
umrê xwe pê bikewîne

gava payîz hat, gava şîn ferikî
cilên mirîyan li xwe ke
ez ku evîn im, xwe dixwînim
tu bi lorîyan xwe dawêşîne

ji min nepirse
şikestî çîye
zaroka do ye dîrok

Ristem û Sohrab

Lokman Polat

Min sê varyantên çîrokên Ristemê Zal xwend. Yeka nivîskarê kurd Xurşîd Mîrzengî bi şêweya romana nivîsîbû. Min li ser romana Ristemê Zal ya ku X. Mîrzengî nivîsîbû nivîseke danasîn û nirxandinê nivîsî û di kovarên kurdî de weşand. Pirtûka din ya Edîp Polat e û li ser Ristemê Zal e. Ev pirtûk hêj nehatîye weşandin û lewre jî min hêj li ser nenivîsîye. Lêbelê min pirtûkê xwendîye.

Di vê nivîsê de ezê behsa pirtûka nivîskar Norma Lorre Goodrich bikim. Navê pirtûka wî "Sam, Zal û kurê wî Ristem" e. Ev pirtûk li Stenbolê di nav weşanên "Pêrî" de bi tirkî hate weşandin. Wergêra pirtûkê Nêrgîza Torî ye.


Nivîskar N. L. Goodrich çîroka mîtolojîk ya antik ji ber Şahnameya Firdewsî wergirtîye û ji nûve nivîsîye. Firdewsî ji rojhilatê Îranê ye û bi eslê xwe Faris-Pers- e. Wî di berhema xwe ya bi nave "Şahname" de behsa çîroka Ristemê Zal kirîye. Lê, wî vê çîrokê wek helbestke û bi wezn nivîsîye. N. L. Goodrich jî ji ber wê wek çîrok bi şêweya pexşanê nivîsîye.

Navê bavê Ristem Sam e.

Sam cengawerekî bêhempa ye. Şahîşahê Aryanana beşeke welêt daye bin emrê Sam. Li başurê rojhilatê welatê Aryanana de desthilatdarîya Sam heye. Zarokên Sam yên lawîn, anku kurê wî tune. Di demekê de jina Sam hamîle dimîne û diwelide. Ew kurekî tîne dinê. Por û birûyên kurik di rengê zîv de ne. Porê hemûyan reş û porê kurik spîyê zîvîn e. Ji bo ku gel -xelk- bi Sam henek neke, Sam navê kurik Zal datîne û ferman dide xulaman ku wî bibin deynin çîyayê Elbrûzê. Xulamên Sam fermana wî bi cih tînin û Zal dibin datînin çîya.

Di navberê de sal û demsal derbas dibin, Sam kalepîr dibe. Porên wî jî spî dibe. Ew ji xwe re difikire ku wî li kurê xwe neheqî kirîye. Sam şevêkê di xewna xwe de kurê xwe dibîne û paşî biryara xwe dide ku biçê li pey kurê xwe bigere, wî bibîne.

Sam piştî lêgerîneke dûr û dirêj kurê xwe Zal dibîne û hikûmdarîya herêma ku di bin desthilatdarîya wî de ye, dide kurê xwe Zal. Di demeke de Sam diçe şer û cengê. Zal jî wek mêvandarî diçe bajarê Kabûlê. Li wir dilê wî



Dibêjin: “Zal bi Rûdabahê re bizewice, dê jê re kurekî cengawer bibe û ew kurik dê Turanîyên dijminên Aryanana têk bibe û wan berepaş bişîne çola Tirkîstanê ya Asya navîn.”

dikeve keça qralê Kabûlê. Navê qral(*) Mîhrab e û navê keça wî Rûdabah e.

Zal bîrara xwe dide ku bi Rûdabahê re bizewice. Ew xeberê ji bavê xwe re dişîne ku ji bo zewacê îcaza wî bigre. Sam ji bo zewaca kurê xwe bi sihirbaz û falcîyên astrologan dişêwire. Ew jî dibêjin: “Zal bi Rûdabahê re bizewice, dê jê re kurekî cengawer bibe û ew kurik dê Turanîyên dijminên Aryanana têk bibe û wan berepaş bişîne çola Tirkîstanê ya Asya navîn.”

Bav û dîya keçikê naxwazin ku keça xwe bidin Zal. Bavê Zal, Sam daxwaza zewaca Zal ji Şahînşahê Aryanana re dibêje, Şahînşah jî naxwaze ku Zal bi keça Melîkê Kabûlê re bizewice. Şahînşahê aryamêr ferman dide Sam ku ew bi ordîyê –artêşê– biçe bavêje ser bajarê Kabûlê û wir fetih bike, malbata qral Mîhrab bi keça wî ve bikuje. Zal bi fermana Şahînşah dihesê. Zal diçe cem bavê xwe Sam û jê re dibêje: “Te ji min re bavîtî nekîr. Te min avêt çîya. Te zarokî û xortanîya min ji min send, niha jî tu dixwazî evîna min ji min bistînî.”

Sam bav e, dilê wî bi kurê wî dişewite û lewre jî ew zewaca wan qebûl dike. Şahînşah jî ji sihirbaz, falcî û astrologan agahdarî digre û ew jî razî dibe ku Zal bizewice. Û Zal bi keçîka spehî

Rûdabahê re dizewice. Piştî neh meh û neh rojan ji Zalê leheng û Rûdabaha bedew re kurekî dibe. Ew navê kurik “Ristem” datînin. Navê Zal dîya wî lê danîye. Dema Zal dibe dîya wî dibêje: “Min berhem afirand.” Û li gor maneya vê vî navî lê datîne. “Rist” peyveke Zazakî ye. Xuyaye navê Ristem navekî Zazakî/Kurdî ye.

Ristem roj bi roj mezin dibe û dibe cengawer. Di dema Ristem de Şahînşahê Aryanana Keykawûs e. Piştî ku Turanîyên hov yê êrişkar Şahê Aryanana –Arîyan– Şah Nadir dikujin, bi alîkariya Ristem Şah Kawûs dibe Şahînşah. Dema Şah Keykawûs diçe sefera herêma Mazîderanê li wir êsîr –dîl– dikeve. Lêbelê, paşî Ristem diçe wî xilas dike. Piştî demekê Şah Keykawûs bi keça Melîkê Ereban Sûdaba re dizewice. Çend meh piştî zewacê xezûrê Şah xeber dişîne pey û dibêje ku; wî bêriya keça xwe kirîye. Bila keça wî bê zeyîyê. Bila ew jî bi keça wî re wek mêvanî bê cem wan.”

Şah Keykawûs û jina xwe diçin mala xezûr mêvanîyê. Xezûr Ereba e û hezar fen û fûtên wî hene. Bi vî Ereba piştî nayê girêdan. Xezûr bi wan bêbextî dike û wan êsîr digre û dike zîndana kelê. Ristem pê dihesê ku Melîkê Ereban Şahînşahê Aryanana dîl girtîye. Ristem ji leşkerên Aryan û

Hîndîyan ordîyeke Îndo-Aryanî pêk tîne û diçe davêje ser kela Erebên samî. Ristem li pêşîya artêşa xwe li ser piştê hespê xwe siwar kirîye. Navê hespê wî jî "Reqş" e. Ev hespekî rewan yê efsanewî ye, wek bayê dibeze. Tu hespek bi qasê wî rewan nîn e.

Ordîya Îndo-Aryanîyan di bin serdarîya Ristem de êrişê ordîya Ereban dike û Ereban têk dibê. Ereb mecbûr dimînin bi Ristem re peyman çêdikin û Keykawûs ber didin. Keykawûs û zilamên wî bi xêra Ristemê Zal azad dibin.

Di wê demê de, li rojhilat Heqanê –serdarê– Turanîyan ordîya xwe amade dike ku êrişê ser welatê Aryanana bike. Keykawûs ji Heqanê Turanîyan re name dişîne. Şah Keykawûs di nameya xwe de bi gotinan Heqanê Turanîyan piçûk dixîne, Turanîyan wek pisîkê bi nav dike. Ew di dawîya nameya xwe de ji Turanîyan re dibêje: "Bila Turanî neviyên Cemşîd û Ferîdûn, şêrê Aryanana hêrs nekin. Bila ew di şûna xwe de rehet bisekinin."

Lêbelê, Turanî rehet nasekinin. Turanî diz, êrişkar û talanker in. Heqanê Turanîyan bersîva nameya Şahê Aryanana dide û dibêje: "Heger ew şêrê Aryanana e, ez jî pilingê Turanana im." Ordîya Aryanîyan û Turanîyan tîna hemberê hevûdu û dest bi şer dikin. Heqanê Turanîyan dibîne ku cengawerê di destî de gurz heye û ew berêve leşkerê Turanîyan dike. Hakan ferman dide, dibêje: "Ew cengawerê ku gurz di destî de ye Ristemê Zal e. Kî wî bikuje yan esîr bigre ezê keça xwe bidime pê."

Lê, tu kesekî nikare Ristemê Zal bikuje yan jî dîl bigre. Ordîya Turanîyan têk diçe. Heqanê Turanîyan ji qada şer direve. Piştî ser-

ketina vî şerî Şah Keykawûs navdarîya cengawer û pelewane cîhanê dide Ristemê Zal. Êdî Ristemê Zal bi fermî wek pelewane cîhanê tê binavkirin. Di dema Ristemê Zal de Ordîya Şahîşahê Aryanana wisan bi hêz dibê ku nîvê cîhanê fetih dike û dixê bin hukmê xwe.

Di demekê de Ristemê Zal diçe nav axa Tirkmenê Turanî. Ristemê Zal li wir, li cihek di nav baxçeyek de radikeve. Tirkmenên koçer tîna hespê Ristem (ku navê wî Reqş e) didizin. Ristem ji xew radike ku hespê wî tune ye anku hatîye dizîn. Ew li pey hespê xwe digere û diçe bajarê Tirkmenan. Heqanê Tirkmenan pê dihesê ku Ristemê Zal hatîye bajarê wan. Heqan diçe cem Ristem û jê re dibêje:

–Gelo kî di welatê min de cesaret kirîye ku li te neheqî kirîye? Hemû mal û milkê me û em bi xwe di xizmeta we de ne.

Li ser van gotinên Heqanê Tirkmenan, Ristem jê re dibêje:

–Hespê min wenda bûye. Min li ser rêça wî gerand. Hesp hatîye vir. Heger hûn niha hespê min neynin, ezê serê gelekana jê bikim.

Heqanê Tirkmenan Turanî dibêje:

–Meraq neke. Emê hespê te bibînin. Tu were bibe mêvanê min.

Ristem dibê mêvanê Heqan. Di koşkê de şeva şahîyê çêdikin. Dansoz reqs dikin, beşdarvan, mêvan xwarin dixwin, vedixwin. Ristemê Zal jî mey vedixwe û hinek serxweş dibê. Ristem ji şûna xwe radike û diçe menzelê ku li wir raze. Ew xwe li ser livîna dirêj dike. Hinek paşê derîyê menzelê vedibe û keçên xweşik tîna hundirê menzelê. Di nav wan keçikan de keçîkê pir spehî heye.

Di wê demê de, li rojhilat Heqanê –serdarê– Turanîyan ordîya xwe amade dike ku êrişê ser welatê Aryanana bike. Keykawûs ji Heqanê Turanîyan re name dişîne. Şah Keykawûs di nameya xwe de bi gotinan Heqanê Turanîyan piçûk dixîne, Turanîyan wek pisîkê bi nav dike. Ew di dawîya nameya xwe de ji Turanîyan re dibêje: "Bila Turanî neviyên Cemşîd û Ferîdûn, şêrê Aryanana hêrs nekin. Bila ew di şûna xwe de rehet bisekinin."

Ristem li wê keçîka bedew dinêre, ew jî li Ristem dinêre. Ristem jê dipirse ku ew kî ye? Ew jî bersîv dide û dibêje: "Ez keça Heqan im." Ristem destê keçîka narîn digre û wê dixîne ser livîna xwe. Herdu hevûdu maçî dikin û bi hev re şadiman dibin.

Ristemê Zal bi prenses Tamînehê re dizewice. Ew li wir demekê dimîne û paşî ji wir diçe. Dema ew diçe madalyoneke weke nîşan dide jina xwe û jê re dibêje: "Heger ji te re kurekî çêbû,

vê madalyonê bike stûyê wî." Piştî neh meh û neh rojan jî Temîneh diwelide, jê re kurekî çêdibe. Temîneh navê kurik Sohrab datîne.

Sohrab mezin dibe. Ew ji dîya xwe pirs dike ku bavê wî kî ye? Dîya wî jê re navê bavê wî dibêje. Dîya wî jê re dibêje:

–Bavê te pelewane cîhanê ye. Ew cengawerekî bi navûdeng e. Ez naxwazim ku ew zanibe tu kurê wî yî. Tu bûyî xortekî ciwan. Ew bizanibe dê te ji min bistîne. Ez nikarim bê te bijîm.

Sohrab jî ji dîya xwe re dibêje:

–Kî li min binêre, dizane ku ez wekî Tirkmenan nînim.

Sohrab dixwaze biçe cem bavê xwe û bi alîkarîya wî Heqan ji ser text bixe û ew bibe Heqanê welatê Turanîyan û dîya xwe jî bike qralîçeya dê. Heqan jî pê dihesse ku ji Rustem kurekî heye. Ew jî dixwaze kurik li dijê bavê wî bikar bîne. Heqanê Tirkmen dixwaze bav bi destê kur bide kuştin.

Heqanê Turanîyan beşeke ordîya xwe dixwe bin fermana Sohrab û ew ferman dide ku Sohrab bi leşkeran ve biçe kelê û bajarên Aryanana fetih bike. Sohrab bi ordîya Turanîyan ve êrişê welatê Aryanana dike. Ew diçin çend kele û bajarên Aryanana fetih dike. Di fetihkirina keleyek de yekî cengawer, cil û libasên hesin lê ye, bi Sohrab re şer dike. Dema Sohrab zora yê cengawer dibe, bi ser dikeve û kumê hesin ji serê yê cengawer derdixe, dibîne ku ew keçikeka spehî ye. Sohrab ji xwe re dibêje: "Keçên Aryanana ewqas cengawer in, gelo mêrên wan yê cengawer çawan in?"

Sohrab keçikê digre, bi hev re diaxifin. Keçik fenek tîne serê wî û ji destê direve û diçe dikeve

hundirê kelê. Keçik tê dîyarê kelê, Sohrab li derveyê kelê ye. Keçik jê re dibêje:

–Tu Turanî nîn î. Çi karê te bi artêşa wan re heye? Tu hetanî fermandarê Turanîyan bî, em te wek leheng qebûl nakin.

Sohrab û leşkerên Turanîyan çarmedorên kelê digrin. Keça qumandarê kelê ji Şahînşahê Aryanana re nameyeke dişîne û jê alîkarî dixwaze. Ew di nameya xwe de dibêje: "Turanîyên zalim agir dibarînin. Kes nikare li pêşberê wan hovan bisekine. Di nav wan de cengawerekî heye, navê wî Sohrab e. Hêj pir ciwan e. Li gor bejn û bala wî, ew Turanîyê barbar nîn e, Aryan e. Em nikarin bi wan re şer bikin, ji me re alîkarî bişînin."

Şahînşahê Aryanana xeber dişîne pey Ristemê Zal. Ristem tê hizûra Şahînşah. Şah ferman dide û ew bi ordîya Şahînşah ve diçin li pêşberê kela ku Sohrab fetih kirîye konên xwe datînin. Sohrab û fermandarên leşkerî yê Turanîyan serê sibê radibin, dibînin ku waye ordîya Aryanana hatine li pêşberê kelê konên xwe danîne.

Sohrab li hespê xwe siwar dibe û tê pêşîya konên artêşa Aryanana. Ew ji leşkerên Aryanana re dibêje: "Ka qralê we? Bila ew bê bi min re şer bike." Ne Şahînşah û ne fermandarêkî newêraye ku bi Sohrab re şer bike. Konê Ristemê Zal li wîyalîn e. Jê re xeber dişînin, ew li hespê xwe siwar dibe û tê qada şer. Sohrab mêze dike yê ku hate qada şer, mirovekî kalepîr e. Sohrab jê re dibêje: "Qada şer ci-hê te kalepîrî nîn e. Ez te bikujim jî serketina min zêde nabe." Ristemê Zal bersîva wî dide û dibêje: "Li gor te dibe ku ez kal bim. Lê, hetanî niha tu kesekî bi min nikarîbûye, min têk nebirîye. Ez guman dikim te gotinên min fêm kir.

Min bi şer û pilîngan re, bi fil û tîmşehan re, bi ordîyan re şer kirîye û ez têk neçûme. Heger tu min têk bibî û biserbikevî, bizanibe êdî kesekî nikare bi te re şer bike. Ez zanim di welatê Turanîyan de şerkerêkî wekî te tune. Min bi hemû cengawerên Turanîyan re şer kirîye û wan têk birîye."

Sohrab ji Ristem dipirse: "Gelo navê te çîye? Tu cengawerê Aryanana Ristemê Zal î?" Ristem nabêje ku ew Ristemê Zal e. Ristem dibêje: "Na, ez Ristemê Zal nîn im. Ew ji min bi hêztir e. Ji bo ku tu derkevî pêşberê Ristemê Zal û pê re şer bikî, divê tu pêşî bi hinek cengawerên wek min re şer bikî."

Sohrab û Ristem –anku bav û kur bê ku hevûdu nas bikin– dest bi şer û cengê dikin. Ew bi hev re bi tundî şer dikin. Şerekî bêhempa ku qet nehatiye dît. Ew bi saetan di ber hevûdu de didin. Sohrab diweste, Ristem ditirse. Herdu jî hinek radiwestin û paşî dîsa dest bi şer dikin.

Herdu bi hevûdu re bi şûr û meral, bi gurz û bi tîr û kevanê şer dikin. Sohrab gurzeke li milê Ristem dixwe. Ristem diheje. Sohrab pê henekan dike, dibêje: "Cengawerê Aryanana, te dît min gurzek li te da, tu çawa hejîyayî û te çok da erdê. Kalo, herî baş ev e ku; ji xwe re vegere mala xwe. Tu nikarî bi min re şer û ceng bikî."

Ji bo ku dibe êvar, Ristem û Sohrab şer radiwestînin, ku sibê dîsa dest bi şer û cengê bikin. Roja din, dîsa ew bi hev re şer dikin. Sohrab bi nava Ristem digre û wî ser piştê dixwe erdê û xençera xwe dikşîne ku li ser dilê wî bixe. Ristem jê re dibêje: "Nabe ku tu niha min bikujî. Li gor pîvanên cengewarîyê hetanî cengawerêkî yê din du car li ser piştê erdê nexe, nikare wî biku-

je. Dema yê pehlewan du car li ser piştê bikeve erdê, wê demê mirinê heq dike."

Sohrab li ser van gotinan Ristemê Zal nakuje. Ew ji ser radibe. Femandarên Turanîyan ji Sohrab aciz dibin ku çima pelewane Aryanan nekuşt. Sohrab jî dibêje: "Ezê wî sibê li ber çavên we bikujim."

Roja din, anku roja sêyem dîsa herdu dest bi şer û cengê dikin. Vêca Ristem bi ser dikeve û Sohrab birîndar dibe, têk diçe. Sohrab jî Ristem re dibêje: "Dîya min gote neçe welatê Aryanan. Min gohdarîya wê nekîr. Min nekuje, lêxe here. Heger Ristem pê bihesse te kurê wî kuştîye, tu bibî teyrê baz jî, dê dîsa bavê min te bibîne û bi destê xwe biqeniqîne."

Dema Ristem van gotinan dibihîse, ew di xwe de sar dibe, şaş û ecêb dimîne. Ristem bangê Sohrab dike û jê re dibêje: "Sohrab ez Ristemê Zal im."

Ji bo ku Sohrab birîndar e û li ser mirinê ye, ew jî bavê xwe lome dike û jê re dibêje: "Çima te berê negot ku tu Ristemê Zal î?" Û paşî Sohrab dimire. Ristem li çokên xwe dixê, dibêje: "Min kurê xwe kuşt."

(*) "Qral" peyveke tirkî nîn e, rusî ye. Hinek kurd bi taybetî kurdên binxetê di şûna peyva qral de peyva "melîk" bi kar tînin. Hinek jî peyva "padîşah" yan jî "serdar" bi kar tînin.

Du xerîbên piçûk

Gulistan Çoban

Ji bo Yahya û Ferhat

Ew du reyhanên min in
Ez wan ji xwe'r bîhn dikim
Ew Mûsa û Harûnên min
Ew Yusuf û Bunyamînên min
Ew Hesên û Huseynên min in
Ew du berxikên belek
Du xerîbên piçûk in

Zemano..!
Çemê bêsekin...
Te girt û bir xerîbîyê
Ew du masîyên bi hev re dilîstin
Bira..!
Nêrînen min wenda dibin
Li rêyên dûr re
Hesret razaye di dergûşa dil de
Dest vala mam li dû ettara
Êdî baş zanim ku
Tişt hene nayên kirin bi pera
Wek sitranên şivana
Wek bêhna berêvarên bihara
Wek şevên havînê
Li bin barana sitêrka
Nûve piçûkbûna min bi we re
Bira..!
Sibe dikim bi çûçikên şeva re
Li ser kevirên sara
Çav nayên hev
Xew revandin wan hestên hara

Zemano..!
Hespê bêsekin..!
Were em li bin wê darê
Peymana xwe nû kin
Sond û qesem kin
Emê konê xwe li ber çemê hêvîya
Li zozana wesletê vegeirin.

Hêvîyên piştşikestî

Murad Pola

muradpola@gmail.com

Çima her gav rastî van bûyeran dihat? Wî jî nizanîbû. Kîngê dest biavêta karekî îlam di derekê de tewşîyek çêdibû. Gelek sal berê çaxê ku hê xortekî nû gihîştî bû, li gel hevalên hevtayê xwe bêyî ku xeberê bide malê, duayê dê û bavê ji xwe re têxe cirîya rêwîtiyê ji welêt revayabûne îçerîyê. Dema li otobozê sîwar bibûn û ji nav bajêr derketibûn kela wî tijî bibû, lê dê dîsa vegeşîya. Bi vê, dilê xwe aş kir. Çaxê li tehelâ rê dinihêrî çî tişt û cîyê teze çav pêdiket mîna zarekî teze xer dide nîşanî hevalên xwe dida, ji wan dipirsî. Bi vê rev û rêwîtiyê wî wetnê ji bindestiyê xelas dibû diçû azadîyê. Lewra ji ber ku nûxiryê dîya xwe, delalîyê malê bû. Loma dê û bavê wî nedihîştin ji ber çavên wan winda bibe, mîna zarên hevalê xwe rabe here çol û bestan bi têra dilê xwe bigere, bilîze. Te bêjî êsîrekî li ber destan bû. Her dem dilê xwe diavête halê hevalên xwe û hez dikir ew mîna wan bi serê xwe û serbest be. Lê êdî îro ew firsend ketibû destan, dê cîyên teze, tiştên nû bidîta, dê xwe berda nav cîhaneke beyanî-

ya rengîn. Yê bixebitiya, pere qezenc bikira, ji dê û bav, xwişk birayên xwe re xelat bianîya, ji malê re alav û hacetên nû bikirîya, lê herî pêşyê dê teybeke mezina mîna ya kurê cînar ji Stenbolê anîbû bikirîya. Lewra ev bibû keser dilê wî de mabû. Çaxê mala cînar band diavêtine ser, çî dengekî rind ji mîratê derdiket û kêfa merivan pêra dihat. Dema ku dê ji îçerîyê vegere, der û cînarên li mal kom bibûna, dê û bavê wî dê xwe bi kurê xwe qure bikirana. Ewê jî rabûya biçûya cem hevalên xwe, bi kincên xwe yê teze fors bikira. Dê ji wan re behsa wan derê lê gerîyabû bikira. Lewra berê, çaxê ku xortên diçûne bajarên îçerîyê - Stenbol, Îzmîr hwd.- ji xebatê vedigerîyan dihatin û şêwr xweş dikirin behsa wan deran dikirin, di hişê wî de cîhaneke wisa fewqûlade, wisa bi xeml û rengîn diçilvilî ku nikarîbû van hest û ramanên xwe bîne ziman. Gava çav bi kinç, sol û tiştên ji wan deran dihatin diket, dilê wî dikire kirekir, dilê xwe de dua dikir û digot ka gelo qet rojeke wisa yê bê, ez jî mezin bibim, mîna



xelkê, van nûciwanên salixê wan deran didin herime wan deran, wan gul û gulistanan bibînim. Ji kêf û lezeta wê tam bikim.

Her çiqasî heta nika derneketibû rêwîtiyeke ewqasî dirêj jî ne aciz bibû ne jî paldabû. Piştî rêwîtiyeke dûr û dirêj xwe dabûne vî warê xûrbetistanê. Berê ji bo lê bimînin, bisitirin cîyekî mayînê peyda kirin. Peyre ji xwe re çendekî li vî bajarê xerîbê mezin gerîyabûn. Ji dû re her kesî ji bo xwe karek peyda kiribû û dest bi xebatê kiribûn. Ewî jî li gel hinek hevalên xwe di însaetekê de dest bi emeletiyê kiribû.

Xebat lê bibû bela, lewra qet jî mîna xeyal dikir rind û hêsan nebû. Sibê zûtirkê radibûn, herkes diçû ser şixûlê xwe û wî jî berê xwe dida însaetê. Li ber destê hostayê xwe diçû dihat, heya êvarê xêncî danê xwarin û

vexwarinê hîç firsenda bihn vedanê tunebû. Loma emeletî jê re pir giran dihat. Ne dikaribû xerç çêke û tevde, ne jî dizanibû destiyê merê rind, bi fesal bigre. Lewma dest û tilfîyên wî du-sê rojan de av girtibûn, bibûne birîn. Kurt û kurmancî ew ne merivê van karan bû. Hostayê wî rojên sifte pê re dengê xwe nedikir û tişt jê re nedigot. Piştî çend rojan lê nihêrî ev berdestiya jê re dest nade û bi zar û zimanekî şîrîn mesele jê re vegot:

–Ronahîya çavên min hela werê li kêleka apê xwe rûnê ez ji te re tişteki bêjim.

Hat li kêleka hosta, li ser kaxizên çîmentoyê yên valabûyî rûnişt.

–Keremke apo guhê min li te ye.

–Lawo wekî tu jî dizanî, we-latê me pirê merivan dunav in. Ji wan yek navê wanê rastîye ku dê û bavê wan lê dikin û navê

wanê din jî piştî ku zar mezin dibin tevî nav millet dibin, xelk li wan dike. Ew navana jî li gor xuy û xeyset, zanebûn û nezani, zîrekî û sistiya wan kesan li wan dike. Gelek caran jî bûyereke ecêb diqewime û ew ji wan re dibe navê dudan. Ez zef dirêj nekim. A li gundê me jî merivek hebû. Navê wî yê rastî Cimo bû. Lê di nav millet de, piştî wî de jê re digotin Hêko. Cimo merivekî baş û zana bû. Lê mîrata rêveçûna wî lê bibû bela. Rêyeke se-etekê, ew sê seetan ancax diçû. Loma mîna mirîşka ku hêk tê de mabe giran giran dilivî û ji ber wê navê wî bibû hêko. Lê şixûlên din de merivekî pir jêhatibû. A qisa te jî ev e. Tu xortekî baqil û delalî, lê ev emeletî, şixûlên giran ne kar û pêşên te ne. Bi ya min tu ji xwe re şixûlekî sivikê ku taqeta te bigihêjê, tu bi hêsani bikaribî bikî bigere.

Ji xwe wî jî dizanibû nikare

di vî karî de bixebite û di loqan-tekê de xebitî. Firaq û folê aşxanê dişûşt. Ew jî ne bi dilê wî bû, nerind bû. Ji ber ku bîhna xwe-rekan zef bû çend rojên pêşîn madê wî hatibû girtin, nan berda nedîçû. Don û zihûma firaqan zorekê lê diçû û hingî di avê de diman destên wî pîrotangî dibûn. Lê qet nebe ji karê din hêsantir bû. Dîsa di çend rojan de jîyan li ber çavan reş bibû. Digot qey ji behîştê revîya ye dojhê. Bêrîya dê û bavê xwe kiribû.

Erê îro êdî ew roja hêvî dikir, li bendê bû û xewn û xeyalên wî dixemilandibûn li ber destan bûn, ew li wir tenîşt a wî bû. Lê ne wisa bû, belê jîyana, cîhana hestên wî hilweşiyabû, winda bibû. Ew hestên wî yê xwerû û paqij gemar girtibû. Di vê jîyana tevlihev a aloz de her çendî hingî diçû fêrî liv û tevgera heyata vir bibûya jî, ligel vê gelek hêjahî û nixên wî yê ku li wî welatê xwe yê piçûkê hê xerab nebibû hîn bibû, ji malbata xwe ya durûtî neketibûyê fêr bibû dimehîyan û pûç dibûn. Te digot qey ketîye nav kevirên aş, bi her veger û fetla berên aş ve hinekî dinê hûr dibû û dihate hêranê.

Roja nedixebitî serê xwe hilda çû li ber behrê. Li qiraxê behrê dêna xwe da avê, li keştîyên li ser behrê nihêrî, merivên ji xwe re masî digirtin, keç û xortên li ber avê temaşe kir. Nişkêva lê nihêrî merivekî nas li ber re derbas bû. Ev hevalê wî yê zaroktîyê bû. Ev çend sal bûn mala wana ji welêt bar kiribûn hatibûne wir. Lê wî hevalê xwe nas kiribû.

Bi dengê kirê; Keleş! Hevalê wî rawestîya û li der dora xwe mêze kir, tu kes nas nekir. Çaxê kir ku here dîsa wî gazî kir, erê xweyê deng nas kiribû. Xwe avêtine hemêza hevûdu. Li ser kursiyê qiraxê deryayê rûniştin. Hal û hewalên hevûdu pirsîn. Rojên berê anîn bîra xwe. Li vêderê xencî dêya wî herkes dixebite. Herdu xwişkên wî di konfeksiyonê de dixebitin, kekê wî şofêrîyê dike, bavê wî di fabirqeyekê de begçî ye, zarên piçûk diçine mektebê û ew jî di pazare de textekî wî heye li ser kincan difroşe. Îro naxebite. Hevalê xwe yê zaroktîyê hilda bire malê.

Taxa wan hema mîna ya gundê wan bêpergal e, pirê wan jî kurd in. Ne rê, ne kuçe û ne jî kolanên semtê wan bi rêk û pêk in. Kifş e li vêderê jî bê xwedî ne. Mal hema mala berê ye. Lê ziman, deng guherîne. Xencî herdu kal û pîra, yên din tenezûlî kurmancî nakin. Bi wî re tirkî xeber didin. Xwedê kirî ev çend meh e li vêderê ye, tirkîya wî jî hinekî baş bûye. Naxwe yê li cem wan gundîyên xwe şerm bikira.

Êdî têderxistibû herdem xeyal, hêvî û rastî bi hevûdu nayên. Ketibû ber bayê çend hevalan, hinek pesn û çîrokên nerast û bibû rêwîyê vê rê. Rêya ku tijî kelem, asteng... Lê gotî ceribandînen vî cûrî pêkbên ku meriv bikaribe fêr be, bikemile. Qedrê welat, hebûn û hêjahîyê xwe bigire. Loma bav kalan gotibûn; "kevir li cîyê xwe giran in." De-

ma meriv bikeve ber destan, hewcî xelkê be, li destê wan binihêre dibê serhevda serê gelê xwe û pêkenîyê xerîban. Êdî dizanibû warê xelkê ji merivan re nabe war.

Rojên wî yê li vî welatê biyanî yê bê serî û bê pergal jî weha ew ligel keseyatîya wî ya tenika hê rind necebirîbû hûr dikir dipirçiqand. Kîngê ji bin barê giranê kar derketa ji bo hinekî bîhnvede xwe berdida kuçe û kolanên vî welatê mezin ê ku te digot qey niştecihên wê biqasî ku ji hevûdu xerîb in ewqasî jî ji hevûdu re neyar in. Piranîya merivan şixûlên xwe bi vir, sextekarî û bêbextîyê digerlandin. Ne karmend ne jî karkir karê xwe durist pêk dianî. Herkes di hêla xwe de li benda xwetakirin û xapandina yê din bû. Bi çavê neyarî li hevûdu dinihêrîn, herkesek ji yê din dikete şikê, hezkî hevkar be hezkî jî cînarê hevûdu yên salên dûr û dirêj bin jî bi hev emîn û ewle nedibûn. Dema di navbera gelê ku her ferdekî wî ji yên din cûda, her cûre meriv tede hebûn de digerîya bîhna wî hê tengtir dibû û diçîkîya.

Gava ji gerê vedigerîya hê bargirantir, sewtketî û westîyayîtir dibû. Bi bendewarîyeke din berê xwe dida hêla hevalên xwe yê hevrêyê vê rêwîtiya berve bi bîra bêbinî. Lê ji wir jî bêhêvî û çog şikestî difetilî. Ji lewra vê axê rengê xwe dabû reng û rûçîkê wan hevalên wî yê berê yê nûbîyanî. Durifê wan jî qulipîbû li ser yên merivên vêderê. Bi zimanekî bîyanî diaxivîn, bi nêrîneke neyarî dinihêrîn û bibûne kovîyên daristana vê şaristanîya ne medenî...■

Ziman pergala jîyanê ye

Seyda Ronahî

Ku meriv li zimanê xwe xwedîtîyê neke pergala merivan belav bûye. Li zimanê xwe xwedî derketin serbilindîya mîlletane... Gelê kurd li alîyekî xwe wenda dikîye, li alîyekî dî jî xwe nuh dikîye. Gaveke pêşta, gaveke şunda. Bi zaroktî ku em çûne dibistanê me Tirkî nizanîbû, nuha jî zarokên me Kurdî nizanîne... Van kêmasîyana çiqas ku hinek kovar û rojname dixwazine ji holê rakin lê derengîya me gellek rind tête fêmkirin.

Pîrekên kurdan ku nifiran dikin, dibêjin "pergala te belav be" îşte îro pergala gelê kurd belav bûye. Ne bi tenê bindestbûna gel, zimanekî mîna çemê Ferrat û Dicle zelal û azîz nuha tevlêhev bûye... evî zimanî nuha xwe nikarîye ji asîmîletîyê xilaske... Ji bo xwedîderketinê lazim e em bixwînin û binivîsin.

Ziman mîna çemekî ku diherike ye. Her ku diherike şen dibê. Lewra îro zimanê kurdî çima ku bi ferehî neyê nivîsandan û xwendin, tim gotin wenda dibîne. Şuna wan gotinan yan Tirkî yan Erebbî dikevîne nav zimanê me... Bi taybetî gerek danûstan-

dinake me hebe lazim e em bi devokên kurdî ve têkevin tekîlîyê.

Min çend gotin li jêr nivîsandin min xwest bira haya we ji van gotinan hebe:

Daraba; bi tirkî bi vî şeklî ti ziman û nivîsandin. Ev gotina di yek cîyan de Kurd dibêjin darabe. Yek cîyan de jî "derabe" yan "derebe" tê ziman. Bingeha ve gotina "dar"e. Darabe yan jî derabe bona ku dukan werin muhafezekirin. Meriv karî bi şeklê der ava jî binivîse û bîne ziman.

Ev gotina bi wî halî xwe darabe, yan dar abe, fîl û kirinê tîne ziman. Der-ava yan der aba. Ji bona ku ev cîya vere avakirin, serrastkirin.

Rast û diristîya vê gotinê der û abandin e (der jî derî tê famkîrin. Abandin yan abad pehetîye. Meriv ku xwedî cîhekî be wêderê meriv bona hîmayekirinê bi darebe ava bike)

Ev gotina bi şeklê "deribandin" tê zimên ku; hîmî deribandinê ji bona nivînaye. Ji bona ku hirîya têda belav nebe. Rast bisekine. Ev herdu gotinana wekhev in



Huza, Xuda: Dîroke de bi navê Gutî, Cutî, Kussîyan ji rebê alemê re gotine huza (hoza) û dibêjin ev gotina wergerîye bûye huda yan hoda. Halbu ji wergerandinê re çî hacet. Hu-za, xu-za yan xo-za bi-xwa-za. Yanê bi xwe çêbû bi xwe hate dunê. Huda yan hoda, xuda jî tê wê maneyê. Hacetî wergerandinê nake. Bi herdu şeklan jî navê rebê alemê ye... (Kürtlerin Kökeni, İhsan Nu-

ri Paşa.)

Kirîv: Ev gotina ji gelê kurdan re tê gotin. Lêbelê Tirkên ku têkîlîya wan bi kurdan re heye ewana jî kirîvatîyê dikin û vê gotinê tînine ziman. Pir caran em dibihîzin, lê ku tê çî maneyî pir mirov nizanin. Kirîv; yekcara kîrbe yan kîrve tê gotin. Ji pîrekan re kirîvê, jî peya re kirîvo tê gotin.

Maneya vê gotinê di hundirê wê de hatîye veşartin. Kirîbî navê tevgerê ye. Kirîbatî mîna malbatîyê meqbûl e. Gotineka bingeha xwe fereh e. Sosyolojîk û cîvatîyê de gelek tê ziman.

Mizzez; îştah e, ev gotina tim bavê mîn î ku çûye ser dilovanîya xwe digot "hinnar mizzeza merî vedike." Li nav gelê me yî Ruhayê tê gotin.

Qedem; Şûna pekaka mirova ye. Ku dikî derekê bipîvin dibêjin çend qedem in. Yanî bi linga çend pek in. Îro ev gotina di Tirkî de bi gotina "qedemê" tê ziman. Bingeha wê kurdî ye. Sê qedeme derecek e. Di karê memurîyetyê de tê xebitandin.

Xîltan: Li Kurdistanê navê gîhakî ye. Bi tenê navê gîha nîne, ev gîha meriv pê diranê xwe dikole. Xîltan dîv xwarinê re bona tevdan û pakijkirina diran ye... Hinek dibêjin "dirankol." A rast xîltan e. Ev gîha li nav çem, kanî, neval û banîyên kurdan de tê dîyîn. Tirka gofîye kurdan, hinek dibêjin "kur-dan", hinek dibêjin "kurd-an". A rast kurdan e. Yanê ji cem kurdan hatîye, mahsûsê kurdan e... ■

tîretav û siba zer

Sidîq Gorîcan

dara zer
 bijûma zer
 belçima zer
 sêva zer
 zerêla zer
 şivka zer
 gula zer....
 her tişt zer ji tava zer bi vê siba zer
 ah! bi melûliyê bûm zîr-zeber
 li hember vê siba zer vê siba kerr

ava zer
 hewayê zer
 berfa zer
 axa zer
 pêta zer
 bayê zer
 pêla zer...
 her misqal zer ji tava zer bi vê siba zer
 ah! bi kederê bûm zîr-zeber
 li hember vê siba zer vê siba kerr

asoya zer
 berbanga zer
 tîretava zer
 payîza zer
 çila zer
 wextê zer
 havîna zer
 leyla zer...
 her dem zer ji tava zer bi vê siba zer
 ah! bi fenabûnê bûm zîr-zeber
 li hember vê siba zer vê siba kerr

newala zer
 çola zer
 deşta zer
 terazina zer
 baxçê zer
 kanîya zer
 gira zer
 mêrga zer
 qesra zer
 kepra zer
 zozanê zer
 çincîla zer...
 her der zer ji tava
 zer bi vê siba zer
 ah! bi bêwarîyê
 bûm zîr-zeber
 li hember vê siba
 zer vê siba kerr

çermê zer
 rûyê zer
 pûncika zer
 diranê zer
 barê zer
 zêra zer
 êşa zer
 karê zer
 zereka zer
 guneha zer
 dila zer....
 her têgeh zer ji tava zer bi vê siba zer
 ah! bi nedametîyê bûm zîr-zeber
 li hember vê siba zer vê siba kerr

xewa zer
 helbesta zer
 hişyarîya zer
 kilama zer
 rastîya zer
 canzerîya zer
 înkara zer
 hesûda zer
 tengezarîya zer
 neçarîya zer
 birîna zer
 firehîya zer
 tenêtîya zer
 hûzna zer
 kula zer...
 her hal zer ji tava zer bi vê siba zer
 ah! bi bedbînîyê bûm zîr-zeber
 li hember vê siba zer vê siba kerr

kalê zer
 pîra zer
 keça zer
 lawê zer
 ciwana zer
 pitika zer
 mêrê zer
 jina zer
 xulamê zer
 mîrê zer
 hevalê zer...
 her mirov zer ji tava zer bi vê siba zer
 ah! bi nekesitîyê bûm zîr-zeber
 li hember vê rengê zer vê siba kerr

Sebrê Sebrê

Ismet Behrewanî

e vîna dilê min sebrê
ez dilê dilê xwe me
bêhna şeveke qedexe
dikêşime hundirê xwe

bêhna te bêhna şevê ye
bêhna dildarîyê diramuse
gerestêrkên beyanî
tu
yek ji wan stêrk û gerestêrka yî

sebrê sebrê
tu li ezmana ez li erdê
tu li yerîvanê ez li wanê
di navbeyna me de
bi hezaran çîya û banî

sebrê sebrê
dizanim êdî tu
rûpelek î ji raborîya min a kambax de


Bihûştta Lal

Salihê Kevirbirî

Heta ji destên min tê, berhe-
mên ku bi zimanê kurdî
derdikevin peyda dikim.
Heger li gorî dilê min bin,
bi coşeke mezin dixwînim.
Pirtûka Selahattin Bulut jî, yek
ji wan pirtûkan bû ku dema
min dest bi xwendina wê kir,
heta dawîyê min berneda. Pir-
tûka ku ji deh kurteçîrokan pêk
tê, ji Weşanxaneya Avestayê bi
navê "Bihûştta Lal" derket. Bê-
yî mubalexe dikarim bibêjim
ku her kurteçîrok ji ya din
xweştir e. Kekê Seleh, kurteçî-
rokên xwe bi zimanekî wisa
şahîk û herikbar nivîsandîye
ku hew mirov dibîne ku çîroka
dawî jî qedîyaye.

'Rê' kurteçîroka yekem a
pirtûka navborî ye. Bi dîtina
min senaryoyeke baş ji vê kur-
teçîrokê derdikeve. Di dema
xwendinê de, xwendevan xwe
yekser di nava otobosa ku ji
Dêrikê ber bi Dîyarbekirê ve
diçe de dibîne. Taswîr ango şî-
bandinên xweza, ajal û miro-
van wisa bi hostehî hatine ki-
rin ku bêyî nepixandin, dika-
rim bibêjim ku nivîskêr bi pey-
van ketîye zikrê. Ev têrê nake,
xwendavan jî ber bi vê zikra
çêjdar ve radikişîne! Fermo ni-
mûneyek ji vê çêjdarîyê:
"...Şofêr bandek xist teybê, fi-
têz guherand û pê li xazê kir.
Dîkekî ku li dawîya otobosê
girêdayî bû xwe pirpirand, bi
du-sê dangan bang da û bi ni-
kilan bi benên lingên xwe ket.
Rêwîyan serên xwe rakirin, li

hev nêrîn û dest bi xeberdanê kirin. Zilaman heta bi Dîyarbekirê ji hev re qala eskerîya xwe kirin..." Vê kurteçîrokê, 'Vardîyaya Mala Toprakan' anî bîra min. 'Vardîya' otobosa zarokatîya min bû. Ya rast ne otobos bû, qamyoneke kevn a sergirtî bû. Çadirek li serê qaseya qamyonê pêça bûn û ew kiribûn makîneyeke rêwîyan. Di kelakela havînê û seqema zivistanê de qaseya 'Vardîya' yê ji zarokên heft salî heta pîrên heftê salî mişt tije dibû. Heta



niha jî nizamim çima navê 'Vardîye' li vê makîneyê kiribûn. Qamyon serê sibê ji gundê Mala Toprakan radibû, li zêdeyî deh gundan digerîya, rêwî tevî dîk, mirîşk, elok, pezên wan radikirin û ew dibirin Misircê (Kurtalan). Êvarî jî, ji Misircê ber bi gundan ve keftûlefta rêwî û qamyonê destpê dikir.

Teyrika Bihuştê, Gewrê, Bayê Xurîfî, Kevirê Kerr, Derbe, Alimê Rewşa Hewayê, Şerbik, Wan Salan û Lal kurteçîrokên din ên pirtûkê ne.

"Derbe", çîroka Seydoyê

Êşa Evînê

Raîfê Bêçare

Xwendin a xwendin!
Tu ji min dûr î ez ji te nêzîk
Dûrîya te girîn
Nêzîkîya min êş û keder

Dest davêjim te nagêjê
Hiş û dil û çav digihêjê
Ne ez bi hiş im ne jî bi çav
Tenê bi dest û bi nig im
Carna digêjim te bi dest digrim
Ew dem çav histir
Dil bi hewar
Hiş bê kesî û nezanî

Ax xwendin ax xwendin!
Bi te zanaî û bê te nezanî
Zanaîya te bi min erdhêja
Nezanaîya te jî bi min tofan
Ne bi te dibe, ne jî bê te
Bi te ye zanaî
Ew jî ser min êş e
Tu ji min dûr, ez ji te nêzîk
Û nêzîkîyeke ne rast
Û dûrîyeke bi rast

Ax xwendin axx!
Ez bê hiş im, bi te bi hiş

Hewar e

Seydayê Muhemmed Nûrî

*D*e ka rabin gelek dosta hewar e
Hewar e hey hewar e sed hewar e

Emê bimrin biçin qebrê muheqqeq
Bixwin goştê me jî ev mişk û mare

Çikû çû ji destî du şeyxê kamil
Li dergahê ewan me zare zare

Ewê ewel ku Şeyx Seydayê kamil
Yê duduyê Seyyîd Elî bo jê re yar e

Dikim hêvî li dergahê te Ya reb
Bikî rehma xwe jî li me dost û yare

Neçî ji dinyayê bê ehd û wefasiz
Ji Xwedê bixwaze tu gelkî pir hewar e

Emê bimrin biçin heşr û hîsabê
Xwuda dergahê xêra li me bikî kare

Xweda mehrûm nekî ji feyda ewa me
Çawa li dinyayê me boran bi wa re

Xweda rebbî Tu Xeffar û Rehîm î
Bikî efûyê li me wan gunhê hare

Nekî li ser me musellit wî leînî
Lepê wî da nekî me şermezare

Digerhê li îşê me daîm xirabî
Weke bav deynê zaroka bi dare

Hîsab bûye li cem wî îş tamamê
Welakîn bi quwweta Te ew nikare

Biro vedibêje ku bi serê xwe ev serpêhatî trajedîyek e. Behsa psîkolojîya mirovekî piştî derbeya leşkerî tê kirin ku derbe ango cuntayê, tîrsa mirovekî ji eskeran çawa çar qat zêdetir kirîye. Tirsekî wisa ku ji roja pêkhatina derbeyê mirov çûyîna nava nivînan jibîr bike, doxîna mirovî ne ji helal û ne jî li heramê re vebe!

Apê Reşoyê ji Gundê Fiti-nê, di kurteçîroka bi navê "Wan Salan" de cih ji xwe re terxan kirîye. Nivîskar, di vê serpêhatîyê de salên şoresgerîya xwe vedibêje ku ew dem jî rastî derbeya leşkerî hatine. Her wiha nivîskar bedewîya salên raborî ji dorhêla Dêrika Çîyayê Mazî vedibêje ku ev bedewî xwe li Binxetê û Çîyayê Kurmênc jî dide nîşandan. Serxet û Binxet di kêm serpêhatîyan de wisa xweşik li hev tê: "Gava mirov bi pişt malên Fitinê diket û qîyameyî Textê Gewr dibû, di nav darên tehew, behîv û mêwên tirî de gundikekî ku çend malek bû xuya dikir. Navê wî gundikî, Erbelûş bû. Her sal di Newrozê de li ser zinarên derdora Erbelûş û Fitinê, li serê timikên herî bilind, li ser Tûmikê, Pozê Hûto, Pozê Holê, Pozê Şîn û li ser Textê Gewr me çend agirên xurt dadidan û berê xwe dida Binê Xetê, Çîyayê Kurmênc. Gava ronahîya agirên me xwe digihand kurdên binxetê, wê wextê wan jî agirên xwe xweştir dikirin û bersiv didan kurdên Serxetê..."

"Gewrê" serpêhatîya bûkeke ciwan radixe ber çavan. Gava li ber çavên Gewrê destên mêrê wê kelemçe dikin û ji

Îstasyona Trênê ya Dîyarbekî-rê, bi trêna sewqiyatê dişînin eskerîyê bûkeke du mehî ya terî-teze ye. Gotinên li pey mêrê xwe, li pey rabûna trêna ku vedibêje û dilorîne nivîskar bi vî awayî darêjtîye ser pelikên ka-xêz: "Marê Reş, marê reş, te çer xortê mîna beranekî ji xwe re daqurtand û tu çûyî?!" Ji ber ku çîrok di serdema Herba Koreyê de derbas dibe, em dikarin bibêjin ku serpêhatî di destpêka salên 1950'î de pêk hatîye. Tê kifşê ku zavayê du mehî bûye 'seferçî'. Di serdemên kevin de ji kesên ku dişandin herbê û piranîya wan nedihatî an jî piştî gelek salan kêma kes ji wan vedigerîyan re, 'seferçî' digotin. Vêca piştî 'sefer' ango çûn û nehatina mêrê Gewrê, jîyana jina ciwan serdanpê diguhere, derûnîya wê xerab dibe, gelek caran ji ber nebûna 'hevşabûn' û kesê di nava 'sing û beran' bi nava poxan û benderên gund dikeve, dîn û har dibe. Ev jî dibe sedem ku pêrgî dab û nêrît ango kevneşopîyên civaka paşdemayî bibe. Qayîşkêşan û xirecira di nava bûk-xesûtîyê jî, alîyeke din a vê serpêhatîya cegersofîner e.

Di "Bayê Xurîfî" de serpêhatîya Apê Seydî ya mîzahî, di "Teyrika Bihuştê" de serpêhatîya kezebşewat a Pîra Fatê û nedî-nebûyîna keça wê ya ciwan Şukranê heye ku bi xwendina vê kurteçîrokê re pûrtê canê mirov radibin.

Bihuştalal, Selahattin Bulut,
Weşanxaneya Avesta 2006, 72
Rûpel, Kurdî ■

Wekî hat pêşya we melûnê şeytan
Selawata bidin li ser Nebîyê Muxtar e



Wekî bigrî yekî ji me ebdê ehmeq
Quwwet nîne me ji destê ejdehare

Herawêra dibin jê ra bi teslîm
Weke yek bigri filek koremare

Xweda rê nedî wî şeytanê melûn
Ji rehma Te xeberdar in hewar e

Muhemmed Nûrî tu gelkî nezan î
Bike ji Rebbê xwe daîm karekare

Dikim hêvî li dergahê te herdem
Xilas kî me ji destê wî ejdeha re



Ji bo xwestinê

Nûbihar
www.nubihar.com
info@nubihar.com

Weşanên Nûbihar

Kitêbên Kurdî	YTL
Rîsala Bîratîyê/ Seîdê Norsî	3.00
Peyîva Bîst û Sêyemîn/ Seîdê Norsî	3.00
Peyivên Piçûk/ Seîdê Norsî	4.50
Nimêj Dikim/ Komisyon	5.00
Gazîya Min/ Berhîm Paşa	4.00
Rubaîyat/ Omer Xeyyam	4.50
Dubeytî/ Baba Tahirê Uryan	6.50
Çarîn/ Sabah Kara	4.50
Peyxamberê Ummetê Hz. Muhammed/ E. Botî	6.50
Leyla û Mecnûn/ Siwadî	7.50
Dîwan/ Seyid Elîyê Fındikî	8.50
Çil Hedîs / İmamê Newewî	5.50
Feqîyê Teyran/ M. Xalid Sadînî	11.50
Kelîle û Dimne / Beydaba	8.50
Teyrê Xerîb / Xurşîd Rûşen	1.25
Abdullahê Minyeyî / Hekimoğlu İsmail	8.50
Seyf-ul Milûk û Melke Xatûn/Siyahpoş	8.50
Gulşenê Raz / Ş. M. Şebusterî	6.00
Pênc Rîsaleyên İmam Xezzalî	6.00
Gulistan / Şeyh Sa'dî-i Şirazi	8.50
Leyl-name/Ayhan Geverî	5.00
Ferhanga Destî (Kurdî - Kurdî) / U.Demirhan	8.00
Evîna Pinhan / Sabri Akbel	5.00
Cildên Kovara Nûbiharê (9 Cild, cildek)	25.00

Kitêbên Kurdî-Tirkî

Nameyên Bêcewab-Karşılıksız Mektuplar/ S. Kara	5.00
Mersîyeyên Rojhilat-Doğu Ağıtları/ S. Kara	5.00
Gotinên Pêşîyan û Botan Atasözleri.../A. Bingöl	12.50
Melayî Cizîrî Divanı'nın Şerhi/A. Septioğlu	9.00

Kitêbên Tirkî

Bediüzzaman'ın Hayatı/ Abdurrahman Nursî	5.00
Bediüzzaman'ın Volkan Yazıları/ Osman Resulan	4.00
36. Paralel ve Ortadoğu/ M.Selim Akdoğan	5.50
Çağdaş İnan Şiiri Antolojisi/ Sabah Kara	5.00
Asilerin Dönüşü / Gülistan Çoban	5.00
İslam Tarihinde Kürt Kadını / M. H. Yüsuf	5.00

Kitêbên Em Belav Dikin

Alimek û Zordarek/ Dr. Yûsif el-Qerdawi	4.00
Cewhera Eqîdeya İslamê / E. Tahir El-Cezaîrî	4.00
Şark Uleması/ Mehmet Çağlayan	10.00
Osmanlı Rus ve İran Savaşlarında Kürtler /A.	10.00

Kitêbên Em Belav Dikin	YTL
Dîroka Dugelên Kurdan/Abdullah Varlı	15.00
Qur'ana Pîroz û Arşa Wêye Bilind/Abdullah Varlı	22.50
Meala Fîrûz û Şerha Qur'ana Pîroz / M.M.G. Farqînî	20.00
Mewlûda Nebî / Ertûşî (cildkirî, du reng, şamûe)	10.00
Kürt-Ermeni İlişkileri/Mayevsıy	12.50
Kurd û Pêvegîriya Nişa û Dîroka Wî/ Reşid Yasemi	12.50

KENT YAYINLARI

Seyahatnamelerde Diyarbakir/ M. Ş. Korkusuz	24.00
İnsanlığın Ortak Aklı (Antoloji)/M. Halit Yalçın	30.00
İslâm'ın Anadoluya Gelişi/ Ahmet Demir	8.00
Vadedilen Günler / Taha Hüseyin	7.00
Bütün Yönleriyle Arabkendi / M. Şerif Eroğlu	10.00
Tezkire-i Meşayih-i Amid/M. Ş.Korkusuz	24.00
Ali / Ali Şeriatî	17.50
Kuruluş Döneminde Eyyübiler / Ali Beyyümi	10.00
Mem ile Zîn / Necdet Karasevda	6.00
Mazlum Halepçe / Müştehir Karakaya	5.50
Urfa Efsaneleri / Mehmet Kurtoğlu	10.00
Diyarbakirli Şair-Sırrı Hanım / M. Ş. Korkusuz	7.00
Aşk ve Savaş (Devriş-i Evdi) / Necdet Karasevda	9.00
Amid'den Diyarbakir'e Eğitim Tarihi / M. Şimşek	6.50
Medreseden Meclis'e... / Gıyaseddin Emre	12.50
Süryaniler ve Diyarbakir / Mehmet Şimşek	12.00
Mem û Zîn / M. Saîd Ramazan el-Bûtî	7.00
Siyamend / M. Saîd Ramazan el-Bûtî	7.00
Tarihin Adı: Urfa/ Misbah Hicri	7.00
Çığığa Duran Sözler / Misbah Hicri	5.00

Ferhenga vê hejmarê

adrewanî dewamî, hergav.
ahengsaz hevdeng, lihevhatî.
axivtin qisekirin, peyivîn.
Berevanî midafeakirin.
bergeh aso.
berhem eser, telîf.
bextewar şad.
bişkiwtin nûvebûn.
cangorî qurbanbûn.
çêlkin behskirin, qalkirin.
çiravk ava nepaqij, ava serşokan.
çirik şurik, wezîb.
daherizî dawerivî, tiştêkî şil ku ava wî jê biçe û zuha bibe.
derçik pêlik, derence.
derfet imkan, firsend.
dewl satila ku ji bîra av pê tê kişandin.
diçilvile (çilvilin) diçirûse, dibiriqe.
dihêne diêne.
dilik aborî.
dirh nîşan.
dohn rûn, rûnê ji hilandina bez çêdibe.
durdane libên mircan.
'et met.
êrdim herêm, dever.
exleb bi pirranî, para pirrtir.
fêris mehin.
feslî demsalî, mewsîm.
gêlaz qeresî, kîraz.
gerasîsk firtone
gerestêrk rojgêran, stêrk.
gestin devlêkirin, gezkirin.
gewez sorîya agir
gogerçin kevok, kebok.
gorbehişt cennetî.
hawir dor, cih, dever.
hehecîk hecîreşk, çivîkeke ku di biharê de tê.
heman eynî.
hevkar hevalên eynî karî, ên ku pev re dixebitin.
hevpişe kesên di eynî meslekî de.
hevrê hevalên eynî rêyê.
hevstirandin di nav hev de stiran-din.

hilveciniqandin ji tîrsa hilperîn.
hingaftin guvaştin.
hivehînin dihûnin.
jûra termî oda mirîyan, morg
kankol gûzikê bi dara berûyê ve çêdibe, gilover, bi niçik û nerm e.
keştî gemî.
kişwerze çiflik.
kite fer, yekane.
lawaz zeif, qels.
lêker fiil.
mawe midet, dem, wext.
mefa hayde, menfîet.
mehandin meyandin, heyvankirin.
mehdik dergûş
merzel gor, mezel.
mexber meqber, gor.
mikurbûn îtrafkirin.
Mirdês navê eşîrekê ye ku bi pirranî li devûdora Semsûrê Kolîkê dijîn.
misêwa daîmî, berdeyam.
misoger miheqeq.
moc pêl, mewc.
navgîn alet, wasîte.
nehênî menfî, tiştê nayên qebûlkin.
nîrewer ronakbîr, mutefekkîr.
niva nexwe, balo.
nûxirî zarokê yekem.
olî dinî, mezhebî.
parêzer awuqat.
pêkutî zordestî.
pêşbazî musabeqê, pêşbirk.
pêvek paşbend, qertaf.
pexşan nesîr, nivîsa bê wezin.
peywendî elaqe.
pirotangî qermîçandina kefa destê ku pîrr di avê de dimîne.
pişevan hevmeslek, hevkar.
qasid kesê ku bi gihandina agahîyêkê hatiye wezîfedarkirin.
qelawîsk rûniştina li tutikan.
qorî muhafezekirin, parastin.
ragihandin neqilkirin, gihandina agahîyan.
Rêgeh çiyê çûyîn û hatinê.
remz nîşan, alamet.
renc derd, ezîyet, zorî, zehmetî.

resen sade, têkûz, esil, orijînal.
rewan tiştê bi rihetî û xweş diherike, diçe.
rêweresm merasîm.
rewxan hilweşandin.
salox naskirin an jî dîtina tiştêk wînda.
sersewixandin paşguhkirin, guhnedayîn.
sext zor, zehmet, sert.
su hêrs.
sûdwegirtin faydedîtin.
şabîkirin tamkirin
şarevanî beledîye.
şarezayî ronakbîr, munewer, agahdar, hayjê, medenî.
şêl û pêl hal û rewş, rê û rêzanî.
şemirandin terkkirin, devjêberdan, bêxwedî hiştin.
şêwe şiklê, awayê.
şipl çeleng.
têdikoşin mucadele û berxwedanê dîkin.
temen umur.
teriqandin reva ji tîrsa ku mirov nizane bi kûve.
term laş, mirî.
tewang (di rêzimanê de) kişandina nav û lêkeran.
tewsî şîret
tifal zarok
tomerî bi tevayî.
veresîyaye filitîye, vebûye.
vexwendî ezimandî, dawetkirî.
wate mane.
wêje edebîyat.
wêne, sûret, resîm.
werze matematîk.
wisa wilo, weha, were, wirga.
xame nû gihayî, nazik, ciwan
ximitî esasî, bingehî.
xwezayî tîbet, siruşt.
zanko fakulte.
zeyî keça zewicî ya ku tê mala bavê xwe.
zihûm mezeloqa firaxên bi rûn.

pêşbazîya jimara 100.

Bi sedema jimara Nûbiharê ya 100. me pêşbazîyek vekirîye.

Pêşbazî di du beşan de ye: Çîrok û Helbest.

Kesên ku dixwazin beşdarî vê pêşbazîyê bibin divê berhemên wan heta **31 Çileya Paşîn/Rêbendan 2007**an bigihêjin destê me.

Emê encama pêşbazîyê di jimara 102. de îlan bikin.

Mercên pêşbazîyê:

1- Divê berhemên şandî, heta niha nehatibin weşandin.

2- Çîrok ji 5 rûperan zêdetir nebin.

3- Divê nivîs hem bi rêya e-mailê û hem jî li ser kaxizê ji me re bête şandin.

Nûbihar/Helbest JÛRÎ

Arjen Arî
Berken Bereh
Malmîsanij
Rojen Barnas
Sabah Kara



Nûbihar/Çîrok JÛRÎ

Farhad Shakely
Firat Cewerî
Hasan Kaya
Hesenê Metê
Roşan Lezgîn

Têbînî: Nav li gor alfabe yê hatine rêzkirin

XELAT:

Yekemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbiharê û pirtûkên wê


Duyemîn: Plaket û 10 Cildên Nûbiharê

Sêyemîn: Plaket û Pirtûkên Nûbiharê

KENT'in ışıkları



Şiir, 96 s.



Deneme, Anı, Gezi Notları, 192 s.



Ji Nûbiharê romaneke
evînê...

Zimanekî zela
û hêsan.



Roman, 112 rp.